.

•

# Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê 2

•

*Abdusamet Yîgît*

*Weşanên soran*

.
.
.
. **Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê 2**

*Abdusamet yigit*

*@Abdusamet yigit*
*Çap 3*
*Berlin/adar-2016*
.

email: han-grafik@hotmail.de

.
Çap û Grêdan :
Concept medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
ISBN 978-3-945956-01-1

**Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê 2.**

Li vir, destpêkek bi gotina ´şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd k u hatî meşandin´ kirin, wê di serî de rastîya şerê bi salane li hemberî civate kurd ku ji aliyê rejimên herêmên ên weke tirkiya ve ku dihê dayîn, wê werêne ser ziman. Di serî de gotineka bi vî rengî, wê rastiyê baştir werêne ser ziman. Pêvajoyên vê şerê ku rejima tirk li hemberî civate kurd dide, giring ku mirov fahm bike. Li vir, herî zêde, rejima tirk, xwe di nava vî şerê bi armanca jenosîdkirina civate kurd de winda kir. Lê ne ew tenê bû. Divê ku mirov rejîmên weke rejima baasê a îraqê a kevn, rejima baasê a Sûrî, rejima îranê a îslamî û berî wê ya behlevîyan û hwd jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov di serî de werêne ser ziman ku me heta vir, bi teybetî li ser pêşketin û rûdawên demkî û rojevî ve hewlda ku rastiyê werênina ser ziman. Bo ku şenberîya vî şerê bi armanca jenosîdkirina civate kurd fahm bikin, hinekî jî min pêwîstî bi wê dît ku li ser minaq û kiryarên şenberî re herim û werênima ser ziman. Bi wê re jî, bi demê re sîyesetek çawa li hemberê civate kurd hat meşandin, bi wê re wê ev jî were fahm kirin. Sîyeseta netew dewletê, rêbazên weke ´bişavtinê´, di nava sînorê xwe de li ser serê xalk û civatên ku di bin desthilatdarîya wê de dimeşêne. Ji aliyê çandî ve dike ku wan bênasnema bike. Ji aliyê ziman ve, dike ku wan ji zimanê wan dûr bike. Ziman û çand, du rastiyên ku di çerçoveya jîyane civatî û pêşketina wê de û bi hebûna wê re divê ku mirov bi hevdû re hilde li dest û werêne ser ziman. Dema ku zimane civatekê, were qadaxakirin û ankû ji destê wê werê girtin, wê ew civat, weke ku pêşî were bênasnema kirin û piştre wê bê xistin li pêvajoya ji hevdû felişendinê de. Ya ku hatî hanîn li serê civate kurd jî divê ku mirov di vê çerçoveyê de di serî de werêne ser ziman.

Zimanê kurdî, qadaxa ya. Tenê li bakûrê kurdistanê, tevî hijmara kurdan ser 20 milyonan re, tenê win dibistanekê bi navê wan û bi zimanê wan nabînin ku ew di wê de hem xwe û zaroyên xwe karibin perwerde bikin. Ev rastî tenê, bi serê xwe, rastîya pêvajoyên şerê jenosîdê pirr baş dide ravakirin. Vêca, ya ku hat serî civate kurd, ew bû ku pêşî zimanê wê hatibû qadaxakirin û bi pergale perwerde re ew li ser zimanê tirkî re dihat perwerde kirin û kurdên ku doza maf û azadîyê binavê civate kurd dikirin jî, rastî tûndûtûjiyê û hwd dihatin. Heta ku weke ku di pêvajoya 40 salîya dawî a şerê rejima tirk a li hemberî civate kurd ku meşandî, mirovên ku doza maf û azadiyê dikirin, dihatina girtin, dihatina avêtin li zindana û bi wê re heta ku bê sûc û sûal dihatina qatilkirin. Rewşa bi hezaran rewşenbîr û pêşengên civate kurd, mirov dikarê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Ji qatilkirina

rewşebîrên kurd ên weke Musa Anter û heta qatilkirina kurdên weke Tahir Elci, wê bi hezaran kurdên bi vî rengî ji aliyê polîs, leşker û hêzên rejima tirk ve werina qatilkirin. Wê bikujin û wê bi navê «´failî mechul» werênina ser ziman. Yanî, ti kes nizanê kê kuştîya. Lê ev gotin, bi karhanîna wê bixwe jî, di vê çerçoveyê de dibû, weke maske û sernûxûmandinekê ji qatilkirinên bi destê polîs, leşker û hêzên dewletê ên teybet ve.

Bêgûman hê gelek rastîyên ku di vê çerçoveyê de bi dîrok û mejûya civatê re ku bûna ku mirov wan werêne ser ziman. Heta roja me, tenê ji di salên dawi de, ji sale 1980´î û heta sale 2015an, ser 200 hezar kurdî re ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hatina qatilkirin, ji ber ku kurd bûn û doza maf û azadîya civate kurd dikirin. Dewleta tirk, ev komkujiyên ku dikirin, di bin navê gotina «terorê» de dikirin. Her wusa, gotina ´terorê´ weke maske û sernûxûmandinekê dihat bikarhanîn. Di serdemeka ku wilqasî çapameniyê pêşketî û popûlerîte derketîya li pêş, bi vê gotina ´terorê´ ´îtham´ kirin jî, wê temenê herêkirin û ne herêkirinê bê. Ji vê aliyê ji aliyê derûnî ve, wê bandûraka wê li ser derûnîya mirovan wê hebe. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê bandûra vê gotinê li kurdan bixwe jî hebe ku gelek dordorên kurd, ku xwe ji tekoşîna maf û azadiyê a kurdan ku xwe dûr jî bidina nîşandin. Yan jî, ku çendî ku dixwestin ku xwe nêzî wê bikin jî, wê bi bandûra vê gotinê nêz nebin. Lê bi demê re bi tekoşîna ku hat dayîn, civatê xwe ji nû ve afirand û bandûra vê gotinê hat şikandin.

Her wusa, pêvajoya şerê rejimên herê bi kurdan re, wê dîrokekê li herêmê bide nivîsandin. Bo ku kurdan li herêmê bêstatû bihêlin û wan hin bi hin ji dîrokê bibin, wê şerekî mazin bi wan re were dayîn destpêkirin. Şerê bi armanca ji hevdû felişendina civakê û bi wê re jî ji dîrokê birinê, divê ku mirov weke şerê jenosîdê werêne ser ziman. Her wusa, divê ku ez werênima ser ziman ku kurd, î ro di pêvajoyên bi vî rengî de derbas bûn û hatina heta roja me. Pêşketineke mazin bi xwe re dana çêkirin. Î ro jî, ew pêşketina wan ya civatî jî, bo ku were ji holê rakirin, hatîya armanc girtin. Di çerçoveya pêşxistina hêrîşên li hemberî civate kurd de afirandina rêxistinên hov û kujar ên weke DAÎŞ, ahrar el-şam, cebetil-nasr´ û hwd, wê bi armanca ji holê rakirina pêşketina civate kurd a ku afirî bê.

Pêvajoyên şerê jenosîdê ên li hemberî civate kurd ku hatî meşandin, wê weke beşek ji dîroka kurdan bê. Wê dîroka kurd û civate a hemdem bide nivîsandin. Piştî şerê cihanê ê yekemin, komkujiyên weke komkujiya zilanê, komujiya agirî hat hanîn li serê civate kurd. Di van komkujiyan de bi se hezaran kurd hatina qatilkirin û gûnd û baajarên kurdistanê hatina ji naqşeyê birin. Di salên weke 1937´an û hwd de, wê komkujiyên weke komkujiya dersimê ku heta roja me bandûra wê ya derûnî li ser civate kurd heya, wê

werina kirin û hanîn li serê civate kurd. Piştî vê komkiujiya(´komkujiya dersimê´) hov û pirr mazin ku di wê de ser sed hezarî re di wê de kurd hatina qatil kirin, wê komkujiyên din ên weke komkujiya helebçê, wê werênina serê civate kurd. Her wusa, ev komkuji, berî wê jî heya. Dema ku em berî wê bikin ku werênina ser ziman, divê ku em dîroka wê bibina heta dema avabûn û xûrixandina komare mihabadê. ..

Her wusa, piştî salên 2000´an, wê pêvajoyek nû werê hanîn li serê kurdan. Weke ku çawa ku serokên kurd berê hatina dilgirtin û bi dervekirin weke Sêd Riza, wê serokê tevgera kurd a demî ku tekoşîna maf û azadîya kurd dide PKK´ê jî were dilgirtin, bi armanca tafisandina wê tekoşîna civate kurd a maf û azadîya civate kurd. Piştî wê re, wê her roj komkujiyên mazin werina serê civate kurd. Herî dawî, wê di sale 2014´an de komkujiyên mazin ên weke komkujiya şengalê ku weke ´fermanekê´ ya ku hatî serê kurdên êzîdî, wê bê hanîn li serê civate kurd. Her wusa, li rojavayê kurdistanê bi sedan komkujiyên ku hatina hanîn li serê civate kurd, wê komkujiyên weke komkujiya kobanê wê werênina serê civate kurd. Her wusa, divê ku mirov di dewama wê şerê ku rjeima tirk li hemberî civate kurd meşandî de ser 8 milyonan kurdan re ji salên 1980´î û heta 2015´an wê bên goçberkirin li cihanê. Her wusa, wê tenê ji sale 2014 û sale 2015´an ser 2 milyonan re kurd ji herêmên wan hatina goçberkirin. Heman rewş, di dema komkujiyên helebçê de li başûrê kurdistanê hatina kirin. Li rojavayê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê jî, bi demê re û ku li demê belavkirî, wê pênaberîya kurdan ji herêmên bi awayekî plankirî wê were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de î ro, em dikarin bahse ´dîyasporaya kurdan´ a li dunyayê bikin. Dîyasporaya kurdan bi deh-milyonan li dunyê hat pêşxistin û hê jî didomê.

Pêvajoya ku î ro em di wê de na, em divê ku werênina ser ziman, li herêmê, wê çawa kurdan ji herêmên wan bikin, wê şerê bi kurdan re bikin. Kuştin, qatilkirin û komkujî, rêbazê fîzîkî ê pêvajoyên jenosîdkirina civate kurd bê. Bi wê re weke aliyê din ê duyemin jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku bişavtin û pêşxistina dîyasporaya kurd´, wê weke rêbaza duyemin a pêvajoya jenosîdkirina civate kurd bê. Bi wê re jî, wê weke rêbaza sêyemin bê ku nehêlin ku kurd li ser axa xwe li kurdistanê bi navê civate kurd, ku xwe biafirênin. Bo vê yekê û bo ku pêşîya kurdan di vê çerçoveyê de bigrin, wê zimanê wan were qadaxa kirin. Ev jî, wê li her çar beşên kurdistanê, werre pêşxistin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku qadaxaya li ser zimanê kurdî, wê bi wê bê armanc girtin ku kurd nikaribin xwe bi zimanê xwe perwerde bikin, xwe bi çandî û hwd biafirênin û pêşbixin. Kurdên ku zimanê kurdî bikarhanîna jî, qatilkirina wan jî di nav

de, wê her rêbazên tûndûtûjî, êşkencekirin û girtin û kirina wan ya di zindanê de wê were pêşxistin.

Şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd ku hatî meşandin, di vê çerçoveyê de bi gelek aliyên wê re mirov dikarê li ser wê bisekinê û werêne ser ziman. Di nava pêvajoyên vê şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd ku hatî meşandin de, wê hebûna civate kurd bixwe jî were redkirin. Ji xwe, wê rejimên herêmê ên weke tirkiya û hwd ku vî şerê jenosîdê li ser serê civate kurd dimeşênin, wê bibêjin ”kurd tûna na”. Kurd, wê bikevina wê derûnîyê de ku pêşî hebûna xwe bi birhan(´îspat´) bikin. Ev rewş bi serê xwe, xwediyê derûnîyek giran a. Civatek ku hebûna wê bixwe di serî de hatî redkirin û ji andamên wê re tê gotin ku ´kurd tûna na´, wê di vê çerçoveyê de bike ku bide nîşandin ku heya. Bi vê yekê, kurdan, dîroka xwe nivîsandin. Li vir, pirsgirêka nasnemayê di serî de xwe di meji de dida li der. Wê di vê çerçoveyê de heta roja me jî, şerê bêstatû hiştina kurdan, bi kurdan re were dayîn. Hêrîşên li hebûna civatîya kurd, wê di vê çerçoveyê de dîrokek mazin bi xwe re bidina nivîsandin. Komkujiyên ku berê di hemû deman de hantina hanîn li serê civate kurd û piştre ku heta roja me dihên hanîn li serê civate kurd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Em î ro di sale 2016´an de dijîn. Her wusa, em hê jî, şahidiyê li şerê ku li hemberî civate kurd dihê meşandin re dikin. Komkujiyên ku li bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Silopî, Sûrê, Nisêbînê, farqînê û hwd ku hê tên kirin, divê ku mirov di çerçoveya vê şerê jenosîdê ê ku li hemberê civatê kurd tê meşandin de werênina ser ziman.

Î ro, hemû maf û azadîya civate kurd ji destê wê hatîya girtin. Maê xwe pêşxistinê ê civatî ê wê ji destê wê hatîya girtin. Zimanê wê kurdî, qadaxaya ku bi wê xwe perwerde bikin û bixwênin û werênina ser ziman. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku di pêvajoya hêrîşên ku piştî 7´ê hezîrene 2015´an û pê de ku li hemberî civate kurd ku li bajarên kurdan hatina dayîn destpêkirin de, leşker û polîsên tirk bi her cûre çekên giran hêrîşê li jîyane civatê dikin. Derîyên malan dişikênin û dikevina malan de. Her wusa, jîyane malbatî ku heya, temenê xira dikin.

Dema ku civate kurd xwe diparêzê jî, bi gotinên ´terorê´ wê xwe parastinê dihênina li ser ziman. Kurd, di vê çerçoveyê de di bin dorpêçkirina pêvajoyên jenosîdkirinê de jîyane xwe jîyan dikin. Hêrîşên li jîyane civatê, ên ku bi oparasyonî hikimeta tirk ku dawutoglu serokwezirê wê ya ku dikir, wê bajarên kurdan, bi xwe re kavil bike. Civat, hêrîşên di bin hêrîşên mazin de dijî. Kurdan, bo ku xwe ji van pêvajoyên jenosîdê biparêzên, rêveberîya xwe yên xweser li bajarên xwe denezendin. Piştî ku kurdan ew rêveberîyên xwe ser denezendin, êdî asta hêrîşên rejima tirk û hwd, li wan derket asta

herî bilind. Kurdan jî, li hemberî wan hêrîşan, weke rêyeka xwe parastinê, ´hendek´ kolan li taxên xwe ku pêşîya ketina taxan bigrin û rastî hêrîşê newin. Bo vê yekê, divê ku mirov werêne ser ziman ku kurd, bi vê rengê, wê bi berxwedana rêveberîyên xwe yên xweser ku bi hendekan dikin re wê bikevina sale 2016´an de.

Li bajarên kurdistanê, piştî berxwedana kobanê, wê pêvajoya hêrîşan li bakûrê kurdistanê li hemberî civate kurd were dayîn destpêkirin. Bi pêvajoya hêrîşan re rejima tirk, wê bi hêrîşan zorê bide kurdan ku wan ji herêmên wan bide goçberkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku kurdan jî di vê demê de dihanî ser ziman, «berê gûnd dişawitandin û didan valakirin, î ro jî bajaran dişawitênin û didin valakirin.» Ev rast bû. Bajarên kurdan, bi hêrîşên ku rejima tirk li wan dida kirin, dihatina vêran kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov van hêrîşan jî, weke hêrîşên şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd ku dihê meşandin werênina ser ziman.

Vê pêvajoya şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd, li ser kirin, kiryar, konseptên şer ku li hemberî civate kurd hatina pêşxistin û hwd re em divê ku werênina ser ziman. Ji xwe, dema ku em dikin pêvajoyên şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd ku hatî meşandin ku werênina ser ziman, di serî de di vê çerçoveyê de wê bi rengekî werê ser ziman.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku pêvajoya şerê jenosîdê ku li hemberî civate kurd hatî meşandin, wê rastîya pêvajoyên şer ên li rojhilata navîn jî, bi xwe re hin bi hin werêne ser ziman. Li rojava, piraniya şerên ku hatina derxistin, di çerçoveya pirsgirêka kurd a li herêmê de hatina derxistin in. Her wusa, di vê çerçoveyê de dîroka şerê herêmê ku li hemberî herêmê harêmê hatîya meşandin jî wê were dîtin. Heta roja me, gelek xalkên ku weke ´xalkên mesopotamikî´ hatina bi navkirin û nasîn jî, hatina bertûnekirinê. Pirraniya wan, êdî li herêmê temenê jîyane wan nemaya. Her wusa, rastîya şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd hatî meşandin, wê rohnîyekê li vê jî bike.

...

**Li ser şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd ku hatî meşandin**

Kurdistan, weke herêmek teybet ya dîrokî ku hertimî, kîjan hêz û qûwet derketiya li holê hatîya herêmê û xwestîya ku li wê serdest bibe. Her wusa di vê çerçoveyê de jî, pêvajoyên şer bi civate kurd li kurdistanê dana destpêkirin. Pêvajoya şerê dîroka tirk a ji dema osmanîyan û heta dema komare tirk, weke pêvajoya herî xadar û hov ya dîrokê a li hemberî civate kurd û li kurdistanê ku hatî pêşxistin jî mirov dikarê werêne ser ziman. Pêvajoyên şerê jenosîdê ê bi civate kurd re ku heta roja me dihê dayîn, divê ku mirov bi perspektifa dîrokê herêmê û bi teybetî dîroka li ser axa kurdistanê ku bûya re werênina ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de pêvajoyên dîroka kurdistanê, ku dem bi dem weke dîroka ´mesopotamiya´ jî dihê hanîn li ser ziman, wê heta serdemên şariştaniyê ên sûmerîyan herin. Bo vê yekê, giring dibê ku mirov ji vê demê bi korstasî dîrokê hilde li dest û werêne ser ziman. Di destpêka sedsale 21´ê de tekoşîna kurdan a bi civatî ku li hemberî wê di çerçoveya "xwe parastina cewherî" de ku pêşxistina, li rojavayê kurdistanê bi serketinek dîrokî ku bi navê ´şoreşa rojava´ re dihê ser ziman. Her wusa, bi wê re jî, li başûrê kurdistanê jî, desthilatdarîyek kurdistanî heya. Divê ku mirov van herdîyan bi hevdû re hilde li dest di çerçovey giştîya kurdistanê de. Di aslê xwe de, em ku pêşketina kurdistanê a li rojava û ya li başûrê kurdistanê, bi hevdû re weke pêşketinek giştî a kudistanê werênina ser ziman, wê rast û di cih de bê. Lê tevî ku bi vî re kurdan pêşketinên mazin bi destxistina û destkevtiyên mazin î ro bidest xistina, hê jî, dawî li wê şerê jenosîdê ku li hemberî civate kurd hê jî tê dayîn ne anîna.

Her wusa, di vê çerçoveyê de me ji rojava û pêşketinên wê yên bi dîroaka wê re bidest hanîna li ser ziman bikin. Rojavayê Kurdistanê, weke herêmek teybet ku xwediyê dîrokek pirr kevn a. Vê herêmê ji dema sumeriyan û berî wê jî destpê dike. Weke herêmek teybet û li ber Firatê, pêşîn niştecihîtî li vir bûya. Mirovan li vir, mal avakirina, cot kirina û şivanî kirina. Li herêmê, dîroka wê ya teybet, bandûra wê li dîroka cihanê a hemdem bûya. Herêm, demên wê ên şariştaniyê, em dikarin ji demên Sumeriyan bidina destpêkirin, û werina ta demên gûtî, hûrî û mîtaniyan. Demên hûrî û mîtaniyan, weke demna teybet ên demên dîroka hemdem a şariştanî na jî. Bo vê yekê, divê ku mirov bi teybetî bibêje ku ev dem, wê piştre jî, bandûra wan zêdetir xwe bide diyar kirin.

Pêşketinên ku î ro, zêde em dikarin bahse wan bikin, pêşketinên dema

hûrî û mîtaniyan in. Di demên hûrî û mîtaniyan, weke demna şariştaniyê ên teybet û pêşketî û kifşkar in. Dema ku dîroka herêmê bahse wê tê kirin, ev dem bi teybetî bahse wan tê kirin. Heta roja me jî, li herêmên Afrîn, Qamişlo, Serêkahniyê, Amûdê û hwd, mirov rastî bermehiyên ji demên hûrî û mîtaniyan tê.

Li vê herêmê bi teybetî, ji dema sumeriyan ve şaristanî pêşket. Ev herêm, weke herêmek ber Firatê jî tê bi nav kirin. Çemê Firatê herêm hemû av dida. Di demasala Sumeriyan a duyemin de û di demên weke yên xanadana Ur û hwd, li ser vê axê pêşketin. Piştre herwiha di dema gûtiyan pêş diket. Dema Hûrî û Mîtaniyan, weke dema kifşkariyên dîrokê vê herêmê a hevdem bûn.

Di dema hûriyan û mîtaniyan de, wê destpêkên giring hatin kirin. Birehim Xalîl li ser wê xalê bûya û destpêka wî ji vir e. Ji bo vê yekê, weke destpêka hemû olên semewî yên yek-Xwedayî jî ji vir tê dayîn destpêkirin. Li herêmê, di dema Hûrî û Mîtaniyan de, ola pêşî ya yek-Xwedayî ola Êzdayan e. Ola piştre ya yek-Xwedayî a duyemin jî ola cihûtiyê ye. Ola sêyemin a yek-Xwedayî jî ya mesîhiyê ye. Ola pişte ya dawiyê ya yekxwedayî Îslam ye.

Wan pêşketina, dîroka herêmê bi pirraniya wê da kifşkirin. Bi vê rengê pêşketinî, ev herêm bû weke navendek olî jî bo hersê van olên yek-xwûdayî jî. Bo vê yekê, dema ku tevgerek li wir biheta kirin, wê bandûra wê li van pêşketinên olî û civatî henûya dibû. Bo vê yekê, li herêmê gelek şerên olî jî bûna. Di dîroka herêmê de, gelek şerên olî jî ya.

Dema hûrî û mîtaniyan, weke demek teybet a dîrokî a herêmê ya. dîroka şaristaniya herêmê di vê demê de gelek şoreşan di nava xwe de dide kirin. heta roja me jî, gelek berhemiyên ji van deman ku mana hena, li herêmên weke herêmên Afrînê, qamişlo, amûdê û gelek herêmên din.

Di dema hûrî mîtaniyan de, weke nirxên olî, em navê melekê Tawis pirr zêde dibînin. Piştre navê Mîtra derdikeve û heya. Bandûra van herdû nirxan li wê herêmê û li çanda wê pirr zêde heya. Olên ku piştre hatiya jî, ji van nirxan sûdgitina û piştre pêşketina dane çêkirin û jînkirin û domandin. Herêmên rojavaya Kurdistanê, di dewama herêmên bakûrê Kurdistanê ên weke Nisêbîn, Cizîrê, Reha û li dora wan ve girêdayî em dikarin bênina ser ziman.

Î ro, di destê me de hinek zanîn hena ku em bi wan dikarin bibêjin ku Hûriyan di dema xwe de desthilatdariyeka xort li herêmê li Firatê ava krin. Ji ber diclê yanî ji hetêmên botanê û heta ku digihişt heleb û ber Şama roja me, lê serdest bûna û bûna xwedî desthilatdar. Ber Firatê, herêma Serêkaniyê, weke ku d dema mîtaniyan de bi navê "weşokanî" ku ji wan re bûya navend û paytaxt, bi heman rengî vê herêmê di dema Hûriyan de jî,

rolek mazin leyistiya. Ji Afrînê û heta ku digihişt Nisêbînê, weke herêmekê ku bi bi hevdû re di rengekî pêşketiya, bandûr û nîşanaka û bermehiyên dema hûrî û mîtaniyan pirr zêde lê heya. Nisêbin, di dema Sumeriyan de navê "Nîrbo" bûya. Di demên piştre, di demên gûtiyan de bi navê ´nisibî´ û yan jî bi navê ´nisabê´ hatiya bi navkirin. Di dema hûrî û mîtaniyan de jî bi navê ´Nisibîs" û hwd, hatiya bi navkirin. Serêkaniyê jî navê wê, di dema Hûriyan de ´Weşûkar´ û di dema mîtaniyan de jî, ´weşokanî´ bûya. Lê di dema mîtaniyan de, herdû jî hatina bikarhanîn.

Serêkaniyê, weke herêmek navend a ji herdû serdeman re jî. Ji ber ku li ber Firatê ya û avî ya. Şînahiya wê pirr zêde heya. Daristanên wê pirr hena. ev herêm, wê çi pêşveçûn û pêşketin lê bibin, wê bandûra wan li herêmên ber bahre sipî û ya reş jî bibin. Yanî, hemû pêşveçûnên vê herêmê kifşkar in. Di dema mîtaniyan de, piştî Mîtra re wê êdî demeka nû li herêmê bi aqil û felsefe destpê bike.

Demên piştî dema mîtaniyan, wê heta dema Mediya, li ser temen nirxên wan weke van bê jiyîn. Piştre jî, pêşveçûnên nû li herêmê bi desthilatdarî rû didin. Piştî dema Mediya dibe, Medî, li herêmê serdest in. Piştî dema mediya, wê li herêmê sefera Îskenderê Mekedonî bibe. Wê bixwezê ku li herêmê serdest bibe. Li herêmê di dema sefera wî de, wê herêm ji gelek aliyan ve bikeve bin hêrîşên ku lê dibin. Piştî sefera Îskender, wê êdî piştre jî, hêrîşên li herêmê nesekin in heta dema Hatina romiyan û hêrîşên wan jî. Dema mîtaniyan, piştî wê re, wê êdî hin bi hin demna nû destpê bikin. Piştî dema Mediya wê dema desthilatdariya kurd a Mediya destpê bike. Li herêmê wê bê desthilatdar. Lê wê dema Mediya zêde ne kişêne. Lê tevî wê kiniya xwe jî, wê nêzî sedsalî wê bijî. Li herêmê, piştî ku desthilatdariya mediya xûrîxî, wê li herêmê bi hevkariya kurd û persan wê dema rêveberiya axamanîşan wê were û destpê bike. Piştre jî, li herêmê wê di deewama wê de desthilatdariya sasaniyan were û bibe û li herêmê bibe desthilatdar. Weke ku çawa ku destholatiya axamanîşan bi hevkariya kurdan bû, wê ya sasaniyan jî bi hevkariya kurdan bibe.

Di wê navberê de gelek seferên talan metingeriyê êdî li herêmê destpê dikin. Pêşî wê sefera Îskenderê mekedonî destpê bike. LI herêmê, wê gelek şerên ku wê hêzên îskender bi xalkên herêmê re bike wê hebin. Li rojavaya Kurdistanê jî, di wê demê de wê paya xwe ji wan hêrîşên wî bigrê. Piştî hêrîşên îskender wê hatina hêzên împaratoriya roma li herêmê bibe.. Wê gelek li herêman, şerên wan bibin. Wê gelek herêm, bi xalkên wan re, bi destê wan ji dîrokê werin û bibin. Li rojavaya Kurdistanê û Palmîra, hêrîşên hêzên roma dibin. LÊ wê rastî berxwedanaka mazin werin. Berxwedana Palmîra ku di bin serokatiya jina bi navê "Zanûba" de, wê dîrokê binivîsêne.

Lê dîsa wê serkevtinaka wusa mayinda li wê herêmê bidest nexistin.

Merwanî jî û Eyûbî jî, ji kokekê na. Heta ku ew herdû jî, tê gotin ku bi koka xwe ji aşîra kurd a Şadadî na. Piştî serdema Şadadiyan, wê li herêmê, demeka nû destpê bike. LI bakûrê Kurdistanê ku jêre tê gotin "herêma botanê" û herêmên rojavaya Kurdistanê jî di nav de tên hasibandin, wê lê desthilatdariya Merwaniyan pêş bikeve. Ev desthilatdarî, wê ser 90 salî re wê demeka dirêj a zêr bijî. Li herêmê wê gelek pêşketinan bide destpê kirin. Aliyê kûrê merwan şahê Merwan, wê serdemek zêr bide destpê pêkirin. Em dikarin bo aliyê kûrê merwan bibêjin ku ew salahadinê Eyûbî yê dema merwaniyan a.

Piştî dema Merwaniyan, wê hin bi hin ku dema Merwaniyan û fêr û cerbên şadadiyan jî ji xwe re dike temen, wê desthilatdariya eyûbiyan bidest pêketina xwe bike. Wê li herêmê, Herêma Rehayê ji xwe re bike navend û ji wê jî, wê rojavaya Kurdistanê jî di nav de, wê i qadaka mazin wê desthilatdariya wê demeka dirêj wê hebe. Xanadana eyûbiyan, piştî Salahadinê Eyûbî, wê ne bin 400 salî wê li herêmê bigiştî weke desthilatdar bimêne. Heta sadsale 16´min wêê weke desthilatdar bimêne. Piştî ku osmanî pêşketin, wê di bin navê "biratiya îslamî" de, piştîgirê bidinê de. Piştî ku osmaniyan jî, bi wê piştgiriyê xwegirtin, êdî ew herêmên xanadana eyûbiyan jî, weke bi xwe ve hasibandin. Lê dîsa, ne dikarin herina bi ser wan herêman de, Êdî piştre, çend ku ne weke berê jî bê, wê heta dawiya sadsale 17´min jî, wê şûnpêya xanadana eyûbiyan bijî.

Di dema Merwaniya de, wê li ser axa rojavaya kurdistan jî desthilatdarîya wê dibe. Wê ji herêmên botanê û Amedê û heta ber firatê ku rojavaya kurdistanê hemûyî dike nava xwe de û ji wir heta ber Heleb û Şamê û hwd û gelek herêmên din wê desthilatdarîya Merwanî lê bi serdestî hebe. Merwanî, Navenda wan û paytaxta wan Amed bû.

Merwanî, di dem û serdema wan de, wê li rojavaya û bakûrê kurdistanê ku bi hevdû re wê pêşketinaka mazin bidina jînkirin. Şahên Merwanî, weke xelîfe li herêmê dihêne pêşwazî kirin. Bandûra wan pirr mazin û zêde heya. PIştî avakerê dewleta kurd a  Merwanîyan Badê kûr dostik, birazîyê wî Aliyê kurê merwan tê ser tax weke şah. Wê dewleta merwanîyan, demeka xwe zêr di dema Aliyê kûrê merwan de bijî. Aliyê kurê Merwan, em dikarin wî weke avakarê dewleta merwanîyan ku li ser temenê wê dide rûnandin jî bihasibênin. Wê dewleta Merwanîyan, pêşveçûna xwe ya mazin di dema Aliyê kûrê merwan de bijî. Wezirê Aliyê kûrê Merwan Şero ku ew jî weke kurdekî bizane dihat hasibandin jî dihat bi navkirin, lê bi azwerîya xwe re dihat zanîn. Heta ku di hin şîroveyên di derbarê Şero de ku dihatina kirin, şerê weke "beko"yê di vegotina ´Mem û Zîn´a Ahmedê Xanî de bû dihat ser

ziman.

Di vê dema Merwanîyan de, zaneyên kurd ên weke Eliyê Hêrîrî û hwd, dijîn. Bandûra wan jî, li ser aqil û pêşketina dema Merwanîyan pirr zêde heya. Dewleta kurd a Merwanîyan, wê serdemeka xwe ya zêr bijî di nava salên 895-1077´an de. Lê piştî van salan re wê dewleta merwanîyan, cihê pêşveçûn û pêşketina xwe ji derketin, pêşveçûn û pêşketina Eyûbîyan re bihêle.

Piştî dem û serdema Merwanîyan re, wê dema Eyûbîyan bi Salahadinê Eyûbî re dest pê bike. Dewleta Eyûbîyan, wê Rehayê ji xwe re bike navend û peytaxt. Bi wê re jî, wê pêşketina xwe ji bakûrê kurdistanê bi ber rojavaya kurdistanê ve bi herikînê. Wê serdestîya Eyûbîyan, li ser axa rojavaya kurdistanê bê.

Heta dema eyûbîyan jî, wê ev herêmên rojavaya kurdistanê ku di nav de û herêmên bakûrê kurdistanê ên ´botanê´ jî di nav de wê weke "herêma mazin a botanê" jî were bi navkirin. Ji aliyê ziman û hwd ve, di temenekî de pêşketin. Rojavaya kurdistanê, ji dema Gûtî, hûrî û mîtannîyan ve ku heta ku dem tê dema demên merwanî û eyûbîyan jî, wê serdestîya kurdan li herêmê kêm nebê. Dema Eyûbîyan bi dema Salahadinê Eyûbî re destpê dike. Ji aliyê kok û aşîrîyê ve jî, Merwanî û eyûbî ji aşîra kurd ya bi navê rawedî na. Dema Eyûbîyan, wê piştî salahadînê Eyûbî re, wê dewleta Eyûbîyan were avakirin. Lê piştre di rengekî xanadanî û mîratî û hwd de wê bide domandin. Serdema dewleta eyûbîyan, ji dema salahadinê Eyûbî ku destpê dike, wê ne bin 400 salî re wê bide domandin bi serwerî.

Eyûbîyan, di demên xwe de pirr giringî dane perwerdekirinê. LI herêmên xwe ên ku ew lê serdest bûna, wê li hemûyan dibistan û an jî bi navê din ê wê "medreseyan" ava bikin. Di demên berî wan de jî wusa bûya. KU heta roja me tên ku ji dema hûrî û mîtannîyan mana, li bajarên rojavaya kurdistanê ên weke Afrînê, Kobanê, serêkahnîyê, Hesekê, Tirbesipîyê, Qamişlo û hwd, ku gelek herêmên din ên rojavaya kurdistanê di nav de, li wan kirman, qasr û dibistanên mana hena. Ev hemû ji dema hûrî û mîtannîyan mana. Ev kirman û dibistanên antîkî ku ji dema hûrî û mîtannîyan mana, dide nîşandin ku wan çendî giringî daye xwandinê. Her wusa, ´tîyatroyên anfî´ ji dema hûrî û mîtannîyan mana jî li rojavaya kurdistanê, li herêmên afrîn, qamişlo serêkehniyê û hwd hena. Dem heta ku hatîya dema Eyûbîyan, Eyûbîyan jî ji wan sûdgirtina. Eyûbîyan, ew pêşketina herêmê ya civatî pirr xweşîk parastina.. Di dema Eyûbîyan de jî, ku ji aliy bawerîyê ve bê, rengên cuda lê hebûn di nava xalkê de. Eyûbîyan, dijberî li wan ne kirina. Di dema eyûbîyan de jî, li herêmê mesihî jî, Êzîdî jî, heta ku hinek cihû jî dijîn hebûn. Hemûyan jî dikarina ku

bawerîya xwe bi azadî bijîn.

Di vê çerçoveyê de pêşketinên ku li kurdistanê dibin, wê kurdistanê, hertimî weke navendekê bide hiştin. Î ro jî, wusa ya. Bo vê yekê ya ku dîroka kurdistanê hertimî bixwûn hatîya nivîsandin. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman, pêvajoya dîroka kurdistanê, hertmî bixwûn bûya. Li rojava û başûrê kurdistanê, desthilatdarîyên kurd ku hena, ew jî, di ancama komkujiyên mazin ên ku hatina serê civate kurd de hatina heta roja me. Li başûrê kurdistanê, piştî xûrixandina komare kurd a Mihabadê, wê li başûrê kurdistanê pêvajoyek tekoşîna azadîyê were dayîn destpêkirin. Her wusa, dîroka vê ya berê jî heya. Ji demên şêx Mahmûdê berzencî, mirov dikarê dîroka wê tekoşîna azadîyê werêne ser ziman. Heta ku mirov dikarê hinekî din jî, kevn herê û herê heta dema Şêx Abdulrahmanê Sorî ku di sale 1806an de li başûrê kurdistanê li hemberî osmanîyan serî hilde, mirov dikarê heta dema wî jî herê. Her wusa, wê bi wê re dîroka kurdistanê, piştre jî, bi berxwedan û tekoşînên Şêx mahmudê rawandûzî bidomê. Ev jî, wê pêvajoyek berxwedanê li rojhilatê kurdistanê jî bi xwe re werêne.

Heta ku dîrok tê dema serok aşîrên kurd ên weke simkoyê şikakî û hwd, wê ev tekoşîn bidomê û wê piştre li rojhilatê kurdistanê, ku çendî ku temenê wê weke nêzî salekê hebûna xwe bi kortî domandibê jî wê bi komare mihabadê ku wê piştre bê temenê têgîneka welatperwerîyekê jî di serdemên hemdem de wê bi ancam bibê. Ev pêvajo, wê bi xwe re pêvajoyên nû werênin. Piştî komare mihabadê, wê li rojhilatê kurdistanê, tekoşîna kurdistanê, kêm zêde wê xwe bide domandin. Piştre jî, wê di wê çerçoveyê de tekoşîna li başûrê kurdistanê, di berdêla komkujiyên weke komkujiya Helebçê û hwd, wê hebûna xwe bi serkevtina kurdan bide taçîdarkirin. Lê tevî wê jî, ji ber ku pirsgirêka kurd li bakûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê û rojavayê kurdistanê domîya, wê li başûrê kurdistanê jî ew serkevtina kurdan a ku bi desthilatdarîyek kurdistanî bi ancam dibe, wê bêpirsgirêk, nikaribê hebûna xwe bide domandin heta roja me. Ji dema konferansa Lozanê û heta roja me, weke çar-qat mayîna kurdistanê di nava sînorê çar dewletên weke îran, îraq, sûrî û tirkiya de qatkirina wê û mayîna wê qatkirinê, wê temenê çêkirina pirsgirêkên di nava civate kurd kurd û hêzên sîyesî ên kurd de jî.

Her wusa, dema ku tenê li ser esasê beşekê ji wan çar beşan sîyeset bi tenê tê kirin, her wusa, wê pirsgirêkên mazin ên weke ku î ro rêveberîya başûrê kurdistanê di nav de ya, wê bijî. Bo vê yekê, êdî kurdan jî fahmkirin pirsgirêk, di vê di çerçoveya qatekê de newina hilde li dest. Divê ku di çerçoveya giştîya kurdistanê de bi hevdû de werê hildan li dest. Ya ku di vê çerçoveyê de ku wê hebûna civate kurd jî bikarî biparasta jî wê ev ba. Her

wusa, pêvajoya hêrîşên çeteyên DAÎŞê li başûrê kurdistanê û şengalê û rojavayê kurdistanê û kobanê jî, ev rastî piştrast kir. Her wusa, kurdan û hêzên kurdan bi hevdû re di filiyetê de bi hevdû re tevgerîyan û serketin. Lê ew qatbûna di nava wan de, hertimî valahiyekê jî di parastina civate kurd de bi xwe re diafirêne. Tekoşîna azadiya li kurdistanê, weke ku li rojava û başûrê kurdistanê, destkevtiyên dîrokî bidest xistin. Her wusa, li bakûrê kurdistanê, gelê kurd ji 7 salê heta 70 salî herkesek li hemberî hêrîşên rejima tirk li ser pîyan in. Tekoşîna azadîyê û statûya xwe didin. Ev pêvajo, bi gelek aliyên wê r ebi hevdû re dimeşê. Her wusa, çendî ku bi serkevtinên kurdistanîyan re bi ancam dibê jî, lê hertimî û demî komkujiyên mazin jî têne serê civate kurd. Her wusa, weke ku li bakûrê kurdistanê. li Cizirabota, Silopî, Farqînê, Sûra amedê, Geverê, Kerboranê, Dêrka çîyayê mazî û hwd, bi wan re li gelek deverên din ên weke bajarên kurdistanê, li wan hêrîşên mazin ên artişa tirk li kurdistanîyan hena û bi komkujiyên mazin ên ku têne serê civate kurd re bi ancam dibin. Emê li jêr, di berfirehîya nivîsandina xwe de cih bidina van jî. Di vê çerçoveyê de pêvajoya biêş û bixwûn a hêrîşên li ser civate kurd ku weke şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd em dikarin werênina ser ziman, emê li ser wan bisekin in.

..Kurdistan, welatê kurdan, birîndar a. Dîroka wê, weke dîrokeka bixwûn a. Dîroka wê bi xwûnê hatîya nivîsandin. Kî hatiyê de, xwestiya lê serdest bibe. Ev jî, bi xwûnê xwestîya ku bike. Dîroka kurdan, dema ku bahse wê dihê kirin, hertimî ew şerên ku li kurdistanê bûna, hêrîşên ku hatina serê civate kurd û kurdistanê dihêna hanîna li ser ziman. Di nava lawik û mamikên kurdan de, bi gotinên biqêrînî bahse wan dihê kirin. Heta roja me jî, ev didomê. Bi teybetî, piştî hatina Osmanîyan li herêmê û bûna serdest li herêmê a wan, ji wê demê û pê ve, li herêmê şer û pevçûn dawî li wan ne hatîya, Herêm, ji destpêka serdestîya osmanîyan ve û heta roja me, hertimî xwûn ji wê herikî ya. Ew herikîna xwûnê heta roja me jî, ne sekinîya. Hê jî, didomê. Bi teybetî, dema ku em bahse dîroka kurdistanê bikin, wê ev bi awayekî vekirî xwe bide dîyarkirin.

Bi teybetî, dema ku em tenê dîroka komare tirk ku li ser bermeniyên osmaniyan avabûya, bi şerkirina bi civate kurd re bûhûrîya. Wê çawa civate kurd ji dîrokê bibe û tûna bike û piştre wê bibe xwediyê welatê wan, li wê hizirîya. Her wusa, di vê çerçoveyê de şerê jenosîdê bi civate kurd re hatîya meşandin. Di vê çerçoveya wê şerê jenosîdê ê bi civate kurd re ku rejima tirk daya de wê komkujiyên weke komkujiya zilanê, komkujiya agirî, komkujiya botanê, komkujiya dersimê û hemû komkujiyên din ku heta roja me dem bi dem dihên hanîn li serê civate kurd, wê werina hanîn li serê civate kurd. Di vê çerçoveyê de nivîsandina dîroka şerê jenosîdê ê ku li

hemberî civate kurd hatî meşandin, wê bi xwe re hemû kiryarên bi şer û hêrîşî ên li hemberî civate kurd bi xwe re bi me bide hanîn li ser ziman.

Bi awayekî bi wî şerê ku jenosîd ê li hemberî civate kurd re di ahengekê de zimanê kurdî jî dihê qadaxa kirin. Bi wê re jî, wê çawa hertiştî weke tirk û weke yê tirkiyê bidina nîşandin, hertimî li ser êw gotin hanîna ser ziman. Yên ku li zimanê xwe xwedî derketîya, wê rastî hêrîşên mazin werin. Her wusa, di zindanan de î ro, bi deh hezaran kurd tên ragirtin weke dil û her roj li wan êşkence tê kirin. Her roj, nûçeyên mirina girtîyên di zindanan de tên. Divê ku mirov vê yekê jî, di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Bi teybetî, vî şerê dawiyê ku rejima tirk li hemberî civate kurd bi awayekî şitt daya meşandin, dîroka wê ya zêde ne dûr, wê bi 13´ê avrêl(nîşana) 2011´an re destpê bike. Di wê demê de rayadarên tirk, wê her dordorên ku dikaribin bikina dewrê û bidina axiftin, wê bikina dewrê û bidina axiftin ku bi tevgera ´agir bestê´ bidina çêkirin. Di roja 13´ê avrêlê de wê tevgera kurd agir bestê denezenê. Lê di roja 14 avrêlê de jî, wê rayadarên tirk û hikimeta de destpêka oparasyonên li KCK û ankû weke ku kurd bi nav dikin ´oparasyonên qirkirina sîyesî´ wê bidina destpêkirin. Ji wê rojê û heta roja me, ti demê dawî li girtinên di vê çerçoveyê de ku hatina kirin, wê newê. Wê herkesek nesibê xwe ji wan girtinan bigrê. Ev pêvajo, wê weke pêvajoyeka ku rejima tirk, êdî bidest oparasyonan li qadên sivîl û sîyesî ên civate kurd dike. Bi vê rengê, dixwezê ku dengê kurdan birrê û pêşîya pêşketina wan ya bi statûya wan re li bakûrê kurdistanê bigrê.

*Oparasyonên Qirkirina Sîyasî*, Gotinaka ku kurdan, ji girtinênên wan yên ku dewleta Tirk, ji 14´ê avrêl(Nîsan)e 2011´an û pê ve, ku girtin, ji wan re got. Operasyonên Qirkirina sîyasî, lingê jenosîde li ser serê kurdan, ku dewleta tirk bi vê re ve dibe, yê sîyasî dihêne ser ziman. Dewlet, ji bo rêxistinîya kurdan xira bike, û temenê rêxistbûna civate kurdan li kurdistanê ji holê rakê, ev oparasyon kirin. Armanca, wê temenê civaka kurd bû. Bi sedan, siyasetmedar, rêveber, şaredar, rewşenbîr,rojnamevan, parêzer, kî mirovê ku karibû li ser navê kurdan gotinekê bibêje hatina girtin. Çend ku, parlamenter, rewşnbîr û şaradar, rêveberên ku ji aliyê gel ve bi hilbijartinê hatina hilbijartin, hatina girtin jî, deng ji ti saziyên Ewropî yên ku digotin "Em mafê mirovan diparên jî, derneket. Emarika, ji aliyê Sîyasî, Leşkerî û Îstihabarî ve piştgirîyaka wê ya ji tirkî re hebû di wê pêvajoyê de.

Dewleta Tirk, ji bo ku rêxistinîya civata kurd jev belav bike, ev oparasyon hatina kirin. di wan oparasyonên sîyasî de, Parlamanter, Rewşenbîr, Rêveber, Rojnemavan, Şaradar, Advokat û hwd, ji civate kurd, kî mirovê ku karibû ku gotinekê li ser navê wan bibêje hatina girtin. Bi hazaran mirov hatina girtin. Parlamenên weke Hatip Dicle ku kurdan bi dengekî bilind

hilbijhartibûn, di wan oparasyonan de hatina girtin.
Dewletê, bi wan girtinan, armanc kir ku kurdan jevbelav bike. Ji bo ku êdî doza mafê xwe nekin. Bi wê armancê ew oparasyon hatina kirin.
Dewlet, bi awayekî pirr bişitt çû bi ser kurdan de. Hemû girtin û kuştinên ku bûn, bi armanca ku kurdan ji xwestina mafê xwe yê azadiyê dûr bikin. Zimanê wan qedexebû, ku doza mafê zimanê xwe nekin. Rêxistina xwe li kurdistanê li herêmên xwe ava nekin. Rêveberîya xwe ava nekin. Çapamniya kurd, bi hemû aliyên wê ve ket ber oparasyonên ku bi dehan rojnemavan di wan de dihatina girtin. Roj tv, televizyona kurd, çend ku li Ewropa jî, weşana xwe dike, ji ber ku bi kurdî weşanê dike, bi hedefa dewletê ji bo ku were girtin. Doza wê ya bi armanca girtinê ku li ser xwesteka tirkî vebû, di 10 Çileyê 2012´an de bi dawî bû. Lê piştre jî, çend ku dadgaha danimarka biryara ne girtina wê da jî, dewleta tirk, dew ji hewldanên ji bo girtina wê ne berdan. Ev jî, şaqak ji wan şaqên ku bi bi wê dixwestin ku rêxistinîya kurdan, were qatkirin bû.
Hemû girtinên ku di çerçova Oparasyonên Qirkirina Sîyasî de hatina girtin, di dadgahên tirkî de, hertimî xwestin ku bi zimanê xwe yê dayikê bi kurdî parastina xwe bikin. Lê dewleta tirk, ji ber ku zimanê kurdî qedexe kiribû, destûr nedida kurdan ku bi zimanê xwe êdî xwe bi parezên. Kurdên ku di Dadgahên dewleta tirk de, bi kurdê diaxiftin jî, serokê dadgahê di got ku "bi zimanekî ku nayê zanîn diaxivin." Ji bo ku navê kurdî, bebêje û navê zimanê kurdî nekeve belge û dokumentên fermî de, dewletê, ev gotin digot.
Heta î ro, bi hezaran kurd, hatina girtin û hatina xistin li Girtîgahê. Tenê, mirovên ku di çeçrova oparasyonên Qirkirina Sîyasî ya kurd de, hatina girtin, bi deh hezaran tên ser ziman. Oparasyonên Qirkirina sîyasî, di bin navê "KCK" de tên kirin. dewlet, ji ber ku pêşîyê li nîqaşên ku wê bi van dozan re wê li ser mafê kurdan werina kirin bigirê, hemû dosyayên van dadgahan jî Sensûr danîna ser ziman. Ne dihiştin ku Parastvanên ku wan diparezên bigihina wan. Lê Saziyên Dewletê ên weke Ên Polisan û hwd jî, Di çerçova programakê de, ji bo ku di deme ku ew kurd dihatina de, ji bo ku temenê wan girtina çêkê û meşrû bike jî, li gor xwe zaneyên ji qarakolên Polisan dişandina Rojnemayan û didan weşandin.
Di serî de, sazîyên rojenamaya Azadîya Welat, Ozgur gundem, Komela zimanê kurdî Kurdî-der Û sazîya Perwerdehîya kurdî TZP-Kurdî. Enstutiya kurd ya çandê Enstutîya kurd a Mesopotamya ya Çand û hunerê. Partiya kurd BDP li hemû rêveberîyên wê bajar û navçeyan hemûyan. Hemû Saziyên ku bi kurdî diaxiftin û zimanê kurdî bikar dihanîn û diparastin, hemû bûna armanc. Sazîyên çandî, hemû bûna Armanc. Sazîyên Sîyasî hemû bûna Armanc.

Di wan dozan de zimanê kurdî qedexe bû. Zimanê kurdî, weke "**zimanekî ku nayê zanîn'**" dihat ser ziman û di dokument û belgeyên dadgahê de dihat qeydkirin. Ji ber çi ev tê kirin? Ji ber ku navê kurdan bi zimanê wan re qedexe ya. Dihê xwestin ku ew qedexekirin were domandin. Bi navê wan re ti tiştek, ne keve fermiyetê de.

Di oparasyonên qirkirina Sîyasî de, armanc, ne tenê hanîna ser ziman, ya rastîyan ya bi riya çapameniyê de bû. Bi wê re, armanca, sereka li bikarhanîna zimanê kurdî bû. Bi wê re jî, armanca herî sereka ew bû ku Kurdan bê rêxistin bikin û pergala nava wan ya civatî ji holê rakirin. Ji bo ku pêşî li kurdistanîyan bigirin ku êdî mafê xwe yê weke ên perwerdehîya bi zimanê dayikê nexwezin. Gotina serok wezirê tirk ya ku di destpêka van oparasyonan de gotibû ku "bila, ti kes mafê perwerdehîya bizimanê dayikê ji me nexwezê", weke manîfestoya van oparasyonan hat dîtin. Armanc, ew bû ku pêşî li xwestina kurdan ya mafê xwe yê hevbeş(’kollektif’) bigirin. Dewleta Tirk, dibêje, "ez mafên hevbeş (´kollektif´) nadim", "ez kurdan weke civak nasnekim".. Bi vê gotinê û li gor pêdivîya wê, hêrîşên mazin li kurdan û saziyên wan kirin ku wan jev belav bikin. dewlet, Armancaka wê jî, ev bû ku di wê dema ku digot ku "ezê destûreka nû binivîsênim", di wê demê de, kurd ne bi rêxistin bin, ku mafê xwe di wê dema ku destûr ji nû ve tê nivîsandin, nikaribin bixwezin.

Li rojhilat, pirr pêşketin bi hev re dibin. Gelên herêmê, ji nû ve di rabin ser xwe û bahse azadiya xwe dikin. Di wê bahskirina azadiyê de, êdî rêveberên herêmî yek bi yek tên guharandin. Bi wê re, Kurd, hê ji wê demê berê ve, di nav tekoşînaka ji bo azadiya xwe de na. Li herêmê, Li Sûrî jî, kurd, doza mafê xwe dikin. Li Îranê jî, kurd doza mafê xwe dikin, weke ku li tirkî wê dozê dikin. Armanca wan oparasyonan ew a ku kurd, ne digihina hêzeka xort ku karibin tekoşîna wan mafê xwe bi hev re bi yek dengî bikin. Oparasyon, di asta bilin de, bi armanca tafisandina kurdan tên li darxistin. Kurd, dema ku bahse mafê xwe dikin û dixwezin ku di destûrên van welatan de nav û mafê wan jî, cih bigirê û bê ewlakirin, bi wê re, di asta bilinde, ku ev pêk hat, wê li herêmê bibina xwediyê statûya xwe ya herêmî. Êdî li ser herêmên xwe wê bi navê xwe wê cih bigirin û wê pêş bikevin. Ya ku ev dewlet dixwezin ku bi van oparasyonên bi van rengan re dixwezin pêşî lê bigirin jî, ev yek a. Naxwezin ku kurd bigihijina statûya xwe. Ji ber vê yekê, Weke ku tirkî di nava sînorê xwe de, li herêmên kurdan van oparasyonan li dar dixe, Îran jî li herêmên xwe bi heman nêzîkatîyê di seknekê û hewldanaka tafisandinê de ya. ev oparasyon hemû, bi oparasyonên leşkerî ên ku li dijî kurdan tên meşandin, bi hev re di ahangekê

de bi rê ve diçin. Armanc, temenê afirîna statûya kurdan ji holê were rakirin. Bi vê yekê, diçina bi ser kurdan de.

Bo vê yekê ya ku pêvajoyên şerê jenosîdê li hemberî civate kurd, dem bi dem bi rêbazên cuda dimeşênin. Her wusa dema ku mirov bi teybetî li bakûrê kurdistanê binerê, mirov wê bibînê ku hertimî rejima tirk, li hemberî kurdan şerek meşandiya. Dîroka vê şerê bi civate kurd re, wê herê berî dîroka komare tirk jî. Her wusa, serdemên Osmanîyan jî, weke serdemên şerkirina li kurdistanê li hemberî civate kurd jî mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de lê bi teybetî demên dîroka komarê bi kortasî, dema ku mirov çavekî lê dide, ya ku mirov dibînê, ew a ku ev şerê jenosîdê, wê di dema komare tirk de bi rêbazên demî û hemdem wê were meşandin. Her wusa, bişavtin û ankû asîmîlasyon, wê rêbezaek ji van rêbazan bê ku li ser pergale perwerdeyê re li hemberî civate kurd dihê meşandin. Bi vê rêbaza jenosîdê ê li hemberî civate kurd re, ku di ahengekê de bê wê zimanê kurdî jî were qadaxakirin. Wê ne hêlin ku di jîyane were bikarhanîn. Ên ku bikardihênin jî, wê rastî hêrîşê werin, werina girtin bên avêtin li zindana, werina êşkence kirin û heta ku werina kuştin jî.

Ji aliyê din ve jî, wê rejima tirk, bi artiş û hemû hêzên leşkerî û hwd, wê hertimî seferan li kurdistanê bike. Di dema komkujiyên dersimê de ser ´97 seferan´ re sefer li kurdistanê dihên kirin. Wê di demên piştre de rejima tirk, li şûna ´seferan´ wê oparasyonên leşkerî, li herêmên kurdistanê bidina destpêkirin. Her wusa, bi teybetî, ji salên 1980´î û pê de, her sal wê bi sadan oparasyonên leşkerî li hemberî civate kurd werina li darxistin. Î ro ku em di sale 2016an de dijin, ku em ji vê demê û heta vê sale ku em di wê de na, sal bi sal ku em kronolojîya van oparasyonên leşkerî derxin, wê hijmara wan bi hezaran û deh hezaran werina ser ziman. Ev oparasyonên leşkerî ên bejehî, hewayî, sîyesî û hwd, ku di gelek qadên din jî, wê oparasyonan bikin, wê di çerçoveya şerê jenosîdê ê bi civate kurd re de bên kirin.

Şerê jenosîdê, mirov dikarê bi gotina nîjadkujiyê re jî werêne ser ziman. Nîjadkujiya kurdan, piştî şerê cihanê ê yekemin û pê de, zêdetirî pêşket. Berî wê jî, hêrşên bi armanca tevkujiyê li kurdan û civate kurd bûbû bûn. Lê ji dema şerê cihanê ê yekem û pê de, zêdetir bû. Jenosîda kurdan, ji aliyê rejimên Îranê, Sûrî, Îraq û Trkiya ve tê kirin û meşandin. Kurd, ji ber ku kurd in û bi kurdî diaxivin tên kuştin. Dema ku ji milletekî bi navê wê mirovên wê werina kuştin, hingî ew dibe nîjadkujî û an jî kû dibê jenosîd. Rewşa kurdan jî, em dikarin bi vî rengî bênin ser ziman. Di jenosîdkirina kurdan de, du rêbaz tên bikarhanîn. Rêbaza pêşî, biqadaxakirina zimanê kurdî ra û bi bernemeyên bişavtin(asîmlasyon)ê kurd hatina tûna kirin bi nirx, çand, ziman û kevneşopîyên wan ên ku temenê civakîtîya wan

diafirênin. Rêbaza duyemin a jenosîda kurdan jî, bi rengê tevkûkjiyan a. Weke ku bi tevkujiyên bi em bi navê ´Komkujiya Zîlanê´ bi nav dikin, bi tevkokujiyên ku bi navê ´ komkujiya dersimê´ bi nav dikin, bi tevkujiyên ku em bi navê ´Komkujiya Helebceyê´ bi nav dikin û hwd, jenosîda kurdan ji aliyê fizîkî ve hatîya kirin.

Heta roja me, yanî heta sale 2014´an jî, zimanê kurdî qadaxa ya. Kurd, nikarin bizimanê kurdî xwe perwerde bikin, biaxifin û binivîsênin. Ên ku dikin jî, rastî tûndûtûji û kuştinê tên. Ziman, stûna hebûna civatekê ya. Dema ku zimanê civatekê were qadaxakirin, hingî, derfet ji pêşketina çand, kevneşopî, zanîn û û hwd, ên civatî ên wê civate ku ew ziman zimanê wê ya tê standin. Bi vê rengî, jenosîda çandî li ser civatê tê meşandin. Kurd, bi qadaxaya li ser zimanê wan, jenosîda çandî li ser wan tê meşandin. Tê xwestin ku hemû mirovên kurd, zimanê kurdî bikarneyênin û tenê bi zimanê tirkî, farîs û arabî biaxivin. Bi wê re jî, bi temmenî zimanê kurdî ji jîyane û pêşketina wê ya di jîyane de dûr bikin. BI wê dûrkirinê re jî, hebûna civate ji holê ra bikin û tûna bikin. Ev rêbazaka jenosîda kurdan ku rejima tirk bi awayekî pirr zêde bikarhanî. Î ro jî, pirranîya kurdan, nikarin bi kurdî biaxivin. Heta ku ´nivîskarên kurd´ jî bi zimanê tirkî dinivîsênin û ji xwe re dibêjin ´em nivîskarê kurd in´. Rayadarên tirk ên weke bilent arinc û hwd jî, bo zimanê kurdî reşbikin û piçûk bidin nîşandin, li ber çapameniyê dibêjin ku "zimanê kurdî, ne zimanekî medenî ya, nabê ku bi wê perwerde bibe." Ev, weke rêbazekî jenosîda kurd hatîya bikarhanîn.

Rêbazê duyem ê jenosîda kurdan, bi kuştin, goçberkirin û hwd re bûya. Kurd, ji ber ku kurd in tên kuştin, tên avêtin li zindanan û rastî tûndûtûjiyê tên. Nîşanak û birana ku jenosîda kurd di sale 2014´an de jî didomê, komkujiyên ku di sale 2014´an de li şengalê û herêmên din ên başûrê kurdistanê û li kobanê û herêmên din ên rojavayê kurdistanê ya. Komkujiya êzidiyan, 2014, weke trejendîya civate kurd a sedsale 21´ê jî hat binavkirin ji aliyê rayagiştî a kurd û navnetewî ve jî. Bi heman rengî, hêrîşên bişitt ên bi armanca jenosîdê hatina birin li ser Kobanê û rojavayê kurdistanê. Ev jî, bi armanca jenosîdê û qirkirina civate kurd bû. Ev hêrîşên bi armanca jenosîdê û tevkujiyên weke ku li şengalê bûn jî, hêrîş û tevkujiyên jenosîda civate kurd ên ku di sale 2014´an de bûbûn bûn.

Dîroka serên li kurdistanê, ku mirov lê dihizirê. Bi dîroka hemdem re ji deme medîya dest pê dike. Di deme Medîya, Piştî ku Medîya têkdiçê û dixuruhê, rahibên medî serhildana wan heya ku ji bo ku rêveberîya Medîya çare din bênin. Piştre, şerên bi kurdan re, wê di di deme Sasanîyan de, ku hene. Lê bi teybetî, piştî hatina misilmanetiyê, li kurdistanê, şerê ku dibin hene. Serhildanên weke ên Mezdek û babekîyan û hwd, mirov karê wê bêne

ser ziman. Ji Asya, hatina selçûqîyan ên li kurdistanê hena. Hêrîşên Şahînşah û piştre yên kure wî yên Siltan Şancar li kurdistanê hene. Piştre hatina Osmanoyan re û dema wan dibêt. "Şerên Osmaniyan ên bi kurdan re, mirov divêt ku bi teybetî bêne ser ziman. Li dûv hevdû, dem bi dem ev şerên osmaniyan ên li kurdistanê bi kurdan re dibin.

Li Kurdistanê şerên ku bûna şerên weke Şerê malazgirê û piştre Şarê Çardiranê ê di nav Osmaniyan û Dewlete sefewîyan, wê li Kurdistanê bibin. Piştî şerê çardiranê jî, şerên dewleta îranê ên bi kurdan re hena. Şerên dewleta Osmaniyan ên bi kurdan re hene. Li ber wan şeran, Serhildanên berdirxanîyan, Serhildan Şêx Ubeydullahê nehrî û hwd, wê weke van serhildana bi dehan serhildanên kurdan bibin. Serhildana Şêx Mahmudê Rawanduzî ku çiyayê Zagros ji xwe re dike navend û bakûr, başûr û rojhilatê kurdistan hin herêmên wan dike nava xwe dibêt di sadsale 18´an de. Dem hata ku tê deme Avabûna Komare Tirk ya ku piştî xûrîxîna osmaniyan re ku avabûya, ji destpêka xwe bi kurdan re ket nava şer de heta vê deme 2012´an.

Heta vê dema ku em di wê de dijîn, wê pêvajoyên hêrîş û şer li hemberî civate kurd werê meşandin. Her wusa divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku dîroka rejima tirk, weke dîroka şer a li hemberî civate kurd ku hatî meşandin a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku pêvajoyên hêrîşê ên rejima tirk û bi teybetî di dema komarê de wê zêdetir bibin. Wê bi awayekî vekirî, hêrîşên ku bi komkujiyên mazin ên weke komkujiya li zilanê, agirî û dersimê ku bi ancam dibin, wê qarakterê şerê jenosîdê ê rejima tirk ku li hemberî civate kurd dide, wê bide li berçavan. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de dîroka kurdan dihildina li dest, her wusa, em di vê çerçoveyê de rastî xateke hêrîşê a li kurdan tên. Dem bi dem hêrîşên ku bi komkujiyên mazin bi ancam dibin, li kurdan dihên kirin. Bi van komkujiyan jî, armanc dikirin ku kurdan bêdeng bikin. Her wusa di vê çerçoveyê de bi teybetî pêvajoyên bi salên 2011, 2012, 2013, 2014 û 2015an û hwd, weke pêvajoyên hêrîşê ên li civate kurd ku bi komkujiyên mazin bi ancam dibê na. Her wusa, komkujiyên ku bi hêrîşên DAÎŞê li şengalê û başûrê kurdistanê û li rojavayê kurdistanê û kobanê ku hatina kirin, wê weke komkujiyên herî mazin ên sedsalê bin ku hatina serê kurdan. Ev komkuji, di çerçoveya ji hevdû belavkirina civate kurd de hatina kirin. Ji ber ku di dewama kirina van komkujiyan de, ser 2 milyonan de kurd hatina goçberkirin ji cih û warên wan li welatên cihanê û ewropa. Di vê çerçoveyê de bi van demên bi xwûn û ku di wan de komkujiyên mazin hatina serê kurdan û civate kurd, wê bi wê re pêvajoyeka giştî ya mazin jî a dîyasporaya kurd were dayîn destpêkirin li cihanê. Her wusa, ev jî dîyasporaya kurd, bi awayekî bi wan komkujiyên ku hatina hanîn li serê

civate kurd di ahengekê de hatina kirin. Divê ku mirov wan bi hevdû re hilde li dest û werêne ser ziman.
….

**Berxwedana li Amedê, Cizirê, Nisêbînê, Silopîyê, sûrê û li hemû deverên din ên kurdistanê û gîyane ´zagona şerq û îslahatê´.**

Li bajarên kurdistanê ên weke li Amedê, Cizirê, Nisêbînê, Silopîyê, sûrê û hemû bajarên din ên kurdistanê berxwedan heya. Li hemû deveran hêrîşên rayadarên tirk, bi polîs û leşkerên wê li kurdan didomê. Pêvajoya herîşên ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe re li kurdan dana destpêkirin, divê ku mirov weke hêrîşên tafisandin û çermisendinê werêne ser ziman. Amedekarîyek mazin ya bo hêrîşan hatîya kirin. Li herêmên weke Silopî, Cizira bota, Sûr, Nisêbîn û hwd, gelek sevkiyeta leşkerî li herêmê hatina kirin. Li pirranîya bajarên herêmê jî, hem di filiyetê de û hem jî di fermiyetê de qadaxayên derketina li sûkê hatina dana denezendin. Bajarên kurdan ên weke Cizira bota, silopî, Nisêbîn, Sûr û hwd, ev qadaxaya derketina li Sûkê, bi awayekî fermî jî tê dana denezendin. Lê li herêm û bajarên ku bi fermî ew qaaxaya derketina li sûkê ku ne hatibê denezendin, di filiyetê de ew qadaxaya derketina li sûkê di çerçoveya afirandina rewşa awarta de hatîya pêşxistin. Bi wê re jî, herîş li kurdan didom in.

Cihan hemû li ber wan hêrîşên ku li kurdan dibin bêdeng in. Çapameniya rojava(´ewropa´) jî, di vê demê de bêdeng a. Di derbarê hêrîşên xadar ên li kurdan re wê bêdengîya xwe dide domandin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman, dema ku mijar dibê hêrîşên li civate kurd, weke ku ev "tiştekî asayî" bê, wê xamsariyê û bêdengiyê didina nîşandin. Her wusa, di vê demê de jî, ew bêdengî dihê dayîn nîşandin. Hêrîşên ku li kurdan dibin, pêl bi pêl dihên pêşxistin. Her wusa, rayadarên tirk, bi ragihandinên ku li ser çapameniyê dikin, dibêjin ku wê ev pêvajoya hêrîşên li kurdan, bidomê. Heta ku hinek ji wan ku andamên hikimeta AKP´ê na, dibêjin ku "wê ev pêvajo heta 2 salan bidomê." Yanî, bi gotinaka din, heta du salan wê li berçavê hemû cihanê her cure hêrîşan li civate kurd bikin bo ku wê bi tafisênin û bi çermisênin.

Çend ku hin dordor, dibêjin ku ev hêrîş, bi teybetî ev pêla hêrîşan a ji 14´ê berfanberê ku li kurdan dewleta tirk da destpêkirin "ji ber çêkirina hendekan a" jî, lê ratî vajî wê ya. Rayadarên tirk, ji ber ku li dijî statûya kurd in, wê çawa pêşî temenê statûya kurd li her deverê tûna bikin, di wê çerçoveyê de hêrîş dikin. Gotinên bi vî rengî ên weke "ji ber çêkirina kendekan a" ku weke "hêncet" dihê dayîn nîşandin jî, tenê divê ku mirov werêne ser ziman ku weke manipûlasyon û derewek a. Hendek, ji ber ku hêrîşên rejima tirk li kurdan bûn, bo ku xwe biparêzên ji hêrîşan hatina

çêkirin. Yanî, di rastiyê de dema ku mirov rastteqînîyê bibînê û werêne ser ziman, divê ku mirov werêne ziman, divê ku mirov bibêje ku ji ber ku hêrîş li kurdan bûna, bo parastinê ew hendek hatina pêşxistin.

Di aslê xwe de, radaydarên tirk, ev pêvajoyên hêrîşê ên ku di vê demê de di çerçoveyek konseptek şer de li kurdan dikin, hê berî dema ku hêrîşên DAÎŞê li kurdan destpê bikin, hizirkiribûn ku wan bikin. Lê pêşî li bendî hêrîşên DAÎŞê mabûn. Ber ku hizir dikirin ku wê DAÎŞê derbeyek mazin li her deverê li kurdan bixista û wê wan jî, li ser wê re êdî bi wê derûnîyê çûban bi ser kurdan de û wê ancam bidest bixistan. Yanî, ev pêvajo, çend ku di vê demê hatibê ser ziman jî, lê temenê wê ji vê demê ve tê çêkirin. Di destpêka pêvajoya çareserîyê de, rayadarên tirk, di cih de li şûna ku bidest avêtina gavan bikin bo çareserkirina pirsgirêka kurd, hemû hêza dana li ser çêkirina qarakol û kalekolan. Sevkiyetên mazin ên leşkerî di wê de li kurdistanê kirin. Weke ku kurdistanê ji nû ve dagir bikin, pêvajoyek dabûbûn destpêkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi vî rengî pêşxistibûbûn. Piştre, li ser wê re bi alikarîya tirkiya hêrîşên çeteyên DAÎŞê û hwd li rojava, başûrê û hwd li kurdan destpêkirin.

Li vir, divê ku mirov dûbare werêne ser ziman ku DAÎŞ, ji rêxistinekê zêdetirî, weke pêvajoyek şer ku li hemberî civate kurd û pirsgirêka kurd hatibûbû dayîn destpêkiribûn bû. Di vê çerçoveyê de hêrîşên DAÎŞê bi teybetî û giranî li kurdistanê li kurdan û civate kurd hatina kirin. Lê bi wê pêvajoya destpêkê bi serneketin. Lê tevî ku bi serneketin jî, gelek xûrixandin dan çêkirin. Herêmên rojava ên weke kobanê û ên başûrê ên weke şengalê xûrîxandin û kirina kavil. Heman rewşên ku li van herêmên başûr û rojava ku bi DAÎŞ, li hemberî civate kurd pêşxistin, nûha jî, xwestin ku li bakûrê kurdistanê jî pêşbixin û pêşxistin. Her wusa bajarên kurdan ên weke Cizira bota, Nisêbîn, Silopî, Sûr, Farqîn û gelek deverên din, dema ku hêrîşên rayadarên tirk bi polîs û leşkerên wan li wan dibûn, piştî wan hêrîşên wan re dîmenên ku derdiketina li holê, ji yên li kobanê û şengalê ku me dîtin ne cuda bûn. Her wusa, bi heman rengî, wê pêşî qadaxaya derketina li sûkan li bajarên kurdan denezenênin û dênin. Û piştre jî, wê bi hêrîşan wan bajaran kavil bikin. Qadaxaya derketina li sûkê, di aslê xwe de weke maske û sernûxûmandinekê bû ji van kirinên rayadarên tirk re.

Destpêka vê pêvajoya hêrîşan wê heta dema destpêka şerê DAÎŞê ê li hemberî kurdan wê herê. Her wusa, di wê demê de dema ku çeteyên DAÎŞê hêrîşî herêmên kurda kir û pê de, dema ku kurdên bakûr bertekên xwe dana nîşandin, bidest hêrîşkirina li wan bertekan kirin. Piştre jî, wê çawa kurdan li bakûrê kurdistanê bêdeng bikin, ketina nava hewldanên wê de. Di vê demê de gotinên weke "sazûmana civakî" û ankû "parastina sazûmana civakî"

hatina avêtin li holê ku li ser wan re temenê van hêrîşên tafisandin û çermisendinê ku wê êdî li kurdan bikin biafirênin. Piştî vê demê, di pêvajoyên hilbijartinan de minaq, di roja 6´ê hezîrenê de li Amedê komkujiya ku hatibû kirin di nava girseya ku bi milyonan li hevdû civîyabû divê ku mirov di çerçoveya vê hêrîş û politikaya hêrîşê de werêne ser ziman. Di dewama wê de komkujiya li Pîrsûsê, piştre jî ya li Anqerê hatibû kirin. Di aslê xwe de pêvajoya destpêkê a vê konsepta şer a li hemberî kurdan, wê bi rêxistinên kurdan ên sîyesî ên weke HDP´ê re destpê bike. Di pêvajoyên hilbijartinê de bi sadan bîro û saziyên wê kiribûbûna armanca hêrîşan de. Bi wê re xwestibûn ku hêza kurdan ji ketina hilbijartinan bixin. Piştî hilbijartinan jî, êdî ev hêrîş, li bajaran li girseya kurd destpêkir.

Pêvajoyên goçberkirina kurdan ji herêmên wan ji sala 1993´an ve li didomê. Di demên bûhûrî ên van dema de ser 5 hezaran re gûndên kurdan şawitandin û dan valakirin. Bi wê re, politikaya bêmirovkirinê li herêmê meşandin. Di vê demê de jî, dema ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe hêrîşî herêmên kurdan dikin, di arabayên leşkerî û ên polîsan de ´anonsan´ li kurdan dikin bajarên xwe biterikênin û herin. Di vê pêvajoya hêrîş a ku piştî hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an ku li civate kurd destpêkir, di nava wê de xwestin ku bi vî rengî mirovan ji bajaran jî bidina goçberkirin. Dema ku rayadarên tirk, dibêjin ku ev hêrîşên li civate kurd wê heta 2 salan bidom in, divê ku mirov bi van aliyan hemûyan re wê hilde li dest. Di serî de, armancaka van hêrîşan jî, ew a ku weke ku çawa ku rejima tirk di dema komkujiya Zilanê de kir, di dema komkujiya Agirî de kir, di dema komkujiya dersimê û hwd de kir, ku kurd aşîr bi aşîr ji herêmên wan didana destpêkirin û li şûna wan aşîrên tirkmen û azarî dihanîn bicih kirin, dixwezin ku pêvajoyek bi vî rengî a nû bidina pêşxistin. Armanca anonsên ku bi wan bangê li girseyên kurd dikin û dibêjin ´ji herêmê herin´, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, li vir, divê ku mirov gîyan û xalên "zagona şarq û îslahatê" li vir cardin bibîr bike. **´Zagona şarq îslahatê´**, di salên 1925an de hatibû derxistin. Lê di sale 1970´î de jî, şîroveyên nû tevlî wê kiribûn û biwê re pêşengên civate kurd komkiribûn û bi wê dabûbûn kom kirin. Çend ku di vê demê de ne di rojevê de jî ya, ev rewş, hemû li gorî gîyane ´zagona şarq û îslahatê´ dihên kirin û pêşxistin.

Li gorî gîyane **´zagona şarq û îslahatê´**, mirov dikarê vê demê weke dema wê ya sêyemin jî, werêne ser ziman. Her wusa, gîyane ´zagona şarqî û îslahatê´ li ser esasê **gûharandina demografîya civate kurd** li herêmê hatîya afirandin. Hertimî jî, armanca wê bûya herêmên kurd. Î ro jî, bi hêrîşên ku dikin re, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku pêlên nû ên goçberkirinê dikin û dixwezin ku bidina pêşxistin. Her wusa, ya ku nûha

li herêmê bi hêrîşên rayadarên tirk ku bi polîs û leşkeran dihê kirin jî, ev a. Ev pêvajoya şer ya ku rejima tirk li hemberî civate kurd, di vê demê de daya destpêkirin, aliyekî wê yê din ê bi vî rengî heya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke pêlek nû ya goçberîyê û ankû dîyaspora dikin ku ji herêmên kurdan bidina dana destpêkirin. Ev jî, weke di bin navê şer û û hwd dihê kirin. Li gorî, rejimê, çendî ku kurd, bêdeng bûn û li gorî wê û zihniyeta wê jîyane û herê kirin ku bibina tirk, wê hingî ew sazûmana wê ya civakî ku wê di mejiyê xwe de tefkîr kirîya wê were li cih. `Zagonên weke yên ´**zagona şarq û îslahatê**´ û hwd, di vê çerçoveyê de weke zagonaka ku bi vê mantiq û gîyanê li herêmên kurdan hatîya xistin meriyetê de ya. Ji sale 1925´an û heta sale ku em di wê de a 2016´an, hê jî, şer û tekoşîna rejima tirk li hemberî civate kurd ya li gorî zihniyeta ´zagona şarq û îslahatê´ daya destpêkirin, didomê. Di wê demê de jî, bi gîyane ´zagona şerq û îslahatê, hebûna civate kurd û gûharandina demografiya wê dihat armanc girtin. Î ro jî, ji wê armanca rejima tirk ku li gorî gîyan û xalên ´zagona şarq û îslahatê´ ti tişt ne gûharîya û hebûna xwe dide domandin. Şerê wê yê hêrîşkirina li bajarên kurdan li bakûrê kurdistanê û kavilkirina bajaran û bi wê re banga çûyîna ji bajêr ku li kurdan dihê kirin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Ew zihniyeta ku hertimî kurdan ew şermazar kiriya a ´**zagona şerq û îslahatê**´, di temenê hêrîşên rayadarên tirk ên li herêmên kurdan û li civate kurd ku bi polîs û leşkerên wê pêş dikevin de ya.

….

**Şerê jenosîdê ê bi civate kurd re û denklemên sîyesî û weke hêzeke avaker kurd**

Piştî pêvajoyên serdem dîroka kurdan ên ji serdemên Şadadîyan û heta ya Merwanî û piştre Eyûbîyan, bi derketina weke hêzekê li herêmê a Osmmanîyan, weke ku ew xate dayîmî ya jîyan û desthilatdarîya kurdan hatibû birrîn. Rewşa î ro ya ku kurd di wê de na, mirov ku bi awayekî dikarê bi şibêne serdema şadadî-merwanîyan jî. Serdema şadadî-merwanî, weke serdemek giring ya destpêkîbû di dîroka herêmê û ya kurdan de. Hêrîşên î ro ku rejima tirk bi DAÎŞ´ê û hwd li rojava dike, mirov dikarê, bişibêne hêrîşên selçûqîyan ên li ser serê desthilatdarîya kurdên şadadî-merwanîyan jî.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê weke aliyekî giring bibêje ku rojava hem derîyê cihane arab a ku bi vê aliyê firatê û diclê ve divebê ya. Her wusa ji aliyê kurdan ve jî serdestîya demê ya. Bo tirkan jî, serdestîya kurdan li rojava, weke girtina vî deriyê li tirkan ji aliyê cihan arab ve jî ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di serî de bandûra sereka ya rojava wê ew bê ku têkiliyên tirkiya ên ku ew dixwezê ku li ser gotina "islamê" re li cihanê arab û kurd çêbike jî, kêm dike. Hemû hêrîşa wê ya li rojava, hinekî jî bo vê yekê ya. Nûha, li ser DAÎŞ´ê re, tenê Ezaz û cerablus, weke rê û deriyê tirkiya ê li ser xate ´sûnnî´ re bi cihane arab re maya. Xistina balafira şer a Rûsya, wê rengê sîyesetê li herêmê bide dîyarkirin. Her wusa, Rûsya jî, naxwezê ku Tirkiya, weke hêzek mazin hebe. Bo vê yekê, xistina balafira şer a Rûsya dide nîşandin ku wê pêvajoyek nû ku kurd jî di nav de ya, wê bi xwe re werêne. Ji xwe, ji nûha de, bi alikarîya balafirên şer ên Rûsya hêzên kurd YPG bo rizgarkirina cerablasê, ber bi rojavayê çemê firatê ve diçê. Ev xate ku tirkiya li ser Cerablus´ê re ku bi DAÎŞ´ê dike ku xwe bigihêne cihane arab, wê jî wê bidina girtin. Li rojava, statûya kurd, ku rejima tirk bi dijminahî li wê dinerê, deriyê wê yê ku li cihane arab vekirî ji dest digirê.

Di aslê xwe de dema ku mirov di vê çerçoveyê de dihizirê, mirov baştir fahm dike ku giringîya ´pêvajoya çareserîyê´. Her wusa, weke ku bi pêvajoya çareserîyê hatibû hizirkirin, wê kurd li herêmên xwe statûya xwe ya desthilatdarî bidest bixista. Bi wê re jî, wê têkilîya kurd û tirkan ji nû ve hatiba bi peyman kirin. Di vê çerçoveyê de wê ew rastîya ´hêze herêmî´ biheta pêşxistin. Lê tirkiya, ev ji dest da. Bi bawerîya ku wê di vê pêvajoyê de wê derbeyê li kurdan bixe, DAÎŞ pêşxist û ajot bi ser kurdan de. Bo vê

yekê ya ku tirkiya têkçûna DAÎŞ´ê, weke têkçûna xwe dibînê. Xistina balafira şer a Rûsya li Sûrî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê fahm bike û werêne ser ziman. Bi teybetî, divê ku mirov xistina balafira şer a Rusya ji aliyê Tirkiya bi sîyeseta wê ya ku ew di vê çerçoveyê de bi wê alikarîyê did DAÎŞ´ê û her wusa hesabên wê yên bêstatû hiştina kurdan û xwe dîsa li ser serê kurdan li herêmê kirina desthilatdar ve girêdayî divê ku mirov fahm bike. Her wusa, hêrîşên li bakûrê kurdistanê ên li Farqîn, Gever, Nisêbîn, Cizira bota û li bajarên din ên kurdan ku li civate kurd dibin û ciwanên kurd tên qatilkirin, divê ku mirov wan jî di vê çerçoveyê de şîrove bike û werêne ser ziman.

Di aslê xwe de li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku bi serkevtina vê serdema rojava re vê vê pêşketina rojava bi ya li başûrê kurdistanê re ji gelek aliyan ve bişibihêne serdema şadadî-merwanîyan. Di vê çerçoveyê de pêvajoyek nû weke ku xwe di vê çerçoveyê de dide dîyarkirin. Tirkiya, weke berê, bixwezê û nexwezê jî, wê nikaribê, êdî xwe bide jîyankirin. Çendî ku komkujiyên weke ên li Pirsûsê bo çêkirina hênceta banga civînê li NATO bike jî, wê ev rewş, nebina rewşna mayînda. Di vê çerçoveyê de komkujiya Pîrsûsê, weke komkujiyeka di serî de ku temenê banga civînê li NATO bike weke ku hat kirin. Ev ji ber çi pêwîst bû? Ji ber ku rejima tirk, di wê de konseptek şer li hemberî civate kurd kiribû meriyetê de û di xwest ku wê întibayê bide rayagiştî a nava tirkiya û dervî tirkiya ku NATO di vê konsepta wê ya şer de li cem wê ya. Ev yek, ji wê re pêwîst bû ku bike. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov wê çêkirina ´hêncetê´ bo bakirina li civînê a NATO bi komkujiya li Pîrsûsê, divê ku li ser du lingan hilde li dest û fahm bike. Lingê pêşî, li ser esasê meşandina konsepta şer li ser esasê bêstatû hiştina kurdan ku karibê bide domandin. Li vir, ji levkirineka li ser masayê bi andamên din ên NATO re, ji wê zêdetirî, bi awayekî deronî li ser çapameniyê re afirandina wê dîmenê, wê weke lingekî vê konsepta şer a rejima tirk bê. Pirannîya andamên NATO, di wê hizrê û bawerîyê de bûn ku ´divê ku pêvajoya çareserîyê were dayîn Domandin. Serok(sekreterê)ê demî ê Jens Stoltenberg, di destpêka şerê rejima tirk ê bi kurdan re de, bakir li tirkiya û got ku «divê ku pêvajoya çareserîyê zindî bikin û bidina domandin.» Lê tirkiya biryara şer dabû bû bi kurdan re. Di bin nav û dîmenê şer û tekoşîna bi DAÎŞ´ê re de dixwestin ku vî şerê bi kurdan re bidina domandin. Dixwestin ku di mejiyê rayagiştî de wê dîmenê bidina çêkirin ku navê tevgera kurd û yê DAÎŞ´ê li hex hevdû were bibîrkirin. Bo vê yekê, rayadarên tirk, hertimî, hevokên ku di wan de navê tevgera kurd û yê DAÎŞê li rex hevdû bikardihanîn dihanîn ser ziman. Gotinên weke «em tekoşînê bi rêxistinê terorê re dikin.» û di dema vê de jî digotin ku «bo me

PKK û DAÎŞ, wehe hevdû rêxistinên terorê na.» Heta ku leze ne girtin û partîyên sîyesî ên kurd ên rojava ên weke PYD jî, navê wan dihildin bi yê DAÎŞ´ê re û car bi car digotin ku «PYD ji DAÎŞ´ê xatertira.» Ev gotin, sedemên wê hebûn. Her wusa, sedema pêşî, hewldana kriminalizekirinê a li ser navê re bû. Sedema dûyemin jî, bo ku şerê xwe yê li dijî civate kurd ku dimeşênin, bidina domandin û herêkirin.

Di dewama van nîqaş û hewldanên rejima tirk ên bi şer de, rayadarên tirk, hertimî, ji Amerika dixwestin ku ”**herêmek tampon**” di nava xate kobanê afrînê de li herêmên weke ezaz û cerablusê were çêkirin. Bi vê dixwest, derbeyekê li kantonên rojava bixe û bi wê re temenê ´statûya civate kurd li rojava tûna bike. Di temenê hemû kiryar, hewldan û dîplomasîyên rayaderên tirk de dijberîya li hemberî statûya kurd hebû. Her wusa, li ser vê esasê şerê ku rejima tirk ji 24´ temûza 2015´an û pê de ku bi civate kurd re da destpêkirin, li ser wê esasê komkujiyên weke yên li Pîrsûsê da kirin ku bi wan bangê li civîna NATO bike. Yanî, bi gotinaka din, NATO, bike xizmeta şerê xwe yê bi civate kurd re. **NATO, çiqasî ev fahm kir, ez wê nizanim. Lê di vê çerçoveyê de divê ku ez bibêjim ku ji aliyekî ve di çerçoveya mantiqê kirina komkujiya Pirsûsê de balafira şer a Rûsya ji aliyê tirkiya ve hat xistin û di cih de li şûna ku herê bi rayadarên Rûsî re bikeve têkilîyê û bûyarê çareser bike, di cih de bang li civîna NATO kir û NATO bo ku piştgirîya xwe ji wê re werêne ser ziman civand**. NATO, weke ku çawa ku piştî komkujiya Pîrsûsê ku tirkiya bang li wê kir, di dema xistina balafira şer a Rûsya de jî civî. Lê vê rewşê, gûmanên mazin di serê gelek andamên NATO de jî çêkiribû di derbarê ´rojevên vêşarî ên tirkiya´ de. Êdî dihat fahmkirin ku tirkiya, tenê nîyeta wê kurd bûn. `The guardian´ di du roj berê 20 mijdara 2015an de dinivîsêne ku ”Tirkiya û T. Ardogan piştgirîyek mazin dide DAÎŞ´ê.”. Di dewama wê de dihêne ser ziman ku di bin maskeya gotina ”terorê” de hêrîşî kurdan dike.

NATO Alikarîya NATO a ji tirkiya re jî, di wê çerçoveyê de ya ku wê çawa Rûsya hinekî bidina sekinandin a. Tirkiya, bi politikayên kurnaziyê û sûdwergertinê dike ku ji wê sûd bigrê. Li li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku ji aliyê çanda navxweyî ya rûsya û ya rojava û Amerika jî, her çend ku nakokîyên wan hebin jî, wê hertimî sînorek di nava wan de hebe. Çendî ku tirkiya andamê NATO jî bê, ku rewş, were û bikeve rewşa levkirineka li ser rojhilat de bê, wê rewş Rûsya bo rojava û Amerika li pêştir bê. Û bi vê rewşê re dema ku mirov li rewşa kurdan binerê jî, hemû nirx û dîroka kurdan a ji dema sûmerîyan û heta demên gûtî, hûrî û mîtannîyan û piştre Medîya jî di nav de, wê bi rengê pêşketina rojava re di aliyê vê dîroka pêşketî de rengê xwe bide dîyarkirin. Kurd, bi rewşa xwe, wûcana xwe, dîrok û pêştina xwe

re li pêş in. Tenê, ya ku maya yekîtîyek dîrokî li ser wê li herêmê çêkirin a.

Li vir, rewşa kurdan, hertimî bûya weke rewşek ´jeo-stretejîkî´. Rejimên herêmê ên weke tirkiya, li şûna ku bi wê hebûna kurdan re bi awayekî adilane têkilîiyê dênin, di çerçoveya xwe kirina desthilatdar de, hertimî ketina nava hewldana pêşîya pêşketina kurdan girtinê de. Hêrîşên li rojava jî, ji aliyê pêşketina statûya kurdan ve ku mirov li wê binerê, hêrîşên rejima tirk ên li wê dihên vê wateyê.

Pêvajoya nû, her wusa, di wê de kurd weke hêzek hena. Her wusa, politikayên bi têgîna dema ´osmanî´ çûyîna rejima tirk bi ser kurdan de li herêmê û ji aliyê hêzên li herêmê ve wê zêde îtîbarê nebînin. Xwe weke ´hêzekê herêmê´ dana nîşandin, wê di vê çerçoveyê de tenê di gotinê de bê.

Serdema ku î ro kurd wê bi pêşketina xwe li başûr-rojava re ku dijîn re weke serdemek nû ya şadadî-merwanî ya. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werêne ser ziman. Li vir, çendî ku rewşa kurdan pêş dikeve, mirov wê jî dibînê ku li nava kurdan leyistin jî zêdetir dibê. Her wusa, hewldanên tirkiya ên li ser PDK´ê re û hwd, di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. LI başûr tengezerîya milisên îranî ên li başûr, hinekî mirov dikarê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman û hinekî jî mirov dikarê di çerçoveyeka ku bi wê hin nakokîyna di nava kurdan û farisan de çê bikin û li ser wê re ku karibin li rojava ancamên wê bi hêrîşên li kurdan derxin li holê.

Hewldanên bi vî rengî ên weke tengezerîya di nava milisên îranî û rayadarên başûrî de di vê çerçoveyê de lingekî wê yê bi rojava ve jî heya. Bi teybetî, piştî rizgarkirina şengalê ji destê çeteyên DAÎŞ´ê û rûdana vê rewşê, di vê çerçoveyê de di derbarê hewldanên di demên pêş de ên li hemberê kurdan de jî, wê têgînna bidina me.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman, î ro em di demeka pirr zêde giring de di bûhûrîn. Bo kê ev dem pirr giring bê, bo kurdan du-qatî ji wê giringtira. Her wusa, di serî de divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de çendî ku kurd yekbin, wê pêşketina xwe pêşvetir bibin. Li vir, li ser vê rastiya kurd re ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku çendî ku başûr û rojava nakokîyên sîyesî ên li ser esasê berjewendîyên sîyesî dênin aliyekî û bi hevdû re tevbigerihin, wê qizinc bikin. Her wusa, ji vê demê û pê de, xorttir kirina têkilîyên başûr û rojava, wê hem bo başûr bê ewlakariyek û hem jî bo rojava wusa bê. Divê ku rojava başûr weke paşbaxçeyê xwe bibînê û bi heman rengî başûr jî li rojava wusa binerê. Di vê çerçoveyê de kirina sîyesetê bi hevdû re di ahengekê de û ji gotinên tûj ên li dijî hevdû dûr sekinin, wê temenê vê rastîyê bê ji wan re.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku weke ku çawa berê temenê kurdan hebû ku biibina hêzek avaker ya herêmî, di roja me de temenê wê û derfeta wê ji wan re dîrok dide nîşandin. Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di serî de di vê demê de ku pişta xwe bidina hevdû û bi hevdû re yek bin. BI gîyane netewî bi hevdû re di nava têkiliyê de bin. Pêşketinên xwe yên zanînî, rewşenbîrî, aborî, sîyesî, dîplomatîkî û hwd, bi hevdû re parve bikin. Li ser esasekî bi hevdû re wê bikin. Di vê rewşê de du bend di nava kurdan de li pêşîya pêşketina wan asteng in. Yek, ew têkilîya wan ya li ser partîtî û berjewendîyên desthilatdarîyî na. Dema ku yek li hemberî ya din bû xwediyê gotinê, wê hingî ev yek wusa bê.

Ez li vir, dixwezim ku vê yekê jî di çerçoveya xwe ji hevdû re kirina pişt bo kurdan werênima ser ziman. Di aslê xwe de çendî ku di vê demê de derfetên dîrokî derketina li pêşîya wan. Mirov wê dibînê. Lê divê ku vê yekê jî bizanibin ku heta ku hevdû bi hevdû ne bi bawer bin û pişta xwe ne nedina hevdû, wê nikaribiin ji vê astê û pê de jî, maztintir pêşketinê bi xwe re çê bikin. Pirsgirêkên weke ya hêzên kurd li şengalê, tenê pirsgirêkên navxweyî ku dikarin hêza kurdan kêm bikin û pêşîya pêşketina wan jî bigrin in. Dema ku di astek netewî de ji vê demê û pê de li mijarê ne hat nerîn û tenê li ser rêveberîyên herêmkî ên bi bi hevdû re bi nakok in, wê tenê temenê hinek pirsgirêkên ku heta ku bi hevdû re di nava wan de pevçûnê jî bide pêşxistin bê.

Dîroka kurdan tenê ya ji şerê cihanê a duyemin û bi vir de, ku kurd karibin bi awayekî baş wê dahûr bikin û bixwênin, wê baş bibînin ku tişî fêr a bo wan. Her wusa, rewşa komare mibabadê, rewşa başûrê kurdistanê a salên 1970ê û hwd, hemû jî li berçav in û hê jî di bîra hemû kurdan de zindî na. Di vê rewşê de ku kurd ne yek bin û ew bixwe ne xwediyê biryarê bin li ser rewş, baxt û pêşaroja xwe û civate xwe, wê heman rewş werê serê wan. Di dema komare mibabadê de ji aliyê Rûsya ve bi tenê hatina hiştin û di salên 1970´î de li başûr ji aliyê Amerika ve bi tenê hatibûbûna hiştin. Berdêla wê jî, bi gelek komkujiyên ku hatina serê civate kurd, bû. Kurd, î ro Rûsya jî, di xwezê ku wan bikişêne cem xwe. Her wusa, fêr û cerba kurd, di demên bûhûrî de bi herdûyan re jî heya. JI aliyê herdûyan ve bi tenê hatina hiştin. Rûsya, di destpêka komare mihabadê de alikarî de û piştre xwe vekişand û kurd bitenê hiştin. Piştre Îranê bi hêrîşên xwe re ew komare nû û piçûk a kurdan xûrîxand. Ji vê ya ku kurd weke fêrekê derxin, li şûna ku pişte xwe bidina hêzekê, ew xwe bixwe politikaya xwe bidina kifşkirin û li gorî rastîya civate xwe li herêmê sîyesetê bikin. Têkilîya wan bi awayekî rast bi hemû hêzan re hebe. Lê ew rengê politikaya xwe bi hêza xwe ya

civatî bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de temenê wan û pişta wan tenê li civate wan û li hevdû bê. Dema ku rewşek nû weke van rewşên berê bibê jî, dakû kurd rastî feleketên nû ên bi vî rengî newin. Di roja me de, hêzek xort ya kurdistanî ku wan biparêzê, wê temenê pêşxistina pêşaroja wan jî bê ji wan re. Lê hêzek bi vî rengî ya xort jî, wê di serî de ne hesanî jî bê ji aliyê hêzên herêmê ve ku wê herê bikin.

Em dema ku li dîrokê dinerin, em dibînin ku rastî hertimî di wê çerçoveyê de bûya ku kurd bûna xwedî hêz û karîna ku li ser pêşaroja xwe gotina xwe bibêjin, hingî karîna ku baxtê xwe jî û yê herêma xwe jî bi xwe re bidina dîyarkirin. PÊşxistina DAÎŞ li hemberî kurdan, hinekî jî di çerçoveya vê hasabê stretejîkî ên rejimên herêmê ên weke Tirkiya de ya. Çend ku DAÎŞ, bi rengekî olî û maskeya olî li herêmê dihê hanîn li ser ziman jî, lê di aslê xwe de ji wê zêdetirî, mirov dikarê, DAÎŞ´ê, weke rêxistinek û pêvajoyek şer a rejima tirk a li hemberî vê pêşketina kurdan jî werênina ser ziman. Her wusa mirov dikarê di vê çerçoveyê de ku em vê pêvajoya î ro ya kurdan bişibihênina serdema şadadî-merwanîyan, divê ku mirov DAÎŞ´ê li ser tirkiya re bişibihêne hêrîşên selçûqîyan ên wê demê ku li herêmê dibûn.

Li vir, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku kurd, yekîtîya wan ya navxweyî, di vê demê de ji ber vê yekê ji nan û avê ji wan re giringtira. Dema ku nakokîyên xwe yên bi hasabên piçûk ne dênina aliyekî û bi hevdû re tifaqek netewî çênekin, wê bi tememî winda bikin. Divê ku vê rastiyê bibînin û rava bikin. Kurd, weke hêzek avakir ku li herêma xwe dide kifşkirin, divê ku xwe pêşbixe. Her wusa, ku di vê çerçoveyê de yekîtîyek netewî çênekin ku her hêzên li herêmê ku bo wan şer bikin û ankû hêzên ku li herêmê sîyesetê dikin ku bibina leşkerên wan ên ku wan ser dixin, wê bi civate xwe bidina windakirin.

Başûr û rêveberîya wê her çend ku bahse "serxwebûnê" dikin jî, bi têkiliyên xwe yên bi tirkiya û îranê re vê gotina xwe vala derdixin. Têkiliyên PDK´ê li li başûr î ro rêveberîya bi îranê re jî û bi tirkiya re jî hena. Yên ku herî zêde li dijî serxwebûna kurdan jî îran û tirkiya ya. Hin kurdên ku diberê digotin ku ´wê tirkiya piştgiriyê bide serxwebûna kurdistanê´, di serî de divê ku mirov werêne ser ziman ku yên ku ti fahmkirina wan ya stretejikî nebû bû. Di serî de dema ku mirov têgîn û stretejiyên van herdû welatan binerê jî, di serî de wê çawa pêşîya kurdan bigrin û li ser wan re xwe bikina desthilatdar. PDK´ê bi peymanên aborî û hwd ên ku bi îran û tirkiya re çêkirina, dest û lingên xwe dana girêdan. ...

Bi xwe re weke hêzek kurd û kurdistanî jî, dest û lingê sîyeseta kurd bi wê dana girêdan. Î ro, ev rewşa PDK´ê bi vîna wê û ne bi vîna wê bê, hem li

pêşîya pêşketina kurdan asteng a û hem jî di pêşîya çêkirina yekîtîya kurdistanî a civatî de jî weke kelemekê ya. PDK´ê, bo ku ji vê astê û pê de di nava sîyeseta kurd pêş bikeve û pê de, divê ku hem sîyeseta xwe rast bike û hem jî xwe ji van kelemên wê yê ku wê bi destê xwe çêkirina, ji wan rizgar bike. ..

Heta ku nekê jî, wê temenê pirsgirêkan di nava civate xwe bixwe de jî bê. Heta ku ev kelem û rewşa wê ya sîyesî a nêzî tirkiya û îranê a li ser wan têkilî û peymanên ku wê çêkirina wê hebe, hertimî wê temenê wê yê ku bi beşên din ên civatî re bikeve pevçûnê de jî wê hebe. Çend ku Berzanî bibêje jî ´heta ku ez sax bim, ezê nehêlim ku şerê birakujî bibê´ jî, lê di vê çerçoveyê de divê ku miirov vê yekê jî bibêje ku rêveberîyeka kurd ku ew serokê wê ya bi peyman û têkilîyên wan ê bi tirkiya û îranê re temenê wê di nava kurdan de afirandina. Bi artişa tirk re oparasyonên ku li başûr ku di salên 1993´an de li hemberê hêzên din ên kurdan bûna, bombardimanên ku î ro rejima tirk dike û hwd, ma mirov çawa wê werêne ser ziman? Ne ev li ser têkiliya wan ya bi PDK´ê re dibin. Dema ku DAÎŞ´ê hêrîşî kurdan kir, ne tenê hêrîşî rojava kir. Bi pirranî jî, bi alikarîya tirkiya û hinekî jî îranê hêrîşî başûr jî kirin. Ji ber ku li van herdû beşên kurdistanê rêveberîyên kurdîstanî hatibûn avakirin û temenê statûya civate kurd hatibû afirandin.

Rûsya, weke ku li Afganistanê tişta ku hatibû serê wê, vê carê, bi fêr û zanîna wê hêrîş dike. Bi serkevtinaka li Sûrîya, wê xwe li herêmê jî bike hêzek nû ya mazin. Li Sûrî, rejimên weke tirkiya dengeyên ku çêkirina li ser cerablus´ê û hwd re, bi wê dixwezin ku rewşa xwe ya li herêmê biparêzên. Tirkiya, pêşketina kurdan û statûya wan ji xwe re kirîya armanc û hêrîşî wê dike. Gelo wê dîrok dûbare bike? Vê carê, wê kurd nehêlin ku li ser bêstatûya wan û ankû li ser cenezeyê wan tirkiya xwe bike hêz. Gelekî weke gelê kurd ku li herêmê ser 50 û ankû 60 milyonî re ya, li ser esasê bêstatû hiştina wan bi wan re şer û tekoşîn kirin, tenê êdî ya ku weke karê ahmaqan bê.

Î ro di destê tirkiya de tenê têkiliyên wê yên bi PDK´ê re mana ku wan li hemberî kurdan bikardihêne. Bo vê yekê ya ku hertimî li dijî yekîtîya kurdan disekin in. Heta roja me, ne hiştin ku kurd yekîtîyekê çê bikin bi li darxistina kongira netewî. Lê bi wê re dîrokê şanî me da ku dema ku kurd ne bi hevdû re bin, wê serkevtineke dîrokî bi dest nexin. Vê pêvajoya bi hêrîşên DAÎŞ´ê re ev yek bi awayekî vekirî da nîşandin. Ev pêvajo û dema ku em di wê re di bûhûrin, gelek pêşketin bi wê re bi hevdû re dibin. Bo ku kurd di bin wan pêşketinên li herêmê de nemênin, di serî de divê ku yekîtîyekê di nava xwe de çê bikin. Li herêmê, gelek hêz hena û bi hevdû re şer û tekoşînê dikin. Hemû jî dixwezin ku xwe biserbixin û yên li hemberî xwe binbixin. Her

çend, sîyeseta rejimên herêmê ên weke Tirkiya wê neçê sêrî û we sernekeve jî, lê wê ancamên wê weke ku li bakûrê kurdistanê dihê ditin, wê bi xûrîxandinê xwe bide dîyarkirin.

Di vê pêvajoyê de hemû cihanê ew jî dît ku kurd hêzek herêmî na. Di vê çerçoveyê de ya ku tenê maya ku ew hêz were birêxistinkirin, bi statû kirin û bi wasif(´**nîtelik**´) kirin. Di vê çerçoveyê de di vê pêvajoya şerê DAÎŞ´ê de cihane rojava jî, weke ku ket lêgerîneke ku bi wê dada xwe ya bi civate kurd re ku bi afirêne. Ev weke pêvajoyekê, nûha bi rê ve diçê. Li vir, li ser vê re mirov dikarê vê yekê jî, werêne ser ziman ku wê reng û têkiliyên herêmî bi pêşketina wê re, li gorî vê jî awa û şekil bistêne. Hemû têkilî û peymanên berê, wê bêbûhûrîner bin. Di vê çerçoveyê de kurd, bi fahmkirineka nû û bi hevdû rebûneka li gorî demê re divê ku bi hevdû re bin. Li şûna gotinê kirin, êdî divê ku cih bistêne.

Her çend ku dema ku bahse têkiliyên PKK û PDK û nakokîyên wan tên kirin jî, li vir, di zane min de divê ku mirov li şûna wê derxistina li pêş a gotina bi pirsgirêk, derxistina li pêş têkilîyên di nava rojava û başûr de û bi awayekî baş pêşxistina wan, wê di vê demê de ya herî giringtir bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi nêzîkkirina beşa civate kurd a rojava û ya başûr re, di aslê xwe de wê temenê sîyeseta çêkirina nakokan di nava sîyeseta kurd û hêzên kurd de jî wê ji holê were rakirin. Civat, weke hêzek afrîner, wê di vê çerçoveyê de bi rengê xwe bide dîyarkirin.

Li ser esasê dijbarîya başûr li rojava û ankû ya rojava li başûr axiftin, tenê û tenê xizmetî hêzên ku dixwezin ku kurdan di rewşeka wan ya bêstatû bihêlin de dike. Ne başûr dijberî rojava ya û ne jî rojava dijberî wê ya. Herdû jî herêmên kurdistanê na û civatên kurd in. Rengên wan ên pêşketinê ê cuda dibêt ku hebe jî. Ev, ne kêmesîyeka ji wan re. Ev dewlemendîyeka civatî ya ku divê ku bi hevdû re were pêşxistin a.

..

**Li ser gotinên weke "sazûmana civakî" û "derxistina pêvajoya çareserîyê ji ´bozdolabê´" û hêrîşên li kurdistanê ..**

Pêvajoya ku em di wê re dibûhûrin, ji aliyê gelek dordoran ve weke ´şerê cihanê ê sêyemin´ jî dihê bi nav kirin. Bi teybetî ku em weke şerê cihanê ê sêyemin bi nav bikin, li vir, di serî de divê ku mirov werêne ser ziman ku tenê ev şer li rojhilat û Asya dibêt. Her wusa, li herêmê jî, ti rejim tûna na ku strejiyên li dijî wê pêşbixin. Vajî wê, di wê çerçoveyê de plitikayên xwe yên demî û rojane di afirênin û didomênin. Rejimên herêmî bi vî rengî hem bi xalkên ku di bin desthilatdarîya wan de re şer wan heya û hem jî bi dordora wan re şerê wan heya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku şerê cihanê ku ev bê, navende wê şerê cihanê li ser esasê rojhilat û

qatkirina kurdistanê û bi xalkên herêmê re ji aliyê rejimên herêmê û hêzên li li herêmê sîyesetê dikin ve dihê meşandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ji aliyê rejimên herêmê ve di serê de pirsgirêka fahmkirina vê rastiyê, dike ku ev pêvajoya şer li ser serê wan bi destê rejimên ku wan kontrol dikin re bi jîyane wan re were domandin. Î ro, li herêmê, şerên ku hena, pirranîya wan şerên desthilatdarîyê na. Mirov, nikarê weke şerna ku dixwezin ku wê rewşa xirab ji holê bikin werêne ser ziman.

Pirsgirêk jî li vir, xwe dide dîyarkirin, di serî de pirsgirêka herêmê bi zihniyetî ya. Pirsgirêka herêmê li ser wê pirsgirêka wê ya zihniyetê re, weke pirsgirêka wan ya bi xalkên herêmê û statûya wan re jî werêne ser ziman. Ji ber ku di vê çerçoveyê de ya, pêşxistina çandaka mirovî û demokratikî jî zor dibê. Bi desthiatdarî, rejimên herêmê, dihizirin ku wê çawa rejimên xwe bidina domandin. Li pêşaroja herêmê û xalkên herêmê na hizirin. Ji xwe, ew ji wan re ne derd a jî.

Rewşa derxistina li herêma DAÎŞ û li hemberî xalkên kurdistanî û mesoptamikî dana hêrîşkirinê jî divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de rewşa DAÎŞê, ji gelek aliyan ve bi zihniyeta ne mirovane ya rejimên herêmê re divê ku mirov hilde li dest. Minaq di vê çerçoveyê de mirov dikarê rewşa tirkiya ya bi DAÎŞê re cardin hilde li dest û fahm bike.

**Di şer de navê DAÎŞ´ê hilde û hêrîşî kurdan bike û dibêje "dewleta hevrast" cemaetê nîşan dike û oparasyonan li kurdan bike.** Weke rengekî politikaya dewletê, ev gotin û fahmkirina wê baş bê. Hertimî, di vê çerçoveyê de hanîya ser ziman. Şerê dewletê ê bi kurdan re, hertimî kirîya ku bi gotina terorê´ werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de hemû xwestekên civate kurd, bi politikayên kriminalize kirinê, pêşî kiriminalize kirîya û piştre çûya bi ser de. Li vir, du lingên rengên politikaya dewletê li vir divê ku miirov di serî de werêne ser ziman. Gotina ´dewleta hevrast´ û bi wê kirina oparasyonên qaşo li cemaetê, di aslê xwe de politikayaka dewletê ya li dijî xwestekên kurdan a. Her wusa, bi demê de mirov dibînê ku di çerçoveya gotina ´dewleta hewrast´ de gotinên ku hanîna ser ziman, nêzîkatîyên ku dana nîşandin û politikayên ku meşandina, di wê çerçoveyê de na ku wê çawa bi wan pêşîya kurdan bigrin a. Yanî, bi gotinaka din, mantiqê ê gotina ´dewleta hevrast´ û politikayên wê ew a ku wê çawa di çerçoveya gotinên T. Ardogan ên weke ´yek millet, yek dewlet, yek ziman, yek ol, yek al´, û hwd ku wê çawa politikaya wan bimeşênin û di vê çerçoveyê de bi gotina ´dewleta hevrast´ çawa pêşîya xwestekên civatî bigrin, di vê çerçoveyê de hanîna ser ziman.

Ev hewa û rewşa ku li ser çapameniyê re hanîna ser ziman, bi wê hemû gavavêtinên kurdan dihên asteng kirin. Yanî, weke ku çawa ku di van rojên dawî de rayadarên tirk, di şer de navê DAÎŞ´ê hilde û hêrîşî kurdan bike, bi heman rengî dibêje "dewleta hevrast" cemaetê nîşan dike û oparasyonan li kurdan bike. Yanî, ev gotinên T. Ardogan ên ku berê dixwest ku navê PKK´ê bi yê DAÎŞ´ê re ku dixwest di hûndûrê heman hevokê de bi hevdû re werêne ser ziman, û DAÎŞ´ê bide nîşandin û herê bi ser kurdan de, heman politika, di roja me de li ser cemaetê re jî li hemberî kurdan dide meşandin. Li ser çapameniyê de weke ku diçê bi ser çemaetê de û oparasyonan li wê dike. Weke ku ji nava dewletê, dike ku wan "paqij" bike. Lê di aslê xwe de, ev rastî, bi zihniyetî, xwediyê mantiqekî ku bi wê dike ku pêşîya kurdan bigrê jî ya. Yan jî, weke ku ser rastîyan di nûxûmênê. Kirina weke hevdû ya Cemaetê û kurdan, di serî de xelata. Cemaet jî, şaqekê dewletê ya û ku di demekê de li hemberî tekoşîna kurd jî hatîya bikarhanîn a. Cemaet dixwezê payê û ankû bahrê ji desthilatdarîyê bigrê. Lê rewşa kurdan, mirov nikarê di vê çerçoveya cemaetê a hewldana wê ya ku dixwezê ku ew xwe bike desthilatdar re werêne ser ziman. Cemaet, sazîyek, bîrdozîkî û sîyesî ku olê ji xwe re weke maske bikardihênê ya. Lê kurd, civatek in û xwediyê maf û azadiya xwe ya xweza ya. Di serî de kirina rewşa kurdan û ya cemaetê weke hevdû, şêwayekî înkare rastîya civate kurd, bi xwe re dide nîşandin. Cemaet, zimanekî wê yê hatî qadaxa kirin tûna ya. Lê civate kurd, zimanê wê kurdî ya û hatîya qatil kirin. Ji ber ku civate kurd civakek a. Cemaet bixwe jî, sazîyeka heman rejima ku bi kurdan re şer dike ya. Di vê çerçoveya «dijber» de kirina cemaetê di pozisyonekê de, di aslê xwe de ji aliyekî ve bo ku her hewldanên bi tekoşîna maf û azadiyê ên cviate kurd ku li ser wê re di bin gotinên weke «hevrastîyê» û ankû «dewleta hevrast» û hwd re kriminalize bikin û piştre ji holê ra bikin a. Yanî, kirina weke «dijber» a cemaetê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi rengê politikaya rejimê ê şer kirina bi civate kurd re fahm bike. Ew jî, di vê çerçoveyê de ya ku ev têgîna «dijberîyê» ku li ser cemaetê re hatî pêşxistin, ji cemaetê zêdetirî, kurdan dike nava xwe de. Mirov dikarê vê rengê politikaya rejime tirk, bi vî rengî jî werêne ser ziman ku dema ku digotin «emê bi DAÎŞ´ê tekoşînê bikin.» Lê di bin navê tekoşîna bi DAÎŞê de bi kurdan re şer û tekoşîn dikirin. Şêwayê rastîya kirina cemaetê a rewşeka «dijber» de, di vê çerçoveyê de bi rengê politikaya rejima tirk re mirov dikarê fahm bike. Di gotin ku «emê bi DAÎŞê re tekoşînê bikin» lê hêrîşî kurdan dikirin. Dema ku bahse cemaetê dikirin, digotin ku «emê bi dewleta hevrast re tekoşînê bikin» lê hêrîşî kurdan dikirin û oparasyonên sîyesî ên di bin navê KCK´ê de li kurdan dikirin.

Her wusa, cemaet statû û xweserîya civatî naxwezê ku dewletek hevrast bê. Lê kurd, civatek cuda ya û zimanê wê cuda ya û civatekê cuda ya û dixwezin ku statûya xwe bidest bixin û bigihiijina maf û azadîya xwe. Cemaet, mafê perwerdeya bi zimanê dayikê naxwezê. Lê kurd dixwezin. Bo vê yekê, gotina ´dewleta hevrast´, çend ku li ser cemaetê re dihênina ser ziman jî, politikayên ku di wê çerçoveyê de dikin û pêş dixin jî, di armanca wan de kurd hena. Her wusa, oparasyonên di bin navê KCK´ê û hwd de ku li bakûrê kurdistanê û sîyeseta wê dihên kirin, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dewlet, bo ku politikayên xwe kriminalizekirina kurdan û tekoşîna wan ya maf û azadiyê bike, mirov divê ku van rengên politikayan werêne ser ziman. Her çend ku weke du aliyên ku ji hevdû cuda jî bin, lê dema ku mirov li ser zihniyetê re dihizirê, ya ku mirov kifş dike, di serî de ev a.

Oparasyonên ku rejima tirk û rayadarên wê li kurdistanê dikin, wê çawa bi wan civate kurd tûna bikin û ji civatitiyê derxin, di vê çerçoveyê de na. Her wusa, bi vê yekê oparasyonên di bin navên ´oparasyonên KCK`´ê ku kurd wan weke ´oparasyonên qirkirina sîyesî" bi nav dikin êdî dikin. Ev jî rewşeka hemdem ya ku mirov dikarê weke rêbazê şerê rejimê ê li herêmê û bi kurdan re werêne ser ziman.

Piştî ku hêrîşên xadar ên DAÎŞ´ê li kobanê zêdebûn û pê de, li bakûrê kurdistanê jî kurdistanîyan li her deverê xwepêşandin bo piştgirîya li kobanê û şermazarkirina hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kobanê li darxistin. Di van xwepêşandinan de hemû kurdistanî û herêm rabûna li ser lingan. Lê li kûderê jî, xwepêşandin li dijî DAÎŞ´ê û hêrîşên wê bi armanca şermazarkirina wê bûna jî, leşker û polîsên tirk hêrîşî xwepêşandanan dikir. Ev, weke demekê didomê. Di wê demê de weke ku herkesek jî bi lê dikê, pêvajoyek nû destpê dike li kurdistanê û di nava civate kurd de. Rayadarên tirk jî, wê çawa bertekên kurdan bişikênin, li ser wê disekinin. Di destpêka hêrîşên DAÎŞê ên li kobanê de rayadarên tirk ên weke Dawutoglu û di wê demê de ´serokwezir´ bû, derdikeve berçapameniyê û dibêje ku "ti têkilîya vir û wir bi hevdû re tûna ya." Bi van gotinan dixwezin ku pêşîya bertekan bisikênin. Bi wê dixwezin ku ji xwepêşandêran re bibêjin ku ti wateya xwepêşandinên we tûna ya.

Lê rastî vajî gotinên Dawutoglu bû. Li aliyê din ê sînor jî, yên ku rastî hêrîşê dihatin kurd bûn û yên ku li vî aliyê sînor jî rastî hêrîşê dihatin jî kurd bûn. Piştre dema ku ditin ku wê bi van gotinan nikaribin, pêşîya xwepêşandinên kurdistanîyan bigrin, xwestin ku gotina "pêvajoya çareserîyê" bikarbênin li hemberî kurdan. BIdest hanîna li ser ziman kirin ku

"dema ku win xwepêşandinan li darbixin û aliyê bidina kurdên rojavayê kurdistanê wê zirerê bide pêvajoyê." Pêvajoya xwepêşandinên bo kobanê û berxwedana kobanê ku hinekî kêmbûn, rayadarên tirk, bidest hanîna li ser ziman kirin ku "sazûmana civakî, hatîya armanc girtin." Piştre jî bidest hanîna li ser ziman kirin ku "heta ku sazûmana civakî(´kamu duzenî´) newê hanîn li cih, wê pêvajo jî bi rêve neçê. Di vê çerçoveyê de bo ku pêşîya bertekên kurdistanîyan bigrin, weke çcateka metingerî ya zihniyetî gotina ´sazûmana civakî´ hatibû kifşkirin û dihat hanîn li ser ziman.

Ya ku rayadarên tirk ji gotina ´sazûmana civakî´ fahm dikir û ankû qast dikir çi bû? Pêşî, ya ku fahm dikirin ew bû ku herkesekî bikina nava kontrola pergalê de ku herkesek ´îtaetê´ ji wê bike bû. Her wusa, Herkesek, girêdayî rejimê bê. Bo rayadarên tirk, dema ku kurdekî doza maf û azadîya xwe ya civatî kir, wê ev weke ´xirakirina sazûmana civakî´ bihat şîrovekirin û ravakirin. Dema ku kurdan hanîn ser ziman ku dixwezin ku xweserîya demokratîk bo civate kurd pêşbixin, wê ev weke xirakirina sazûmana civakê bê. Dema ku kurdekî got ku ´ez kurd im´, ev jî wê bûba weke bertekeka ku sazûmana civakî xira dike bê. Her wusa, wê hêrîşên rejima tirk û rayadarên wê bi polîs û leşkerên wê re li kurdistanîyan bibin, weke ku li Farqîn, Cizre, Nisêbîn, Hezex, Geverê, Silopî û hwd, polîs û leşkerên tirk hêrîşî kurdan bikin û her cûra komkujiyên bikin. Lê dema ku li ber wê deng hat derxistin û ankû kurdan xwepêşandin bo şermazarkirina wê kirin, wê ev bê xirakirina sazûmana civakî. Di vê çerçoveyê de gotina ´sazûmana civakî´, weke gotina ku wê çawa bi wê tirsê di nava civate kurd de çê bikin, tafisandinê li ser serê civatê pêş bixin û wan bêdeng bikin û pêşîya bertek û xwepêşandinên wan bigrin, di vê çerçoveyê de gotina ´sazûmana civakî´ dihat bikarhanîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dema ku kurd doza maf û azadîya xwe dikin û her wusa ´rêveberîyên xwe yên xweser´ weke li Farqîn, Cizire, nisêbîn, hezex, gever, Silopî û hwd ku dihanîn ser ziman, wê rayadarên tirk bi polîs û leşkerên ve ve bi her cûre xadarîyê hêrîşî wan bikin û piştre bibêjin ku "heta ku em sazûmana civakî cardin ava nekin emê ne sekinin." Piştî hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs û leşkerên wê ên hov ku li farqînê kirin û pê de, serokwezirê tirk Dawutoglu derdikeve berçapameniyê û li ser gotina ´sazûmana civakî´ re dibêje ku "ev herîş li sazûmana civakî na, wê hêzên me yên ewlakarîyê sazûmana civakî biparêzên." Bi vî rengî, wan hêrîşan diparêzê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku gotina sazûmana civakî, bi rengê ku hatîya şîrovekirin û şîroveyên ku rayadarên tirk ên weke Dawutoglu ku di bin navê wê de pêş dixin, di çerçoveya înkare civate kurd, nirxên civate kurd, meşrûkirina hêrîşên li civate kurd û her wusa di çerçoveya sazûmana bi wê heta roja me pêvajoyên

bişavtinê li ser serê civate kurd domandin û bi wê dixwezin ku bi wî rengî ji nûha û pê de jî, bidina domanin. Yanî, gotina ´sazûmana civakî´, weke argûmanaka ku bi wê dixwezin ku rejima ku dixwezê ku civate kurd ji dîrokê bibe û herkesekî bike tirk, di wê çerçoveyê de dihênina ser ziman. Rengekî din ê vê gotina ´sazûmana civakî´ jî ku çendekê berê dihanîna ser ziman gotina ´engteresyonê´ ya. Ev gotina ´entegresyonê´ jî, bi mantiq û nêzîkatîya bişavtinê û ankû ´asîmlekirinê´ dihê hanîn li ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku hêrîşên ku di vê çerçoveyê de dibin, divê ku mirov weke hêrîşên jenosîdkirina civate kurd jî werêne ser ziman. Mafê xwerêvebirina civate kurd, di vê çerçoveyê de hêrîşên ku li farqînê, Cizîrê, Nisêbînê Hezexê, geverê, Silopîîyê û li bajarên din ên kurdistanê ku li wan dibin, bi gotina ´xirakirina sazûmana civakî´ pêşî dixwezin ku şaş û xirab bidina nîşandin û kriminalize bikin û herina bi ser wê de. Di aslê xwe de gotina ´sazûmana civakî´, weke gotin û ankû argûmanaka vê konşepta şer a rejima tirk ku piştî hilbijartinên 7´ê hezirene 2015´an ku kiribû dewrê de jî mirov dikarê werêne ser ziman. LI ser vê gotina ´sazûmana civakî´ re, dixwezê ku di mejiyê mirovan de meşrûtîyekê di derbarê komkujiyên ku li ser serê civate kurd li kurdistanê dikin, di mejîyê mirovan de bidina çêkirin.

Li vir, divê ku mirov weke lingekî din ê vê gotina ´sazûmana civakî´ ku bi wê û li ser wê re kriminalizekirin û hêrîş dihê pêşxistin jî, mirov dikarê gotinên ku hinek mirovên ku ji xwe re dibêjin em "rewşenbîr" in û dibêjin ku "PKKê di hilbijartinan de pêşîya girt" jî, weke gotinaka ku mirov dikarê weke gotina ´dawutoglu´ a bi rengê ´sazûmana civakî´ ku dihêne ser ziman, wê jî şîrove bike. Ancama ku ji van gotinana derdikeve, ew a ku ´tekoşîna maf û azadîyê, divê ku newê dayîn û ya ku dewlet dike rast a, divê ku di nava sînorê ku wê dayî kifşkirin de herkesek bimêne.´Ji xwe, yên ku van gotinan dibêjin, çi rasthatina ku şerê rejimê ê bi kurdan re nabînin û rejim û rayadarên wê heta roja me, bi polîs û leşkerên xwe çend kurd qatilkirin, tenê gotin jî ji devê van derdoran di derbarê wan derneketîya. Hertimî, aliyê kurd weke "berpirsîyar" dîtina û ew armanc dana nîşandin û çûna bi ser wê de. Minaq, di vê pêvajoyê de rayadarên tirk û hikimeta wê dawî li pêvajoya çareserîyê hanî. Ev dordor, nabêjin çima dewletê dawî li pêvajoyê hanîya, li ser gotinên ku bi wan dixwezin nakokîyê di nava kurdan de çê bikin, hertimî kurdan di mejiyê xwe de dikina mijara nîqaşê û diçina bi ser wan de. Gotina ´sazûmana civakî´ ya rayadarên dewletê, hikimet û hwd a. Beremberî wê jî, gotinên din jî, ew gotinên ku hertimî hin mirov di bin navê rewşenbîrîyê de aliyê kurd hertimî di mejiyê xwe de dihênina ser ziman in.

Li ser tekoşîna maf û azadîya civate kurd, win nabînin ku van dordoran

ti gotin gotibê. Her wusa, rojekê ne hanîna ser ziman ku rejimê zimanê civate kurd qadaxa kirîya. Ji xwe, mafê xwe rêvebirinê û ankû rêveberîya xwe, bo wan ti carî nabê gotinaka ku ew hilde devê xwe jî. Hertimî dewlet û hikimet û rayadarên tirk, dihildina pişt xwe û berê xwe didina kurdan û bi gotinên xwe diçina bi ser kurdan de. Her wusa, di van herdû heyvên dawî de ser 300 kurdî re kurd ji aliyê hêzên rejimê ve hatina qatilkirin. Di kêlîkên ku min ev dinivîsand, **jineka kurd bi navê "selamet Yesilmen" ku dayîka çar zarokan bû û ew bixwe jî du-canî bû bi destê polîs û leşkerên tirk hat qatilkirin**. Her wusa, zarokên wê jî, giran brindar bûbûn. Ti kesekî, ew ne hanîya ser ziman.

Her timî, weke ku zilm û şîdeta ku li kurdan dihê kirin "meşrû" bê li ber wê bêdeng mana. Î ro jî, polîs û leşkerên tirk, herêmên kurdan kirina qada şer û gola xwûnê, lê ti kesekî heta vê kêlîkê li ber wê deng dernexistîya. Her wusa, li vir, ez divê ku vê yekê jî bibêjim ku ew rojava tirkiyê û ankû tirkên ku li hemberê komkujiyên ku rejima tirk dihênina ser ziman, bi çi ahlaqî û wijdanî, wê piştre bahse "bi hevre jîyînê" bikin? Di vê demê de bêdeng bûyîn û piştre ev gotin bilêvkirin, wê tenê dirûtî bê.

..

**Bêcidiyeta rayadarên di pêvajoyê de û kirina weke listika zaroka a ´pêvajoya çareserîyê´.**

Her wusa, gotina ´pêvajoya çareserîyê´ û ya ´sazûmana civakî´ bi hevdû re car bi car hatina bikarhanîn. Hatîya gotin ku "heta ku sazûmana civakî newê çêkirin, wê pêvajoya çareserîyê jî ne domê.´ Di vê çerçoveyê de bi awayekî çaprastî bikarhanîna bi hevdû re a gotina ´çareserîyê´ û ya ´sazûmana civakî´, di çerçoveya ku wê çawa kurdan bêdeng bikin û ji xwestekên wan bi şûn ve gavê bi wan bidina avêtin, dikin bikarbênin. Her wusa, pêvajoya çareserîyê jî, ji aliyekî din ve jî bi serdestîya xwe ya hikimetî û bindestbûna kurdan re dikin ku werênina ser ziman. Divê çerçoveyê de weke ´konsepteka ku bi wê dixwezin kurdan bişikênin´ gotina ´pêvajoyê û ankû´pêvajoya çareserîyê´ bikardihênin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di serî de rengê têgîn û "çareserîyê" ê bi gotina çareserîyê re ku di serê raaydarên tirk de ew a ku wê çawa kurdan di nava sînorê tirkiya de bi wan ´bêstatûtîyê´ bi wan bidina herêkirin, di vê çerçoveyê de li ´pêvajoyê´ dihizirin. Ji ber ku di vê çerçoveyê de dihizirin, her wusa êdî dema ku hikimeta AKP´ê dengê wê kêmbûn, Yalçîn Akdogan derdikeve berçapameniyê pêşî dibêje "ku em herên wê pêvajo jî dawî li wê were." Piştre jî, di dema wê de dihêne ser ziman ku "winê êdî êdî filmê pêvajoyê çêbikin." Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di çerçoveya çareserkirina pirsgirêka kurd de

li pêvajoyê na hizirin. Di çerçoveyeka ku ew dixwezin ku wê çawa pirsgirêka kurd bi demê re bide domandin û li ser esasê domandina pirsgirêka kurd, bi înkare li ser serê civate kurd û bêstatû hiştina re li ´pêvajoya çareserîyê´ dihizirin. Ji xwe, ji ber ku di vê çerçoveyê de dihizirin, êdî li ser domandina desthilatdarîya xwe li wê dihizirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku kurd, wê çawa ´bêstatû´ werina hiştin, di çerçoveya wê de pêvajo bi argûmanên wê re dihên hûnandin. Hêrîşên li ser serê civate kurd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs û leşkerên wê re li Farqînê, Cizirê, Silopîyê, Nisêbînê, Hezexê, Geverê û hwd, ku li ser serê civate kurd dibin, di vê çerçoveyê de nîşanak û birhana vê zihniyeta rejimê û rayadarên wê a di çerçoveya gotina pêvajoyê de ya. Bi gotina ´pêvajoyê´ re, çi li gorî xwe rast dibînin, li ser esasê civate kurd dikin bi kurdan bidina herê kirin. Her wusa, ji destpêka pêvajoyê ve, dema ku kurdan xwepêşandin li dardixistin, ji kurdan re digotin ku ´ev kirinên we zirerê didina pêvajoyê´ Yanî, bi gotinaka din, dixwestin ku kurd, li ber kirinên wan bêdeng bimênin. Di vê çerçoveyê de li pêvajoyê dihizirin. Heta roja me jî, divê çerçoveyê de li pêvajoyê dihizirin. Piştî hilbijartinên 1´ê mijdarên mirovên weke Beşir Atalay ku derdikevina berçapameniyê dibêje ku "pêvajoya çareserîyê ji ´bozdolabê´ were derxistin."´ Piştre jî, dibêje ku "dema ku pêvajo di ´bozdolabê´ de bê, ev tê wê wateyê ku dikarê ji wê were derxistin jî." Yanî, weke listika zarokan kengî li hasabê wan were ji bozdolabê derxin û kengî were hasabê wan bikina bozdolabê de. BI wê re jî, êdî weke ku ´pêvajoyê´ û gotina ´pêvajoyê´ re dihizir kirin, ku pirsgirêka kurd bêî ku çareserîyek ji wê re were hanîn, êdî bi demê re bidina domandin.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku rayadarên tirk jî dihênina ser ziman ku "pêvajoya çareserîyê ji ´bozdolabê´ were derxistin.". Dibêt ku di rojên pêş de di vê çerçoveyê de bibêjin ku ´me pêvajo, ji bozdolabê derxist û hinek hevîtin jî bibin. Lê li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê dîsa çareserîyek ji pirsgirêka kurd, heta ji wan were wê nehêlin ku were ditin. Weke ku ji sala 2013´an û heta sale 2015´an, ku hemû rêyên çareserîyê ku aliyê kurd û birêz Ocalan dîtina ku bi awayekî bi porgramatikî ku çawa rayadarên rejimê bi politikayên xwe kirina ku wan vala derxin û derxistina jî, wê di vê dema nû de jî wusa bibe. Zihniyeta ku hêrîşî rêveberîyên xweser ên kurdistanîyan ku li Farqînê, Cizirê, Silopîyê, Nisêbînê, Hezexê, Geverê û hwd, ku hêrîş dike, wê di çerçoveya wê zihniyeta ku bi wê hêrîş dike de, wê dîsa hemû rêyên çareserîyê bi xitimêne û kengî ku dît ku ne li gorî wê ya, wê dîsa bibêje ku ´me pêvajo dîsa hilda bozdolabê.´ Weke ku hanakê xwe bi kurdan û hemû cihanê bikin, dibêjin ku

´me pêvajo hilda bozdolabê´ û ankû ´me pêvajo ji bozdolabê derxist.´ Ev zihniyeta kujar a ku heta roja me kurd qatil kirina. Li vir, divê ku mirov vê pirsê jî bike, rejima ku li Farqînê, Cizirê, Silopîyê, Nisêbînê, Hezexê, Geverê û hwd, ku hêrîşî rêveberîyên xweser ên kurdistanîyan dike, wê di çerçoveya çi zihniyetê de pêvajoyê cardin bide destpêkirin û pêşbixe. Ev gotinên ku weke Beşîr Atalay, dibêje ku "pêvajoya çareserîyê ji ´bozdolabê´ were derxistin", bi awayekî dîsa hewldana dayîna xapandinê û mijulkirinê, xwestina pêşxistina pêvajoyekê van gotinan dibêjin.

Êdî nikarin, weke berê, bi rêyên înkarê pirsgirêka kurd bi rêve bibin. Ev rengê bi gotina ´pêvajoya çareserîyê´, li şûna wê, weke rêyeka ku qaşo li gorî xwe dîtina û hwd a. Çend ku pêvajoya çareserîyê hizra aliyê kurd û aliyê weke birêz Ocalan daya destpêkirin jî, di vê çerçoveyê de dikin bi karbênin. Ya ku rastîya gotina pêvajoyê tûna dike jî, ev a. Pêvajoya çareserîyê, dema ku destpêbike jî, ku ne di bin çavdêrîya hêzên navnetewî û ankû neteweyên yekbûyî de bê, wê dîsa aqûbeta wê weke ya ji sala 2013´an û heta sale 2015an bê. Di serî de divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku´pêvajoya sale ji 2013´an û heta 2015´an ya bi navê ´pêvajoya çareserîyê´, da nîşandin ku ti plan û programên mirovanane ên rejima tirk û rayadarên wê tûnana bo çareser kirina pirsgirêka kurd.Dema ku rewş ev bê, wê çaxê, hildana pêvajoyê weke ku ew dibêjin li ´bozdolabê´ û ankû ´ji bozdolabê derxistin jî ti cidiyeta wê tûna ya.

Gotinên weke "em dikarin pêvajoyê ji bozdolabê derxin jî, bi nîyeta ku ji sala 2013´an û heta 2015´an çawa bêî ku bihêlin ku çareserî pêşbikeve ku pêvajo hanîn heta roja me, dixwezin ku bi wê ji vir û pê de jî bibin. Ya ku bi gotina "em dikarin pêvajoyê jî bozdolabê derxin" ku di mejiyê wan de ya jî ev zihniyeta qirêj û plan û programên şikandina kurdan in. Ji sala 2013 û heta 2015an jî, rejima tirk, Hikimeta AKP û hemû rayadarên wê, ji wê înkare kurd û her wusa hewldana şikandina kurdan, gavek jî bi şûn ve ne avêtina. Dema ku rewş ev bê, wê çaxê, bi gotinên "em dikarin pêvajoyê ji bozdolabê derxin" re, ya ku dihê ditin ku dihizirin, ew a ku vê pêvajoya înkare kurdan û hewldana şikandina kurdan, di bin navê gotina pêvajoyê de hinekî din jî bidina domandin. Li vir, di dewama wê de divê ku em vê yekê jî bibêjin ku di pêvajoya "pêvajoya çareserîyê" a ji nava salê 2013´an û heta salê 2015´an, rejima tirk, hemû pêvajo bo mazinkirina DAÎŞê û ajotina wê ya bi ser kurdan de bikarhanî. Her wusa, divê ku mirov di vê çerçoveyê de vê yekê jî werêne ser ziman ku dema ku bibêjin "em dikarin pêvajoyê ji bozdolabê derxin", wê çaxê, ev dide nîşandin ku rayadarên tirk, dihizirin ku weke ku di vê pêvajoya bûhûrî de DAÎŞ pêşxistin û ajotina bi ser kurdan de,

dixwezin ku pêvajoyna din ên bi vî rengî pêşbixin. Bo vê yekê jî wan re dem divêt. Dixwezin ku wê demê jî, bi dîsa bidest bikarhanîna gotina ´pêvajoyê´ û bi gotina ´em dikarin pêvajoyê ji bozdolabê derxin, bidest bixin.

Rejimeka ku dema ku kurdan di hilbijartinên 7´ê hezirenê de ku kurdan vîna xwe derxistin li holê û ew tûna hasiband û li ser wê re hilbijartinên 1´ mijdarê da kirin, wê bi çi ahlaqê û cidiyetê, bahse ´pêvajoyê´ bike? Di serî de dema ku pêvajoyek nû were destpêkirin, di wê de sê tişt û ankû kirin, divê ku bin wan were xatkirin û li berçav were girtin. **Yek, weke ya pêşî** ew a ku ji destpêka pêvajoya çareserîyê ji sale 2013´an û heta sale 2014an ku rejima tirk pêvajo weke pêvajoya mazinkirin û ajotina bi ser kurdan a DAÎŞê were li berçav girtin. **Tişt û kirina dûyemin** jî, ew a ku bûyîna hilbijartinên 7´ê hezirenê û tûna hasibandina wê ji aliyê rayadarên tirk ve ya. Di serî de divê ku mirov bi vir ve girêdayî werêne ser ziman ku dema ku bi ancamên hilbijartinên 7´ê hezirenê re tûna hasibandina wê û vîna civate kurd û hebûna wê, wê weke aliyekî giring ku wê rastîya nêzîkatîyên rayadarên tirk ên piştre jî ku bide dîyarkirin bê. Her wusa weke **tişt û kirna sêyemin** jî, ew a ku piştî ku kurdistanîyan rêveberîyên xwe yên xweser li bajarên kurdistanê ên weke Farqînê, Cizirê, Silopîyê, Nisêbînê, Hezexê, Geverê û hwd, û ku piştre rayadarên tirk bi polîs û leşkerên wê re bidest hêrîş kirina li wan kir. Ev jî, weke aliyekî giring ku divê ku mirov li berçav bigrê ya. Bi wê re jî, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hêrîşên rayadarên tirk li goristanên pekrawanên kurdistanîyan, her wusa, zihniyeta ku bi wê rejima tirk komkujiya Zilanê, Dersimê û komkujiyên ku wê piştre kirina ya. Gorên mazinên kurdan ên weke sêd Riza, şêx seîd, bedîûzzaman û hwd ku heta roja me nayê zanîn, divê çerçoveyê de bi wê zihniyetê divê ku mirov werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê jî bi gotina ´pêvajoya çareserîyê´ re werêne ser ziman, ku ya ku wê pêşketinê bi wê re bide dîyarkirin ku wê tekoşîn û berxwedana gel bê. Heta roja me, hemû destkevtiyên li kurdistanê bi tekoşîn û berxwedana gel hatina bidestxistin. Di serî de divê ku gel li vîna xwe xwedî derkevê. Divê ku tekoşîna parastina vîna xwe ya civatî a bi nirxên xwe re bide. Ya ku wê serkevtinê bi jîyane wî ya civatî re ji wî re werêne jî wê ev bê. Wekî din, di vê pêvajoyê de jî, hat dîtin ku rejim, li kûderê valahiyê dibînê, weke temenê hêrîşkirina li civatê û nirxên civatê bikardihênê.

..

**Hêrîşên li bajarên kurdistanê û komkujiyên ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe re li ser serê civate kurd kirina**

Bi teybetî divê ku mirov werêne ser ziman ku konseptek şer ku rejima

tirk, berî hilbijartinên 7´ê hezirenê dabûbû destpêkirin, bi kurdan re da destpêkirin. Ancamên hilbijartinên 7´ê hezirene 2015´an, ne li gorî wê bûn. Li ser wan ancamanan re ne dikarin konsepta şer bidina domandin. Bo vê yekê, ancamaka ku bi wê karibin konsepta şer bidina domandin û her wusa înkara kurdan bidina domandin, xwestin ku bidest bixin. Di serî de di hilbijartinên 1´ê mijdarê de hemû rê û rêbaz bikarhanîn, bo ku ancamaka bi vî rengî bidest bixin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ancamên 7ê hezîrenê, bi hemû kêmesîyên xwe re hinekî rengê vîna kurdan bi wê re hat û derket li holê. Piştre jî, ew ancam înkar kirin û bo ku ji holê ra bikin, pêvajoya tûna hasibandina ancamên hilbijartinên 7´ê hezîrenê red kirin û çûna hilbijartinaka din. JI ber çi ev bû? Ji ber ku rayadarên tirk, di serê wan de heya û dixwezin ku ew bi "pêvajoya çareserîyê" ku ew bahsê dikin, di çerçoveya "bêstatû hiştina kurdan" de biancam bikin. Her wusa hêrîşên li rêveberîyên xweser ên kurdistanîyan ên li Cizirê, Farqînê, Nisêbînê, Hezexê, geverê, Silopîya û hwd, divê çerçoveyê de bi têgîna rayadarên tirk a bi gotna pêvajoya çareserîyê ya di serê wan de re mirov divê ku li wê bihizirê. Di dema ku hêrîşan dikin û bombabaranê li kurdistanê û civate kurd dikin de, hanîna rojevê, "em dikarin pêvajoyê ji bozdolabê derxin´ hinekî jî, di vê çerçoveyê de xwediyê wate û mantiqekê ya.

Li vir, di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku herdû salên pêşî ên bi gotina ´pêvajoyê´ re ku bûhûrtin, di wan çi ancam û rêyên çareserîyê ku aliyê kurd derxistin li holê, rayadarên tirk, bi sîyesetê û hêrîşên kurd kirin û her wusa ne hiştina hatina li cih û hwd re, xwestibûn ku ancamaka bi vî rengî bidest bixin. Ji ber ku di serê wan de tenê û tenê tiştekî bi vî rengî heya. Ti carî, ti kesek nikarê bibêje ku di çerçoveya paraastina civate kurd û nirxên wê de çareserîyek di serê rayadarên tirk de heya. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs û leşkerên wê ku li bajarên kurdan ên weke Cizirê, Farqînê, Nisêbînê, Hezexê, geverê, Silopîya û hwd, ku dibin, di derbarê nîyet û zihniyet û her wusa "çareserîya" di serê wan de bo pirsgirêka kurd ku heya jî hizirna pirr baş didêt me.

Her wusa, li bajarên kurdan hêrîş dikin. Dîmênên ku ji farqînê tên, didina dîyarkirin ku li hemberî sîvilan tank û top hatina biharhanîn. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku li farqînê dîmênên ku me piştî hêrîşên DAÎŞê ku li kobanê afirî bûn me ditin. Rewşa Nûha ya li farqînê ji ya kobanê ne cudatira. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku beşîr Atalay dibêje ku em dikarin pêvajoyê ji bozdolabê derxin. Bi zihniyeta ku li bajarên kurdistanê ên weke Cizirê, Farqînê, Nisêbînê, Hezexê, geverê, Silopîya û hwd, k u hêrîşî kurdan dikin ku derxin wê çibê û dernexin wê

çibê? Ji xwe bêcîdîyeta wan, bi gotina " pêvajo hatîya cemidandin" û ankû "pêvajo di bozdolabê de ya", bi awayekî vekirî xwe radixe li berçav. Pêvajoya ku bûhûrî, da nîşandin ku bi bawerkirina bi rayadarên tirk, ti carî, pêvajoyek nayê destpêkirin. Di dema komkujiyên dersimê de jî, agahiyê ji Sêd Riza re dişênin û dibêjinê de ku "em dixwezin bi hevdîtinê pirsgirêkê çareser bikin." Li ser wê Sêd Riza jî bi wan bawer dike û çi Erzinganê. Li wir, Sêd Riza tê dilgirtin û piştre tê bi dervekirin. Her wusa bi wê re jî li dersimê seferên leşkerî ên ku bi bi komkujiya bi deh hezaran kurdan re pêktê li derdixin. Namerdîya ku di wê demê de rayadarên tirkan li Sêd Riza kir, di vê demê de jî di pêvajoya çareserîyê de li Birêz Ocalan kirin.

Hêrîşên li bajarên kurdistanê û komkujiyên ku li bajarên kurdistanê, ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe re li ser serê civate kurd kirina**,** bi wan Kurdistan kavil kirina. Her roj, bi dehan ciwanên kurd ku hatina qatilkirin, nûçeyên wan tê. Bi dehan mirov hatina birîndar kirin. Polîs û leşkerên tirk, bi fermana rayadarên tirk, li ser hêtan dinivîsênin "ku tu tirk şanaz ba, ku tu ne tirk bê îtaetê bike." Çend ku ev gotin, weke gotinên "şerê deronî" jî dihên ser ziman jî, lê zihniyetek qirêj di temenê van gotinan de heya. Bi wê zihniyetê heta roja me rejima tirk kurd qatil kirina. Înkare kurdan kirîya. Piştî komkujiyên Ermenîyan, vê piştre heta roja me, bênavber komkujîyên kurdan rejimê domandina. Piştî ku jenosîdkirina ermenîyan bira sêrî, nûha jî, xwest ku pêvajoya jenosîda kurdan ku daya destpêkirin bibe sêrî. Înkara kurd, qadaxaya li ser zimanê kurdî û her wusa komkujiyên rejima ku bi konseptên şer bi armanca tafisandina kurdan ku dimeşêne, di vê çerçoveyê de xwediyê armanc û gîyanekê na. Bi gotina "pêvajoya çareserîyê" re, zihniyeteka bi vî rengî ya ku mirov dikarê di çerçoveya "bêstatû hiştina kurdan" de formule bike, di serê rayadarên tirk de heya. Bi gotinaka din, jenosîdkirina civate kurd, bi rêbazên sinsî, di serê rayadarên tirk de heya.

..

**Piştî Farqînê hêrîşên li Nisêbînê denezendina ´qadaxaya derketina li sûkê´ û Xistina balafira şer a Rûsya ..**

Di hêrîşên leşker û polîsên tirk ên li Farqînê de ser du hefteyan re doma. Di dema ku hêrîş dikirin jî, derketina li sûkan hatibû qadaxa kirin. Piştî 12 û ankû 13 rojan, qadaxaya li sûkê li farqînê hat rakirin. Piştre jî, dîmênên ku ji sûkên Farqînê hatina ditin, ew bûn ku ji yên li kobanê ku çeteyên DAÎŞ´ê bi hêrîşên xwe pêşxistibûn, ji wan ne cuda bû. Her wusa, nûha jî, heman politika li Nisêbînê dihê meşandin. Rejima tirk, weke konseptekê vê yekê dikê. Pêşî li deverekê derketina li sûkê pêş dixin. Di wê dema ku qadaxaya li sûkê pêşxistina, komkuji û xûrixandinê ku plankirina dikin û piştre, qadaxaya derketina li sûkê dirakin. Heman politika, di dema hêrîşên li

Farqînê de kirin. Piştre jî li nisêbînê kirin.

Di aslê xwe de, bi vî rengî, politikaya derketina li sûkê, weke politika û konsepteka şikandina vînê, bikardihênin. Lê bi wê re jî, herî zêde, vê rewşa derketina li sûkê, bi awayekî vekiriî bi şêwayekî din jî bikardihênin. Her wusa, weke ku di dema qadaxaya derketina li sûkê a li farqînê ku pêşxistin û dirêjkirin li 12 û ankû 13 rojan û piştre rakirin, bi wê re mirovên ku bertekên xwe de dana nîşandin, weke ku bersiv ji bertekên xwe re hildabin, piştre bêdeng man. Her wusa, ev rewş, weke ku biawayekî din jî dihê bikardihanîn. Dikin ku hemû bertekan li xalekê bicivînin. Bi wê re jî, hêrîşên xwe bidina domandin. Di rewşa pêvajoya hêrîşê a li Farqînê de ev kirin. Pêşî kirin ku hemû bertek, di pêvajoya hêrîşan a li Farqînê de were dayîn nîşandin. Piştî ku herkesekî farqîn kir navend û bertekên xwe dan nîşandin, piştre qadaxaya derketina li sûkê rakirin. Piştre jî, di cih de rayadarên rejima tirk bi leşker û polisên xwe berê xwe dana bi ser nisêbînê de. Di vê pêvajoya hêrîşên li hêrîşên li Nisêbînê de, bertekên ku hatina dayîn nîşandin kêm in. Hinekî jî, ev ancama vê politikaya rejimê a bi armanca domandina hêrîşên xwe ya li ser serê kurdan a.

LI farqînê dawî li qadaxaya derketina li sûkê hanîn û piştre li Nisêbînê ew qadaxa dana domandin. Nûha jî, piştî Nisêbînê re dixwezin ku cardin di serî de li Cizira bota û hwd, wê bidina domandin. Ev politikaya domandina tûndûtûjîyê li ser serê civate kurd a. Politikayên tafisandinê na. Divê ku miirov werêne ser bîra xwe ku pêşî ew qadaxa li Cizira bota, piştre li Farqînê hat pêşxistin. Piştî farqînê, li Nisêbînê hat pêşxistin. Î ro jî, piştî nisêbînê, dixwezin ku cardin li Cizira bota û hwd pêşbixin.

Di vê ppêvajoyê de hat ditin û fahmkirin ku qadaxaya li sûkê, weke rêbazaekî bi vî rengî kêmkirin û ´minîmalîze´kirina bertekên civatî a li hemberê hêrîşan a. Di vê çerçoveyê de di şêwayekê de weke politikayakê qadaxaya derketina li sûkê bikardihênin. Bi vî rengî, pêşî, weke ku li farqînê ku kirin, dikin ku ppêşî hemû bertek werina ser nuqte û ankû xalekê. Piştî wê re, wê qadaxaya derketina li sûkê li wir rabikin û devereka din dênin. Weke ku piştî ku li farqînê rakirin û piştre li Nisêbînê danîn û ku ev ser 12 rojan re ya ku didomê.

Ev weke politikayaka jenosîdî a ku bi wê hem dixwezin ku pêşî hêrîşên xwe li civate kurd bidina domandin û bi wê re jî bi vî rengî bi rakirin û cardin danîna qadaxaya li derketina li sûkê re ku karibin pêşîya bertekên girseyî bigrin. Yanî, aliyekî li deverekê rakirin û li devereka din danîna qadaxaya derketina li sûkê, di çerçoveya bi derûnîya mirovan a girseyî re leyistin jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman.

**. Piştî danîna qadaxaya derketina li sûkê dest bi hêrîşan dikin.** Piştî 7ê hezîrene 2015´an û pê de, rejima tirk, rêbazekî din ê hêrîşkirinê pêşxist. Pêşî qadaxaya derketina li sûkê didêne û piştre bidest hêrîşên xwe dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi vê danîna qadaxaya derketina li sûkê re du armancên rejima tirk hebûn. Yek, ew bû ku pêşîya girsebûna gel di berxwedana kurdistaniyan de bigrê. Ya duyemin jî, ew bû ku çendî komkuji û hêrîşê bike, ji aliyê raygiştî û çapameniyê ve newê dîtin. Ji xwe, heta roja tenê ji 7ê hezîrene 2015´an ve heta roja 11´ê berfanbera 2015´an ser dusad kurdîstanîyî re hat qatilkirin ji aliyê polîs û leşkerên dewletê ve. Ji aliyekî din ve bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Nisêbîn, Farqînê, Geverê û hwd, dîmênin kavilkirin û xûrîxandinê ku me li Kobanê di dema hêrîşên çeteyên DAÎŞê de dîtin, li van bajarên di dema hêrîşên polîs û leşkerên tirk afirîn. Bo ku ev jî, di çapameniyê de newina dîtin, qadaxaya li sûkê didênin û piştre hêrîş dikin.

Lê aliyekî din, ê pêşî danîna qadaxaya derketina li sûkê û piştre hêrîşkirin û bi wê hêrîşkirinê û xûrixandinê jî heya. Ew jî, ew bû ku bo ku tirsandinekê bi kurdan re çê bikin ku weke ku li van baarên kurdistanê ku kurdan rêveberîyên xweser denezendin ku li deverên newina denezendin. Di çerçoveyê de bi armanca çavtirsandinê jî ew hêrîşên ên hov ên ku bi kavilkirin û xûrixandinê re ancam dikin dihên kirin.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku qadaxayên derketina li sûkê, bi awayekî din mirov dikarê weke ´rewşa awarta a rejima jidandî´ dihê afirandin. Herêmên kurdistanê ji salên 1984´an û pê de, bi ´rewşên awarta´ hatina rêvebirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de çend ku piştre di gotinê de ´rewşa awarta´ "hat rakirin" jî, lê di kirin û jîyanê de rewş ne wusa bû. Tenê navê wê hat guharandin. LI şûna navê ´rewşa awarta´ gotina ´rêveberîya teybet a bajaran´ hatibû pêşxistin. Weke ku çawa ku li gotina "gotina "DGM´ gotina "dadgeha cezayê giran" û hwd, were bicihkirin.

Li bajarên kurdistanê, di vê çerçoveyê de rewş hat domandin. Di wan deman de jî, qadaxayên derketina li sûkê, weke ya vê demê ne domîya. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku ji 7´ê hezîrene 2015´an û heta dawiya salê, li her bajarên kurdistanê, politikayak din hat pêşxistin. Pêşî, qadaxaya derketina li sûkê didênin û piştre bi dest hêrîşan dikin. Ev qadaxaya derketina li sûkê, weke ku li Cizira bota Nisêbîn, Farqînê û hwd ku dihê danîn her care dihênin, nêzî du hefteyan didomê. Di hundûrê wê pêvajoya ku qadaxaya derketina li sûkê hatîya danîn de jî, wê hêzên rejima tirk bi polîs, leşker, tank û topên giran hêrîşên bajarên kurdan bikin û kavil bikin û bixûûrîxênin. Di vê çerçoveyê de xûrîxandin, li piraniya bajarên

kurdan hatîya pêşxistin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku rewşa qadaxaya derketina li sûkê û piştre hêrîşkirina li sênîyên bajêr, bi polîs, leşker, tank û topan, wê weke politikayaka konsepta şer a rejima tirk ku di 24´ê temûze 2015´an de li hemberî civate kurd kiribû meriyetê de bê. Bi wê re jî, wê li ser hêtên mal û kargehên kurdistanîyan bi gotinên qirêt nivîsandinên ku ´haqaretê´ li wan dike û wan piçûk dixê wê bên nivîsandin. Minaq, nivîsandina "ku tu tirk bê, şanaz ba, lê ku tu ne tirk bê îteatê bike", gotinên weke vê dihên nivîsandin. BI vî rengî, wê bi sedan û bi hezaran gotinan li ser hêtan di dema hêrîşkirina li kurdan de binivîsênin. Ev jî, weke rêbezakê hêrîşkirinê bi rêbazên şerê deronî li mejiyê mirovan dihat pêşxistin.

Lê çendî ku polîs û leşkerên rejima tirk, hêrîşî kurdan dikir û komkuji dihanîn serê wan û bajar tarûmar dikirin, tenê nûçeyek di derbarê wê de di çapameniya tirk de ne dihat nivîsandin. Her wusa, weke ku ji xwe ew şer û hêrîş û komkuji nayêna kirin, tevdigerîyan û rojevna din dihanîn li rojevê. Li vir, divê ku mirov rewşa, piştî danîna qadaxaya derketina li sûkê dest bi hêrîşan dikin, bi wê ´sensûra´ bi vî rengî dihat danîn li ser çapameniyê re hildina li dest û werênina li ser ziman. Di rewşa hêrîşkirina li civate kurd de wê rewşa piştî danîna qadaxaya derketina li sûkê dest bi hêrîşan dikin û sensûrkirina bi çapameniyê re ku bi ne hanîna wan hêrîş û komkujiyan ku dihênina li serê civate kurd li rojevê re wê hevdû temem bikin.

Mirov dikarê wê sensûrkirina li ser çapameniyê weke temenê wê qadaxaya derketina sûkê jî werêne ser ziman. Ji xwe, ti tişt ne dihat nivîsandin û ser ziman. Çapameniyê jî, weke ku ji rayadarên tirk re bibêje, nehêle ku ez bibînim, çavên xwe li wê qadaxaya derketina li sûkê a li ser serê kurdan digirt. Minaq, tenê ji 7´ê hezîrene 2015´an û heta dawîya vê salê, wê bi sadana caran ku bi rojan û heftayan didomê, wê qadaxayên derketina li sûkê werênina danîn. Lê win tenê, di derbarê yekê de jî, di çapameniya giştî a tirk de nabînin ku ew hatîya nivîsandin. Ji xwe, weke ku tiştekî wusa tûna ya, tevdigerihin. Minaq, dema ku li Cizîra bota, piştî 7´ê hezirenê 2015´an care pêşî hat danîn, hingî ser 14 rojavan qadaxaya derketina li sûkê domîya bû. Bi heman rengî li farqînê jî, dema ku qadaxaya derketina li sûkê domîya bû. Lê piştre, ew qadaxa hatina rakirin û cardin, hatina danîn.

Dema ku di nava rayagiştî a kurdistanê de bertek li hemberê wan qadaxaya derketina li sûkê û bi wê re hêrîşên ku li wan bajaran dibûn ku derketinali holê, wê qadaxaya derketina li sûkê rakiriban. Piştre di cih de li deverek din danîban. Minaq, piştî ku li Cizira bota rakirin, di cih de li Farqînê ew qadaxaya derketina li sûkê danîn. LI wir jî nêzî 13 rojan wê

qadaxaya derketina li sûkê domîya. Piştre, ji wir jî li ser bertekên kurdistanîyan û rayagiştî a kurdistanîyan rakirin, lê di cih de piştre li Nisêbînê ew qadaxaya derketina li sûkê danîn û ser du heftayan re domîya. Di dema ku ew qadaxaya derketina li sûkê li bajarên kurdistanê didoma jî, polîs, leşker û hêzên teybet ên rejima tirk bi tank û topan hêrîşî sênîyên wî bajarî dikir û bajar bixwe jî dikir kavil û dixûrixand.

. **Li vir**, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku politikaya bi armanca domandina hêrîşan li civate kurd, di vê çerçoveyê de dihê dayîn nîşandin. Yanî, ev jî, rêbazaka şerê teybet a qirêj û bêahlaq a. Her wusa, ji vê rewşa rakirin û danîna cardin a qadaxaya li sûkê, mirov fahm dike ku rejim, dixwezê ku hêrîşên xwe yên bi armanca jenosîda civatî a li ser serê civate kurd bide domandin. Her wusa, divê ku mirov vê politikaya rejima tirk a rakirin û cardin danîna qadaxaya li sûkê, weke rêbezê şeê DAÎŞ´ê ê bi hêrîşkirinê ku wê hem dixwest ku bitirsêne û bide ravandin û hem jî bi wê ku dixwest ku xûrixandinê hem di bajêr de û hem jî di derûnîya mirovan de ku bide çêkirin a.

Li vir, divê ku mirov vê rastiyê jî werêne ser ziman ku DAÎŞ û hebûna wê ya ku dabûbûn hêrîşkirin li ser civate kurd, weke politikaya rejima tirk a di hundûrê pêvajoya çareserîyê de jî werêne ser ziman. Her wusa, gelên herêmê dema ku bi pêvajoya çareserîyê re ku hizir dikirin ku bigihijina aşîtiyekê û bi wê re ku hin bi hin digihiştin rehetiyekê û xwe di nava wê rehetiyê de diberdan de, rayadarên tirk DAÎŞ pêş dixistin û mazin dikirin ku wê biajona bi ser kurdan de. Hizirkiribûn ku ew reheweta ku di wê pêvajoya çareserîyê re ku li kurdistanê afirîya, wê li ser wê re bi DAÎŞê û hêrîşê bi wê re di hevrastiyê de ku li civate kurd bikin, wê bi ancamê bidest bixin.

Ji ber vê yekê ya ku dema ku hêrîşên Rûsya, Amerika û welatên bi hewayê û hwd bin, ku li DAÎŞ´ê dibin, ev hêrîş pirr zêde Tirkiya aciz dike. Ji ber ku DAÎŞ, ji kontrayên wan ên ku hertimî mirov dikuştin pêktê. Provakasyonên artişa tirk li ser sînorê rojava, alikarîya wê ya ji çeteyêmn DAÎŞ´ê re û heta ku xistina belafira şer a Rûsya jî di nav de, hemû jî hin bertekna rayadarên tirk ku mirov dikarê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman in. DAÎŞ, weke rêxistinek, pêvajoyek hêrîşê a li herêmê û ku bi wê dihê xwestin ku herêm were dîzaynkirin a. Di vê çerçoveyê de karê ku rejimên herêmê ên weke Tirkiya ku dabûn ser milê DAÎŞ´ê ew a ku wê bigiştî û serekayî asta pêşketina li kurdistanê û mesopotamiya ku heta roja me bi tekoşîna xalkan a azadîyê afirîya û pêşketîya ku ji wê ji holê ra bike. Bo vê yekê, DAÎŞ, bi teybetî, weke armanc, hêrîşên xwe di nava sînorên herêmên kurdistanê de dike. Herîşên ku weke ku li weke ku Tunisê û ku li turistên rojavayî bûn, Herîşên ku li Firansa û hwd bûn, di vê çerçoveyê de

weke hêrîşna balkişandinê li ser hin xalna din jî mirov dikarê şîrove bike. Her wusa, dema ku miirov nûçeyên ku di rojnemayan de ku derkevin ku mirov wan dahûr dike, mirov digihijê ancamak bi vî rengî.

Her wusa, xistina balafira şer a Rûsya jî, di vê çerçoveyê de weke politikayaka rejimên ku piştgiriyê didina DAÎŞ´ê divê ku mirov werêne ser ziman. Ku tirkiya jî di nav de, hin hêzên ku li piştî DAÎŞ´ê na, wusa hizir kirina ku ´pêşbazîyek´ li herêmê di nava Amerika û Rûsya de heya. Her wusa, xistina balafira şer a Rûsya ku bikina çerçoveyeka bi vî rengî de û bi wê re li ser "parastina sînoran" re ku argûmanên xwe yên parastinê çêbikin, di vê çerçoveyê de weke ku hizirî na. Bêgûman, wê li ser wê têkilîya di nava amerika û Rûsya û politikayên wan ên ji hevdû cuda de, wê gelek şîrove werina pêşxistin. Lê ev şîrove jî, wê ji aliyekî ve bina weke sernûxûmandinekê ji vê politikaya hêzên herêmê ên weke tirkiya a bi piştgirîya ji DAÎŞê re. Ji vê xistina balafira şer a Rûsya, mirov fahm dike ku hêzên li pişt kontrayên-DAÎŞ´ê, dihizirin ku hê jî DAÎŞ´ê weke politkayaka şer ya ku bi wê mudahaleyê li herêmê dikin bikarbênin.

Bêgûman, hêrîşên Rûsya ên dawî ku li çeperên DAÎŞê hatina kirin, derbeyna mazin li DAÎŞ´ê xist. Li herêmê DAÎŞ, hem kir rewşek pirr zor de. Lê wusa xûya dike ku hêzên ku dixwezin ku DAÎŞ hê jî bimênê û bi wê hêrîşên li xalkên herêmê bikin. Xistina balafira şer a Rûsya, di vê çerçoveyê de hewldanaka xilaskirina ji tûnebê a DAÎŞ´ê ya.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku mirov nikarê DAÎŞ´ê tenê weke rêxistineka kujar ku olê weke maske ji xwe re bikardihêne û îstismar dike. Divê ku mirov weke pêvajoyeka şer a mudahaleya li herêmê werêne ser ziman. Xistina balafira şer a Rûsya, di vê çerçoveyê de weke piştgiriyekê ji vê konsepta şer a bi DAÎŞ´ê re jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Piştî xistina balafira şer a Rûsya Dawutoglu derdikeve berçapameniyê û dibêje ku "ku li tirkmenen, arab û kurdan, kî agirî wan bike (hêrîşî wan bike) ku rejima sûrî bê, komên terorist bê û hêzek derve bê ku mudahaleyê dike bê, peyame me ji wê re vekirî ya." Di serî de di nava gotinên Dawutoglu de bikarhanîna navê kurdan ku weke ku wan diparêzê´, tenê bi armanca propaganda, manipûle kirinê ya û derew a. Bila pêşî rejima tirk û rayadarên wê, ku her roj ku bi 30 û ankû 40 balafirên şer ku hêrîşî kurdan û çîyayê kurdan dike, û her roj li Cizira bota û nisêbînê û Gever û farqînê ku kurdan dikujê, bila pêşî dawiyê li wê werêne. Rejima tirk, ti carî ne dostê kurdan a ku kurdan biparêzê.

Ku rejima tirk, mafê ketina rojava î ro hilde, wê di cih de bikeve rojava û bi kurdan re şer bike. Bi gotinaka din, ku navê kurdan jî di nav de bikardihêne û dibêje ku "ku li tirkmenen, arab û kurdan, kî agirî wan

bike(hêrîşî wan bike) ku rejima sûrî bê, komên terorist bê û hêzek derve bê ku mudahaleyê dike bê, peyame me ji wê re vekirî ya" jî, tenê propanganda, derew û manipûlasyona. Ji xwe, rejima tirk, li bakûrê kurdistanê her roj kurdan qatil dike. Rewşa li bajarên kurdan ên weke farqîn, gever, Nisêbîn û Cizira bota li holê ya. Di seatên ku Dawutoglu van gotinan dibêje de jî li NIsêbînê polîs û leşkerên tirk di hêrîşên xwe yên li kurdan de kurdekî din ê bi navê Sedat Gungor qatil kiribûn. Ya ku li hemberê vê gotinê ku mirov ji rejima tirk rayadarên tirk re bibêje ew a ku win dawî li qatilkirina kurdan a ku win bixwe dikin bênin, kurd ne hewceyê parastina we na.

Balafirên şer ên Rûsya, komên çete ên DAÎŞ´ê ku kifş dike, li hêrîşî wan dike. Herêmên ku rejima tirk, bi navê tirkmenan dihêne ser ziman, li wir zêde tirkmen jî tûna na. Lê ji vir ve, gelek komên çete ji tirkiya tên bûhûrandin li Sûrîya ku hêrîşî kobanê jî bikin hene. Piştî paqijkirina çeteyên DAÎŞ´ê ji kobanê û herêmên din ên rojava, ku heta roja me, çeteyên ku karibin kom bi kom li herêmên kobanê ên weke `şîrînê´ û hwd ku karibin hêrîşê pêk bênin, divê ku mirov bi derbaskirina komên çete ji tirkiya li van herêman fahm bike.

Her wusa, li vir, divê ku mirov di çerçoveya kirinên rejima tirk de werêne ser ziman ku hêrîşên weke li Farqîn û ku î ro pirr zêde li Nisêbînê zêdebûna, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Li Sûrîya, hêrîşên rayadarên tirk, ên di bin maskeya DAÎŞê de ku dibin, her wusa, xistina balafira şer a Rûsya xistinê jî di vê çerçoveyê de, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Li vir, di dewama wê de werênima ser ziman ku rejima tirk, dixwezê ku hertimî berxwedan li çend bajarokokên weke gever, Cizir, Nisêbîn, Farqîn, Silopî û hwd re bi sînor bimênê. Ev kêmesîya herî mazin ya berxwedana li bakûrê kurdistanê ya. Ku dema ku weke Cizira bota û Nisêbîn, Farqîn û gever, pirranîya bajarên din ên bakûrê kurdistanê rabûbabn serpîyan û weke van bajaran berxwedan pêşxistiban, wê pêşîya wan xûrîxînên li van bajarên kurdistanê ên weke Cizira bota û Nisêbînê, Farqîn û geverê jî bigirtan. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di serî de diviyabû ku heta vê rojê, berxwedana li hemû bajarên kurdan belav bûba.

Li vir, di serî de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku çawa ku li Cizira bota û NIsêbînê û Farqîn û geverê heya, divê ku rêveberîya xweser were denezendin. Ji xwe hêrîşên rayadarên rejima tirk ên xadarî ên hov, bi armanca çêkirina tirsandinê ya ku li ti deverên din rêveberîya xweser newê denezendin a. Bi carekê re li bajarên kurdistanê, ên weke merdîn, Wan, Amed, Sêrt, Bedlis, Agirî û hwd, li hemû bajarên mazin û yên din ên piçûk li

hemûyan divê ku rêveberîyên xweser werina denezendin. Hemû kurdistanî û rêxistinên kurd, divê ku hinekî jî ji ber ku li bajarên din ew rewş pêşnexistina, divê ku xwe ji xûrîxandina li van bajarên weke Cizira bota û Nisêbînê û Farqîn û Geverê jî berpirsîyar bibînin.

**Rejima** tirk, ji vê astê û pê de, wê ti carî nikaribê hebûna xwe bi tûndûtûjî û terore li ser civate kurd, wê nikaribê hebûna xwe li kurdistanê bide domandin. Di serî de divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman. Di nava van hemû mudahaleyên ku li herêmê dibin de, di serî de divê ku kurd weke prensiba sereka yekîtîya xwe ya navxweyî biparêzên. Hemû mudahaleyên ku li herêmê dibin, di serî de rejima tirk, dixwezê ku kurdan jî di nava wê mudahaleyê de bitafisêne. Herîşên li bakûrê kurdistanê, her wusa herêş û mudahaleyên li rojavayê kurdistanê ên rejima tirk ku li ser DAÎŞ´ê re divê ku mirov divê çerçoveyê de werêne ser ziman.

…

**Piştî Kobane, berxwedana kurdan a li Cizira bota û Farqînê**

Di destpêka êlûna 2015´an û pê de, rejima tirk û hikimeta AKP´ê li Cizîra bota komkujiyên mazin kirin. Bi dehan kurdên sivîl bi destê polîs û leşkerên rejima tirk hatibûbûna qatilkirin. Î ro jî, weke 11 mijdara 2015an nûçeyên ku ji herêmê tên, ew in ku heman pêvajoya komkujiyê li bakûrê kurdistanê li Farqînê û Silwanê dihê kirin. Êdî bi awayekî vekirî rejima tirk di nava bajêr de hêzên xwe dide hêrîşkirin li ser kurdan. Her wusa, bi wê re hêrîşên rejima tirk û leşkerên wê li rojavayê kurdistanê jî didom in. Di pêvajoya hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kobanê de hêvî dikirin ku wê derbeyekê li kurdan bixin. Di bin nîqaşên "tekşîna li dijî DAÎŞ´ê de" rejima tirk hêrîşî kurdan dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de jî dixwezê ku mudahaleyên xwe li rojava bidomê ne. BI wê re jî dixwezê ku hêrîşên xwe yên li bakûrê kurdistanê jî bide domandin.

Êdî asta hêrîşên ku hêzên rejima tirk li bakûrê kurdistanê li kurdan dike, ketîya rengê "şerê nava bajêr" de. Her wusa, bi awayekî vekirî hêrîşî kurdistanîyan dikin. Li Cizîra bota, gever, Silwan, Farqîn, Sûr, silopî, Nisêbîn û li geleke deverên din, hêrîşên hêzên dewletê li kurdistanîyan dibin. Cihan hemû jî li hemberî wê bêdeng a. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku weke li Cizira bota û Farqînê dihê ditin û dibê, bi awayekî bi plan û program hêrîş li Kurdistan dihên kirin. Bi tank û halikopterên şer, bombabaran di nava bajaran de dibê. Di dema ku min ev rê dinivîsandin, weke "nûçeyên lezgîn" ji Farqînê dihat ku ji ardê ve bi tankan bombabaran li nava bajêr dikin û ji hewayê ve jî halikopter bombabaran li farqînîyan dikin, weke ku çawa ku di rojên destpêka meha êlûnê de ku li cizira botanê dikirin.

Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku êdî pêvajoya şerê rejima tirk

ê bi civate kurd re awayekî vekirî standîya. Di nava bajêr de bombabaranê dikin. Bi konseptek şer a giştî bi kurdên bakûrê kurdistanê re şer dikin. Nûha jî, dikin û dixwezin ku vî şerê derxina dervî sînor jî. Her wusa hêrîşên xwe ên li rojavayê kurdistanê zêdetir bikin. Bi wê re jî, ku karibin li başûrê kurdistanê jî, hêrîşna li kurdistanîyan bikin. Gera Ferîdûn Sînîrlioglu a li Başûrê kurdistanê bi armancaka bi vî rengî jî dihê kirin. Di hefteya dawî a temûza 2015´an de gereka Ferîdûn Sînîrligolu li başûrê kurdistanê bûbû. Di wê gerê de di seatên ku Sînîrlioglu bi rayadarên başûr ên PDK´yî hevdîtin dikir de, weke ku bi awayekî bi plankirî komkujiya li gundê Zergelê hatibû kirin di ancama bombabardima balafirên şer ên tirk de. Piştre jî, li ser wê re nîqaşên ku dabûbûna destpêkirin, ew nîqaşên ku bi wan digotin ku"divê ku PKK ji qandilê derkeve", dabûbûn destpêkirin. Di van rojên ku hêrîşên leşker û polisîên tirk, cardin piştî hilbijartinên 1´ê mijdarê Ferîdûn Sînîrlioglu diçê başûrê kurdistanê û di seatên ku bi rayadarên başûrê ên PDK´yî re hevdîtinê dike de, nîqaşên ku di çapameniya kurd a başûrê kurdistanê a PDKê de dihê destpêkirin ew a ku "divê ku YPG ji şengalê derkeve" ya. Dema ku Sînîrlioglu bi rayadarên PDKê van gotinên dide gotin ku "divê ku "YPG ji şengalê derkeve" ku dide gotin de, Dawutoglu jî di dîplomasîyê de ya ku "şerê li dijî DAÎŞ´ê vergerênê şerê li hemberî kurdan. Di vê çerçoveyê de bi rayadarên Amerikî re jî hevdîtinê dikin. Her wusa Dawutoglu daxwezên xwe yên weke hêrîşî rojavayê kurdistanê kirinê dihê ser ziman.

Di civîna "20-G´an" ku tê gotin ku wê li tirkiya çê bibe, Dawûtoglu û T. Ardogan bi daxwezên bi vî rengî, dixwezin dîplomasîyê bikin. Wê çawa pêvajoyaka şer li hemberî civate kurd di nava sînor û dervî sînor de bi rêxistin bikin, hemû giranîya dîplomasîya xwe didina ser wê. Gotinên xwe jî, di wê çerçoveyê de didina gotin. Her wusa, di vê çerçoveyê de konsepta şer a ku hikimeta AKP û T. Ardogan li hemberî kurdan daya destpêkirin, giştîya kurdan digrê nava xwe. Wê çawa pêşîya kurdan bi komkujiyan, xûrîxandin û hêrîşan bidina sekinandin, li ser wê re gotinên xwe dikin û hêrîşên xwe pêş dixin.

Di aslê xwe de, çendî ku destpêka vê konsepta şer a hikimeta AKP´ û T. Ardogan ji 24´ê temmzê dihê dayîn destpêkirin jî, divê ku mirov hinekî din bi wirde bibe. Rasta ku di vê dîrokê de pêleka giştî ya hêrîşê lli bakûrê kurdistanê dana destpêkirin. Lê di aslê xwe de divê ku mirov destpêka vê konsepta şer û hêrîşên wê ji têkçûna DAÎŞ´ê a li kobanê re bide destpêkirin. Piştî ku DAÎŞ, têkçû, êdî bi awayekî vekirî bidest hêrîşê dikirin JI ber ku hêvî dikirin ku wê DAÎŞ´ê derbeyek mazin li kurdan bixista û êdî wê hemû tişt li gorî ya dilê wan bûba. Lê wusa nebû. Di roja salwegera

rojava rojava û a bi destxistina Kobanê de dest bi hêrîşên li kobanê kirin. Di roja salwegera konferanse Lozanê de bidest hêrîşên konsepta şer a li bakûrê kurdistanê kirin. Her wusa, roja 1´ê mijdarê ku weke roja cihanê a kobanê ya, xwestin ku hilbijartinê bikin û di wê rojê de derbeyekê li kurdan bixin. Di vê çerçoveyê de hemû hêrîşên xwe bi plan kirin li kurdan û civate kurd. Nûha jî, di van rojên ku li bakûrê kurdistanê hêrîşên rejima tirk li civate kurd Zêde bûna, li rojavayê kurdistanê û li rojavayê kurdistanê, hin kurdên ku kirina bin kontrola xwe de, li hemberî kurdan, didina axiftin.

Li bakûrê kurdistanê kurd dixwezin ku rêveberîya xwe ya xweser ava bikin. Wê çawa pêşîya wê bigrin, di vê çerçoveyê de hêrîşan dikin. Wê çawa kriminalize bikin, di wê çerçoveyê de hêrîşî kurdan dikin. Her rê û rêbazê bikardihênin ku hêrîşî kurdan bikin.

Li hemû bajarên bakûrê kurdistanê, hêrîşên leşker û polîs û kontrayên wê li kurdan hene. Her wusa di vê çerçoveyê de bombabarandinên hewayî jî li çîyayên kurdan dikin. Çend ku hin rayadarên AKP´yî derdikevin berçapameniyê û dibêjin ku emê piştî ku "derketina dervî sînor bû emê pêvajoya çareserîyê pêş bixin" jî, ev derewek a. Heta roja me, bi salan derfet ketina destê wan de ku çareserîyê werênin. Ji xwe, ev hêrîşên wan, didina nîşandin ku ti çareserîyên wan ên di çerçoveya radestkirna maf û azadîya civate kurd de tûna ya. Hêrîşên hikimeta AKP a li kurdan, nîşanaka nebûna çareserîyeka mirovana a wê ya bo pirsgirêka kurd a. Yên ku pirsgirêka kurd afirandin jî ew in. Li pêşîya navê kurd bi cih kirina gotina ´pirsgirêkê´, bi serê xwe têgîneka bi wê hebûna civatekê dihê kriminalize kirin, di xwe de dihawêne. Ya ku dikin jî, ev a. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman.

Bi giştî li kuderê destkevtiyek civate kurd heya rejima tirk û hikimeta wê, ji xwe re dike armanc. Bi wê re armanca hêrşên li rojavayê kurdistanê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Hêrîşên li rojavayê kurdistanê, bombardimanên li çîyayên kurdistanê, oparasyonên bejehî ên li civate kurd û oparasyonên sîyesî ên li sîyeseta kurd, bi wê her roj bi dehan ciwanên kurd dihên girtin, hinekî jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Di her qadê de li hemberê civate kurd, pêvajoyek şer daya destpêkirin. Hêrîşên li bajarên kurdistanê ên weke Cizira bota, Farqînê, Silwanê, Geverê, Silopî, Nisêbînê û hemû bajarên kurdistanê, vê rastiyê dide nîşandin. Her wusa, di dema ku Ferîdûn Sînirlioglu diçe başûrê kurdistanê û bi rayadarên kurd ên başûrê re hevdîtinê de dike de, hanîna ser ziman a gotina "divê ku YPG ji şengalê derkeve", di aslê xwe de nîşanaka pêvajoyaka şer a hê maztira jî. Ev dide nîşandin ku dixwezin ku bi çêkirina nakokîyan di nava hêz û partîyên kurd de û her wusa tangkirina wan ya bi tevgerî re, êdî ku

derbeyê li kurdan bixin. Ev rewş, dide nîşandin ku konseptek şer ya rejima tirk heya ku dixwezin ku li ser rojavayê kurdistanê jî bikine merîyetê de.
Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku konseptek şer a ku giştîya kurdan û civate kurd di armanca wê de ya. Her wusa, wê çawa kurdan bişikênin, di wê çerçoveyê de gavan diavêjin û hêrîş dikin. Gera Ferîdûn Sînirlioglu a li başûrê kurdistanê jî, bi vê armancê ya. Di dewama wê de jî ku konsepte şer a li bakûrê kurdistanê bidina domandin. Hêrîşên xadarî ên li Cizira bota, Silwanê, Farqînê, Nisêbîn û geverê, vê rastiyê dide li berçav. Rejima tirk bi dehan balafirên şer û tank û topan hêrîşî kurdan dike. Di şerê di nava dewletan de jî, bi vî rengî hêrîşkirina li hevdû tûna ya. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku heta roja me, ser sadî re balafirên şer çîyayên kurdistanê û civate kurd bombabaran dikin. Î ro, bi awayekî vekîrî hêrîşên li ser silwan û farqînê di rojevê de na. Berî vê, hêrîşên li Cizira bota û Nisêbînê di rojevê de bûn. Î ro, hemû herêmên kurdistanê di bin hêrîşê de na. Bajarên kurdistanê tên bombabaran kirin. Weke ku li Cizira bota, Silwan û Farqînê, tax bi tax nava bajarên kurdan dihên bombabaran kirin. Ku em bibêjin ku li bakûrê kurdistanê şerê nava bajêr di nava kurdistanîyan û hêzên rejima tirk de destpêkirîya, wê rast bê. Pêr, hêrîş li rojava û kobanê bû. Li şengal û başûr bû. Duhû, li Cizira bota, NIsêbîn û geverê bû. Î ro li silwan û Farqînê ya. Sibe jî, wê navên herêmên din ên bajarên kurdiistanê bi hêrîşên leşker û polîsên rejima tirk re bikevina rojevê de. Bi awayekî rewşa awarta, hemû bajarên kurdistanê, li wan derketina li sûkan qadaxa ya. Bi wê re, têkilîyên herêmê bi derve dibirin û hêrîşî herêmê dikin. di nava bajarên kurdistanê de êdî rejima tirk tank û topan bikardihêne di hêrîşkirinê de. Bi helikopteran bombabarênê li taxên bajarên kurdistanê dike. Bi balafirên şer jî, çîyayên kurdistanê bombabaran dike. ..
..

**Gotina Dawutoglu a bi rengê "em nasmena hêrîşkan dizanin lê em nikarin wan bigrin", rengê politika û şentaja wan ya di çerçoveya politikaya wan ya di hilbijartinên 1´ê mijdarê de jî ya.**

Pişti komkujiya li Anqerê gotina dawutoglua a bi rengê "em nasmena hêrîşkaran dizanin lê em nikarin wan bigrin", di aslê xwe de gotinaka ku mirov dikarê bi wê nêzîkatîya hikimeta tirk jî bixwêne ya. Li kurdistanê, belesebep her roj serdegirtinan dikin û mirovên bêguneh digrin û diavêjina zindanan de. Her wusa mirovan digrin û êşkence wan li wan dikin. Her wusa, rojek namêne ku nûçeya kuştina ciwanekî kurd ku ji aliyê hêzên dewleta tirk ve ku hatî kirin ku newê. Tevî ku rewş ev bê, çawa dibê ku ´ew nasnema hêrîşkaran dizanin lê nikarin wan bigrin. Anjî, bi rengekî din,

mirov divê ku vê gotinê çawa bixwêne? Divê ku mirov vê gotinê di wê de bixwêne ku rayadarên tirk ji partîya kurd re dibêjin ku "her mitinga ku we kir, emê di wê de komkujiyan bikin. Win nikarin mitingan bikin. Emê bikin, lê tenê winê li me binerin." Tenê wateya vê gotinê ev a.

Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku komkujiya li Anqerê, komkujiyeka rejima tirk a li dijî pêşketina wîne kurd a. Komkujiya li Anqerê, hasabên ku bi wê re hatibûbûna kirin, di serî de di çerçoveya oparasyonek têgihê de ku pêşî li berçavên cihanê karibin bibêjin, ´têkilîya me, bi DAÎŞê re tûna ya´ û ji aliyê din ve jî di çerçoveya sîyeseta navxweyî de li ser hêrîşên DAÎŞê ênli kurdan re de ku sîyeseta tirsandinê bimeşênin û bi wê re ancamê di hilbijartinan û hwd bidest bixin. Lê aliyê wê yê din ê giring ew bû ku ev komkujî di roja ku wê tevgera kurd, ´bêçalakî´ denezendiba de kirin. Ji xwe, berî wê, rayadarên tirk digotin ´çi bêçalakî´, ´ em ti bêçalakiyê nasnekin´ û hwd. Ji ber ku konseptek şer amedekarîya wê hatibû kirin, û wan dixwest ku wê bikine kirinê de dijîyanê de. Em nikarin, komkujiya ku di **6ê hezîrene 2015**´an û komkujiya li Pîrsûsê ji vê komkujiya li Anqerê cuda şîrove bikin û werênina ser ziman. Bi heman zihniyetê ev komkujî hatina kirin. Bi vê re me divê ku vê yekê jî bibêjin ku heta roja me, çendî ku komkujî hatina kirin û nakû hatina serê gelê kurd, weke van komkujiyan û ankû komkujiya roboskî û hwd, di derbarê wan de ti biryarên dadî ne hatina girtin. Yan doz bi biryarên ´neşopandinê´ hatina bi ancamkirin weke doza komkujiya roboskî û yan jî doz pêşî bi "biryarên vêşarî" ên ku li ser wan re dana re dem li ser wê re dana bûhûrandin û piştre jî, hewl hatina dayîn ku werina ji bîrkirin û ser wan werê sernûxûmandin.

Ji komkujiya zilanê, komkujiya Dersimê, komkujiyên ku piştî salên 1990´î re ku rayadarên tikr li kurdistanê kirina, di derbarê ti komkujiyan ji wan re doz ne hatina vekirin û ne hatina derxistin li holê. Hertimî wan hatîya nuxûmandin. Ji xwe, ji ber ku ev hatîya kirin, heta roja jî, komkuji hatina kirin û kirina wan hatîya domandin. Ev komkujiya li Anqerê jî li ser wê re di cih de rayadarên tirk "biryara vêşarî", di derbarê wê de dana. Weke ku çawa ku di doza komkujiya roboskî de biryara "neşopandinê" hat dayîn û ankû hewl tê dayîn ku ser komkujiya li pirsûsê were girtin û nûxûmandin, wê rewşa komkujiya li Anqerê jî ji wan ne cudatir bê. Ji xwe, di destpêka komkujiyê de ku ew mudahaleya polîsan a bi gazê nebûya, weke ku gelek mirovên bijîşk dibêjin ku "wê hijmara mirîyan, wilqasî ne zêde bûya." Rewşeka ku asta mirîya di vê komkujiya anqerê de zêdetir kir, ew mudahaleya polîsan abi gazê a li gel bû. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya li Anqerê, weke komkujiyaka hikimeta tirk a bi plan mirov dikarê werêne ser ziman. Weke ku çawa ku li

ser kirina komkujiya roboskî pêşî di MGK´ê de axiftin bûya, dibêt ku li ser vê komkujiya li Anqere jî axiftin bûbê. Her wusa, gelek nîşanakên ku derdikevina li holê vê rastiyê didina dîyarkirin. Di serî de, gotina Dawutoglu a bi rengê "em nasmena hêrîşkan dizanin lê em nikarin wan bigrin", mirov dikarê weke nîşanaka vê rastiyê werêne ser ziman. Her wusa, ev gotina

Gotina bi rengê "em nasmena hêrîşkan dizanin lê em nikarin wan bigrin", mirov dikarê weke tehdîdekê jî wê werêne ser ziman. Ev gotin, weke tehdîdeke ku li kurdan dihê kirin a. Yanî, her mitingên ku win bikin, emê bi vî rengî di wan de bombayan bitaqênin. Vê peyamê Dawutoglu bi vê gotinê re dide sîyeseta kurd û ya dordorên demokrat. Ji aliyekî ve gotinên bi vî rengî dibêjin ku bi wan ppêşîya bertekên civate kurd bigrin û ji aliyê din ve jî lez û giraniyê didina li darxistina ´oparasyonên qirkirina sîyesî´ li bajarên kurdistanê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di aslê xwe de ev gotina Dawutoglu a bi rengê "em nasmena hêrîşkan dizanin lê em nikarin wan bigrin", bi awayekî vekirî piştrast dike ku komkujiya li Anqerê rayadarên hikimeta tirk a ku nûha Dawutoglu li ser serê wê ya, plan kirina û dana kirin. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman. Ji aliyekî din ve, ev gotin, tiştekî din jî dide nîşandin ku wê di rojên pêş de komkujîyên din jî ên di rengê vê komkujiya li Anqerê de heya ku bên kirin. Bi teybetî, cihê van komkujiyan jî, wê kûder bê? Wê her devera ku partîyên kurd ên weke HDP û hwd ku li wan mitingan bikin bê. Ji vê gotina Dawutoglu, ya ku bi awayekî vekirî dihê ditin û xwandin wê ev bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku komkujiya li Anqerê, weke komkujiya ppêşî lêgirtina li darxistina miting û hanina li ser ziman a bertekan a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov di serî de vê rastîya vê komkujiyê fahm bike. Armancên hikimeta tirk ên bi kirina komkujiya li Anqerê re ew in ku karibê partîya kurd bêtevger bide hiştin û li ser wê re li bin bendê de wê bide hiştin. Gotina Dawutoglu a bi rengê "em nasmena hêrîşkan dizanin lê em nikarin wan bigrin", rengê politikaya rejima tirk bi vî rengî dide dîyarkirin.

Gotina Dawutoglu a bi rengê "em nasmena hêrîşkan dizanin lê em nikarin wan bigrin", weke gotinaka ku dide nîşandin ku berî kirina vê komkujiyê ku di ´kabîneya hikimetê de bê û ankû di MGK´ê de bê, li ser wê û kirina wê hatîya axiftin. Hemû nîşanekên bi gotinên rayadarên hikimetê û her wusa nîşanakên di nava gotinên T. Ardogan de vê rastiyê radixina li berçav. Bi vê re rastîyeka din jî radixina li berçav ku wê, komkujiyên nû jî di dewama komkujiya Anqerê de bikin.

..

**Di roja bîryara tevgera kurd a ´bêçalakiyê´di denezênê de komkujiya li Anqerê weke bersiv ji wê biryara bêçalakiyê re kirin.**

Piştî hilbijartinên 7´ê hezirene 2015´an pê de, rayadarên tirk konseptek şer kirina dewrê de û bidest hêrîşên li kurdan kirin. destpêka van hêrîşên li kurdistanîyan bi komkujiya li PIrsûsê re zêdetir bû. Piştî wê re jî, bi bombardimanên bi balafirên şer, oparasyonên leşkerî ên li bejehîya kurdistanê û oparasyonên li qaa sîyeseta kurd ku kurd weke ´oparasyonên qirkirina sîyesî´ bi nav dikin re dest pê kir û doma. Î ro jî, li Enqerê, komkujiyeka hovana a ku bi zihniyeta AKP´ê hat kirin. Ji vê komkujiyê hikimeta AKP, T. Ardogan û şûreqaya wî ya ku konsepta şer daya destpêkirin berpirsîyar a. Di 6´ê hezîrene 2015´an de li Amedê, disa di mitinga HDP´ê de bi armanca komkujiyeka mazin bê kirin, taqandinên mazin hatina kirin. Maxdûrên ku ji komkujiya Amedê xilasbûna, digotin ku "li deveran bomba hatibû bicihkirin." Î ro, dîsa maxdûrên ku ji komkujiya Anqerê filitî na, dibêjin ku "ji sê deveran taqîn bû." Ev çi dide nîşandin? Ev dide nîşandin ku yên ku vê komkujiya li amedê û piştî wê komkujiya li Pirsûsê kirina, ev komkujiya li Anqerê jî kirina û ankû dana kirin.

Her wusa, teybetîyeka din, ew a ku di destpêka komkujiya li Amedê de jî û di destpêka komkujiya li Pirsûsê de jî û di destpêka komkujiya li Anqerê de jî, polîs bi awayekî hovane hêrîşî gel dike. Her wusa, li vir di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku gelek maxdûr û mirovên ku cihê ku komkujiya Anqerê ku li wê bûya, gelek nexeşxane nêzîkî wir in. Lê ser nîv seatê re û ankû weke ku tê gotin heta seatekê ne hatina ambûlansan, weke nêzîkatîya bi qasit dihê ditin. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku tiştekî din jî, pirr giringa ku ev çend roj in ku rayadarên tevgera kurd dihênina ser ziman ku wê "bêçalakiyê denezênin." Pêşî alikarê serokwezîrê hikimetê Yalcin Akdogan û gelek rayadarên din ên hikimetê dihênina ser ziman ku ´Em bêçalakiyê ne hildina bercidiyetê." Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku aliyekî vê komkujiya li Anqerê weke bersiveka hikimeta tirk a ji wê ´bêçalakîya´ ku tevgera kurd wê denezênê re jî mirov dikarê li wê binerê.

Pêvajoya çareserîyê hikimeta AKP´ê dawî li wê hanî. Piştre jî, konsepta şer li dijî civate kurd dan destpêkirin. Pêşî xwestin ku bi çeteyên DAÎŞ´ê û hwd, ancamê bidest bixin. Di birêxistinkirin û çalakiyên çeteyên DAÎŞ´ê de istihbarate tirk heya. Ev bi gelek caran bi belgeyên ku derketin li holê jî hatîya piştrast kirin. Li vir, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rejima tirk, di vê pêvajoyê dixwest ku kurdan bişikêne. LI ser şikandin û tûnakirina vina kurdan û civate kurd, hebûna xwe bi konsepta şer daya rûnandin. Divê ku mirov li vê konsepta şer a rejima tirk di vê çerçoveyê de li

wê binerê.

Li kurdistanê, li cizira bota, Nisêbin, Silwan, Farqîn, Gever, Agirî, Wan, Silopî, Amedê û Sûra Amedê û hwd û li gelek deverên din ên kurdistanê, hêzên dewletê pêvajoyek şer li dijî kurdan dana destpêkirin. Her wusa, xwesteka kurdan û civate kurd a xwe rêvebirinê, xwestibûn ku di nava wê pêvajoya şer de kriminalize bikin û piştre jî, herina bi ser kurdan de. JI ber vê yekê bû ku dema ku tevgera kurd hanî ser ziman ku wê ´bêçalakiyê denezênê´ di cih de Yalcin Akdogan p gelek rayadarên din ên tirk derdikevina li holê û dibêjin ku "wê ev nebê, em ne hildina ber cidiyetê." Her wusa, ji ber ku dixwezin ku di nava rewşek şer de bi rengekî ku kriminalize bikin û wê tûna bikin. Di vê çerçoveyê de pêvajoyek şer li dijî kurdan dana destpê kirin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ancamên hilbijartina 7´ê hezîrenê bo hikimeta tirk bûna sedema şerê wê yê bi kurdan re. Ji ber ku ew hebûna kurdan nasnekê û statûya kurdan herê nakê û nepejirêne. Bo vê yekê, wê çawa wê ancamê ji holê ra bike, di vê çerçoveyê de pêvajoyek şer bi kurdan re daya destpêkirin. Her wusa, ev komkujiya li Anqerê jî weke ya li Amedê û li Pirsûsê, ji aliyê qasra T. Ardogan ve hatîya kirin. Ku sibe bibînin ku ancamên hilbijartina 1´ mijarê jî, wê xirabtir bê, wê hilbijartinên 1´ hezirêne jî taloq bikin.

Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rejima tirk, hemû hêrîşên xwe yên ku piştî hilbijartinên 7´ê hezirene 2015´an ku rejima tirk li kurdan dike, di dewama hêrîşên ku bi destê DAÎŞê ku li kurdan hatina kirin de dihên kirin. Di dewama hevdû de dibin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Komkujiya li Anqerê, dide nîşandin ku rejima tirk çendî ji mirovatiyê derketiya. Di aslê xwe de nêzîkatîya wê ya li kurdan û mirovên ku li rex kurdan disekin in jî dide nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku komkujiya li Anqerê, dide nîşandin ku çendî qaddar û hov bûna. KOmkujiya li Anqerê, ku bi zinhiyeta ku li Anqerê serdest a hov pêkhatîya. Ev komkuji, di aslê xwe de asta hêrîşên rejimê ên li ser serê kurdan jî ra dixe li berçavan. Heta roja me, hertimî li her bajarên kurdistanê bi vî rengî hêrîşî kurdistanîyan û civate kurd kirina.

Komkujiya li Anqerê, her wusa, aliyekî wê yê din jî heya. Aliyê kurd û tevgera û civate kurd hertimî dibêje aşîtî. Di vê demê de jî wusa got. Dema rejima tirk û hikimeta AKP û T. Ardogan konsepta şer li dijî kurdan pêşxistin, kurdan got ku ´emê şer bi te nedina kirin.´ Bi vê re jî, xwepêşandin û mitingên aşîtîyana li darxistin. Hemû mitingên aşîtîyana heta roja me, ji aliyê rejima tirk û hêzên wê ve hatîya bi xwûn kirin. Li anqerê jî, ´mitinga aşîtîyê´ hebû. Hemû dordorên demokrat, kurd û aşîtîxwez li cihê´

stasyona trênê´ li hevdû **dicivîyabûn**. Di nava wan de ji sê aliyan ve çeteyên AKP`ê ku bi rêxistin kirina bombayên ku kirina qadê de ditaqênin. Yanî bi gotinaka din, dibêjin ku emê mitingên aşîtîyê bi we nedina kirin. Li vir, ya giring êdî dibê ew ku hemû dordorên demokrat, di helwesta xwe ya aşîtî xwest isrer bikin û li rex kurdan cihê xwe bigrin. Bi dirişma ´emê bi te şer nedina kirin´, hertimî li qadan bin.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku heta roja me li kurdistanê hêzên dewletê komkujiyên mazin kirina. Bi wê re divê ku mirov werêne ser ziman ku her roj li bajarên kurdistanê, nûçeyên qatilkirina ciwanên kurd tê. Ev ciwanên kurd ji aliyê rejima tirk ve dihên kirin. Ji xwe êdî komkujiyên li kurdistanê bûna ji rêzê. Êdî komkujiyên ku di wan de yek, du, û ankû sê mirov dihên qatil kirin, weke bûyarên ku di derbarê wan de nûçe jî nayêna çêkirin in. Heta roja me, tenê ji demên piştî 7ê hezirene 2015´a û pê de, her roj çend ciwanên kurd hatina qatil kirin. Li vir, divê ku ev vê yekê jî binê wê xat bikin û bibêjin ku her mirov û rojnemevanê ku li hemberî van komkujiyên kurdan bêdeng mana, divê ku bi wê xamsarîya xwe re berpirsîyarîya xwe di vê komkujiya li Anqerê de jî bibînin. Di komkujiya li Anqerê de heta vê seata ku ez vê nivîsê dinivîsênim de hijmara mirovên ku hatina qatilkirin derketîya 97´an. Lê her kêlîk, hijmara mirovên ku jiyane xwe ji dest didin zêdetir dibê.

Heta roja me, gelek dordorên ku banga bêçalakiyê dikin, deng ji wan dernekeve. Divê ku herî zêde li hemberî komkujiyên bi vî rengî dengên xwe bilind bikin. Her wusa, Çend roj berê parlamana Ewropa bang li aliyan kir ku ´vegerina li ser masayê.´ Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku dordorên sîyesî ên ewropî jî divê ku deng li hemberî van komkujiyan derxin. **Li vir, em divê ku vê yekê jî bibêjin ku hemû komkujiyên ku tên kirin, bi armanca şikandina kurdan tên kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku heta ku pirsgirêka kurd newê çareser kirin, wê komkujiyên ku rayadar û hêzên tirk li ser serê civate kurd dikin jî dawî li wan newê. Bo vê yekê, divê ku giraniyê bidina ser çareserkirina pirsgirêka kurd. Divê ku bizanibin ku heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê rejima tirk dawiyê li komkujiyên bi vî rengî newênê.Her kêlîka ku pirsgirêka kurd bêçareserî dimênê û mirov û dodorên sîyesî ku li ber wê bêdeng in, divê ku xwe bi wê bêdengîya xwe re ji van komkujiyan re bi berpirsîyar jî bimênin.**

Bi hemû komkujiyên rayadar û hêzên dewletê li kurdistanê kirina, bi komkujiya li amedê a 6´ê hezirenê û komkujiya li Pirsûsê re, vê komkujiya hov a li anqerê jî şermazar û lenet dikin.

..

**Piştî komkujiya li Pirsûsê û li Anqerê, kirina hilbijartinên 1´ mijdarê û pirsgirêka wê ya ´meşrûtîyê´**

Ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, hilbijartinên 1´ mijdarê xwediyê pirsgirêkeka mazin ya ´meşrûtîyê´ ya. Di serî de hilbijartin, ne di nava aramiyê de bûya. Ji aliyekî din ve di çerçoveyeka konseptek şer de bûya. Ji aliyek din ve jî, mirov dikarê hilbijartinên 1´ê mijdarê ku li tirkiya û kurdistanê bûna, di çerçoveya hilbijartinekê de wê şîrove bikin û werênina ser ziman. Hilbijartinên 1´ê mijdarê, di serî de daya nîşandin ku li tirkiya çendî ku gotina "demokrasiyê" dihê bikarhanîn jî, ew tûna ya. Di aslê xwe de hilbijartinên 1´ê mijdarê di serê de ev rastî raxista li berçav.

Her wusa bijartina roja 1´ê mijdarê jî bi zanebûn û plan bû. Roja 1´ mijdarê, salekê berê weke ”roja kobanê a cihanê” hatibû denezendin û bijartin. Di vê rojê de bi serkevtina li kobanê, moral û şahîya ku di nava kurdan de çê dibe, di wê rojê de ku têkçûnekê di hilbijartinan de bi kurdan bide jîyan kirin. Bo vê yekê, bi teybetî û zanebûnî ev roj hatibû bijartin. Yanî, bi gotinaka din, li şûna ku weke ´roja kobanê a cihanê´ ku di mejiyan de cih bigrê, wan dixwest ku weke rojek têkçûnê di mejiyan de cih bigrê. Bo vê yekê, ev roj bijartibûbûn. Bi heman rengî, divê ku mirov di dewama wê de bibêje ku roja 24´ê temûzê ku di wê de destpêkirina bombabarandinên artişa tirk li çîyayê kurdistanê destpêkirin, roja ku di wê de peymana lozanê hatibû mohrkirin. Di wê rojê de jî kurdistan û civate kurd hatibû qatkirin li çaran dervî vîna wan. Bijartina roja 24´ê temûza di destpêka roja hêrîşên di sale 2015´an de, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi plan werêne ser ziman. Di aslê xwede gotinaka dawutoglu ku di kongira AKP´ê a 2015´an de gotibû, hinekî vê rastiyê dide ravakirin û fahmkirin. Dawutoglu gotibû ku ”êdî kurd nalînên û êşên xwe bi zimanê xwe dijîn.” Yanî, hertimî, jîyankirina êşê weke politikayakê hatîya bijartin. Li gorî vê jî, roj û ankû rewşên ku şahîyê û ankû ´moralê´ bidina kurdan, dikin ku ji holê rabikin û ankû li şûna wan êş û şidetê bicih bikin. Hertimî ku mejiyê mirovê kurd, ku di nava êşê de bihêlin. Hinekî jî, mantiq ev a. Rojên ku weke ´roja kobanê a cihanê´ ku kurd wê bi têgîneka serkevtinê dikin ku bijîn, wê çawa di wê rojê de êşekê û ankû têkçûnekê bicih bikin, di vê çerçoveyê de û bi vê mantiqê weke roja hilbijartinê di sale 2015´an de hatîya bijartin.

Roja 24´ê temûzê roja salwegera mohrkirina peymana lozanê ku bi wê kurdistan û civate kurd hatibû qatkirin û ku piştre jî di ancama wê de sal bi sal komkuji di dewama wê de hanîna serê kurdan. Weke ´rojeka bi êş´ di mejiyê kurdan de cih girtîya. Her wusa, li ser vê êşê re dikin ku hêrîşî civate kurd bikin, bo ku ancamê bidest bixin.

Bi wê re ku roja kobanê a cihanê ku di mejîyê kurdan de weke roja ´serkevtinê´ cihgirtîya, bo ku bi întîbayekê li ser şikeştineka mihtemel ya di hilbijartinê de ku weke roja ´têkçûnê´ ku di mejiyê mirov de naqş bikin. Hinekî jî, di temenê bijartina roja 1´ê mijdarê weke roja hilbijartinê, bi vê mantiqê bûya. Ji xwe di vê çerçoveyê de û bi mantiqekê bi vî rengî, hertimî rojên şahî û ankû giring ên civate kurd, kirina weke ´rojên ku di wan de komkuji jî kirina.´ Her wusa, di roja newrozê de ku hemû kurdistanî şahîya newrozê dikin, li Hesekê li hemberî kurdan bi DAÎŞ kirina komkujiyê û di wê de qatilkirina ser 60 mirovên kurd ên sivil, hinekî jî di vê çerçoveyê de bi mantiqekî bûya. Yanî, armanca vê politikaya dewletê, ew a ku nehêle ku ´şahî´ bibe. Li şûna şahîyê ´şînahî´ dana jîyankirin, di vê çerçoveyê de weke politikayekê şerkirina bi civate kurd re hatîya bijartin. Rojên bişîn hê zêdetirî bişîn bikin û rojên şahîyê jî, bikina rojên şînê. Di dewama vê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rejima tirk ne tenê bi polîs leşkerên xwe bi kurdan re şer dike. Li çapameniyê hevdû re, bi moralê civate kurd re jî şer dike. Nirxên ku mirov ji wan hêz, fêz û şahîyê digrê, dikina armanca hêrîşê de. Kurd, di nava xwe de vê rewşê bi gotina ´**şerê deronî´ ku li hemberî wan tê meşandin** re dihênina ser ziman.

Wekî din jî, çendî ku ew hilbijartinên 1´ê mijdarê de ku bûna bahse wan were kirin jî, mirov dikarê di vê çerçoveyê de bahse wan bike. Hilbijartinên 1´ê mijdarê bûna, hilbijartinên ku pergale metinger li ser serê civate kurd û civatên bidina rûniştandin a. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di nava aramiyekî de ku hilbijartin bûba, wê HDP ji sedî 16 jî wê girtiba.

Lê tiştekî din jî, hat ditin ku çendî ku car bi car weke rexneyekê jî li sîyeseta kurd û partîyên kurd ên weke HDP dihat kirin û dihat gotin ku "divê ku bibina xwe bikina ya tirkiyê" jî, hat ditin ku tenê derewek a. Yên ku herî zêde pêşîya wê bûyîna sîyeseta kurd li tirkiya û pêşketina partîyên kurd li tirkiya digrê jî rejima tirk bixwe ya. Ev jî hat ditin. Ev yek, bi awayekî vekirî di hilbijartinên 1´ê mijdarê de hat ditin. Bo vê yekê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku yên ku vê rexneyê li sîyeset(´ramyarî´)a kurd û partîyên kurd dikin, ku ne bi nîyetetk xirab van gotinan dibêjin bin, divê ku di serî de van aliyên rejima tirk ên bi awayekî pêşîlêgirtina sîyeseta kurd û partîyên kurd li tirkiya divê ku bibînin.

Weke aliyekî din jî, ev jî hat ditin ku sîyeseta kurd serkevtî ya. Çendî ku di vê demê de bahse "binketina di hilbijartinan de" were kirin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de vê yekê werêne ser ziman. Rejimeka ku pirsgirêka kurd çareser nekirî û maf û azadîya civate kurd ku ji destê wê girtî, ne dikarê bahse demokrasîyê û mafê mirovan bike û ne jî dikarê navê mirovahiyê jî

hilde li dest. Di serî de divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman. Yên ku bahse demokrasîyê, maf û azadiyê dikin, divê ku mirov weke şîleyekê ku li rûyê wan bixe, bahse mohrkirin û girtina dibistanên kurdî ên ku kurdan li geverê, baxlare Amedê, Nisêbîn, Cizîra bota û hwd, li ber wan werêne ser ziman. Yên ku bahse wekheviyê dike, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Yên ku bahse demokrasiyê dike, divê ku mirov li ber wan werrêne ser ziman ku çawa ku hemû herêmên kurdan weke ku di 1´ê mijdarê de bû, weke "herêmên leşkerî" di denezênin û piştre her bi oparasyonên leşkerî ku rejima tirk û artişa wê li kurdistanê û li ser serê civate kurd li dardixe werêne ser ziman.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Hat ditin ku tevî hemû hêrîş, astengî û bendên rejima tirk ên bi hêrîşan hwd jî, partîya kurd bende ji sedî 10 derbas kirîya. Divê ku mirov vê yekê jî li vir binxat bike û werêne ser ziman ku di roja ku di wê de hilbijartin dihat li darxistina a 1´ mijdarê de jî, oparasyonên sîyesî li hemberê andamên partîya kurd i bajarên kurdan hatina li darxistin. Bi dehan û sedan ciwanên kurd hatina girtin. Di pêvajoya hilbijartinê de, tenê ji hilbijartinên 7´ê hezirenê û heta a 1´, mijdarê, ser dusadî re ciwanên kurd hatina qatilkirin. Li cizira bota, Nisêbîn, Farqîn, Gever, Amed, Silopî, Silwan, û li gelek bajarên din ên kurdan, bi dehan ciwanên kurd hatina qatilkirin di vê pêvajoya hilbiijartinê de. Her wusa, bi wê re her roj oparasyonên li leşkerî li bejehîya kurdistanî û her wusa li oparasyonên hewayê li çîyayên kurdistanê hatina li darxistin.

Li vir, divê ku mirov dûbare vê rastiyê jî, werêne ser ziman ku partîya kurd, tevî van komkujiyan jî serkevtîya. Ji komkujiya di 7ê hezirene 2015´an û heta komkujiya Pirsûsê û piştre heta komkujiya li Anqerê, komkujiyên ku rejima tirk li ciwanên kurd û ên demokrat ku kirina na. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku yek jî ji wan komkujiyan kiryarên wan ne hatina ditin û girtin. Serwan hatîya niûxûmandin. Bi wê re jî, weke tehdîdekê rayadarên tirk weke Dawutoglu derdiket li qadan û digot ku "em dizanin ku ´bombayên zindî´ li qadan digerihin lê em nikarin wan bigrin". Ev tehdîdek li sîyesete kurd bû. Weke ku li Wanê ku kurdên sivîl tehdîd dikir û digot ku "ku win dengê xwe ne dina me, wê ´torosên sipî´ derkevina li holê."Torosên sipî", ew taksiyên ku leşker û polisên rejimê bikardihanin û bi wan mirov di ravandin û qatil dikirin bûn. Heta roja me jî, dayikên wan ciwanên kurd ku bi wan taksiyan hatina ravandin û qatilkirin li qadan weke "dayikên şemiyê" her rojên şemyê li hevdû dicivin û li aqûbeta zaroyên xwe dipirsên. Ji dewletê û rayadarên wê dixwezin ku aqûbeta zaroyên wan vebêjê.

Lê heta roja me, di derbarê aqûbeta wan ciwanên kurd de ti tiştek ne hatîya

ser ziman. Dewletê hertimî, weke ku li ser komkujiyên ku kiriya û ser wan nûxûmandiya, ser wê jî nûxûmandîya. Di aslê xwe de hilbijartinên 1´ mijdarê bûya, hilbijartineka ku wê rejima ku heta roja me komkuji li ser serê civate kurd meşandiya ku wê dîsa karibê li ser serê civate kurd bi komkujiyan bide domandin. Pêşî, ancamên hilbijartina 7´ê hezirenê red kirin û bo wê ji holê rakin, pêvajoya şer bi kurdan û civate kurd re dane destpêkirin. Piştre jî, di hilbijartinên 1´ê mijdarê de ku bi zanebûnî rastî roja 1´ê mijdarê ya salwegera roja kobanê a cihanê hatîya hanîn, bi hîlebazî û mudahaleyan ew ancam bidest xistin. Tenê ku miirov di çerçoveya ciwanên kurd ên ku ji 7ê hiezrene 2015´an û heta 1´ê mijdara 2015´an de jî bihizirê, mirov divê ku werêne ser ziman ku di serî de pirsgirêka meşrûtîya a mazin ya hilbijartinên 1´ê mijdarê heya.

Sîyeseta kurd, xate wê rastîya. Lê bi gelek tiştên ku kiriba û ne kirina wan re kêm maya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman. Her wusa, li ser parastîyan nirxên civatan û biratîya gelan sîyeset kiriya. Di serî de hemû hêrîşên ku li partîya kurd hatina kirin divê ku mirovan di çerçoveya hêrîşên li rejima tirk ên li dijî tekoşîna civate kurd demokratik a bo maf û azadî û civate wê, werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman. Her wusa, mirov nikarê hêrişên li partîên kurd û saziyan, tenê weke hêrşên ku bi wan dixwezin ku pêşîya serkevtina partîyekê bigrê fahm bike. Di serî de hemû hêrîş, weke hêrîşên pêşîlêgirtina pêşketina statûya kurd jî werêne ser ziman. Ev jî, bi konseptek şer ku bi wê pêşî "pêvajoya çareserîyê" dawî li wê hanîn û piştre li ser wê re ku dana destpêkirin, di wê çerçoveyê de ancamên hilbijartinên 1´ mijdarê hatina bidest xistin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku li hemberî wê konsepta şer, partîya kurd, karîya ku çûyîna xwe ya li mecislê biparêzê, Ev jî, serkevtineka giringa. Di serî de divê ku mirov wê pîroz bike.

Ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê divê ku mirov werêne ser ziman ku hilbijartina 1´ê mijdarê, mirov nikarê di çerçoveya hilbijartinekê de û bi ast û pîvanên wê werêne ser ziman. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Di serî de di vê çerçoveyê de divê ku mirov hilbjartinên 1´ê mijdarê, weke hilbijertinaka ku pirsgirêka wê ya pirr mazin ya ´meşrûtiyê´ heya werêne ser ziman. BI oparasyonên bejehî û hewayê ên leşkerî xwestina ku wê ancamê bidest bixin. Di serî de, divê ku mirov di vê çerçoveyê de di çerçoveya alikarîya rajima tirk a ji DAÎŞ´ê re û her wusa di çerçoveya şerê wê yê ku ev 40 sala bi kurdan re dike de li hilbijartinên 1´ê mijdarê binerê. Rejima tirk bo çi ev 40 sale ku bi civate kurd re şer dimeşêne? BO ku hebûna civate kurd ji dîrokê bibe, wê şerê bi kurdan û civate kurd re dike. Rastîya şerê rejima tirk a bi kurdan re bi mohrkirina dibistanên kurdî ên li

gever, cizira bota, Farqîn, Silwan, Silopî, Nisêbîn, BAxlare Amedê û hwd re werêne ser ziman. Ancamaka ku wê çawa pêşîya statûya kurdan bi wê bigrin, û wê çawa nehêlin ku perwerdeya bi zimanê kurdî bibe, wê çawa şerê xwe bi civate kurd re bidomênin, di wê çerçoveyê de xwestin ku wê ancamê bidest bixin. Yanî, bi gotinaka din, ancama ku bi zorê û zilmê û oparasyonên leşkerî û hawayî ên artişa tirk bi wê hatîya bidest xistina. Yanî, ancamaka ku bi wê karibin inkara statûya kurd bidina domandin û şerê wê bi civate kurd re bikin a. Di vê çerçoveyê de ti mirovên bi aqil û wijdan, nikarin bahse ´meşrûtîyê´ bi hilbijartinên 1´ê mijdarê re bikin.

..

Li vir, divê ku mirov hinekî din di vê çerçoveyê de mijarê kûr bike û bi wê e herê. Her wusa, bi teybetî li ser bûyar û mijarên demê re ku mirov bi şenberî bike ku werêne ser ziman, wê çêtirîn bike ku were fahm bikirin. Heta roja me, şerê rejima tirk, bi her awayê li hemberî civate kurd hatîya dayîn domandin. Her wusa, weke ku li bajarên kurdistanê êdî rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe re biawayekî hêrîşî kurdistanîyan dikin. Rewşên ku piştî 24´ê temûza 2015´an û pê de ku bûya û rûdaya, êdî vê yekê bi awayekî vekirî radixe li berçav. Her wusa divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku konsepta şer a ku li hemberî civate kurd hatîya dayîn destpêkirin û meşandin, di vê çerçoveyê de divê ku mirov di asta herêmî û navntewî de jî aliyna wê yên ku hena werêne ser ziman. Her wusa, di nava tirkiya de li ser pergale dadê re hemû sûcên ku rayadarên tirk kirin, dikin ku ”paqij” derxin. Her wusa, heta roja di derbarê ti komkujiyên ku hatina hanîn li serê civate kurd ku ti doz ne hatibina vekirin û ti biryarên mahkûmkirin derneketibin divê ku mirov weke birhana vê rastiyê werêne ser ziman. Bi wê re dozên qatilên kurdan ên weke Cemal temizoz û hwd, ku her yekê ji wan bi sadan kurd qatilkirina, dozên wan ji aliyê pergale dada tirkiya ve bi biryarên ”baraatê” dihên biancamkirin. Ev jî, bo ku rewşên ku Cemal Temizoz bikardhanî û bi wan kurd qatilkirin ku werina domandin. Her wusa, piştî bi ancamkirina doza Cemal Temizoz bi çend rojan qatilkirina mirovên weke Tahir Elcî ku aktivîstên sivîl ên kurd in, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Rayaderên tirk, hertimî biryar dana û kurd bi vî rengî qatilkirina, û piştre gotina ”faîlî mechûl.” Yanî, ti kesek nizanê kê kuştîya. Lê herkesek jî dizanê ku polîs, leşker û hêzên teybet ên dewletê ew qatilkirina û ankû kuştina.

Lê divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ên weke vê pirr zêde na. Lê piştî 24´ê temûza 2015´an û pê de, zêdetir bûn. Her wusa, êdî bi awayekî vekirî leşker û polîsên tirk û hêzên wan ên teybet, berê xwe dana kurdan û bidest kuştina kurdan kirin. Lê cihan jî, mixabin li ber wê bêdeng bû.

Em li vir, hinekî din jî li ser baraat kirina doza cemal temizoz bisekin û piştre di dewama wê de li ser qatilkirina Tahir Elci rawasitihin. Ji ber ku weke ku ji aliyê rayadarên dewletê ve di dewama hevdû de ku hatina kirin in.

**"Baraat"kirina kujaran, di wijdanê mirovatiyê de nayê baraatkirin.**

Heta roja me, bi destê rayadarên rejima tirk bi sadan kurd hatina qatil kirin. Yek jî ji mirovên ku bi destê rayadarên rejimê hatina qatil kirin, qatilên wan ceza negirtina. Ji ber ku wan qatilan li ser nav dewletê û rejima wê mirov qatilkirina, li şûna ku ew werina cezakirin ji ber sucên ku kirin, ew hatina xelat kirin. Komkujiya Dersimê jî, minaqa wê li holê ya. Qatilên weke "mistafa muglali" ku li qerqeliyê 33 kurd li ber hêt dana rêzkirin û piştre gûla li ser wan dana barandin û qatilkirin jî, ceza negirtina. Qatilên weke "cemal temizoz", di dema xwe de digot ku "şirnax, komara min a", rojek ne dima ku vê qatilî û bênamusî mirovekî kurd nedikuşt. Lê wî jî bi fermana rejimê dikuşt. Bo vê yekê, rejimê jî, li qatilên xwe xwedî derket û ew "baraat" kir. Ew rejima ku di dadgehên xwe ji qatilên xwe re biryara "baraatê" derxist" wê mirovatî ti carî wê i wijdanê xwe de baraat nekê.

Çeteya temizoz ku cerdewanên ku li ser navê dewletê mirov dikuştin ên weke ´kamil atak´ ji nav de na, heta roja me, tenê yên ku tên zanîn di nava xalkê de, bi dehan mirovên bêguneh qatil kirin. Di salên 1990´î û piştre de, van herêma şirnaxê û dordora wê kiribûbûna gola xwûnê. bi sedan mirov bi destê wan hatina qatilkirin. Heta roja me, ku weke kevneşopîyeka rejima tirk bûya, wê hertimî komkujiyan bikin û bi pergale dadê bikin, ser wê binûxûmênin. Di dîroka komara tirk de, bi sadan komkujiyên ku wê hanîna serê civate kurd bûna. di ancama wan komkujiyan de bi deh hezaran kurd hatina qatilkirin. Lê mirov rastî ti biryara dadî ya pergale dada wê, nayê ku sucek jî ji wan sucên ku qatilên wê li dijî civate kurd kirina ku mahkûm bike. Hertimî, kirina û bi vî rengî bi pergale dadê ser wan nûxûmandina. Di komkujiya Roboskî de jî, pêşî dozek bo pêşîya bertekan bigrin vekirin û bi demê re dirêjkirin û ser ve dem bûhûrandin û piştre "biryara neşopandinê" dan û ser dozê jî girtin. Di derbarê komkujiyên ku rejima rejima tirk li agirî, zilanê, Dersimê, botanê, û herêmên din ên kurdistanê û serhadê kirin de, ti biryarên dadî ne hatina girtin.

Vajî wê, dadgeh bûna cihna paqij derxistinê. Ji salên 1980î û pê de jî, heta roja me, bi dehan komkujiyên weke yên ku rayadarên rejimê hatina serê civate kurd bûna. Lê ser hemûyan jî, hatina girtin. Tenê di zindana de, ku mirov binerê bi sadan mirov hatina qatil kirin. Ji ber ku di salên 1980´î de di zindana amedê de gelek komkuji kirina, û ji ber ku dixwezin ku ser wan kuştinên xwe binûxûmênin, dixwezin ku zindana amedê jî xirabikin. Her

wusa, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku ji ber çi hêrîşî goristanên kurdan dikin? Ji ber ku ew zaroyên kurd ên ku bi destê rejimê hatina qatilkirin di wan goristanan de dirazihin. Ya ku dixwezin bidina windakirin bi wan hêrîşên li goristanan, ew a. Weke ku çawa ku Sêd Riza bi derve kirin û cihê ku ew di wê de defnkirin vêşarî kirin û weke ku çawa Şêx Seîd bi derve kirin û cihê tirba wê nayê zanîn û her wusa bedizûzzaman û ankû seîdê kurdî çawa ku cihê mezela wî nayê zanîn û hwd. Ev rewş, hemû, rewşna ku hevdû temem dikin.

Qatilên weke cemal temizoz ku bi dehan kurd qatilkirina, di derbarê wî de biryara "baraatê" didin. Her wusa, heta roja me, ser 3 hezarî re kurd hatina qatilkirin bi destê mirovên bi vî rengî. Lê win rastî tenê dozekê jî nayên di derbarê sucên rayadarên rejimê de. Hemû jî, ser wan hatina girtin. Ev tê çi wateyê? Ev tê wê wateyê, dixwezin ku ji î ro û pê de jî, ku karibin komkujiyan li ser serê civate kurd bidina domandin. Mirov dikarê di vê çerçoveyê de vê biryarê bixwêne. Her wusa, ev vê jî dide nîşandin ku hemû qatilên ku li ser navê dewletê kurd qatilkirina, wê dozên wan bi vî rengî bên bi ancam kirin. Yanî, dewlet, wê qatilên xwe xelat bike ji ber kurd qatilkirina. Heta roja me, ev kirîya. Ji destpêka dîroka komara tirk û heta roja me, di derbarê ti sucên ku rayadarên rejimê ku li dijî kurdan û civate kurd kirina, ti doz nîn in ku bi mahkûmkirinê bi ancambûna. Ji xwe, di gelek komkujiyên ku kirina de, doz jî nevekirina. Her wusa heta roja me, em divê ku vê yekê bibêjin ku ji sadî 90´yê kurdistanîyan ku hatina girtin û birina qarakolan, êşkence li wan hatîya kirin. Di derbarê yekê jî ji wan de ti tiştek ne hatina kirin. Dozên destavêtinê ên ku bi destê rayadarên dewletê bûna ên weke li herêma dersimê, batman, Cizirê, çolemergê, Sêrtê, Bedlîsê, Amedê û hwd, ku li gelek deverên din jî bûna, biryarên bi vî rengî ên ´neşopandinê´ û ankû ´paqij´ derxstinê hatina dayîn.

Dadgehên tirk, şerê jenosîdkirina civate kurd, bi vî rengî dike ku ser wê binûxûmêne. Her wusa, wê çawa şerê jenosidkirina civate kurd bidina domandin, di wê çerçoveyê de biryaran ji dadgehê derdixin. Piştre bi deh û ankû pist salan piştre, henek wê derkevin û wê bibêjin ku dadgehê bi vî rengî biryar daya, nexwe wan ti sûc nekirîya. Lê wê ev ti carî ne rast bê. Wê ew nifşên piştre jî, wê binizanibin, ku ev dozên sernûxûmandinê û domandina şerê jenosîdkirina civate kurd in. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku heta roja me, ji destpêka dîroka komarê û heta roja me, sal bi sal komkujiyên hatina hanîn li serê civate kurd hena. Bi hezaran komkujiyên ku rayadarên dewletê li ser serê civate kurd kirina hena. Lê ti biryar tûna na ku di derbarê wan de hatina girtin in. Dadgeha tirk, hertimî bûya dadgehek ku weke ku qatilên dewletê ku kurd qatilkirina ku wan paqij

derxê bûya. Ev rengê dadê û pergale dadê wê hertimî di wijdanê mirovatiyê de were mahkûmkirin û şermazar kirin. Wê ti carî ´baraat´kirina kujaran di wijdanê mirovatiyê de newê baraat´kirin.

Xeleka dawî a qatilkirinên dewletê bû Tahir Elci û bi sadan ciwanên kurd ku li bajarên kurdistanê li berxwe didin in. Di vê çerçoveyê de di dewama vê ´baraatkirina´ qatilên dewletê de divê ku miirov werêne ser ziman. Cemal Temizoz, kujarekî dewletê ku li ser navê mirov dikuştin û hatibû kifşkirin bû. Wê çawa wê kifşkirina wî, ji berçav dûr bikin û ser kirinên wî binûxûmênin û wî paqij derxin, di vê çerçoveyê e biryara wî dan. Ji xwe, piştî baraatkirina Cemal temizoz bi çend rojan, wê Tahir Elci were qatilkirin. Doza Cemal temizoz û biryara ´baraatkirinê´ a ku ji dadegeha tirk a Şirnaxê hat derxistin, bo ku qatilkirinên weke yên ku hanîn serê Tahir Elci bidina domandin a jî. Her wusa, piştî derxistina vê bîryara ´baraatê ji dadgehê, piştre hêrîşên li bajarên kurdistanê ên bi leşkerî bi tank û topan, divê ku mirov bibîr bike. Di salên 1990î de heman rewş bûbû û leşkerên weke Temmizoz erk dikirin. Di wê demê de komkujiyên ku Temizoz û ´ekîb´a wî kirin i herêmên şirnaxê, heta roja me jî, li ser wan tê axiftin. Ji xwe, piştî vê biryara dozê, qatilkirina Tahir Elcî  û piştre jî, bajarên weke Cizira bota, Silopî û gelek deverên ên li dora Şîrnaxê, ku ji aliyê leşkerî ve weke salên 1991-2an hatina dorpêçkirin jî, wê vê rewşê baş bide ravakirin. Di 12ê berfanbara 2015´an de şaqê wezereta perwerdet ku peyaman li ser telefonên destî re ji hemû mamostên herêmê re dişêne û wan dişêne **betlaneya bêdem** û piştre sevkiyeta leşkerî li herêmê çê dibe, her wusa rewşa dema temizoz û komujiyên ku wî di dema xwe de kirina, dihanîna bîra mirovan. Ev rewş, weke rewşna ku nîşanaka wê bûn ku komkujiyên nû dihatina plan kirin li ser serê civate kurd jî dihatina şîrovekirin. Di 12 ´ 13ê berfanbara 201´an de sevketîyetên mazin ên leşkerî li herêmên botanê ên weke Cizira bota, Silopî û dora wê dihatinakirin. Bi heman rengî li Sûra Amedê û li dora wê jî, rewşna bi vî rengî hebûn. Hemû bajarên ku li wan kurd li ser pîyane, bi vî rengî sevkiyetên leşkerî li wan tên kirin û bi wê sevkiyeta leşkerî ew tên dorpêçkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de hizir dikirin ku hêrîş bikin û ancamê bidest bixin. Rejima tirk, bi vî rengî şerê ´bêstatû hiştina kurdan´ bi kurdan re dida. Bi pêvajoyeka şer ya nû ku li demê hatî belavkirî li hemberî civate kurd şer dihat meşandin.

..

**Qatilkirina Tahir Elci, mirov dikarê gelek wateyan ji wê derxe. Bi wê, mirov dikarê ji gelek aliyan ve rastîya dewletê û rejimê a li hemberî kurdan û pêvajoyên wê yên şer ên li hemberî kurdan dahûr bike. Lê di serî de ji aliyê wê pêvajoya ku Tahir Elci di wê de hatkirin, wateya wê**

**ew a ku Tahir Elci û qatilkirina wî, politikaya dewletê a kriminalize kirina rêveberîya xweser ên kurdan ku di wê demê de li bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Nisêbîn, Gever, Farqîn, Sûr, Silopî û hwd ku hatibûn kirin, di wê çerçoveyê de weke hêrîşeka li kurdan mirov divê ku fahm bike û werêne ser ziman.**

Bo dewletê û rayadarên wê qatilkirina kurdan, weke ku hertimî ´meşrû´ bûya. Heta roja me, kurdên ku hatina qatilkirin, ji aliyê kujarên dewletê ve hatina qatilkirin û qatilên ti kesekî ji wan ne hatina derizandin. Kujarên Tahir Elci, ankû polîsên ku li Gever, agirî keça Sibel Çapraz kirin û ew birindar kirin, wê werina drinzandin? Wê ti carî ev yek nebe. Weke ku çawa heta roja me ev nebûya. Û ankû tiştekî wusa nebûya. Begûman, divê ku mirov qatilkirina Tahir Elci jî di nav de hemû hêrîşên li kurdan bi politika û ankû konsepte rejima tirk a şer a kriminalize kirina rêveberîyên xweser ku kurd wan li Geverê, Farqînê, NIsêbîn û Cizira bota diparêzên ve girêdayî werênina ser ziman.

Gotinên rayadarên dewletê ên ku ji dev T. Ardogan jî derketina û yên ku ji devê Dawutoglu jî derketina gotinên sernûxûmandinê na. Wê çawa bertekan bi şikênin û vajî bidina nîşandin li berçavên cihanê, di nava hewldana wê de na. Dawutoglu dibêje, ´ev hêrîş li dewletê ya´. Ev derew a. Ev gotineka sernûxûmandinê. Ev hêrîş, bi têkilî û konsepta hikimeta wî li kurdistanê li civate kurd hatîya kirin. Hikimeta Dawutoglu, di çerçoveya kiriminalize kirina rêveberîyên kurdan ên xweser û politikaya xwe ya tafisandinê a li ser serê civate kurd de ev komkuji kirina.

Li vir, divê ku mirov di serî de vê yekê jî, werêne ser ziman ku heta roja me, çendî ku komkuji bidestê dewletê hatina kirin û ku serwan nûxûmandî mana, wê di vê rewşa Tahir elçi de jî rewşê şîlo bikin. Her wusa di rewşa Hirant Dink de jî, ew şîlokirin kiribûn.

Li vir, ez dixwezim ku vê yekê werênima ser ziman. Di çend rojên berî hlbijartinên 1´ mijdara 2015´an de gotinên Dawutoglu ên piştî komkujiya li Anqerê ku hanîbûbûna ser ziman ku gotibûn, "em dizanin ku bombayên zindî digerihin, lê em nikarin wan bigrin", di vê rewşa qatilkirina Tahir Elci de hat bîra min. Her wusa li berçapameniyê û çavê herkesekî qatilkirina wî, weke çavtirsandinekê ya ji sîyesetmederên kurd re jî ya. Weke ku ji wan re bibêjin ku li ser Geverê, farqînê, Nisêbînê û ankû Cizira bota û hwd, win bi vî rengî derkevina pêş çapameniyê, emê bi vî rengî li we bikin.

Ev komkujiya Tahir Elci, rastîya hêrîşên dewletê ên li kurdan dide rava kirin. Heta roja me, rewşên bi vî rengî li kurdistanê bûna. Lê yek jî berpirsîyariyên wan ne hatina darizandin. Ji xwe, dema ku dewlet wan qatilên ku ev komkuji kirina ku polîs bin û ankû hinekî din ku derxe li holê,

wê wê armaca ku bi wê kuştinê xwestîya bidest bixe ên weke ´çavtirsandinê´ û hwd, wê vala derxe. Qatilkirina Tahir Elci, di çerçoveya konsepta şer a ku rejima tirk di 24´ê temûze 2015´an û pê de ku li hemberî civate kurd dabû bû destpêkirin, hatîya kirin. Ev konsepta şer a ku rejim û hikimeta tirk li hemberê civate kurd dabû bû destkirin jî, di çerçoveya pêvajoya hêrîşên DAÎŞê, Ahrar el-şam, Cebetil-nasr´ û hwd de ku li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê hatibû destpêkirin, di wê çerçoveyê de li bakûrê kurdistanê hatîya dayîn destpêkirin. Bo vê yekê, wê bike ku li ser çapameniyê re çawa, ser wan were nûxûmandin. Her wusa, li vir, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku divê ku mirov qatilkirina Tahir Elci, di çerçoveya politikaya dewletê ya ´kriminalize kirin´a rêveberîyên xweser ku dewlet dixwezê ku bi hêrîşên xwe bike de fahm bike.

Bo vê yekê, divê ku mirov vê yekê bibêje, heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, ev hêrîş û komkuji û kuştin, ne yê pêşî bin û ne jî yên dawî bin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li mijarê binerê.

Her wusa, gotinên "dawutoglu ên li ser qatilkirina Tahir elci ên weke "ev hêrîşa li dewletê ya" û ankû "di dema me de ti ´failî meçhul´ nebûna û wê ev jî wusa nemênê" jî, di aslê xwe de gotinên ku vê bûyarê jî bikina weke bûyaraka sernûxûmandî. Weke ku çawa ku di doza Hirant Dink de digotin ku ´wê heta dawiyê pêşîya wê newê berdan." jî, di vê rewşê de jî dihê gotin. Lê wê dem şanî me bide ku wê ne wusa bê. Kurdên ku li nirxên xwe xwedî derketina, li zimanê xwe xwedî derketina û ankû bi zimanê kurdî nivîsandina, hertimî bûna armanca dewletê. Heta roja me wusa bûya. Wê ji roja me û pê de jî, wusa bê.

Li vir, divê ku mirov qatilkirina Tahir Elci, weke reng û rêbazekî nû ên bi konsepta şer a rejimê a li hemberî bajarên kurdan ku rêveberîya xwe ya xweser denezendina jî werêne ser ziman. Divê ku miirov vê bûyarê bi vî rengî jî bixwêne. Her wusa, di çerçoveya hêrîşên rayadarên ên bi polîs û leşkerên wê re ku li Farqînê, Gever, Nisêbînê, Cizira bota û hwd, ku dibê, di wê çerçoveyê de li qatilkirina Tahir Elci jî binerê. Ji xwe, di çerçoveyek bi vî rengî de ev qatilkirin hatiya kirin.

Li geverê, hêrîşên li ciwanên ku sibel çapraz û sefer Terzioglu di wê de birindar bûn, di vê çerçoveyê de bûya. Her wusa, ti farqê vê hêrîşê ji ya li nisêbînê ku di wê de jina kurd a bi navê Selemet ku dayika pênc zaroyan bû, ji wê ti cudahî tûna ya. Hêrîşên li kurdan dibin, di vê demê de hêrîşên tafisandinê na. Her wusa, li bakûrê kurdistanê, êdî hebûna dewletê bi hêzên wê yên ku kurdan qatil dikin re bi sînor maya. Ji wê û pê de, ti tişt nemaya. Yên ku ev hêrîş kirina, wê di wijdana mirovatiyê de werina mahkûm kirin.

……….

**CHP û dijminatîya wê ya li kurdan ku di sosyalist enternasyonalê de dide nîşandin**

KU mijar dibê kurd, hemû jî dibin yek. Di rengekî de derdikevina li hemberî kurdan. Ku em dîroka komare tirk hildina li dest, ji sale 1923´an û heta salên 1950´î wê weke demeke qaşo ´yek-partî´ bê. Di vê demê de jî wê CHP desthilatdar bê. Piştî salên 1950´î wê qaşo pirr-partîtî were pêşxistin. Lê dîsa zihniyet wê bi yek-partîtîyê bê. Bi zihniyet yek-partîtîyê ji sale 1950´î û heta roja bi dîmênê pirr partîtîyê tirkiya rêvebirin û mirov jî xapandina bi gotinên ´dema pirrpartîtîyê´. Mirov, vê yekê, di vê çerçoveyê de jî dibînê ku çawa mijar dibê kurd, partîyên rejimê ku ti farqê wan ji hevdû nabê. Her wusa wê her yekê, ji aliyê xwe ve wê çawa pêşîya kurdan bigrê û herê bi kurdan de, ketîya nava hewldanê de.

CHP´ê weke partîya komarê ku ji salên 1923´an û heta salên 1950´î ku bûya desthilatdar û di van deman ji hemû komkujiyên ku hatina serê civate kurd berpirsîyar a. Ji komkujiyên ku hatina serê kurdan, ên weke komkujiya zilanê, komkujiya agirî, komkujiya dersimê û hwd, ev partî berpirsîyar a. Piştre jî, di şerê rejimê ê li hemberî civate kurd de rol û weyna vê partîyê bi rengna din domîya ya. Her wusa, wê çawa xwe di bin ´maske´ya ´sosyal demokrat´ de bide nîşandin, ketîya nava hewldanê de. Aliyên ku rejimê nekerîya ku bi paertîya li ser desthilatdarîyê bide sînorkirin, li ser CHP´ê re kirîya. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku CHP, hertimî di pozisyona partîya desthilatdarîyê û ankû di şerê

rejimê ê bi kurdan re de li rex partîya rejimê a desthilatdar bi awayekî di fiîlîyetê de bierk bûya.

Her wusa, î ro AKP li tirkiya bi awayekî hatîya kirin weke desthilatdar. Ev partî, bi kurdan re, hemû derfetên rejimê bikardihêne û şer dike. Di qada navnetewî de jî bi dîplomatîkî jî tekoşînê li dijî kurdan dike. Politikayên ku di vê çerçoveyê de rejim kifş dike û partîyên desthilatdarîyê dikin meriyetê de, li rex wê partîyên weke CHP´ê ku bi awayekî weke nîv-desthilatdarin jî ji aliyê xwe ve dikina meriyetê de. Pozisyona CHP´ê li hemberî kurdan, ji ya AKP´ê ne cudatira. Hertimî, li hemberî kurdan, bi awayekî plangerî, CHP´ê bi partîya desthilatdarê a weke AKP û hwd re di ahengekê de tevgerîya ya. Di hilbijartinên berê de dema ku hilbijartinên bûn û hat fahmkirin ku wê çend parlamanê HDP ji zindanê werina bijartin, rejimê û AKP´ê li ser CHP´ê re jî ew rewş pêşxistin. Her wusa, wê çawa pêşîya nîqaşên li ser pirsgirêka kurd bigrin, CHP´ê bi wê re weke ku hatîya bierk kirin.

CHP´, di qada navnetewî de jî andamê ´**sosyalist enternasyonalê**´ ya. Di bin banê vê sazîya navnetewî de jî, wê çawa pêşîya kurdan bigrê, CHP´ê di nava hewldanê de ya. Herî dawî di 28-29 mijdare 2015´an de di civîna sosyalist enternasyonalê a li Angola de jî, li hemberî partîya kurd PYD´ê di nava hewldanê de ya. Bo ku partîya kurd PYD´ê nebê andamê sosyalist enternasyonalê, her rêyê bikardihênin. Her wusa, li ser navê CHP Umut Oran ku li wir a, heta ji wan tên, wê dijberîyê li hemberî partîya kurd didina nîşandin.

Di her civînên ku di wê de bahse partîya kurd PYD´ê hatîya kirin de, li ser navê CHP´ê umut Oran, wê "şerhê" dênê li pêşîyê. Di vê çerçoveyê de wê çawa gotina ´terorê´ li hemberê kurdan bikarbênin û bi wê kurdan bi sînor bikin, CHP´ê di nava wê hewldanê de ya. Ya ku herî zêde zora mirov diçê jî, ew a ku yên ku hertimî serî li rêbazên terorê dixin ku ji yê li hemberê xwe re gotina terorê bikarbênin. Rejima tirk, bi hemû sazî û hêzên xwe re hertimî rêbazên terorê li hemberê kurdan bikarhanîya. Hertimî, teror meşandîya li ser civate kurd. Hemû rêyên xwe hanîya li ser ziman a civate kurd girtîya, zimanê wê kurdî qadaxa kirîya û ku kurdan li dijî wê tekoşîn kirina, ji wan gotina terorê hatîya bikarhanîn. Ya ku kurd dikin, ne teror a. Ya ku tê serê kurdan teror a. Ya ku li ser serê civate kurd tê meşandin teror a. Jenosidkirina civatekê terora herî mazin a. Qadaxakirina zimanê mirovekî û ankû civatekê terora herî mazin a.

Di vê pêvajoyê de jî CHP biqasî AKP´ê li hemberî kurdan di dîplomasîya dijber de ya. Ji wê zêdetir û wirdetir jî, hemû sazî û hên dewletê di vê çerçoveyê de di çerçoveyekê li dijî kurdan de di nava hewldan û

tevgerê de na. Yanî, di vê pêvajoyê de rejima tirk, hemû hêza xwe didêne li holê ku karibê kurdan bitafisêne, bêdeng bike û wan piştre bêstatû bihêlê. Hewldanên CHP´ê ên dii civînên sosyalist enternasyonalê de li hemberî kurdan ku di bin navê ´sosyal demokrat´îtitiyê de dihên kirin ji yên AKP´ê ne cudatir in. Di serî de divê ku mirov vê yekê kifş bike û werêne ser ziman.

Lê li vir, divê ku ev vê yekê jî werênina ser ziman ku tevî hemû hewldanên CHP`ê ên di çerçoveya dijminatîya kurdan de ku di civîna sosyalist enternasyonalê kir de jî nekarî ku pêşî bigrê ku PYD bibe andamê sosyalist enternasyonalê. Di 30´ mijdara 2015an de, ji navenda PYD´ê a ewropa, ragihandina ku hat kirin, di wê de dihat gotin ku `PYD´ê, weke andamê sosyalist enternasyonal bi dengên zêde hatîya herê kirin û qabûl kirin. Di her qadê de CHP´ê xwe weke ku bi navê rejimê bi erkeke erkdar kirîya ku di çerçoveya politikayên dijmatîya kurdan ên rejimê de di nava xabatê de ya. Ev jî, her wusa, di vê çerçoveyê de care din di civînên sosyalist enternasyonalê de hat ditin û kifşkirin. Dijberîya rejimê a li hemberî kurdan, di her qadê de di bertekên hemû sazî, partî û keseyetîyên ku li ser navê wê(rejimê) gotinê dibêjin de xwe dide dîyarkirin.

Ji xwe, ev zihniyeta ku ev 90 sale ku bi kurdan re şer dike. Wê çawa kurdan ji dîrokê bibe, di wê çerçoveyê de bi kurdan re şer dike. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku vê zihniyetê, ji destpêka komarê û heta roja me, komkuji hanîna serê kurdan. Ev qarakterê CHP´ê fasîzan, î ro bi AKP´ê re xwe dide dîyarkirin. Ev herdû partî jî, xwediyê gîyanekê na. Çendî ku weke ´polîsê baş û polîsê nebaş´ gotinê ji hevdû dem bi dem bo kirina sîyesetê bibêjin jî, wê ev rastiyê ne gûharêne.

CHP´ê weke partîyeka rejimê ku ji komkujiyên ku ji sale 1923´an û heta 1950 ku hatina serê kurdan berpirsîyar a. Her wusa, piştî wê re, partîyên ku hatina, hemû jî bi gîyane yek-partîtîyê meşîna û sîyeset kirina. Herî zêde, ev gîyane yek-partîtîyê, di demên AKP´ê de zêdetir derket li holê. Ku mirov li şûna navê AKP´ê navê CHP´ê bo hemû demên AKP`ê, wê di reng û awayê demên CHP´ê ên ji salên 1923an û heta 1950´î, wê di çerçoveyekê bi vê rengî de xwe bide dîyarkirin.

Li vir, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku kevneşopîya CHP, berî wê SHP û berî wê jî DSP û AP jî, wê di vê çerçoveyê de dîmenekî bidina dîyarkirin. Her wusa, di bin navê di bin navê ´sosyal demokrat´titiyekê de nîjadperestîyek tirkitiyê hertimî jîyankirina. Di vê çerçoveyê de jî hertimî, gotinên weke ´komarê´, ´wekhevî´, ´sosyal demokrat´ û hwd, bo wê bûna weke maske û makyaj ku bi wan rastîya xwe ya esasî bide vêşartin û bi mirovan bide herê kirin. Di vê çerçoveyê de çûyîna wê ya bi ser kurdan de jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Qaşo,

´rapora kurd´ amede kirîya û bi wê gotinê kirina wê ya sîyesetê jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Ev hemû sîyesetên CHP ên maske na ku xwe di bin wan de bi rastîya xwe re divêşêrê ya. Kevneşopîya çapê´ li tirkiya, di vê çerçoveyê de tenê bi gotinna ku weke maske ji van politikayên rejimê re dihê bikardihênin, ji wê nebûhûrîya. Her wusa bo vê yekê ya ku mirov nikarê, bahse kevneşopîyeka cidî ya çapê li tirkiya bike. Ya ku heta roja me jî, hatîya pêşxistin, bi bandûra tevger û tekoşîna kurd pêşketîya. Ew jî, li hêtê nîjadpestiya partîyên weke CHP´ê ku xwe weke ´sosyal demokrat´ didina nîşandin alîqî û lawaz ma.

Î ro, ti partîyên ku li tirkiya û bi teybetî jî li rojhilat giştî, perspektifeka wan ya ku bo xalkên herêmê ku bi hevdû re bijîn tûna ya. Partîyên ku rejimên herêmê ên weke tirkiya ku di ne çareserkirina pirsgirêka kurd de isrer dikin û hemû hewldanên bo çareserkirina pirsgirêka kurd û bo civate kurd bi gotina ´terorê´ re dikin ku werênina ser ziman, tenê bi wan re heya. Di aslê xwe de di vê dijbarîya CHP`ê de mirov dikarê politikayên rejimê ên 90 sal bixwêne. Di vê çerçoveyê de çûna bi ser kurdan de. Her wusa, pêşketina kurdan, ku li deverek din jî bê, li dijî wê disekin in. Her wusa, li rojavayê kurdistanê partîya kurd PYD´ê ku sîyesetê dike, ji ber ku ew tekoşînê bo maf û azadîya civate kurd dike, wê jî dikin bi gotina terorê re li rex hevdû bidina nîşandin û werênina ser ziman. Hewldanên kriminalize kirinê ku CHP û AKP car bi car weke hevdû dikin û car bi car jî di şêwayna cuda dikin, di armancakê de dihên kirin.

Ku mijar dibê mijar weke ku pêşîyên me kurdan gotina ´sa pêl dûvê sa nakê.´. ku mijar dibê kurd, ne AKP´ê ji CHP´ê cudatira û ne jî CHP ji AKP´ê cudatira. Hemû jî, kurdan ji xwe re bi heman rengê û awayê weke ´dijmin´ dibînin. Nîşanaka vê jî, şerê AKP´ê li hemberî civate kurd û hewldanên dîplomatîkî yên wê bi wê re jî yên CHP`ê weke ku di sosyalist enternasyonalê de li dijî kurdan dide nîşandin a. Lê tevî hemû dîplomasîya CHP´ê a di bin banê sosyalist enternasyonalê a li hemberî kurdan de jî, bi serneket û PYD bûya andamê sosyalist enternasyonalê. Bûyîna PYD´ê andamê sosyalist enternasyonalê, li hemû kurdistanîyan û xalkên herêmê pîroz bê:...

...

**Rewşa pênaberkirina kurdistanîyan ji rojava li Tirkiya û hewldana weke ´kozekî´ ji aliyê tirkiya ve li hemberî welatên Ewropa bikarhanîna wê**?

Li vir, di serî de divê ku mirov rastîya pênaberên ji Sûrî û rojava hinekî li ser wan rawastihê. Ev rewşa wan, wê piştre, pirr zêde hem li rojava û li tirkiya bê mijara nîqaşan. Her wusa, pênaberî çawa, weke kozekî dihê bikarhanîn ji aliyê tirkiya ve di Gera Angele Merkel a li Tirkiya û di hevdîtina wê ya bi T. Ardogan re hat dîtin. Her wusa, di vê çerçoveyê de, bi zor û alikarîya Îstîhbarate tirkiya, gelek mirov dikirina kiştan û di şandina li yewnanistanê. Gelek ji wan kiştan, noqî avê jî bûn û di ancama wê de bi dahan mirovan jîyane xwe ji dest dan. Her wusa, di hevdîtina Angele Merkel û T. Ardogan de Merkel xwest ku Sûrî û rojavayî(´rojavayê kurdistanê´) li tirkiya werina ragirtin di berdêla alikarîya aborî de. Di vê çerçoveyê de peyman jî mohrkirin.

Lê tirkiya, dixwest ku di şerê xwe yê bi kurdan re de jî alikariyê bi wê bistêne. Di vê çerçoveyê de zor dida rayadarên Ewropî. Yanî jî, ji wan re digot ku ”ezê pênaberan bişênima li rojava.” Bi vê rengê, weke ´şantajekê´ bikardihanî. Her wusa, di vê çerçoveyê de li ser jîyane mirovan re bazarî dihat kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku pêlek din ya dîyasporîya kurdan li ewropa bi destê tirkiya dihat pêşxistin. Her wusa, di vê çerçoveyê de jî divê ku mirov li mijarê binerê. Tirkiya, li bakûrê kurdistanê, ev politikaya bêmirovkirina herêmê hertimî meşand. Di ancama wê de bi sed hezaran kurd, mecbûr mana ku goçî welatên ewropa bikin. Lê di vê pêvajoya hêrîşên i rojava de, ev politika, bi awayekî bêwijdanî pirr bi xadarî hat bikarhanîn. Ser 2 û ankû 3 milyonan re kurd, bi darêzorê ên hêzên DAÎŞ û tirkiya dana goçberkirin li nava tirkiya. Piştre jî, li ser wê re temenê politikayêa bikarhanîna pênaberan weke ´şantajê´ bikarhanîn.

Piştre pêl bi pêl, şandina li ewropa. Mirovên ku hatina şandin, pirranîyan jî, di rêyan de jîyane xwe ji dest dan. Her wusa di vê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku Tirkiya, bi rêya pênaberan çeteyên DAÎŞ´ê dişandina welatên ewropa ku bûyarên terorê bikin. Ev jî, rengekî din, xortkirina vê koza pêneberan û biharhanîna wê bû. Her wusa, tirkiya ji vê jî sûdgirt û rewşa pênaberan weke koz bikarhanî li dijî ewropa. Ji ber ku politikaya demê a rejima tirk li ser DAÎŞê re bû, kozên xwe di vê çerçoveyê de li ser wê re diafirand. Divê çerçoveyê de hem weke ´tehdîdekê´ û ´şantejekê´ bikarhanîna rewşa pênaberan ji aliyê tirkiya ve li hemberî rojava(´ewropa´), wê bandûra wê li rewşa şerê wê(´rejima tirk´) yê bi kurdan re jî bike. Tirkiya, di serî de dixwest ku ji vê şentaj û tehdîdê sûdwergirê û alikariyê ji şerê xwe yê li dijî civate kurd dimeşênê de ji ewropa û navendên wê bigrê. Komkujiya li firansa, di vê çerçoveyê de weke komkujiyeka ku di vê çerçoveyê de bi şerê rejima tirk ê bi kurdan re jî werêne ser ziman. Çend ku li ser DAÎŞ û cîhadistan re ew nîqaş tên kirin jî, lê di aslê xwe de ev nîqaş, tememîya rastiyê nayênina ser ziman. Tenê aliyekî rastiyê û nîvê wê tênina ser ziman. Alî û nîvê wê yê din jî, di vê çerçoveyê de weke ali û nîvê esasî divê ku mirov bi şerê rejima tirk ê bi kurdan re werêne ser ziman. Her wusa, komkujiyên ku li Firansa di 14´ê mijdarê de bûn, aliyekî wan bi vî rengî jî bi tirkiya vê girêdayî ya li ser **DAÎŞ´ê re**.

.. Di çapameniyê de biqasî ku tê gotin li gelek deveran komkuji hatina kirin. Û nûçeyên ku tên ji Fransa û Parîs´ê ew in ku gelek mirov birindarbûna û jîyane xwe ji dest dana. Di serî de dibêjim serê gelek firansa û mirovatiyê sax bê. Yên ku hêrîşên bi vî rengî dikarin bikin, di serî de nesîbê xwe ji mirovatiyê negirtina. Nikarin bahse nirxên mirovatiyê bi navê xwe re bikin.

Gelo di roja ku kurdan şengalê ji destê çeteyên DAÎŞ rizgarkir de kirina van hêrîşên hov ên li Parîs´ê kî dikarê weke rasthatinakê werêne ser ziman? Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku li kûderê bê bila bibe, hêrîşên bi vî rengê divê ku newina herêkirin û divê ku her mirovê ku ji xwe re dibêjê ez mirov im û divê ku bertekên xwe bidina nîşandin. Di serî de komên çete ên weke DAÎŞ, Boko-haram, El-şebeb, Taliban û hwd, hemû rêxistinên bi vî rengî ên kujar ku li serê mirovatiyê kirina bela, divê ku mirovatî li hemberî hemûyan bi yekdengî bisekinê.

Herî zêde kurd, di vê demê de ji destê van çeteyên hov û kujar êş kişandina. Li bajarên kurdistanê ên weke Kobanê û Şengalê û hwd, van çeteyên hov û kujar bi hezaran kurd qatilkirin. Her wusa, heta roja me jî, li şengalê jin û keçên êzîdî ku hatina berhevkirin û weke "koleyan" ji aliyê ve çeteyên kujar ve hatina firotin, cihan di derbarê wan de diaxivê. Ev bo

kurdan û mirovatiyê weke êşa sedsalê mirov dikarê wê werêne ser ziman. Rejimên weke tirkiya ku bo ku metingerîya xwe li ser civatan ku ava bikin, alikariyê didina van çeteyên kujar, ji ne ji wan ba, wê wilqasî ev çete nekarîban bijîyan. Ne bi alikarîya tirkiya ba, wê li DAÎŞ li rojavayê kurdistanê û Sûrî û başûrê kurdistanê û Iraqî, wilqasî mazin nebûba û herêmên weke şengal û musilê nekarîba ku bikira bindestl xwe de û ew komkuji li wan bikira.

Di serî de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku çeteyên DAÎŞ û komên çete ên weke wê li deverên cûr bi cûr ên cihanê li serê mirovatiyê kirina bela, heta roja me komkujiyên mazin kirina. Di dema hêrîşên çeteyên DAÎŞ ên li kobanê û şengalê de, bi deh hezaran çete li ser tirkiya re hatina bûhûrandin li van herêman. Lê çi rasthatina ku dema ku kurdan û hêzên kurdan ve herêmên xwe ji çeteyên çeteyên DAÎŞ´ê rizgarkirin û ew ji herêmê paqij kirin, hemû çeteyên ku komkuji pêkhanîn hatina windakirin. Di çapameniya kurd de gelek caran hat ser ziman ku ew ´pêlên pênaberan ên li welatên ewropa ku dibin´, ku li ser tirkiya re dibin, di nava wan pênaberan de çete tên veşartin û tên şandin li welatên ewropa. Çiqasî ev rast û ankû ne rast a, ez nizanim. Lê çapameniya kurd, gelek dimênên bi vî rengî li ser Pîrsûsê re weşandin. Bo vê yekê, di serî de ya ku mirov bibêje ku hemû pênaberên ku ji tirkiya hatina şandin welatên din ên ewropa, divê ku di binçav de werina hiştin.

Î ro jî gelê kurd dipirsê, ku ewqas çeteyên kujar ku li ser tirkiya hatina şandin li rojava çûna kûderê?

Pirsgirêka terorê, li hemû cihanê li ser serê civaten weke tehdîteka mazin xwe dide dîyarkirin. Di serî de rejimên ku hê metingerîyê li ser hin civatna weke civate kurd ku dimeşênin, weke rejimên ku herî zêde piştgirîyê didina pêşxistin û domandina wê terorê. Ji ber ku herî zêde şerê ku li hemberî wan civatan dimeşênin, di bin navê "terorê" de dikin bi nav bikin û her wusa manipûlasyonê bi terorê pêş dixin. Bi terorê rojevê diigûharênin. Rejima tirk, hertimî, şerê xwe yê ku bi wê jenosîdkirina civate kurd pêş dixe, di bin maskeya "tekoşîna bi tererê re" de dike. Di vê çerçoveyê de diçê bi ser kurdan de.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku salix nekirina gotina terorê biawayekî rejimên weke ên rejima tirk ku nikaribin şerê xwe yên metingerî ê bi civatên weke civate kurd re bi wê salix dikin jî, dibê temenê domandina wê terorîsmê li ser serê mirovatiyê. Gotina terorê, weke gotina "dîtbar" dimênê. Di serî de terorîsme ku ol ji wê re weke maske dihê bikarhanîn, weke terorîsme herî xaternek mirov dikarê werêne ser ziman.

Bi terora DAÎŞ´ê re li rojhilat, teror weke rêyeka rejimên herêmê a xwe

serdestkirinê dihê bikarhanîn. Ev çeteyên kujar ku olê xwe ji re weke maske bikardihênin, ti kesek li ser wê lêkolîn nakê ku çawa hatina pêşxistin. Kîjan rejim piştgiriyê dide wan, ti kesek li ser wan ne axivê. Her wusa, rejimên weke tirkiya ku alikarîyek mazin didina çeteyên weken ên DAÎŞ´ê bo ku hêrîşan li civate kurd bike, ti kesek zêde nayênê rojevê. Ji ber ku tirkiya andamê NATO ya, ti kesek kirinên wê nayêne rojevê. Di piretikê de ev kirin hemû dibin weke kirinna ku piştgiriyê didina vê terore ku li ser serê mirovatiyê bûya bela. ..

Teror, weke kirineke ku hertimî bi hemû aliyên wê ve were şermazar kirin a. Teror, bi alikarîya rejimên ku pişgiriyê di bin navên cûr bi cûr de didinê de bûya weke tehdîteke mazin li ser jîyane mirovan û hebûna civatan bixwe jî. Minaqe vê jî, hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ên li kobanê û şengalê na.

Li vir, divê ku em dûbare vê jî werênina ser ziman ku di roja ku şengal ji destê çeteyên DAÎŞê hat rizgarkirin de kirina van hêrîşên li parîsê, weke hêrîşna şikandina moralê mirovan a bi wê serkevtina li şengalê a li hemberê terorîsmê ya. Terorîsmê û rejimên ku piştgirîyê didina terorîsmê, derbeyeka mazin pêşî li kobanê û piştre jî li şengalê, xwarin. Bi hêrîşên bi vî rengî terorîsm û rejimên piştgirîyê didinê de dixwezin ku moralê mirovan xira bikin û wan bidina tirsandin. Ya ku weke li hemû mirovên bi wijdan û ku ji xwe re dibêjê ez mirov im dike jî, ew a ku bêhtirî dengê xwe yê bi mirovatî li hemberî van hêrîşên hov û bêahlaq bikina yek. Divê ku mirov bidina nîşandin ku mirovatî, ji yên ku van hêrîşên kujar û bêhlaq dikin maztir a.

Teror, li kobanê têkçû, li şengalê têkçû, wê li parîsê jî têkherê. Pêşaroja terorê û rejimên piştgirîyê didinê de wê nebê. Em carek din têkbirina terorê li şengalê û rizgarkirina şengalê pîroz dikin û hêrîşên li parîsê jî li ser navê mirovatîyê şermazar dikin.

...

**Rewşa pênaberan û şandina wan ya mirinê.**

Di serî de divê ku mirov werêne ser ziman ku her roj ku rojek namêne ku nûçeya ´noqî kiştiyeka pênaberan´ ku newê nîn a. Her wusa, pirranîya wan jî, pênaberan ku ji tirkiya dikin ku derbasî yewnanîstanê dibin in. Her wusa divê ku mirov vê jî werêne ser ziman ku ev mirovên ku bi kiştiyan dihên noqî avê kirin jî, berî ku mirovna tirk wan bişênin her yekê ji wan herî kêm di nava 5 û 10 hezaran de euro ji wan distênê. Yanî, dema ku wan dişênina mirinê jî weke ku wan dişelihênin û dişênin.

Mirovên diçina mirinê, pirranîya wan, çend ku weke ´sûrîyî´ werina ser ziman jî, kurdên rojava na. Bi teybetî jî, rayadarên tirk, van dinaqênin û dişênin. Her wusa, gelek hindik yên ku ne kurd in dişênin. Ev jî, weke politikayaka bêmirovkirina herêmên kurdan, dihê pêşxistin. Di vê çerçoveyê

de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku pênaberîya ku dihê pêşxistin, divê ku mirov di çerçoveya plnagerî û programaka ku bi wê dihê pêşxistin, bahse wê bike. Di vê çerçoveyê de ku mirov, gotina ´dîyasporîya kurd´ bi wê re werêne ser ziman, wê rast bê. Her wusa di vê çerçoveyê de bi awayekî sîstematîkî dîyasporîya kurd dihê pêşxistin.

Mirovên ku weke tacîrîya mirov dikin, li tirkiya, rayadarên tirk, wan nas dikin. Her wusa, di bin kontrola rayadarên tirk de ev dihê pêşxistin. Heta ku gelek nûçeyên ku ji nava wan mirovên ku hatina şandin ku dihên ser ziman, di wan de dihê gotin ku saloxgerîya tirkîya wê pêşdixe.

Di destpêka hêrîşên DAÎŞê ên li rojava û kobanê de, bi teybetî, hêrîşên dana goçberkirinê li herêmên kurdan kirin. Li herêmên weke girê-sipî û hwd, bi awayekî vekirî, wê çawa mirovan bidina goçberkirin, di wê çerçoveyê de hêrîşên tirsandinê dikirin. Piştî ku hêrîşên li kobanê destpêkirin û pê de, êdî bi sed-hezaran mirov dana goçberkirin. Ev mirovên ku hatina goçberkirin, tirkiya pêşî xwest ku wan bi gelek rengên din bikarbênê. Ji wan, pêşî xwest ku komên çekdar bide pêşxistin û di nava komên cihadîstan de bê û ankû di nava komên din ên ku di bin kontrola wê de bê, bide şerkirin. Gelek mirov, di vê çerçoveyê de ji aliyê saziyên dewletê ve bi gotina ´ol û bawerîyê´ hatina xapandin û şandina mirinê. Lê yên ku li şûna mana jî, bi vî rengî kirina kiştîyên mirinê de û şandina mirinê de. Her çend ku di çapameniya tirk de weke ´rêwîtîya li hêvîyê´ bahse wê hewldana çûyîna wan ya li ewropa dihê kirin jî, lê li vir di derbarê ku kî wê ti tiştê dihêne serê wan mirovan win ti nûçe û ankû nivîsandinê nabînin. Her wusa, ti kesek jî, heta roja me, di wê rewşê de ne hatîya girtin. Yên ku weke çend mirovan hatina girtin jî, ew bêceza hatina hiştin.

Her wusa li vir, divê ku vê yekê jî werêne ser ziman ku piştî hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kobanê û pê de, rejima tirk ji nû ve bi konsepta şer pêvajoya hêrîşên li kurdan bi rêxistin kir û temenê wê afirand. Di vê çerçoveyê de wî şerê ku bi kurdan re dike, wê çawa alikariyê ji wê re bistêne, di wê çerçoveyê de politikayên xwe pêşxistin. Her wusa, kirina komkujiya Pîrsûsê û xistina balafira şer a Rûsya û piştre banga civînê li NATO kirinê, di vê çerçoveyê de weke politikayna ku bi wan dixwestin ku temenê şerê bi kurdan re bidina domandin bûn. Her wusa, rewşa pênaberên ku Tirkiya ew bi alikarîya DAÎŞ´ê berhevkirina, li ser wan re bidest pêşxistina politikaya şentaj kir. Weke kozekî pêşxistina pênaberan li hemberî ewropa, bo ku alikarîyê ji şerê xwe yê bi kurdan re bistêne, wê bi wê re carek din were rojevê. Her wusa, di gera Serokwezirê Alman Angela Merkel ya li tirkiya de ev rewş bi gelek aliyên wê re hat rojevê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku tirkiya, rewşa pênaberan di vê çerçoveyê de weke

politikaya şer pêşxist.

Her Politikaya pênaberîyê, di vê çerçoveyê de ji gelek aliyan ve tirkiya ew bikarhanî. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di nava wan pênaberên ku dişandina li ewropa de gelek andamên DAÎŞ´ê jî di vêşartin û di şandina li ewropa. Wan terorîstên ku şandina li ewropa, bi wê re sazûmana civakî ya welatên ewropî kirina bin tehdîd û şantajê de. Komkujiya li Parîsê a hov ku hat kirin û di wê de nêzî 200 mirovî jîyane xwe ji dest dan, wê weke komkujiyeka vê zihniyetê bê. Her wusa, li ser vê rewşa komkujiya li Parîsê de, tirkiya koza pênaberîyê li hemberî ewropîyan ji gelek aliyan ve bi wê bikarhanî. Di vê çerçoveyê de gelek dijberî jî di nava rayagiştî a ewropa de li hemberê pênaberan dana çêkirin.

Ev rewş hemû, rewşna ku di çerçoveya politikaya bikarhanîna rewşa pênaberîyê weke kozekî de ku hatina pêşxistin in. Li ser wê re jî, êdî ji aliyê aborî, sîyesî û dîplomatîkî û hwd ve alikarî û piştgirîyê dixwezin.

Pênaberî, di vê çerçoveyê de bi çi zihniyetê ku dihê pêşxistin, ji gelek aliyan ve mirov dikarê li ser wê bisekinê û werêne ser ziman. Her wusa, di serî de di çerçoveya tûnakirina civatekê û ankû ji dîrokê birinê de, bi awayê dîyaspora dihê pêşxistin. Pêvajoya şerê rejima tirk ê bi kurdan re, bi wê re di ahengekê de goçberkirin hertimî hatîya pêşxistin. Ji bakûrê kurdistanê, rejima tirk, heta roja me, ser 9 milyonan re kurd ji cih û warên wan dana goçberkirin. Ser 5 hezaran re gûndên gûndên kurdan hatina telankirin, vêrankirin û şawitandin. Van rewşan jî, divê ku miirov di çerçoveya politikaya goçberkirina kurdan a ji herêmên wan a rejima tirk ve werêne ser ziman.

Ji şengalê û rojava, di pêvajoya hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan de bi sed hezaran kurd ji cih û warên wan hatina kirin. Her wusa bo ku ev mirov ne vegerihina cih û warên xwe, rejima tirk, politikaya pênaberîyê bi wan pêşxist. Kurdên ku ji rojava dana goçberkirin, dema ku dikin ku vegerihina li herêmên xwe hêrîşan dibina ser wan. Bi teybetî, herêmên sivîlan dikina bin hêrîşan de. Hêrîşên DAÎŞ´ê ku bi alikarîya tirkiya li rojava û şenglê û herêmên wan bûn, bi teybetî li herêmên sivîlan dihatina kirin. Hêrîşên goçberkirinê bûn. Wê çawa çavtirsandinê li ser sivîlan bidina çêkirin, di vê çerçoveyê de hêrîş dikirin. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku çapamenî jî, di çerçoveyê de pirr zêde bikarhanîn. Di destpêka hêrîşan de vîdîyoyên ku wan bi destê çeteyên çêdikirin û di weşandin, bi wan armanca pêşî ew bû ku wê çawa mirovan ji herêmê bidina goçberkirin.

Rejimên herêmê ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin ên weke tirkiya û hwd, di vê çerçoveyê de politikaya pênaberîyê weke politikayaka valakirina herêmên kurdan ji mirovan hertimî bikarhanîna. Ji salên 1980´î û

pê de nof bi nof, mirov ji herêmê hatina goçberkirin ji welatên ewropî.

Pirsgirêka pênaberîyê, di vê çerçoveyê de dema ku mirov bi navê kurdan re hilde li dest, divê ku mirov bi rewşa wan ya tekoşînê û xwestina wan ya statûya wan re werênina ser ziman. Rejimên herêmê li hemberî statûya wan in. Bo vê yekê, politikaya ji hevdû belavkirinê hertimî di vê çerçoveyê de pêşxistina. Goçberî, di vê çerçoveyê de weke politikayaka ku di temenê vê rewşê de hatîya bikarhanîn a. Di vê çerçoveyê de dîyaspora kurdan li rojava(´ewropa´) hatîya pêşxistin.

Her roj nûçeyên ´kiştîyên pênaberan ku noqî avê dibin´ ji herêmê tê. Di wan de jî, bi dehan jin, zaro û mirov jîyane xwe ji dest didin. Rewşa zaroyê kurd ku navê wî Alan kurdî ku laşê wî yê piçûk li parava bahre bodrumê xistibû bû, weke dagereka vê pênaberîya ku dihê pêşxistin, ket rojeva cîhanê de. Lê piştre jî, mirinên di kiştîyên ku tişî pênaber û ku noqî avê tên kirin dawî li wan ne hat. Gelek pênaberên ku axiftinên wan weke nûçe hatina nivîsandin jî di çapameniyê de, di wan de dibêjin ku ´yên ku em pereyan didina wan ku me bênina ewropa, di nîvê avê de kiştan noqî avê dikin. Yanî, gelek ji wan kiştan, bi zanebûnî di çerçoveya politikaya pênaberîyê û bikarhanîna wê de dihên noqkirin.

Dema ku mirov pênaberîyê ji politikayên rejimên herêmê cûda hilde li dest, wê zêde baş newê fahm kirin. Ya ku wê pêş dixe û ankû dide pêşxistin, ew ew politikayên rejimên herêmê na. Her wusa, divê ku mirov pêşxistina wê pênaberîyê, weke ancamaka rastîya zihniyeta wan jî werêne ser ziman.

**Şengal û rizgarkirina wê û rewşa piştî wê li herêmê. ..**

Nûçeyên ku ji şengalê tên, ew in ku hêzên kurd bi hevdû re di nava ahengîyekê de dikin ku şengalê ji destê çeteyên DAÎŞê ku rejima tirk alikarîyê dide wan xilas bike. Bêgûman ku pirsgirêkên di nava hêz û partîyên kurd de nebûba, wê rizgarkirina şengalê jî zûtirîn bihata kirin.

Di serî de divê ku mirov vê yekê bibêje ku kurd ji her aliyê ve ku mirov li dinarê di pêvajoyek giring û dîrokî de di bûhûrin. Herî zêde di vê demê de pêwîstîya wan bi yekîtîyek civatî ya kurdistanî heya. Ji vê demê û kêlîkê û pê de, çi nêzîkatîyên ku li ser partîyan re werina dayîn nîşandin, wê weke derbeyek li civate kurd û pêşaroja wê bixwe jî bê. Di serî de divê hemû hêzên kurd vê yekê fahm bikin. Di pêvajoyên bûhûrî de di demên ku DAÎŞ´ê hêrîşî rojava kir de, hat ditin ku divê ku yekîtîyek kurdistanî a hevbeş dikarê xilasîya wan bi xwe re werêne. Wusa jî bû. Heta ku hêzên

kurd, weke kêlîkekê jî bê, heta ku pirsgirêkên xwe ne danîna li aliyekî û bi hevdû re neçûna çeperan û bi hevdû re tekoşîna azadîya kurdistanê nedan, nekarîn ku serbikevin.

Di vê demê de jî ev wusa ya. Di demên pêş de wê zêdetirî pêwîstî bi yekîtîyek civatî ya kurdistanî wê hebe. Bo vê yekê, girînga ku sîyesete kurd, zimanê dijberîyê ji nava xwe dênê aliyekî bi hevdû re di çeçroveya civatîtîya kurdistanî de gotinên xwe bibêjin û bi hevdû re tev bigerihin. Ya ku wê di vê demê de û ji vê demê û pê de ji wan bide qizinckirin jî, wê ev bê. Hat ditin ku rejima tirk, çendî ku di çeçroveyek dijbarîya kurd û civate kurd de tevdigerihê. Lê tevî wê jî, rejima tirk, li ser PDK´ê re dixwezê ku dubendiyê bike nava civate kurd û lawazîyê di tekoşîna kurdan a li hemberî çeteyên DAÎŞ´ê de valahiyê çê bike. Divê ku kurdên başûr, fahm bikin ku dema ku hêrîşek hovane weke ya DAÎŞ´ê li wan were kirin, wê ne rejima tirk û ankû ya îranê wê were alikarîya wan. Wê dîsa birayên wan kurd bin. Ev bo beşên din ên kurdistanê jî, wê wusa bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku çendî ku kurd yekbin û bi hevdû re tevbigerihin, wê zêdetirî qizinc bikin.

Hemû ger û zîyeretên Dawutoglu û Sînîrlioglu ên li başûrê kurdistanê, bi armanca çêkirina dubendîyê di nava kurdan de ya. Di pêvajoya mohrkirina ´peymane hewlêrê´ ku li başûrê Kurdistanê bû de û ku di nava kurdên rojavayî de hat çêkirin, ev yek bi awayekî vekirî hat ditin. Di cih de di wê demê de Dawutoglu çûbû bû başûrê kurdistanê û bi hinek kurdan re hevdîtin çêkirin û nîfaqa pêşî wî kiribû nava kurdên ku peymana hewlêrê ku mohrkiribûn. Piştre jî, ji xwe re bi sîyeseteke ku kirin, hertimî hewldan ku wê peymanê li ser ENKS´ê re vala derxin û derxistin jî.

Di pêvajoya ku di wê de amedekarî bo li darxistina kongira netewî a kurd de jî heman rewş bû. Bi amedekarîyan kongira hat li ber lidarxistinê. Pêşî T. Ardogan, kurdên başûrî "tehdîd" kirin û got ku "wê ew zirerê ji wê bibînin, Soz dana me, .." Piştre jî, Nêçîrwan Berzanî çû Anqarê û dema ku vegerîya li darxistina kongira netewî hat taloqkirin li demek nedîyar.

Ji van pêvajoyan, gelek ancamên dîrokî ên ku sîyesetmederên kurd divê ku derxin hena. Divê ku van kirin û kiryaran baş bixwênin. Her wusa, divê ku sîyeseteka li ser esasê parastina civate kurd bikin. Her wusa, li şûna bêtifaqetîyê, divê ku roj bi roj tifaqa nava xwe pêş bixin. Rejima tirk, hertimî li ser wan nakokî û bêtifaqetîyên ku di nava sîyeseta kurd de çêkirina li nava civate kurd leyistîya. Her wusa, ku î ro, sîyeseta hn partîyên kurd ên başûrî nêzî ya rejima tirk ku di van rojên dîrokî de li sîilwan û farqînê komkujiyan dike û têne serê kurdan, divê ku mirov hinekî di vê çerçoveyê de wê sîyesetê bike berlêpirsînê de. Heman tirk, bo hin komkên li rojav jî

mirov divê ku werêne ser ziman.

Kurd, di vê demê de, di demek dîrokî de di bûhûrîn. Herî zêde divê ku di vê demê de di yekîtîyekê de bin. Divê ku hemû hêzên kurdistanî, bihevdû re di ahengekê de bin û di yekîtîyekê de bin. Dem bo wan ne dema ku gotinên dijber li dijî hevdû bibêjin a. Bi sîyeseta ku bikin, wê yan civate xwe di vê rewşa wê ya ku î ro di wê de ya wê bihêlin û yan jî wê derxistina başîyê. Di serî de, di vê çerçoveyê de divê ku nêzîk bibin. Bi hevdû re rizgarkirin û parastina şengalê, divê ku bikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku di çerçoveya koordînasjonek netewî a kurdistanî de bi hevdû re tevbigerihin û êdî dernekevina dervî wê. Pirensib û rêzikên netewî ên kurdistanî, divê ku bo wan xate sor bin. Kurdên ku li ser hemû komkuji û trejedîya ku li başûr û şengalê û rojava û kobanê û piştre ku î ro li bakûrê kurdistanê bi destê rejima tirk dihê serê civate kurd ku nebînin û ji wê fêrê dernexin, divê ku bi navê xwe re bahse mirovatiyê jî nekin.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê bibêje ku destkevtiyên kurdistaniyan ku hene, tenê bi yekîtîyekê dikarin werina parastin û pêşxistin. Bo vê yekê, divê ku hemû hêz û partîyên kurd, vê yekê bibînin bi gîyane netewîya kurd, tevbigerihin û gavên xwe biavêjin. Ya ku wê, ji wan re û ji civate wan re pêşarojê jî werêne wê ev bê. Rizgarkirina şengalê, weke ya kobanê, divê ku weke gavek giring a yekîtîya civate kurd were dîtin û di vê çerçoveyê de were xwendin. Her wusa, divê ku kurd, kobanê û şengalê, weke dagera yekîtî û tifaqa kurdistaniyan bibînin û nêz bibin. Herî zêde di vê demê de hemû kurd, di çerçoveya nêzîkatîya wan civatî de mihtacîya wan ji hevdû heya û divê ku dest bidina hevdû. Bo vê yekê jî, divê ku li dora civate xwe û kurdistanê, gotina xwe bibêjin û tifaqa xwe çêbikin. Pêvajoya hêrîşên li kobanê û piştre berxwedana ku di wê de hatî li darxistin, bû temenê gîyaneka berxwedanê a kurdistanê. Heman tişt li şengalê jî wusa ya.

Di vê dema ku kurdistanîyan li şengalê bahse rizgarkirina şengalê kirin de rejima tirk bidest hêrîşên xadar li bakûrê kurdistanê dike. Divê ku mirov li bende bê ku bo ku têkilîyên rojava û başûrê kurdistanê ji hevdû cuda bike, rejima tirk, wê li ser partîyên kurd re bike ku sîyesetê bike. Her wusa, bo vê yekê ya ku berî rizgarkirina şengalê dana nîqaşkirin ku divê ku "YPG ji şengalê derkeve." Bo ku têkilîya başûr û rojava ji hevdû qût bikin, wê dikin. Yanî, ev gotinên bi vî rengî, weke gotinna ku wê di demên pêş de jî li ser wan di vê temenê de sîyesetê bikin bin. Her wusa, di nava şengalê û rojava de jî, hin "hendekna" dênin. Wê, sîyeseta şikandina tifaqa kurdan, di vê çerçoveyê de piştî rizgarkirina şengalê jî bidina domandin. Divê ku mirov van rastîyan di serî de kifş bike û fahm bike.

Şengal, dema ku were rizgarkirin, wê bê herêmek tampon di nava rojava

û başûr de. Her wusa, ew herêma tampon ku rejima tirk nekarî ku di nava rojava de li herêmên weke ezaz û cerablusê çê bike, wê bike ku li ser birrîna têkilîyên başûr û rojava re li şengalê bike. Divê ku mirov vê yekê jî, di serî de werêne ser ziman. Bo vê yekê ya ku ji nûha de hebûûna YPGê li şengalê dikina bernîqaşê de.

Herêma şengalê, bi rizgarkirina wê re, wê derîyekî giring di nava başûr û rojava de jî ve bibe. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman. Şengal û rizgarkirina wê, pirr giringa ku mirov wê fahm bikê. Her wusa rizgarkirina şengalê, pirr dereng maya. Divîyabû ku pirr zûtirîn bûba. Heta roja me, mayîna çeteyên DAÎŞ´ê li şengalê, bûya weke xateka qûtkirina têkilîyên kurdan jî. Rejima tirk, ev hebûna çeteyên DAÎŞê li şengalê, weke ya çeteyên DAÎŞê a li ezaz û cerablusê hildaya li dest û kirîya ku bikarbêne. Çendî ku ezaz û cerablus, xaterîyê li ser giştîya rojava çê dike, biheman rengî ne rizgarkirina şengalê jî bo başûr heman weyn leyistîya. Bo vê yekê, rizgarkirina van herêman ji çeteyên DAÎŞ´ê giringa ku bibê.

Herêma şengalê, weke herêmek navend a di nava rojava û başûr de jî dikarê weyn bileyizê. Mirov divê ku vê yekê jî, bi wê re werêne ser ziman. Bo vê yekê, çendî ku bi rizgarkirina wê re şengalê di nava rêveberîya kurdistanê û bi teybetîyên xwe yên civatî û bawerîyî ku xwe birêxistinkiriya, wê giring bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov li şengaê binerê. Rizgarkirina şengalê giring a. Rizgarkirina şengalê wê, şikandina ´ambargoya li ser rojava´ jî bê. Ji xwe bo vê yekê ya, ku rejima tirk, weke ku çawa ku bi derîyê sêmalka û hwd, bend di nava kurdan de dana kişandin, wê bikin ku li şengalê jî, vê bikin. Her çend ku temenê wê zêde tûna jî bê, wê biceribênin. Ji ber ku rejima tirk, li şûna çareserkirina pirsgirêka kurd, ne çareserkirin û înkare kurd dike ku ji xwe re bike sîyeset û li ser wê re herê bi ser kurdan de. Hemû hêrîşên rejima tirk ên li bajarên bakûrê kurdistanên ên weke Cizira bota, gever, silopî, nisêbîn, Silwan û Farqînê, vê rastiyê didin ravakirin û radixin li berçav. Hêrîşên rejima tirk ên li ser Silwan û ankû Farqînê, rengê sîyeseta wan ya li dijî kurdan a di demên pêşde jî radixe li berçav.

Ya ku wê pêvajoyê ji kurdan re bide qizinckirin, yekîtîya. Bi hedû re divê ku welatê xwe Azad bikin. BIqasî ku pêşketina başûrê kurdistanê ku li beşên din ên kurdistanê bidina pêşxistin, bi heman rengî pêşketina li beşên din ên li kurdistanê jî divê ku li başûrê kurdistanê, were pêşxistin. Bi vî rengî, yekîtîya civate kurd û azadîya wê, wê were. Têgihiştina civatî, wê zêdetirî temenê pêşketina azadîya civatî û tekoşîna wê ya bi nirxên civatî bê. Rizgarkirina rojavayê kurdistanê, wê bo başûrê kurdistanê jî dîrokî û hêza parastinê ya. Di vê çerçoveyê de di her warê de li ser perwerde û jîyane

civatî re jî û her wusa bi sîyesetî jî divê ku di yekîtîyekê de bi hevdû re bin û di parvekirinaka bi hevdû re de bin. Bi vî rengî, wê qatkirina kurdistanê ji holê ra bikin.

.. Di destpêkê de divê ku mirov rizgarkirina şengalê ji aliyê hêzên kurd HPG; YBŞ û pêşmergeyan ve pîroz bikin. Di serî de ev rewş dide nîşandin ku hêzên kurd bi hevdû re yekbin û bi yekîtî tevbigerihin, wê çendî karibin serkevtinên mazin bidest bixin. Her wusa mirov divê ku vê yekê jî, werêne ser ziman ku dema ku hêzên kurdistanî bi hevkarî şengal rizgar kirdin.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku giringîya şengalê û rizgarkirina wê ji gelek aliyan ve mirov dikarê bahse wê bike. Her wusa, rêya çûyîna çeteyên DAÎŞ´ê a ji herêmên Iraqê ên weke musilê li rojava jî, bi awayekî hat girtin. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ev ser 7 heyvan re bû ku hinek taxên şengalê di destê şervanên kurd ên weke HPG û YBŞê de bûn. Piştre jî bi oparasyona leşkerî ku dana destpêkirin re azadkirina şengalê çêkirin. Di rojên dawî de wusa dihê ditin ku pêşmerga jî, hatina hanîn li herêmê ku tevlî rizgarkirina şengalê bibin.

Şengal, ji aliyê kurdan ve rizgarkirina wê dihê çî wateyê? Di serî de divê ku mirov ji aliyê kurdan ve di çerçoveya bersiva vê pirsê de vê pirsê bibersivênin. Ev giring a. Ji aliyê civate kurd ve giringîya wê bi tevgerîna di yekîtî û yekbûnekê de xwediyê wateyekê ya. Şengal, herêmeka dîrokî ya kurdistanê ya. Her wusa, çeteyên DAÎŞ´ê li şengalê komkujiyên mazin li şengalê kirin. Dîmênên ku di wan de bi girseyî mirovan bi jin, zarok û pîr û kalan ve ku ji şengalê di ravîn û di rêyan de na hatin. Wan dîmenan dilê her mirovê kurd û yên ku ji xwe re dibêjin ez mirovim êşand û kir qat.

Piştî wan dîmenan re hêzên kurd ên YPG xwe gihand şengalê û çîyayê şengalê, li wir, xatek parastinê pêşxist û her sivîlên ku gihiştin wir, parastin. Bi demê re bi sed hezaran ezîdî li çîyayê şengalê bûn kom. Navenda şengalê ket bin destê çeteyên DAÎŞ´ê de. Ji 3´ê tabaxa 2014´an û heta roja me ku weke 13 mijdara 2015´an wê êşê xwe da domandin. Ji wê demê û heta roja me, gelek hêzên kurd bi hevdû re ketin nava hewkariyê de û bi hevdû re şengalê rizgarkirin. Di nava van hêzan de HPG`, YBŞ, YPG, YPJ, YPJ-şengal û piştre jî pêşmerga tevlî wê pêvajoya rizgarkirina şengalê bûn. Di hundûrê vê pêvajoyê de tekoşîna li hemberî çeteyên DAÎŞ´ê doma. LI rojava jî, di vê pêvajoya ku pêvajoya azadiya şengalê hatibû destpêkirin, li rojavayê kurdistanê jî pêvajoya azadkirina Hesekê jî ji aliyê hêzên kurd ên rojava ve hatibû dayîn destpêkirin.

Hêzên kurd, di roja 13 mijdara 2015´an de hêzên kurd bi hevkarîya hevdû şengal rizgarkirin. Piştî salekê rizgarkirina şengalê, di serî de bi xwe re derengiyekê jî dide dîyarkirin. Divîyabû ku dema ku kobanê hat

rizgarkirin û pê de, ew pêvajo bêrawastandin li şengalê hatiba domandin û şengal hatiba domandin. Lê di wê de li şengalê kêmasî mabûn bû.

Rizgarkirina şengalê, divê ku mirov giring û pîroz binirxêne. Her wusa, divê ku mirov weke rizgarkirina beşeke kurdistanê werêne ser ziman. Ev serkevtin, bêgûman, keda hemû hêzên kurd ên weke HPG, YBŞ, YPJ û pêşmergeyan jî di wê de heya. Di vê çerçoveyê de şengal, weke kobanê bûya, navendeka ku mirov dikarê bi yekîtîyeka navxweyî ya kurdistanî ya hêzên kurd re werênina ser ziman.

Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku şengal, weke navendeka giring ku têkilîya rojava û başûr bi hevdû re xort dike û ji aliyê rojava ve bo rojava û ji aliyê başûr ve jî bo başûr, dibê weke navendek têkildanînê ya herêmê jî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi giringî werêne ser ziman.

Herêma şengalê weke herêmeka giring di nava başûr û rojava de dibê herêmek navend jî. Ji vê aliyê ve jî divê ku mirov li wê binerê. Her wusa dema ku mirov bi mejiyê mirovekî ku li rastîya civate kurd û pêşketina wê dihizirê ku bi wê bihizirê, mirov wê bibêje ku herî zêde wê şengal bibê herêmek ku başûr û rojava wê bigihêne hevdû jî. Li ser şengalê re başûr û rojava ku bi hevdû re karin di her warê de têkilîyê dênin û pergalek hevbeş ya başûr û rojava ku bi hevdû re pêş dikeve pêş bixin. Her wusa, di vê çerçoveyê de, bi pêşxistina çûn û hatina başûr û rojava li hevdû û her wusa di warê perwerde, pergal û rêveberîya sîyesî, bi hevdû re di warê pêşxistina makanizmayên parastinê û hwd de, ku gelek warên din jî di nav de, di hemû waran de wê rojava û başûr di yekhengiyê de pêş bikeve.

Di vê çerçoveyê de şengal, weke navendek kurdistanî ku rojava û başûr ku li wan du desthilatdarîyên kurdistanê avakirî hene ku wan digihêne hevdû, ku di vê çerçoveyê de li wê were nerîn, wê çêtirîn were fahmkirin. Ji xwe, hêzên ku dixwestin ku şengalê di bin destê çeteyan de bihêlin, pêşî di xwestin ku pêşîya vê rastiyê bigrin. Dema ku kurd, şengalê bi erk û rastîyaka bi vî rengî fahnekin û wê pêşnexin, wê di serî de di nava xwe de jî bikina temenê pirsgirêkên desthilatdarî ên li kurdistanê ku zirerên mazin bide civate kurd. Ji xwe, piştî rizgarkirina birêz Mesûd berzanî ên piştî rizgarkirina şengalê ji destê çeteyên DAÎŞê ku li çîyayê şengalê kir û di wê de dibêje ku "tenê pêşmerge di rizgarkirina şengalê de hebûn", weke gotinek şaş û xelat û ne rast, di vê çerçoveyê de dibina temenê kirinên xelat. Ku li gorî van gotinên birêz Berzanî tevgerin bibê, divê ku mirov bibêje ku rêveberîya kurd a başûr, wê hebûna şengalê bike temenê gelek pirsgirêkên nû di nava civate kurd bixwe de jî.

Her wusa, li vir, divê ku em vê yekê bibêjin ku gotinên Birêz Berzanî ku

dibêje ku "tenê pêşmerge di rizgarkirina şengalê de hebûn", ne rast in. Hêzên kurd ên weke YPG, HPG, YPJ û YBŞ jî hebûn û ev hêzên kurd di destpêkê de û heta dawîyê de di rizgarkirina şengalê de hebûn. Hêzên ku temenê tekoşînê li hemberî çeteyên DAÎŞê li herême dana domandin, ji xwe ev hêz bûn. Piştî rizgarkirina şengalê, ya rast ew bû ku birêz Berzanî kiriba û bi hemû hêzên kurd re weke serokekî kurdistanî hevdîtin kiriba û piştre peyamek li ser navê hemû hêzên kurd û civate kurd daba civate kurd û hemû cihanê jî. Ya ku wê cidiyeta rêveberîya kurd û serokê kurd daba nîşandin jî, wê ev ba. Çûyîna wî ya li ser serê çiyayê şengalê û li ber çend mikrofênên 4 û ankû 5 telewisyonên kurd ên başûrî û gotina wî ya "tenê pêşmerga di rizgarkirina şengalê de hebûn" wê weke serokekî kurd, bo wî bixwe jî, weke nîşanaka piçûkatiyekê bin. Di serî de divîyabû ku weke ku çawa ku di destpêka şerê bi DAÎŞ re de ku birêz Berzanî çû û bi hêzên kurd ên Gerilla re jî li Maxmûrê rûnişt û bi hevdû re di çerçoveyek kurdistanî peyam da cihanê û civate kurd û van hêzên kurd bi hevdû re di parastina başûrê kurdistanê de cih û war girtin, di vê çerçoveyê de divîyabû ku birêz Berzanî heman cidîyet, berpirsîyarî û serokatî, di rizgarkirina şengalê de jî dabana nîşandin. Di rewşek bi vî rengî de ku bi sedan tv´yên kurd û cihanê ku li wir daban amede kirin û li ser navê hemû civate kurd û gelê ezîdî gotin bigota. Ya ku cidîyeta wî daba nîşandin jî, wê ev ba.

Lê birêz Berzanî, ne weke serokek kurdistanî, lê weke serokê partîyekê tevgerîya û peymanek ji rêzê da. Di peyame xwe de hebûna pirranîya hêzên din ên weke HPG, YPG, YPJ, YBŞ û hwd ku di rizgarkirina şengalê de cih girtibûn înkar kir û got ku "tenê pêşmerga di rizgarkirina şengalê de hebûn." Hemû dunya û cihan jî, weke navê xwe dizanê ku ev gotina birêz Berzanî ne rast a. BIrêz Berzanî, divîyabû ku xwe ne kiriba rewşek b bi vî rengî ya piçûk de. Ya ku weke serokekî kurd, ku ji wî dihat hêvî kirin bi cidiyetekê tevgerîya ba û rastî weke ku heyî ji civate kurd û cihanê re hanîba ser ziman. Wê çaxê, wê hemû dunyê jî weke serokekî kurd cidiyeta wî dîtîba û wê civate kurd jî, zêdetirî rêz û hûrmet bidayê de.

Her wusa, di vê çerçoveyê de bi helwesta xwe re birêz Berzanî, pirr piçûk hizirîya. Yên ku ev aqil danê de û ew bi wî rengî dana tevgerîn, di serî de di mejiyê xwe de pirr piçûk hizirîna. Ne li gorî rastîya civate kurd û mejûya wê hizirîna. Yan jî, heya van mejiyan, ji rastî û mejûya civate kurd tûna ya. Tenê, di çerçoveya hinek berjewendiyên piçûk de hizirîna û dixwezin ku serkevtin û rizgarkirina şengalê jî, bikina xizmeta hinek berjewendîyên xwe yên piçûk ên keseyetî û rêxistinî ên piçûk de. Yên ku li şengalê bi vî rengî hizirîna, ne weke navendek kurdistanî ku karibê rojava û başûr bihigêhe li hevdû li şengalê hizirîna. Li şengalê, weke bajarekî ku bikina bin kontrola

xwe de li wê hizirî na. Ev jî, ne hizirînaka rast a.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku şengal ji aliyê hemû hêzên kurdistanî ve hatîya rizgarkirin. BIrêz Berzanî, li şûna ku dubendiyê bike nav de, ji hemû hêzên kurdistanî ku di rizgarkirina şengalê de cihgirtina hilde şûn xwe û li pêşîya hemû capameniya Kurdistan û cihanê bahse rizgarkirina şengalê bike. Yekîtîya kurdistanî divê ku were esas hildan. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku weke navendek kurdistanî ya di nava rojava û başûr de li wê binerê. Nêzîkatîyên li ser partîyan re, divê ku êdî newê dayîn nîşandin. Nêzîkatîyek netewî ya kurdistanî divê ku were dayîn nîşandin.

Rizgarkirina şengalê ji destê çeteyên DAÎŞ´ê divê ku bê xistin temenê têkîliyên mazin ên di nava rojava û başûr de. Divê ku rizgarkirina şengalê, bê xistin temenê gihandina li hevdû a rêveberîya kurd a li başûr û li rojava. Her wusa, şengal, newê xistin weke ´hendekek´ di nava rojava û başûr de. Di vê pêvajoyê de di ancama gelek xelatiyên dîrokî ên sîyeseta kurd de jî, civate kurd zirer dîtîya. Xelatîya dîrokî, ew a ku di wan rojên berî dema ku wê DAÎŞ´ê hêrîşî rojava û başûr kiriba, nîqaş û amedekarîyên bo kongira netewî hebû. Ku ew bi serkevtî hatiba bi ancamkirin û kongira netewî a kurd hatiba li darxistin, wê î ro ew xûrixandinên li kobanê, başûr û rojava û kobanê, ne wilqasî zêde mazin bûba. Yanî, di vê çerçoveyê de, divê ku hemû sîyesetmederên kurd jî, berpirsîyarîya di xûrîxîna kurdistanê a bi destê DAÎŞê de bibînin. Çend ku piştî ku hêrîşên DAÎŞê destpêkir û hêzên kurd bi hevdû re ketina nava hevkariyekê û bi hevdû re tevgerîyan û bersiv dana DAÎŞê jî, lê dîsa ev ser wê xelatîya wan ya dîrokî nanûxûmêne.

Li şûna ku divîyabû ku li ser yekîtîya civate kurd û kirina yek ya hêzên parastina civate kurd û kurdistanê, kirina nîqaşên ´kê şengal rizgarkir´ û ankû hêzek li hemberî ya din xwe dana nîşandin, nîşanaka ku kurdan û rêveberîyên kurd ên ku di roja me de hena, bi rêxistiniyên wan re, rastî, serdem û ev pêvajo baş ne xwandin û fahm nekirina. Ya giring, ew a ku ji î ro û pê de, hemû hêzên parastina kurdistanê, ku Pêşmerge bê, YPG bê, HPG bê û ankû hemû hêzên din ên piçûk û mazin bin, di bin sazûmanakê û sêwanaka netewî de werina kirin yek ku bi hevdû re parastina kurdistanê, civate kurd û nirxên civatî biparêzê. Pêvajoya hêrîşên DAÎŞ ku li rojava û kobanê û li başûr û şengalê da nişandin ku, divê ku hêzek netewî ku hemû hêzên kurdistanî ên parastinê dike nava xwe de divê ku hebe.

Di warê sîyesî de divê ku yekîtîyekê di nava xwe de çê bikin. Di warê hemû aliyên din de ên bi sazûmanî jî divê ku yekîtîyeka ku civatî hebe. Heta ku divê ku pergale perwerdeya civatî a kurdistanî jî, divê ku bi hevdû re di ahengekê de xwediyê pêşketinekê bê. Ya rastî bo civate kurd çiya, divê ku di

wê çerçoveyê de nêzîkatî were kirin. Ev, divê ku newê kirin. Rastîya civate kurd, divê ku were parastin. Sîyeseta kurd, ku xwediyê fêreka ku ji vê pêvajoya ku di wê de ya, derxe. Divê ku fêrê ji Helebçê, berî wê komkujiya zilanê, dersimê û hemû komkujiyên ku piştre hatina kirin, divê ku derxe. Dema ku hemû hêzên kurd, bi hevdû re ne di yekîtîyekê de bin, tişta ku hat hanîn li ser komara kurd a mihabadê, wê were serê wan.

Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku şengalê deriyê başûrê kurdistanê ê li rojavayê kurdistanê û deriyê rojavayê ê li başûrê kurdistanê bê. Her wusa, bi wê re jî şengalê deriyê başûrê kurdistanê û rojavayê ê li rojhilat û bakûrê kurdistanê ê ku hatî vekirin bê.

. **Keçên ezîdî ku hatina revandin û politikaya înkar û jenosîd kirina civate kurd. ..**

Mijara revandina keçên ezîdî di dema hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê li ser şengalê de, divê ku mirov weke aliyekî giring ê pêvajoya jenosîda li ser civate kurd û bi teybetî jî li ser kurdên ezîdî werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku rewşa keçên êzîdî, hê bi rastîya wê re ne hatîya hanîn li ser ziman. Bi hezaran keçzaroyên zaro û jinên ciwan hatina revandin. Piştre, di pêvajoya rizgarkirina şengalê de gelek ji wan keçên kurdên êzîdî hatina rizgarkirin û bi vegotinên ji devê wan mirov fêrî xadarî û bênamûsîya ku hatî hatî li serê wan, mirov dbihiziê.

Di dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li şengalê destpê dike, her herêma ku digihjinê de, wê hemû mirovên ku li wê herêmê dijîn berhev bikin û jin, zaro û keçên ciwan û hwd, wan ji hevdû cuda bikin û bikin komên cuda û bişênina herêmên din û weke ´koleyan´ bifiroşin. Her wusa, weke ku çawa ku di serdema navîn de mirov li bazaran dihat firotin, wê bi heman rengî li deverên weke **Musil, Telafer, Rakka** û hwd, ev keçên ezîdî ên kurd, werina derxin li firotinê.

Piştre jî, wê di vê çerçoveyê de ew werina firotin. Yên ku wan dikirin jî, wê mêrên ku duqat temenê wan kiribin bin. Mêrekî 60 salî wê were keça 13 û ankû 14 salî ji xwe re bikirê û bi male xwe û lêxê, êşkence lê bike û piştre destavêtinê li wê bike. Bi vî rengî, wê baxtê pirranîya keçên kurd ên ku hatina revandin weke hevdû bê. Ev keçên kurd ên ezîdî, divê çerçoveyê de wê rastî nemirovî û bêahlaqiyeka mazin werin. Jinên ku hatina berhevkirin û çeteyên DAÎŞê bi xwe re birina, wan weke "genîmeta şer" dibînin û ji xwe re wusa li wan xwedî derdikevin. Bi vî rengî wan weke "malê xwe" dibînin.

Armanca şerê bi civate kurd re ew a ku civate bi hebûna wê re bi tememî ji dîrokê bibê. Bo vê yekê, xal û nûqteyên ku civat xwe bi wan diafirêne, bi teybetî li wan hêrîş dihên kirin. Kevneşopî û nirxên civatî ên ku

hena, wê herîşî wan bikin. Yan jî, wê çawa ji navê kurdan dûr werênina ser ziman, li ser wê pirr disekin in. Tirkiya, hertimî bi navê ´tirkitiyê´ û ´tirkiyatiyê´ ew hanîn li ser ziman. Bo vê yekê jî, gotina navê ´kurd´ jî, weke gotinaka ku hertimî hatî kriminalize kirin û wê çawa bikin ku mirov ji wê biravin, politika li hemberê wê pêşxistina. Kurdên ku ji rastîya xwe diravin û ji zimanê civate xwe diravin, hinekî jî di temenê wê rastîya wan de ev rastî jî heya.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku li kurdistanê, navê kurd û hertimî di hevokên ku bi gotina ´terorê´ hatina ser ziman re hewl hatîya dayîn ku were hanîn li ser ziman. Her wusa bi heman rengî li ser rewşa çanda kurd jî, heman politika hatîya meşandin.

Komkujiyên ku hatina serê civate kurd, bin navê ´tekoşîna bi terorê´ re hatîya hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov binxat bike ku gotina ´terorê´, bûya gotinaka ku weke ´maske´ û ´sernûxûmandinek´ jî ji şerê jenosîdkirina civate kurd re. Divê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî rastîya gotina ´terorê´ ji aliyê civate kurd ve kifş bike. Yanî, hemû kiryarên dijmirovî, bêhlaqî, komujiyên ku hatina serê civate kurd, hêrîşên ku di her deverê û demê de li civate kurd bûna, di vê çerçoveyê de hatina hanîn li ser ziman.

Hêrîşên ku li şengalê bûna jî, di destpêkê de rayadarên tirk ên ku li piştî DAÎŞê û hêrîşên wê na û her cûre alikariyê didinê de, di xwestin ku bi gotina terorê werênina ser ziman. Vê gotina bi hostetiyekê gotina ´terorê´ bikardihênin. Li şûna ku ji kurdan re gotina terorê bikarbênin, ji yên ku hêrîşê dikin û wî şerê şerê jenosîdê bi civate kurd re dimeşênê li ser wan re gotina terorê dihênina ser ziman. Yanî, vê intibayê dixwezin ku ew bidina rayagiştî ku "meyizênin, ew terorîstin, ji xwe me jî denezendîya ku em li dijî terorê na û me ew weke terorîst denezendina. Ti têkilîya me bi wê re tûna ya. Tenê, weke hêrîşna ku komna terorîstan kirina herê bikin û li şûn xwe bihêlin. ´ Yanî bi gotinaka din, di vê çerçoveyê de ji aliyekî din ve jî gotina terorê di vê çerçoveyê de li hemberê civatê di çerçoveya meşandina şerê jenosîdê bi civate kurd re dihê bikarhanîn.

Wê întibaya ku ´komna terorîst, ew hêrîşkirina", dixwezin ku weke maskeyekê û ser nûxûmandinakê jî ji yên li pişt wê şerê jenosid kirinê ku disekin in, bikarbênin. Hêrîşên ku li şengalê bûn, di serî de, divê ku mirov bi şerê civate kurd re werêne ser ziman. Her wusa di dewama şerê jenosîdkirina civate kurd de jî, divê ku pênaberkirina kurdistanîyan ku ji başûr û şengalê bê, ji rojava bê, ji rojhilat bê û ankû bakûrê kurdistanê bê, divê ku mirov di çerçoveya wê de werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku li kurdistanê, ev

şerê jenosîdkirina civate kurd, ku em komkujiyên li şengalê û revandina keçên êzîdî bi wê re dibînin, divê ku mirov hêrîşên li bakûrê kurdistanê ên ku rejima tirk û rayadarên wê bi polîs û leşker û hêzên wê yên teybet li bajarên bakûrê kurdistanê ên weke Cizira bota, Nisêbîn, Gever, Farqîn, Sûra amedê û hemû deverên din ên bakûrê kurdistanê dimeşên, bi wê re bi hevdû re werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov bi konsepta wê ya şer ku bi wê re li bakûrê kurdistanê bi kurdan re şer dike, bi wê hêrîşî rojava dike û her wusa li gorî pêwîstîyên wê ku leşkerên xwe dişênina li musil-Beşîka û hwd, werêne ser ziman.

Pêvajoya jenosîd kirina civatekê, weke ku rejima tirk li hemberê civate kurd dimeşêne, divê ku mirov bi gelek aliyên wê yên civatî re werêne ser ziman. Lingê vê şerê jenosîdkirina civate kurd ê giring, danîna qadaxayê li ser zimanê kurdî ya. Lingê din jî, şerkirina bi wê re ya. Di vê çerçoveyê de, wê çawa civatê ji civatîya wê derxin, şerê xwe yê bi civatê re bi konseptên şer bi plan dikin û bi leşker, polîs, hêzên teybet û çapameniyê re jî bidina domandin.

Di sedsale me de çapameni, weke lingekî giring ê bişavtinkirina (´asimle kirina´) civatekê dihê bikarhanîn. Her wusa, hemû bi wê re civatê reş bike û kriminalize bike û hem jî li berçavê andamên wê bixwe jî bide reş kirin û hwd, di gelek awa û rêbazên ku bikardihêne de mirov divê ku wê kifş bike û werêne ser ziman.

Di pêvajoya hêrîşên DAÎŞ´ê de her wusa, çapamenî, weke lingekî wî şerê bi kurdan re hat bikarhanîn. Çapamenî jî, di çerçoveya wê şerê bi kurdan re de hat dîzaynkirin. Dengên cuda ên dervî gotina hikimet û rayadarên tirk, hatina dûrkirin ji çapameniyê. Çavtirsandin, li ser wan re hat pêşxistin. Tenê, rêyek ji wan re hatibû hiştin ku wê çawa li gorî dewletê û gotina wê, biaxifin û werênina ser ziman. Li ser çapameniyê re, bi wê re wê ´oparasyonên têgihê´ werina meşandin bi wî şerê ku bi civate kurd re dihê meşandin. Di vê çerçoveyê de bi çapamaniyê hem hêrîşî mejiyê wî dike û hem jî bi şer ji aliyê fizikî ve hebûna wî armanc digrê. Van herdû aliyan jî bi hevdû re di ahengekê de bi rê ve dibêt.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di çapameniyê de wê cih bê dayîn li hevpeyvinên ku keçên kurd re hatina kirin in jî. Di di çapameniya cihanê de wê pirr zêde bahse keçên kurd ên ezîdî ku ji aliyê çeteyên DAÎŞê ve hatina revandin jî bike. BI wan re saziyên komelên mafên mirovan ên navnetewî ên weke ´**Emnesty**´, ´human rights Watch´ û hwd, wê bi wan keçên êzîdî re wê hevpeyvînên dirêj bikin û wê di derbarê wan re gelek ´raport´ werina amede kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dema ku mirov

hemû kirinên DAÎŞê ên dij-mirovî ku li hemberî kurdistanîyan û civate kurd, tenê bi gotina ´olê´ ya ku ji wê re weke ´maske´ dihê bikardihênîn re werênina ser ziman, wê pirr kêm bê. Her wusa, wê rol û weyne rejimên weke ya tirkiya û hwd ku ew di çerçoveya kirina wê jenosîdkirina civate kurd re ku bi wê di hevkariyê de bûn, wê ji berçav were dûrkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî dubara werêne ser ziman, ku mirov nikarê DAÎŞê û hwd, tenê weke rêxistinekê werêne ser ziman. Divê ku mirov weke pêvajoyeka şer ku li kurdistanê û li herêmê li hemberî kurdistanîyan û xalkên herêmê hatîya pêşxistin li wê binerê. Demekê navê pêvajoya şerê jenosîdkirinê DAÎŞ a. Demekê navê wê, ´ahrar el-şam´ a. Demekê navê wê ´Cebetil-nasr´ a. Û bi vî rengî didomê û diçê. Di pêvajoya hêrîşên li kobanê û şengalê de navê wê pêvajoya şer li ser çeteyên DAÎŞ´ê re bû. Lê di van demên dawiyê de bi hêrîşên çeteyên ´cebetil-nasr´ ên li ser Afrînê re navê wê ´cebetil-nasr a.

Di dewama vê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku heta ku pirsgirêka kurd hebe û bê domandin jî, wê ev pêvajoyên şer bi konseptên ku di çerçoveya wê de dihên pêşxistin weke ku li bakûrê kurdistanê rejima tirk pêş dixe û hwd, wê bidomê. Divê ku mirov di serî de binê vê rastiyê xat bike. Rêbazên jenosîdkirinê ên rejim û dewletên serdema me, li ser gotinên ´terorê´ û hwd re xwe dide domandin, weke ku çawa ku rejima tirk şerê xwe yê jenosîdkirina civate kurd bi gotina ´terorê´ jî bi nav dike û dihêne ser ziman û hwd.

Her wusa, dema ku mijar di vê çerçoveyê de were mahkûm kirina yên ku vê komkujiyên li rojava û kobanê û başûr û şengalê dana kirin jî, wê navê DAÎŞ´ê were derxistin li pêş. Lê bi wê re di esasê wê de jî, rejimên weke tirkiya ên ku bi wê re di alikariyê û hevkariyê de na jî, wê li şûn bimêne. Yanî, wê bi vî rengî xwe ji derizendinaka li dijî sûcên mirovatiyê ku dikin, wê bi vî rengî rizgar bikin. Di pêvajoya destpêka hêrîşên DAÎŞ´ê de, bi vî rengî mantiqekê bi rejimên herêmê ên weke tirkiya re hebû ku "wê DAÎŞê derbeyek mazin li kurdan xistiba, piştre, ew jî, weke rejimna ku ´demokratikû ´ ankû ´xilasker´ wê bihatan weke ku di çapameniyê de dihanîn ser ziman, wê çend oparasyon li DAÎŞê bikira û wê hem DAÎŞ, ji holê rakiriban û hem jî, wê xwe jî ji sûcên ku bi navê DAÎŞê û bi destê wê kirina, wê xwe ji wan dûr daban nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de ji xwe, heta roja me jî, tevî rejima tirk DAÎŞ, ji gelek aliyan ve pêşxistiya û alikariyê didiyê de ku hêrîşî kurdan bike, wê têkiliya di dîplomasî û gotinên xwe yên li ser çapameniyê û hwd re înkar dike. Înkar di vê çerçoveyê de weke rêbazekî, bi vî rengî şerkirinê ya jî bi xalkên herêmê û her wusa ên şerên rejimên bi vî rengî ya. ..

Di pêvajoya hêrîşên li şengalê û hwd de jî, heman rewş hat pêşxistin. Nûha, tenê navê DAÎŞê li holê hatîya hiştin. Ji xwe, hêzên weke rejima tirk ku li pişt, vê rêxistina kujar û hêrîşên wê na, navê wan nayê ser ziman re jî. Çend ku rejima tirk û rayadarên wê li pişt hêrîşên DAÎŞê ên li başûrê kurdistanê û şengalê û rojava û kobanê û hwd in û her wusa di vê demê de li bakûrê kurdistanê konseptek şer bi civate kurd re dane destpêkirin, di çerçoveya zihniyeta înkare civate kurd û tûnakirina wê de, bi pêşxistina gerên weke gera Berzanî a di 10´ê berfanbera 2015´ê de ku li tirkiya kir û hwd, weke ku têkiliya wan bi kurdan re baş bê û hwd, wan gerên bi vî rengî ji şerê xwe yê bi civate kurd re weke maske bikardihênin û manipûla dikin. Di vê dema ku li bakûrê kurdistanê rejima tirk konseptek şer li hemberî civate kurd daya destpêkirin de gera Berzanî, di vê çerçoveyê de bi armanca çêkirina dîmenekî din a. Yanî, bi gotinaka din, li ser kurdan re dikin ku mejiyê kurdan bixapênin. Bi heman rengî, weke ku çawa ku li Cizîra bota, Nisêbîn, Gever, Farqîn sûr amed û hemû deverên ên kurdistanê, hêzên rejima tirk bi awayekî hovane hêrîşî civate kurd dikin, bo ku wan di rayagiştî de manipûla bikin, wê Dawutoglu derxina berçapameniyê û ji devê bibêjin ku ´emê sazûmana civakî biparêzên" û her wusa T. Ardogan jî derxin berçapameniyê û bi devê bibêjin ku "dewlet di her warê de wê bi we(kurdan) re bê" û hwd. Ev gotinên bi vî rengî, hemû jî gotinên manipûla kirin û domandina şerê jenosîdkirina civate kurd in. Bi gotinaka din jî, gotinên maske û sernûxûmandinê na ji şerê rejimê ê li hemberî civate kurd re.

Di vê çerçoveyê de têkiliyên kurdan ên navxweyî bixwe jî, dihên îstismarkirin. Weke ku çawa di nava PDK´ê û PKK de weke ku ne weke hevdû hizirîn hebe, wê çawa vê rewşê li gorî xwe pêşbixin û bikarbênin, li ser wê re jî, sîyesetekê ji rewîstê dûr dikin. Her wusa, bi vî rengî, têkiliyên ku bi PDK´ê re ku rejima tirk çê dike, wê çawa bi wan derbeyê li civate kurd bixe û wê çawa bêstatûtiyê li bakûrê kurdistanê bi kurdan bide herêkirin li ser wê re dike. Di vê çerçoveyê de têkiliyên xwe didêne.

Her wusa, piştî rizgarkirina şengalê şendina hêzên tirk li beşîka û musilê û hwd, di vê çerçoveyê de di çerçoveya şerê jenosîdkirin civate kurd û înkare kurd de bi gotina ´metingerkirina´ civate kurd re divê ku mirov werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê çawa temenê şerên dema nû ên civate kurd re biafirênin li ser wê re vê yekê pêş dixin.

….

**Piştî rizgarkirina şengalê, hewldanên artişa tirk ên bi hebûna leşkerên tirk li Beşîka û Musil û armanca tirkiya a di temenê wê de ku bi konsepta wê ya şer ya li dijî civate kurd li bakûrê kurdistanê re girêdayî**

**heya. Wê çawa kurdan kontrol bikin, di vê çerçoveyê de ew leşker, li başûrê kurdistanê dihên şandin.**

Ji salên 1990´î ve li başûrê kurdistanê li herêmên weke ´kanîmasî´, ´**bamernê**´, ´delalok´, ´şeladizê´, ´bamernê´ û hwd, leşkerên tirk hena. Ev leşkerên tirk, li başûr di nava gelek kiryarên leşkerî ên li hemberî rêveberîya a başûr û ya baxdadê jî bûna. Her wusa, gelek ´sûîqastên´ ku di wan de gelek kurdên pêşeng ên navdar ku di nava civate kurd de xwediyê hebûnê na, hatina qatil kirin. Her wusa, çend ku weke komek leşkerî ya ´piçûk´ were hanîn li ser ziman jî, lê weke ´leşkergehekê´ li herêmê ewder hatîya bikarhanîn. Her wusa, di gelek oparasyonên di nava kurdan bixwe de jî, van hêzên tirkan rol û weyn leyistina. Destê wan ketiya xwûna kurdan de. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ji kanîmasî ´hemû oparasyonên leşkerî´ ên li dijî qandilê û hwd jî hatina plankirin.

Di van rojên dawi de di rojevê de bûyîna hebûna leşkerên tirk ên li ´beşîka´ her wusa divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku weke ku çawa ku ´kanîmasî´ di vê çerçoveyê de weyneka navendî ya oparasyonal leyist, li ser Musil re hemû oparasyonên DAÎŞ´ê ên li başûr, li şengalê û hwd, ji navenda leşkerî a beşîka weke ku hatîya rêvebirin. Divê ku mirov werêne ser ziman ku hebûna leşkerên tirk, di du çerçoveyan de mirov dikarê werêne ser ziman. Di çerçoveya pêşî de divê ku mirov bi hêrîşên DAÎŞ´ê re werêne ser ziman. Her wusa, oparasyon û hêrîşên DAÎŞ´ê ku li nava îraqê û başûrê kurdistanê bûna, alikarîyek mazin ya van hêzên tirk ên li başûrê kurdistanê ji wan re bûna. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. JI ber vê yekê ya ku DAÎŞ´ê li başûr û îraqê, hêrîşî hemû hêzên kurd û hêzên îraqî dike, lê çend komikên leşkerî ên tirk hena û rastî ti hêrîşê nayên. Di serî de divê ku mirov bi vir ve girêdayî, wê rastî hêrîşê ne hatina wan werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov çerçoveya duyemin a leşkerên tirk a li başûrê kurdistanê jî bi armanca ´kontrolkirina´ kurdan û hatina wan ya li cem hevdû jî werênê ser ziman. Heta roja me, di vê çerçoveyê de weynek leyistina.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hêrîşên li sr başûrê kurdistanê û şengalê ên DAÎŞ´ê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi van navendên ku bi leşkerî tirkan weke navend bikarhanîna re werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de, weke ku çawa ku di van rojan de di rojevê de ya, ku li Sûrî, dikin ku ´tirkmenan´ derxina li pêş, her wusa, li îraqê û musilê jî, çend tirkmenên ku hena, hatina bi rêxistin kirin û li hemberî herêmê dihên bikarhanîn. Di bin navê alikarîya ji tirkmanan re ku bi dehan tir´ên mazin ku bûhûrandina li îraqê, di wan de biqasî ku di nava xalkê de jî tê gotin, "di wan tiran de çek û amûrên leşkerên ku dihên şandin li musilê ji DAÎŞ´ê re" hena.

Gelek tirên ku bo benzîn tên bûhûrandin, di vê çerçoveyê de tişî çek û barkirî, tên şandin û piştre tişî mazot tên vegerandin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku alikarîya van leşkerên tirk ên li kanîmasî û beşîka, di xistina musilê li destê DAÎŞ´ê de jî heya. Divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman. Her wusa, tirkmenên li musil, telafer û kerkukê jî, di vê çerçoveyê de weke ´alikarî´ hatina bikarhanîn ji DAÎŞ´ê re.

Li Îraqê DAÎŞ, li ser aligirên Saddam ên sunnî û tirkmenên ku ketina bin kontrola tirkiye re de hatîya pêşxistin. Di vê çerçoveyê de ev hêzên tirk ên li beşîka ku tê gotin ku "bo perwerdekirinê" li wir a, vê hêza tirk kê perwerde kiriya jî, ew jî ´nepenîyek´ a. Her wusa, çend ku bibêjin ´me peşmerge perwerde kirin´ jî, wê ev ne rast bê. Ev gotin, wê tenê bê maske ji vê rewş û kirinên leşkerîn tirk ên li kanîmasî û beşîka re. Weke ku çawa ku piştî salên 1990´î ku leşkerên tirk li kanîmasî bicihkirin û li ser wê re hanîn li ser ziman ku "bo ku di nava PDK´ê û YNK´ê de pevçûn rûnedê ew leşker li wir bicihkirina." Ev gotina "bo ku di nava PDK´ê û YNK´ê de pevçûn rûnedê ew leşker li wir bicihkirina", weke gotinaka sernûxûmandinê bû. Di bin vê gotina niyeta rayadarên tirk a bi cihkirina leşkerên li tirk li kanîmasî dihat veşartin. Nûha jî, bi heman rengî, bi gotina "leşkerên li pêşîka bi armanca perwerdekirinê li wir in", bi heman rengî weke gotineka sernûxûmandinê mirov dikarê werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rejima baxdadê, nerazîya xwe ji hebûna leşkerên tirk li musilê hanî ser ziman. Lê ev ne razîbûna hikimeta baxdadê ku Heydar Ebadî hanî ser ziman, çendî bicidîya, divê ku mirov hinekî li ser wê jî bisekinê. Heta roja me, di gelek politikayên ku rejima berê ya baxdadê ku malikî li ser serê wê bû, bi tirkiya re di hevkariyekê de dikirin. Carna jî, weke ku li dijî hevdû na û gotinên dijber ji hevdû re digotin. Lê ev gotinên wan û politikayên wan yên weke "dijber" jî, weke ´sernûxûmandinekê´ bûn ji politikayên wan esasî ên ku li dijî kurdan û li herêmê dimeşandin. Yanî bi gotinaka din, rejima baxdadê û ya tirk, di wan deman de "leyistika polisê baş û polîsê ne baş" dileyistin. Gelo di vê demê de, heman politika bi hikimeta heydar Ebadî û ya tirk re jî heya? Di serî de divê ku mirov vê pirsê bike. Ji ber ku bi nîqaşên weke di bin nerazîbûnê de, gelek politikayên xwe yên esasî li hemberî kurdan ên bi armanca kontrolkirina herêmê di meşandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rejima tirk, ji "destpêka şerê kendavê" ê pêşî ve li başûrê kurdistanê bicihkirîya. Di wan deman de tirkiya mafê tevlîbûna li oparasyona li hemberî Saddam bidest nexist. Hingî tirkiya, dixwest ku tevl oparasyona li hemberî Saddam bibe û tenê li herêmên kurdan bibe û bi wê re pêşîya pêşketina statûya kurdan

bigrê. Lê ne gihişt vê armanca xwe. Piştre jî, bi alikarî û hin leyistikên rayadarên tirk û bi ´teşvîkkirina´ tirkiya PDK´ê bidest hêrîşî YNK´ê kir. Piştre jî, ev kirin ´hêncet´ û hinek leşkerên xwe li herêma ´kanîmasî´ bicihkirin. Yanî, tişta ku di destpêkê de bidest nexist, di vê demê de bi vê rewşê xwest bidest bixe. Bi leşkerên ku li kanîmasî bicihkirin û hwd, li herêmê, xwest ku politikayên xwe li hemberî kurdan bike meriyetê de. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku partîya kurd PDK´ê bi peyman û ´peymanên aborî´ û hwd, ên ku bi wê re mohrkirina, dest û lingên wê girêdan û li hemberî kurdan bikarhanîn û î ro hê jî wê bikardihênin li hemberî kurdan. Dema ku mirov bixwezê rewşa beşîka û hebûna leşkerên tirk fahm dike, divê ku mirov van rastîya û dîrokê bigiştî li berçav bigrê.

Hebûna leşkerên tirk li beşîka, di serî de, divê ku mirov di çerçoveya şerê DAÎŞê ê li başûrê kurdistanê bi kurdan re û li îraqê ku bûya, bi wê re werêne ser ziman. Di serî de, aliyekî din ê hebûna leşkerên tirk li beşîka û kanîmasî, bi şerê rejima tirk ê bi kurdan û civate kurd re jî divê ku mirov hilde li dest. Her wusa, rewşa hebûna leşkerên tirk li beşîka û kanîmasî, di çerçoveya hewldanên wê yên bêstatû hiştina kurdan de divê ku mirov hilde li dest. Her çend ku di bin navê "perwerdekirinê" de ew leşkerên tirk li beşîka hatibina bicihkirin jî, divê ku mirov di çerçoveya koordîna kirina hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan de werêne ser ziman. Piştî ku DAÎŞ´ têkçû û hatina rojevê ku wê li musilê oparasyona rizgarkirinê werê kirin, êdî rayadarên tirk jî dixwezin ku rewşa xe ya leşkerî li beşîka û hinekî jî li kanîmasî xort bikin. Yanî, bi rizgarkirina Musilê re, wê rewşa kurdan jî, baştir bibe. Her wusa, di vê çerçoveyê de bo ku wê kontrolkirina ku heta roja me, bi vî rengî kirina, dixwezin ku bidomênin.

Li vir, ya ku dihê ditin ku hebûna leşkerên tirk, di vê çerçoveyê de di çerçoveya politikayên wê yên dijberî kurdan de divê ku mirov fahm bike. Di nava hikimeta Îraqê de jî, dibêt ku yên alikarîyê didina vê hebin bo ku kurdan bisînor bikin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku gotinên Haydar Ebadî bi rengê ku bi wan dixwezê ku "leşkerên tirk divê ku axa îraqê biterikênin", rewşa gotinên malikî ku bi tirkiya di çerçoveya "leyistika polisê baş û polîsê ne baş" de dikir de dihêne berbîra min. Her wusa, di serê gelek kurdan de jî, î ro bi vî rengî gotinên Haydar Edabî tên biwate kirin. Di nava kurdan de hertimî hatîya bawer kirin ku hêzeka ku ji binî ve li Îraqê politikayên hikimeta Îraqê jî li hemberî kurdan dide dîyar kirina a kifşkar heya. Weke hêza ´sernûxûmandî´ û ankû ya ´vêşarî´ jî mirov dikarê wê bii nav bike.

Hebûna leşkerên tirk li Beşîka, Musil û armanca tirkiya a di temenê wê de, divê çerçoveyê de bi gelek armanc û politikayên li herêmê ên di

çerçoveya dijî-kurd de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, bi armanca kontrolkirina  kurdan û herêmê, mirov dikarê werêne ser ziman. Ji wê jî zêdetirî, heta roja me, weke ku di taqîna gelek bombayên berî hebûna DAÎŞ´ê li îraqê û bi teybetî li başûrê kurdistanê kurdistanê de destê tirkiya hebûya. Di dema şerê dûyam ê kendavê de li pêşîya biroya PDK´ê taqîna bombayê ku di wê de samî abdullrahman jî hatibû kuştin jî, têkilîiya tirkiya di wan de hebûya. Pirranîya hêrîşên bi vî rengî li YNK´ li şengalê jî ku bûna destê tirkiya û van hêzên tirkiya ên ku li van herêmên başûrê kurdistanê bicihkirina di wan de heya. Hebûna leşkerên tirk li beşîka û deverên din ên başûrê kurdistanê ên weke delakokê, kanîmasî, şêladizê û bamernê, qatek û beşek ji şerê wê yê bi kurdan re ya. Çendî ku bibêjin ew hêz bo ´perwerdekirinê´ li wir in û bi pêşmergeyan re bi têkiliyên de jî. ...

**Hêrîşên li Afrînê, civîna li Rîyadê û hebûna leşkerên tirk li beşîka, bi rewşa ezaz û cerablusê re çerçoveya hêrîşên nû ên li herêmê å li rojava jî diafirêne. ..**

Li vir, pêşî, em hinekî li ser armancên di serê radaydarên tirk de ê di temenê şandina leşkerên tirk li beşîka çina û ne çina, divê ku mirov pêşî hinekî li ser wê rawastihê. Rejima tirk, şandina leşkerên tirk li beşîka, divê ku mirov bi pêşaroja musilê ve girêdayî wê hilde li dest. Li wê dihizirin ku dema ku musil, hat rizgarkirin, li wir, ku karibin, girseyek tirkmen li wir bicih bikin û politikayên xwe li ser wan re bidina domandin. JI xwe, di serî de dana goçberkirina ji musilê  û şengalê hinekî jî bi vê hasabê wan ve girêdayî ya. Dixwezin ku musilê, di vê çerçoveyê de dagir bikin. Yanî, piştî rizgarkirina musilê ji DAÎŞê, ew jî, ji aliyekî din ve Musilê dagir bikin û di vê çerçoveyê de politikayên xwe bi wê re bikina meriyetê de. Yanî şandina leşkerên tirk li beşîka, di serî de bi hasabê wan yê dagirkirin û metingerkirina musilê ve girêdayî ya. Di serî de Asûrî, xiristiyan, şebek û ezîdîyên ku ji herêmê hatina goçberkirin, li şûna wan, malên tirkmanan bicih bikin. Ev rengê politikaya rejima tirk, li bakûrê kurdistanê, ji şerê cihanê ê yekemin ve hatîya meşandin. Kurd, ji herêmên wan hatina derkirin û li şûna wan malbatên tirkmen bicihkirina. LI herêmên Serhadê jî, li bajarên weke agirî û hwd, ezîdî û ermeniyên ku hatina qatilkirin, li şûna wan hin aşîrên tirkmen ji aliyê komare tirkmen ve hatibû hanîn û li ser mal û semyanê wan bicihkiribûn.

Dema ku mirov dîroka azerîyên li Agirî, hilde li dest, di vê çerçoveyê de mirov wê rastî dîrokeka pirr qirêj were. Nûha jî, ev politikaya ku berê li hemberî ermeni, asûrî û kurdan hat meşandin, dîsa li musilê li hemberî cih û warên ezêdî, şebekî, asûrî û kurdên wê herêmê dixwezin ku bidina meşandiin. Yanî, di vê çerçoveyê de ev civatên ku bi hêrîşan ji mal û

herêmên wan hatina goçberkirin, di vê çerçoveyê de rejima tirk bi tirkmenan û hin bermehiyên sûnnî în ku mana, li ser wan re li herêmê hasab dike. Hinekî jî, di vê çerçoveyê de dema ku mirov bihizirê, divê ku mirov werêne ser ziman ku şandina leşkerên tirk, di vê çerçoveyê de bi planaka dagirkirin û metingerkirina musilê ve girêdayî ya. Yanî, ji dagirkirin û metingerkirina DAÎŞê xilas bikin û bikina bin dagirkirin û metingerkirina leşkerên tirk de. HInekî jî, di vê çerçoveyê de hebûna leşkerên tirk ên li beşîka, di vê çerçoveyê de di çerçoveya dagirkirina musilê de ew hatina şandin li wir.

Ev demeka ku rejima tirk û rayadarên wê, li ser tirkmenên ku li wê herêmê na, hin planna bi vî rengî dike ku bike meriyetê de. Her wusa, wê çawa li herêmê û bi teybetî, li musilê temenekê xwe bide çêkirin, di vê çerçoveyê de dihizirin. Her wusa, kurdên başûrî û bvi teybetî ên PDK´yî, di vê çerçoveyê de weke enstrûman dihên bikarhanîn. Yanî, bi destê PDK´yîyan, weke ku dixwezê ku başûrê kurdistanê, dagir bike.

Politikaya dagirkirina herêmên musilê bi tirkmenan, di serê rayadarên tirk de heya. Nexwe, ti kesek nikarê di çerçoveya gotinên weke ´ew leşker bo perwerdekirinê li wir in, û ankû ´bo parastinê li wir in, werêne ser ziman. Li vir, di serî de, rejima tirk, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de wê çawa demografiya musilê bidina gûharandin, di vê çerçoveyê de kar dikin. Bo vê armancê ew leşker şandina li wir. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Rayadarên tirk, dihizirin ku piştî rizgarkirina musilê jî, mirovên ku ji wê dana goçberkirin, newina herêmê û li şûna wan, her wusa, li gorî xwe bi tirkmenan demografiya wê bide gûharandin. Bo vê yekê bû ku ezîdîyên ku goçî bakûrê kurdistanê kiribûn, rejima tirk, bi teybetî ew kiribûbûna armanca xwe ku wan bişêne welatên ewropa. Her wusa, bo ku ew kurdên ezîdî cardin nevegerihin li ser mal û li herêmên xwe, ew şandina li welatên ewropa. Yanî, ev rewşa şandina êzîdîyên kurd ji tirkiya û bakûrê kurdistanê jî li welatên ewropî, hinekî jî di vê çerçoveyê de bi vê hasabê rayadarên tirk ê di serê wan de ve girêdayî bû. Di vê çerçoveyê de piştî ku ew hatina şandin li deverên dûr bo ku nevegerihin, êdî piştre, di vê çerçoveyê de li ser cih û warên hasab hatina kirin.

Li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov têkiliyekê bi şandina leşkerên tirk li beşîka û her wusa, bi darêzorê şandina kurdên êzîdî, şebekî û asûrî bi darêzorê li welatên ewropî dênin. Ji ber ku di vê çerçoveyê de têkiliyek wan bi hevdû re heya. Piştî hêrîşên li musil û şengalê ku gelek goçberî bûn û pê de, êdî piştî ku şengal hat rizgarkirin û pê de, dema ku dor tê rizgarkirina musilê, rayadarên tirk, leşkerên xwe dişênina herêma musilê beşîka. Li wir, wan bicih dikin. Pêşî dibêjin ku ´me ew bo perwerde kirina pêşmergeyan

şandina.´ Lê piştre dihê fahmkirin ku ew derew a. Bo vê yekê, êdî T. Ardogan bi xwe derdikeve berçapameniyê û dibêje ku "ji wir(´îraqê´) hêrîşî dema ku li me bibin û ew bergiran negrin, emê bigrin.´ Lê di aslê xwe de, ev jî derewek a.

Ev hasabê tirkiya ê li musilê wê herê sêrî û ankû neçê sêrî, wê dem şanî me bide. Lê li vir, di serî de, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dem ne ew dema berê ya ku wê xalkan tacir bikin û li şûna wan êdî xwe bicih bikin. Berê ew dikirin. Ermenî tacirkirin. Kurd ji herêmên wan tacir kirin. Asûrî ji herêmên wan tacir kirin. Gelek xalkên din li Anatolia, hem tacirkirin û hem jî bi bişavtinê û hwd bê, tûna kirin. Î ro, ti kesek ji wan navê wan nayê ser ziman.

Bi vê re, divê ku ez vê yekê jî werênima ser ziman ku di dema ku rejima tirk van hasaban dike û her wusa leşkerên xwe dişêne li beşîka, li bakûrê kurdistanê jî li bajarên weke kerboran, Nisêbîn, Sûra amedê, Farqîn, Cizîra bota, Gever û hwd, ku gelek deverên din jî di nav de, li wan bêsînnor hêrîşî kurdistanîyan dike û herêm û bajar kavil kirina.

Mijara hebûna leşkerên tirk a li beşîka, wê bandûrê li hêzên herêmê bike. Di vê çerçoveyê de divê ku miirov werêne ser ziman ku wê di serî e bandûrê li kurdistanîyan û jîyane wan bi xirabî bike. Bi vê re divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku piştî dawîya hefteya pêşî ya berfanberê a 2015´an ku mijar ket rojevê de, êdî rayadarên Îraqî jî hanîn ser ziman ku divê ku Tirkiya ´bê şert û merc leşkerên xwe ji îraqê vekişêne. Yê ku ev hanîbû ser ziman, serowezirê îraqê Haydar Ebadî bû. Di dewama wê de Haydar Ebadî hanîbû ser ziman ku ´em 48 seatan didina wan ku hêzên xwe ji nava axa îraqê vekişênin.´ Li hemberî bertekên Haydar Ebadî, rayadarên tirk, weke T. Ardogan, Dawutoglu û Sînîrlioglu û hwd, li ber çapameniyê radigihandin ku ´ewê leşkerên xwe nevekişênin.´ Piştre jî, di dewama wê de piştî 10ê berfanbera 2015´an, hat rojavê ku hikimeta Îraqê a navendî serî lijneya ewlakarîyê a netewweyên yekbûyî daya bo mijarê.

Ev rewşa hebûna leşkerên tirk, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman, reşeka ramyarîya ´klasîk´ a kevn a herêmê ya û êdî dema vê rengê ramyarîyê û kirina ramyarîyê weke bûhûrîya. Di aslê xwe de rewşa ku li herêmê, mejiyên rêveberîyên herêmê bibaşî weke ku fahm nakin û nabînin jî, ev a. Bi vê yekê re li herêmê, israrkirina di ne çareserkirina pirsgiirêka kurd û hwd de jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Di aslê xwe de, piştî şoreşa rojava, êdî rewş li herêmê nebûna weke berê. Wê çawa şoreşa rojava têkbibin, hertimî, hêrîşî wê kirin. Li şûna ku rengên pêşketinên herêmê û ratîya wê fahm bikin, hewldidin ku wê bêî ku fahmkirin bi rastîya xalkên herêmê re wê ji holê rabikin. Pirsgirêkên mazin di vê çerçoveyê de

ku hena, di temenê wan de aliyekê ne fahmkirina bi têgîna demî re heya û bi wê re jî zihniyeta berê di temenê wê de heya. Rewşa hebûna leşkerên tirk a li beşîka, ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, mirov nikarê ji rengê zihniyeta civîna Rîyadê cuda werêne ser ziman. Di çerçoveyekê de weke ku hevdû ji hevdû diafirênin û didina dîyarkirin. Piştî civîna Rîyadê, hêrîşên bombayî li Til-Têmirê ên ku di ancama wan de gelek sivîlan jîyane xwe ji dest dan jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Li herêmê ku mirov ji kîjan aliyê ve binerê, ku çendî ku herîşên xadarî li xalkên herêmê werina kirin jî, wê êdî temenê rewşên metîngerî ên weke ku bi civînên weke li Rîyadê re temenê wan hatî avêtin û hebûna leşkerên tirk li beşîka û hwd re wê êdî nebê. Mudahaleyên li jîyane xalkan ku dihên kirin, wê êdî di dîrokên pêş de bi îbretî werina bibîr kirin.

Hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs û leşkerên wê re li bajarên bakûrê kurdistanê jî di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê bi îbretî werina bibîr kirin. Hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs û leşkerên wê re li bajarên bakûrê kurdistanê, wê ancama zihniyeta wê ya metinger bin. Bo ku di vê çerçoveyê de na, bi armanca tafisandinê û bêdengkirinê û piştre jî bêstatû hiştinê dihên kirin. Ji xwe, serîlêdedana rêveberîya Îraqê a li lijneya ewlakariyê a neteweyên yekbûyî, çendî ku bi armanca parastina desthilatdarîya wê jî bin, wê ancamna wê yên hêrênî li herêmê jî hebin.

Ev rewş hemû yên ku herêmê dibin, didina nîşandin ku li herêmê ji nûve sazûmankirineka li gorî jîyane xalkan pêwîsta bi wê. Her wusa, rengên rêveberî û zihniyetên wan ên ku heta roja me bi serdestî hebûna xwe dana domandin, êdî ti bersivê nadina jîyane xalkên herêmê. Di serî de di temenê vê zihniyetê de pirsgirêka ´nîjadîtîyê´ û şîrovekirina olê bi rengê wê li gorî sîyeseta rêveberîyên herêmê, wê ji gelek aliyan ve temenê pirsgirêkên ku li herêmê diafirin bin. Heta roja me, di vê çerçoveyê de bi mudahaeyên ku li jîyane xalkên herêmê hatîya kirin û komkujiyên ku hatina hanîn li serê wan, pirr zêde na.

Sîyeseta desthilatdarîyê, ku ne xwediyê wate û têgînekê ya bi jîyane xalkan re ya, wê jîyane xalkên herêmê bike jîyaneka weke ya di bin metingerîyê de. Bi olê, xalkên herêmê û mejiyê wan di xewê de hiştina. Ol, pirr zêde li dijî xalkan îstîsmarkirina. Di aslê xwe de, pêvajoya derxistina çeteyên DAÎŞ´ê û hwd ku were dahûrkirin ji gelek aliyên wê ve, wê di vê çerçoveyê de gelek têgînan bide mirov. Rastîya DAÎŞê, rastîyeka ku çawa ol û bawerî jî, dihê îstîsmarkirin û bikarhanîn jî li dijî xalkan û di xizmeta desthilatdarîyan de.

Ol û desthilatdarî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov weke aliyekî giring ê bi pirsgirêk a vê rewşê werênina ser ziman. Nexweşîya desthilatdarîyê ku ol

û bawerîyê re hatîya zewicandin, wê rengê metingerîya li rojhilat ku heta sedsale 21´ê jî ku hatîya domandin jî bê.

. **Di van** rojên dawî de nûçeyên hêrîşkirina çeteyên çebetil-nasr û cihadîstên din li Afrînê tê. Her wusa, ji aliyê din ve jî, ji bin ve hinek nûçe ji nava tirkiya tên ku li herêmên weke Antebê ku dikevina dahma Afrînê de, rayadarên tirk weke ku hin amederkarîyna jî dikin. Gelek dordor van amedekerîyên li hewirdora antebê û hêrîşên çeteyên cebetil-nasr´ û cihadîstan bi hevdû re şîrove dikin û dibêjin ku ´ ev destpêka pêlek din ya hêrîşkirinê ya ku bi alikarîya tirkiya li rojava bibe. Di serî de dixwezin ku xûrixandinê bi hêrîşan li wir jî bikin. Bi wê re jî, bi awayekî di fiîliyetê de çeteyên cebetil-nasr´ weke ku ambargo danîna li ser herêmê. Ev demek a ku nûçeyên hêrîşê ji wê herêma rojavayê kurdistanê tên. ..

Wusa xûya dike ku ev civîna ku tê gotin ku wê li ´Rîyadê´ were kirin, wê bê destpêka pêlna nû ya herîşan li herêmên kurdan. Weke ku bi vê nivînê re pêvajoya hêrîşan ji nû ve bi rêxistin dikin. Heta nûha bi navê ´DAÎŞ´ê hêrîşî herêmê dikir. Nûha herêmên ku çeteyên DAÎŞ´ê di destê xwe de digrin, di pêvajoya vê civînê de radestî çeteyên Ahrar el-şam û cebetil-nasr dike. Di vê çerçoveyê de ya ku mirov kifş dike, ev rêxistinna olî na. Ev rêxistinna dewletî ên ku rejimên weke tirkiya û hwd, bi alikarîya hin dewletên din ên herêmê ava kirina, û dem bi dem wan bi kardihênin. Ji vê rewş tê fahmkirin ku piştî civîna li ´Rîyadê´ wê navê çeteyên Ahrar el-şam û cebetil-nasr´ wê zêdetir were rojevê. Ev jî, weke çerçoveyek û rastîyek vê vê pêvajoya şer ku bi DAÎŞ´ê re li rojava destpêkirîya ya.

Di serî de wusa dihê fahmkirin ku DAÎŞ, ne rêxistineka. Navê pêvajoyek şer ya ku rejimên herêmê ên weke tirkiya li hemberî xalkên herêmê bi rêxistina kirina na. Her wusa, rejimên olî ên weke Sîûdî û hwd jî, di hin wan waran de alikarîyê didina van pêvajoyên şer ên li hemberî xalkên herêmê ku dihê meşandin û rêvebirin.

Ku mirov ku ji kûderê ve lê binerê, her wusa wusa dihê ditin ku têkilîya hêzên tirk ên li beşîka û musilê bi van hêrîşan ve heya. Her wusa, dema ku mirov di çerçoveya hêrîşên li rojava de li mijarê binerê, divê ku mirov hebûna hêzên tirk li beşîka û musilê, civînên weke ya li Rîyadê û pêla hêrîşên nû ên çeteyên cebetil-nasr ên li ser Afrînê divê ku mirov bi hevdû re hilde li dest. Her wusa, hebûna leşkerên tirk li beşîka û musilê, DAÎŞ, wê ji xwe re weke ´ewlakarîyekê´ jî dibînê. Di vê çerçoveyê de rejima tirk konsepta şer a li hemberî kurdan ku daya destpêkirin bi rêve dibe. Dema ku mirov mirov rewşa hebûna hêzên tirk ên li beşîka û musilê, ji hêrîşên wê yên li dijî civate kurd û li rojava ku dibe bi destê çeteyên weke ´cebetil-nasr û

hwd, wê hingî, ev ji wê re bê weke sernûxûmandinekê ji nîyetên wê yên vêşarî re. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Piştî, rizgarkirina şengalê ji destê çeteyên DAÎŞ´ê, hebûna leşkerên tirk a li beşîka, bi civîna li Rîyadê û hêrîşên li ser Afrînê re dikeve rojevê de.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku tirkiya li piştî hêrîşên cebetil-nasr ên li ser Afrînê, weke ku çawa li pişt hêrîşên DAÎŞê bû di dema ku hêrîşî kobanê dikirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîyê biawayekî werêne ser ziman. Tirkiya, di serî de di vê demê de giranî daya ser listika xwe ya di xate di nava kobanê û Afrînê de. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku herêmên weke cerablus´ê, ezaz û herêmên ku weke herêmên tirkmenan dihên bi navkirin, li wan temenê hêrîşên li herêmê bi rêxistin dikin. Nûha, rejima tirk, bi destê çeteyên cebetil-nasr´, ku ev demeka ji herêma antebê ve alikarîyê ji wan re dişêne, dike ku pêlek nû ya hêrîşan li ser Afrînê bide destpêkirin. Leyistik, vêçarê, di xate di nava Afrîn û Kobanê de dihê leyistin.

Weke ku çawa di dema ku hêrîşî kobanê kirin de giranî dabûbûna hêrîşên li ser taxên kurdan ên li Halabê jî. Di vê demê de jî, giraniyê didina ser hêrîşên li van herêmên ên weke taxên eşrefîya û şêx-maqsûd. Di vê çerçoveyê de armanca bi van hêrîşan re jî, dixwezin ku gelek nûqteyên hêrîşê bi carekê biafirênin. Her wusa, ji gelek nûqteyan ve weke pêlên hêrîşê bidina destpêkirin. Êdî bi wê re, nehêlin ku hêzên parastinê ên kurd, tenê karibin hêza xwe li nûqteyekê bikina kom. Wusa xûya dike û ji hebûna leşkerên tirk ên li beşîka û musilê, mirov fahm dike ku li wir jî, heya ku pêlna nû yên hêrîşê li ser başûrê kurdistanê bidina destpêkirin. Hebûna leşkerên tirk ên li beşîka, hinekî jî, mirov dikarê di vê çerçoveyê de rava bike û werêne ser ziman.

Êrîşên li hember Efrînê pêk tên, bi konsepta înkar û tûnekirinê ya li dijî Rojava ve girêdayî ya. Ev konsepta bi hewldana bêstatû hiştina kurdan a. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi vê mantiqê civîna li Rîyadê û hêrîşên li Afrînê bi hevdû ve girêdayî jî bi alikarîya tirkiya û konsepta wê ya şer bi hevdû re werêne ser ziman. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hêrîşên li hemberî Afrînê berdewamiya hêrîşên li hemberî Kantona Cizîr û Kantona Kobanê na. Di dewama wan de ev hêrîş dihên kirin. Di vê çerçoveyê de wusa dihê ditin û xûyakirin ku bi civîna li Rîyadê re dixwezin ku rewşa xwe nû bikin û li ser wê re pêlek nû ya hêrîşê li hemberî rojava û kurdistanîyan bidina destpêkirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê civîna li Rîyadê, weke civîna destpêkirina hêrîşan û civîna ku di wê de pêlên nû ên hêrîşê li rojava dihên plankirin jî werêne ser ziman.

Hêrîşên li Afrînê, civîna li Rîyadê û hebûna leşkerên tirk li beşîka ku bo

parastina DAÎŞ´ê na, çerçoveya hêrîşên nû ên li rojava û li herêmê jî diafirêne. Divê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku piştî vê cîvîna li Rîyadê, wê hêrîş li xalkên herêmê zêdetir bibin bi destê çeteyên DAÎŞ, Ahrar el-şam û cebetil-nasr. Wusa dihê xuya kirin ku di vê civînê de, ev komên cihadîst jî, dihên hanîn li cem hevdû û di nava wan de koordînasyonek dihê çêkirin. Civîna li Rîyadê, mirov dikarê di vê çerçoveyê de bi vî rengî jî bixwêne. Bi vî rengî, ev hêzên ku hanîna cem hevdû, wê êdî wan bi pêlek nû ya hêrîşê re bidina hêrîşkirin li ser rojava. Di serî de divê ku mirov balê bikişêne li ser vê. Her wusa, heya ku pêlên nû li ser şengalê jî bên dayîn destpêkirin. Ji ber ku ji Musilê û heta herêmên din ên rojava, têkilîya wan bi rizgarkirina şengalê re hat birrîn. Nûha, wê bixwezin û hewl bidin ku wê rêyê cardin bidest bixin. Bo vê yekê, wê xwe biceribênin. Bo vê yekê, divê ku mirov balê bikişêne li ser wê jî ku piştî civîna li Rîyadê, li başûrê kurdistanê jî û li rojavayê kurdistanê pêlên ên hêrîşkirinê dibin, wê bi wan dixwezin ku cardin rewşa xwe li herêmê xort bikin. Di vê çerçoveyê de civîna li Rîyadê, weke civînaka xwe nûkirinê ya van hêzên hêrîşkar jî mirov dikarê werêne **ser ziman**.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rejima tirk, konsepta şer a ku li hemberî civate kurd daya destpêkirin, di vê çerçoveyê de li giştîya kurdistanê şer bi kurdan re dike. Di aslê xwe de hebûna leşkerên tirk ên ku Beşîka, çendî ku ji aliyekî ve weke moral a ji DAÎŞ´ê re bi heman rengî, mirov dikarê di çerçoveya şerê rejima tirk ê bi kurdan re wê hilde li dest. Her wusa, wusa dihê dîtin û fahmkirin ku di vê pêvajoya şer de, wê heta ku bikin ji aliyê başûr ve jî şerekî ku hemberî hêzên kurd ên weke HPG û YPG bikin ku bidina destpêkirin. Ji ber k u ji bi hêzbûn û mazinbûna wan pirr aciz in.

Î ro ku mirov li başûrê kurdistanê binerê, ji salên 1903-4 û 1995 ve hebûna artişa tirk li başûrê kurdistanê heya. Herêmên weke ´kanîmasî´, **´bamernê´**, ´delalok´, ´şeladizê´ û hwd, navendên ku artişa tirk bi levkirina bi PDK´ê re ku weke leşkergeh bikardihêne hena. Di van salên ku bûhûrî de, hemû oparasyonên dervî sînor ku dikirin, ji van navendan, ew bi rêve dibirin. Di vê demê de, ev navênden leşkerî ên artişa tirk ên weke li ´kanîmasî´, **´bamernê**´, ´delalok´, ´şeladizê´ hatina xortkirin û bi wê re li beşîka jî dikin ku navendek din jî vekin. Em li vir, divê ku vê yekê bibêjin ku ev rewşa leşkerî, di çerçoveya şerê rejima tirk ê bi civate kurd re divê ku mirov werêne ser ziman. Di dewama hêrîşên DAÎŞê ên li kurdan de divê ku miirov fahm bike û werêne ser ziman. Rejima tirk, di vê demê de pêşî, ´pêvajoya çareserîyê´ dawî li wê hanî, piştre xwest ku di hilbijartinan de derbeyekê li kurdan bixe û partiyên kurd dervî meclisê bihêle. Piştre jî, bi wê re

derbeyekê li kurdan bixe. Her wusa, êdî ji her aliyê ve pêvajoyek şer, rejima tirk bi kurdan re da destpêkirin. Hebûna leşkerên tirk li beşîka, divê ku mirov di çerçoveya şerê yê bi civate kurd re werêne ser ziman.

Her wusa, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs, leşker û hêzên wê yên din ên teybet re ku li bakûrê kurdistanê li hemberî kurdan dana destpêkirin. Kurdan, li bajarên kurdistanê rêveberîyên xwe yên xweser denezendin. Dixwestin ku xwe bixwe bi rêve birin. Rejima tirk, pêşî bi hêrîşên ku li wan kir, xwest ku wan kriminalize bike. Piştre jî, wan tûna bike. Hemû hêrîşên li kurdan di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Dema ku mirov hêrîşên rejima tirk ên li van bajarên kurdistanê ên weke Cizira bota, Nisêbîn, Gever, Farqîn û hwd, fahm neke, mirov wê hêrîşên wê yên li rojava, alikarîya wê ya ji çeteyên DAÎŞê re û bi wê re jî hebûna leşkerên tirk a li başûrê kurdistanê ya li musil-beşîka, ´kanîmasî´, **´bamernê**´, ´delalok´, ´şeladizê´ û hwd jî, baş fahm nekê.

....

**Weke Beşîka, herêmên başûr ên ku rejima tirk weke navend şerê bi civate kurd re bihar dihênê kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê**

Dema ku mirov bahse dagirkirina başûrê kurdistanê bike di vê demê de, divê ku mirov navê cihên giring ên başûrê kurdistanê werêne ser ziman. Ev cih jî, kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê ya. Li van cihan, beşîka jî hatîya lê zêde kirin. Bi navên herêm û bajarên başûrê kurdistanê ên weke beşîka, kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê, di vê demê de bi dagirkirina leşkerên tirk re di rojevê de ya. Heta vê demê, nabê Kanîmasî, delakokê, Şêladizê û Bamernê bi dagirkirina başûr a ji aliyê artişa tirk ve di rojevê de bû. Lê piştî dagirkirina Musil û şengalê ji aliiyê Çeteyên DAÎŞ´ê ve herêma beşîka a musilê jî navê bi vî rengî weke yê kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê derket li pêş bi dagirkirina leşkerên tirk re

Ev pêvajoya dagirkirina van herêmên başûrê kurdistanê ên weke kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê û hwd, dîroka wan diçêt ta salên 1993-4´an û wan. Di van deman de rayadarên tirk partîya kurd PDK, di berdêla bi wê re danîna hin têkiliyna û weke hildana li cidiyetê û piştre li ser wan têkiliyan re ku bi wê çend peymanên aborî û hwd bi wê re çêkirin û hwd, êdî bi wan re ev partîya kurd, hat girêdan û piştre li ser wê re dagirkirina van herêmên kurdan hat meşrû kirin. Hertimî, dema ku mijara van herêmên dagirkirî ku hatîya rojevê, ev partîya kurd, hatîya derxistin li pêş û ji devê wê gotin hatîya dayîn gotin, weke ku çawa ku di dema ku navê ´beşîka´ bi dagirkirina wê re hat rojevê û Berzanî derket berçappameniyê û got ku ev ´mijar, hat pirr zêde mazin kirin" û hwd.

Di aslê xwe de ev reng û rêbazê dagirkirina rojava, divê ku mirov rêbazek metingerkirinê a li gorî demê ya li hemberî civate kurd jî werêne ser ziman. Her wusa, li ser van herêmên ku hatina dagirkirin re rejima tirk şerê xwe li dijî tevgera kurd û civate kurd dimeşênê. Rejima tirk, ev kirina temenê şerê xwe yê bi armanca jenosîdkirina civate kurd de jî.

Dema ku mirov bahse van herêmên başûrê kurdistanê ên weke beşîka, kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê û hwd bike, divê ku mirov bi dîroka şerê rejima tirk ê li hemberî civate kurd dimeşêne re werêne ser ziman. Herêmên Beşîka, kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê, weke herêmna stretejikî ên başûrê kurdistanê na. Ji van herêman rejima tirk, hertimî kirîya ku başûrê kurdistanê û sîyeseta wê jî bike bin kontrola xwe de. Dema ku em bahse pêvajoya li darxistina kongira netewî a kurd bikin û biserneketina vê pêvajoyê, divê ku mirov dîsa sedemeka wê bi vê rewşa dagirkirina van herêman re werênina ser ziman.

Her wusa, başûrê kurdistanê, bi dagirkirina van herêmên weke Beşîka, kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê û hwd re, weke ku ji navikê ve rêveberîya wê û sîyeseta wê dihê kirin bin kontrolê de. Her wusa, di aslê xwe de, mirov dikarê weke dorpêçekê ji li başûrê kurdistanê, desthilatdarîya wê û her wusa sîyesetkirina wê. Dem bi dem, dema ku herîş li başûr bûna û ankû hewldanên bi armancên derxistina tevlîhevîyê li başûr ji aliyê rejimên herêmên ên weke rejima tirk û hwd ve, ev herêmên ku hatina dagirkirin jî hatina bikarhanîn. Di dema şerê DAÎŞê ê li hemberî rojavayê kurdistanê de DAÎŞê li ser leşkerên tirk re ji van herêmên dagirkirî ên weke Beşîka, kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê û hwd re alikarîyek mazin stand. Di aslê xwe de bi alikarîya tirkiya, DAÎŞê, ev herêm û navend kiribûbûna temenê xwe de û herîşî başûrê kurdistanê dikir.

Hêrîşên li başûrê kurdistanê kurdistanê û şengalê, divê ku mirov werêne ser ziman ku li ser rêxistinên kujar û hov ên weke DAÎŞê û hwd re bê, divê ku mirov van herêmên dagirkirî weke lingekî ku bi wan ew herîş li başûr û herêmên wê dihatina li darxistin jî werêne ser ziman. Her wusa, mirov dikarê hinekî din jî wir de herê û bibêje ku ji destpêka salên 1993´an û pê de, heta roja me, pirranîya bombayên ku li Îraqê ditaqin, têkilîya van navendan bi wê re heya. Di salê 2007an de li şengalê ew komkujiya mazin a di 14 tabaxê de ku hatibû kirin, telîya tirkiya li ser van herêmên ku wê bi leşkerên xwe re dagirkirina re di wê de hebû. Lê piştre, çendî ku ji nava PDK´ê hinek mirovan ew dizanî û hanî ser ziman jî, piştre weke ku dengê wan mirovan ji nava wê hatina tafisandin jî. Heta ku di destpêka mudahaleya duyem a kendavê de jî li navendên partîyên PDKê û YEKÎTÎ hêrîşên ku hatina kirin, dîsa telîya van navendênk u hatina dagirkirin heya. Di hêrîşa li bîroya PDKê

a ku di wê de rêveberê wê samî Abdullrahman jî hatibû qatilkirin, dihat zanîn ku telîya tirkiya ji van navend dagirkirî heya, çend ku bi çend gotinan hingî di wê demê de hat ser ziman jî, lê piştre ew gotin hat dayîn ji bîrkirin. Heman rewş di rewşa komkujiya di sale 2007an a li şengalê de jî bû. Hingî, heta ku gelek rayadarên başûrî fahmkiribûn ku telîya tirkiya ji van navendên dagirkirî ên weke kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê û hwd heya. Lê ew jî, çendî ku çend gotin di vê çerçoveyê de hatina gotin jî, piştre hatina dayîn jibîrkirin.

Bi heman rengî, ji destpêka şerê çeteyên DAÎŞê ê li hemberî civate kurd li başûr û şengalê, ev navendên weke Beşîka, kanîmasî, Delakokê, Şêladizê û Bamernê û hwd, weyn û roleka mazin leyistina. Heta ku hêrîşên DAÎŞê ên ku hebûna rêveberîya a başûr digirtin di wê demê de jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Şerê DAÎŞê, giştîya civate kurd, li her çar beşên kurdistanê dabû bû berxwe. Hêrîşî hemûyan dikir. Di destpêka şer de, li ser olê re digotin ku "qatle kurdan ´helal´ a" û piştre hêrîşî kurdan dikirin.

Dema ku em vê pêvajoya hêrîşî a bi navê DAÎŞê baş şîrove nekin, emê fahm nekin ku wê di rojên pêş de jî, wê bi çi rengê hêrîşên xwe bidina domandin li civate kurd. Bo vê yekê, giring dibê ku mirov wê baş dahûr bike û fahm bike. Li vir, bi dûbareyî divê ku ez werênima ser ziman ku DAÎŞ, ji rêxistinekê zêdetirî, divê ku mirov weke pêvajoyeka şer ya li hemberî civate kurd û herêmê werêne ser ziman. Carna, di vê pêvajoyê de bi navê DAÎŞê hêrîş dikin. Carna, di vê pêvajoyê de bi navê Ahrar el-şam hêrîş dikin. Carna jî, di vê pêvajoyê de bi navê cebetil-nasr hêrîş dikin. Bi vî rengî, gelek navên din jî, heya ku bikarbênin. Lê ev nav hemû jî, bi armanca li ser çapameniyê re li darxistina oparasyonên têgihê ên li mejiyê mirov in. Bo ku fahmkirina mirov şaş bikin in.

**.Bi wan rewşên şandina leşker li beşîka, hebûna leşkerên tirk li bamernê, delakokê, kanîmasî û şiladizê, civînên weke li Rîyadê, hewldana di destê DAÎŞ´ê de girtina xate di nava koban û afrînê a ezaz û cerablusê û hwd re ku me hanîn ser ziman, çerçoveya hêrîşên nû ên li kurdan ku wê di demên pêş de werina kirin tê afirandin.**

Ku mirov ji kîjan aliyê ve binerê, pêşketinên li herêmê, wê pêşaroja herêmê jî bidina dîyarkirin. Bi heman rengî, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku heyîna cîvînên weke ên li Rîyadê, hebûna leşkerên tirk li beşîka û musil û her wusa xate di nava kobanê û afrînê a ezaz û cerablusê de temenê hêrîşên nû ên li herêmê û bi teybetî li kurdan diafirêne. Her wusa di serî de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman. Pirsgirêka kurd, bûya êdî pirsgirêkek herêmî. Pirsgirêk, ji nava sînoran derbas kirîya. Bo vê yekê,

şerê bi kurdan û civate kurd re jî ji sînoran derbas kirîya. Her wusa alikarîya Tirkiya a ji DAÎŞ, Cebetil-nasr, Ahrar el-şam û hwd re ku hêrîşî kurdan û herêmên wan dikin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Şerê ku bi giştî bi kurdan re dihê meşandin, karakterê wê, bi gotina jenosîdê û ankû jenosîdkirina civatê re mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de şerekî jenosîdkirinê ya. Pêvajoya ku di wê de DAÎŞ hatibû bi rêxistinkirin û hat dayîn hêrîşkirin li ser kurdan, gelek planên rejimên herêmê ên weke tirkiya bi wê re hebûn. Du hasabên sereka hebûn. Yek, ew bû ku bi DAÎŞ´ê wê derbeyek giştî li kurdan xistiba û ew ´pêvajoya çareserîyê´ ku bahse wê dihat kirin, wê tirkiya ji wê xilas bikira. Lê dema ku DAÎŞ, hevîya wan ne hanî li cih, êdî wan bixwe dawî li pêvajoya çareserîyê hanî û şer bi civate kurd re dana destpêkirin. Hêrîşên ku rejima tirk bi artişa xwe re li bakûrê kurdistanê, ji yê ´şerkirina dewletekê bi dewletek din re´ maztira. Her wusa, ti qaîda û rêzik di wê de nayêna naskirin. Î ro bajarên bakûrê kurdistanê ên weke Cizira bota, Nisêbîn, Gever, Farqîn, Silopî, Sûra Amedê û hwd, bi gelek deverên din re weke kobanê hatina xûrixandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku çerçoveya konsepta şer a rejima tirk ku şerê wê ê bi kurdan re di 24´ê temûza 2015´an de destpêkir jî, divê ku mirov ne tenê di çerçoveya giştîya bakûrê kurdistanê de hilde li dest. Her wusa divê ku mirov di çerçoveya giştîya kurdistanê de hilde li dest. Hewldanên wê yên li başûrê kurdistanê ên weke şandina leşker li beşîka û hwd jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Ti kesek nikarê politikaya rejima tirk a şandina leşker li beşîka ji hewldana wê ya ku ew bi wê dixwezê ku xate di nava kobanê û afrînê de ku di destê çeteyên DAÎŞ, cebetil-nasr, ahrar el-şam û hwd de bide hiştin cuda werêne ser ziman. Di çerçoveya şerê rejima tirk ê bi kurdan re divê ku mirov wan herdû mijaran bi hevdû ve girêdayî hilde li dest. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rejima tirk, ji beşîka û heta ezaz û cerablusê, weke xateka şer dixwezê ku di nava kurdistanê de li hemberî civate kurd bide afirandin. Pêvajoya şerê rejimê ê pêşî ku li ser DAÎŞ´ê re li ser DAÎŞ´ê re ji Musilê û heta rojava û afrînê û hwd biafirêne. Lê ev bi serneket.

Gotinên li ser hebûna leşkerên tirk ên li beşîka re ku tên gotin ku "bo rizgarkirina musilê" û ankû "bo perwerdekirinê li wir in", di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku yekî rastîya rejima tirk û rewşa wê ya bitêkilî a bi DAÎŞ´ê re bizanibê, wê bi rehetî fahm bike ku ev gotinên bi vî rengî tenê manipûlasyon û derew in. Tirkiya, wê ti carî li hemberî DAÎŞ´ê şer nekê. Car bi car weke ku ´şer´ û ankû ´tekoşînê´ li hemberî DAÎŞ û hwd, dike ku xwe bide nîşandin. Lê ev jî, wê bo domandina rewşa xwe ya bi vê rengî ya li ser

DAÎŞ´ê re bê.

Her wusa weke aliyekî din ê ku rejima tirk bi wê ji DAÎŞê bi bendewar bû, ew bû ku wê DAÎŞ´ê derbeyek giştî li kurdan bixista. Di vê çerçoveyê de di xistina Musilê destê DAÎŞ´ê de jî rol û weyna tirkiya li pêş bû. Alikarîya tirkiya ji wê re bû. Nûha jî, hebûna leşkerên tirk, li başûr û bi teybetî li beşîka, di çerçoveya rewşek mihtemel a ku wê Musil ji destê DAÎŞ´ê were rizgarkirin de ku ew karibê rewşa xwe biparêzê bê. Bi gotinaka din, ku temenê şerê xwe yê bi civate kurd re bide parastin û domandin bê. Ji bilî beşîka, hêzên tirk li başûrê kurdistanê bi levkirina PDK´ê re ji sala 1993-4´an ve li Kanîmasî, Bamernê, Delakokê, Şiladizê û hwd jî hena. Heta roja, dihê gotin ku "tirkiya 25 caran oparasyonên dervî sînor li hemberî tevgera kurd li başûrê kurdistanê kirina." Di van oparasyonên wê yên leşkerî de, ev navêndenên weke Bamernê, Delakokê, Şiladizê û kanîmasî û hwd hatina bikarhanîn. Dema ku tê gotin ku leşkerên li beşîka bo perwerdekirinê na. Divê ku mirov bipirsê ku bi hezaran leşker û bi sedan tank û topên li van navendên wê yên din ên li başûrê kurdistanê ên weke **bamernê, delakokê, Şiladizê, Kanîmasî** û hwd, ji ber çi li wir in? Bêgûman, mirov nikarê, bi gotina ´perwerde´kirinê re werênina ser ziman. Her wusa, di çerçoveya şerê rejima tirk ê bi kurdan re û bi gotina zihniyeta wê ya metingerî divê ku mirov wê werêne ser ziman.

Hêrîşên li Afrînê, civîna li Rîyadê û hebûna leşkerên tirk li beşîka, çerçoveya hêrîşên nû ên li herêmê jî diafirêne. Her wusa, ji vê rewşê miirov dikarê fahm bike ku rejima tirk, di serê xwe de ne xwediyê politikayna baş ên mirovane ya. Her wusa, xwediyê politikayna ku bi wê şer bi kurdan re bike û bi wê şerê re jî ku karibê derbeyekê li kurdan bixe. Her wusa, di vê çerçoveyê de li beşîka rejima tirk, leşker bicihkirina.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku divê ku mirov li politikayên wê yên li dijî rojava binerê û bi wan hebûna leşkerên wê yên li beşîka fahm bike. Bi wê re jî, vajî wê jî, ku mirov li hebûna leşkerên wê yên li beşîka binerê û politikayên wê yên li li dijî rojava û bi teybetî jî li dijî bakûrê kurdistanê fahm bike. Weke ku çawa ku mirov nikarê hebûna leşkerên tirk ên li beşîka ji rewşa wê yê ya ku bi alikarîya DAÎŞ´ê hêrîşî rojava dike cuda werêne ser ziman, bi heman rengî mirov nikarê hebûna leşkerên wê yên li beşîka û ji hêrîşên wê yên li dijî rojava, hêrîşên li bakûrê kurdistanê jî cuda werêne ser ziman. Bi hevdû ve girêdayî û di çerçoveyekê de divê ku mirov werêne ser ziman. Li vir, bi gotinaka din jî, mirov dikarê vê yekê werêne ser ziman û bibêje ku politikaya wê ya ku bi wê hêrîşî Cizira bota, Nisêbîn, Gever, farqîn û hwd dike û her wusa, bi wê ´qadaxayên derketina li sûkan´ dike û bi wê diçê bi ser kurdên bakûrê kurdistanê de, mirov dikarê bi wê

rengê politikaya wê ya ku bi wê leşker şandîya beşîka fahm bike. ....

**Çerçoveya nû a hêrîşên li herêmê; hebûna leşkerên tirk li beşîka, civîna Rîyadê û rewşa eaza û cerablusê**.

Berzanî, di destpêka gera xwe de gotinên ku li ser hebûna leşkerên tirk li beşîka dihêne ser ziman, ji yên rayadarên tirk ne cudatir in. Her wusa gotinên ku Berzanî dihêne ser ziman, "bûyar hat mazin kirin." Lê rastî, ji van gotinan jî pirr zêde mazintira. Her wusa, ji xwe, ji salên 1995´an ve li bajarên başûrê kurdistanê ên weke bamernê, delakokê, Şiladizê, Kanîmasî û hwd, hebûna leşkerên tirk bi levkirina bi PDK´ê re li wir heta roja me, hatîya domandin. Ji wê demê û heta roja me, ser 25 oparasyonên leşkerê ên dervî sînor li başûrê kurdistanê hatina kirin li hemberî kurdan û tevgera kurd, û ji van navendên leşkerî ku artişa tirk li başûrê kurdistanê afirandina, ew oparasyon hatina birêvebirin.

Çend ku bê gotin ku ew leşker li wir in bo "perwerdekirinê" jî, lê divê ku mirov werêne ser ziman ku di destpêka pêvajoya xistina musilê li destê DAÎŞ´ê de jî, weyn û rola van leşkerên tirk ên li beşîka heya. Ji wir, weke ku oparasyona DAÎŞê a li musilê hatîya bi rêvebirin û piştre li bajarên din ên Îraqê ew hatîya pêşxistin.

Pêvajoya şerê bi kurdan re di vê çerçoveyê de bi hebûna leşkerên tirk ên li beşîka û komkujiya li Til-têmirê re ku di 11´. berfanbera 2015´an de bû, weke destpêka vê pêvajoya nû a şer ku rejima tirk li hemberî kurdan û civate kurd bi rêve dibê jî ya. Her wusa, bi van rewşan re, ev pêvajoya şer weke ku ketîya pêvajoyaka din ya hêrîşkirinê li hemberî civate kurd, Ev hêrîş, wusa xuya dike ku wê werina zêdetir kirin. Piştî civîna li Rîyadê, kirina komkujiya Til-Têmirê, divê ku mirov weke rastîya zihniyeta civîna Rîyadê jî werêne ser ziman. Ev komkujiya li Til-têmirê, di çerçoveya mantiqê civîna li Rîyadê de bûya ku rojava li hemberî civate kurd. BI gotinaka din, civîna Rîyadê, bi vê komkujiya li til-têmirê, weke ku ji kurdan re bibêje ku wê li hemberî statûya xweser a rojavayê kurdistanê şer bike. Wê wê nasnekê. Di vê çerçoveyê de bi vê mantiqê ev hatîya kirin. Wê ev herîş werina dayîn domandin jî. Mantiqê, civîna rîyadê li ser esasê înkare kurd û civate kurd de, bi mantiqê rejima tirk re hatîya pêşxistin. Hemû komkujiyên ku li herêmê dihên kirin jî, çerçoveya vê mantiqê û zihniyetê ya.

Li vir, divê ku mirov di dewama mijarê de werênina li ser ziman ku rewşa leşkerên tirk ên li beşîka, bi gera Berzanî a li Tirkiya di 10´ê berfanbera 2015´an re dihê xwestin ku were mayindakirin û xort kirin. Di vê çerçoveyê de dihê xwestin ku ew li wir bêhiştin. Piştî gera Berzanî, hanîna li ser ziman ku ”berzanî bi Ocalan re hevdîtin kir” jî, ku kiribê jî û ne kiribê jî,

divê ku mirov vê gotinê weke manipûlasyoneka di vê çerçoveyê de ku dixwezin biafirênin bê. Her wusa wê çawa, rewşa leşkerên tirk, bidina domandin, di vê çerçoveyê de gotin hatina gotin.

Li herêmê, wusa xuya dike ku divê ku mirov fahm bike ku li Rîyadê hebûna civîna qaşo ”muhalefetên li Sûrî”, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke civîneka ku bi wê re ji nû ve rêxistinkirinekê li ser hêzên ku li di nava Sûrî de didina şerkirinn ku bi wan re bidina çêkirin bê. Ji xwe piştî civîna li Rîyadê ku bû, di roja 11´ê berfanbarê de li Til-têmirê bi awayekî hemwaxt hêrîşên bi arabeyên bomba barkirî li gelê sivîl, her wusa, mirov dikarê weke nîşanaka hêrîşên pêvajoyên nû jî bixwêne. Di vê dema ku hêrîşên li Afrînê dibin bi alikarîya tirkiya ku çeteyên Ahrar el-şam, cebetil-nasr û hwd dikin jî, divê ku mirov di dewama vê hêrîşan de werêne ser ziman. Bi wê re zêdekirina hêrîşan li taxên kurdan ên li hababê jî, vê rastîyê radixe li berçav.

Li kurdistanê, weke ku pêvajoyek nû ya herîşkirinê wê were dayîn destpêkirin. Wusa dihê dîtin ku hebûna leşkerên tirk, weke rewşeka metingerî ku bi mantiqê civîna Rîyadê û di dewama wê de dihê kirin a. Ya ku bi wê re mirov kifş dike, ew a ku dixwezin ku vê pêvajoya metingerîya li herêmê li ser serê kurdan bidina domandin. Her wusa, di vê çerçoveyê de hêzên li herêmê ku bi pirsgirêka kurd ve alaqader in, mirov nikarê bibêje ku j ivê rewşê bêxaber in. Bi hevdû re di nava ahengekê de ev dihê kirin. Çend ku li herêmê hêza herî mazin ya ku bi DAÎŞê û komên din ên çeteyên cihandîst re şer û tekoşînê de tenê kurd in û rojava(´ewropa´) û Amerika dibêje ku ew xwediyê koalisyona ku li dijî DAÎŞ´ê şer bike jî ya, Herî zêde, di vê pêvajoyê de hêrîşên ku li kurdan dibin, li hemberî wê bêdeng in. Rejima tirk ku andamê NATO ya, di vê çerçoveyê de ji destpêka pêvajoyê şerê DAÎŞ´ê ve hertimî bi awayekî li gorî zihniyeta xwe ya înkarker hêrîşî kurdan dike. Ji 24´ê temûza 2015´an ve her roj bi sedan balafirên şer dirakê û çîyayên kurdistanê bombabaran dike. Bajarên kurdistanê weke Cizîîra bota, Nisêbîn, Farqîn û hwd, ku hemû bajarên din jî di nav de, tarûmar dike, lê li hemberî wê ti deng dernekeve. Her wusa, ev rewş hemû, divê ku mirov di çerçoveya politikayên pêşarojê de bixwêne.

Hêrîşên herî mazin li kurdan dibin. Li herêmê hêrîşên ku li civate kurd dibin, hem ji aliyê rejimên herêmê ên weke Tirkiya ve dibê û hem jî bi destê çeteyên DAÎŞê ku ew alikariyê didinê (´rejimên weke tirkiya´) de dibê. Ev pêvajo, di vê çerçoveyê de didomê. Di vê çerçoveyê de ji her aliyê ve hêrîş li kurdan dibin. Kurd, bi şer weke ku hem ji aliyê rejimên herêmê ên weke tirkiya û her wusa çeteyên DAÎŞê û hwd ku ew alikariyê didinê ve hatîya dorpêçkirin. Î ro, ´ambargo´ û ´abluka´ ku li ser rojava rejimên weke tirkiya pêşxistî, temenê domandina vê şerê li rojava, li bakûrê kurdistanê û

herikandina şerê bi civate kurd re li başûrê kurdistanê jî. Her wusa, ji vê aliyê ve jî divê ku mirov hebûna leşkerîn tirk a li beşîka werênê ser ziman.

Di aslê xwe de piştî şandina leşkerên tirk li beşîka-musil û li darxistina civîna li Rîyadê, zêdebûna hêrîşên çeteyan li Afrînê û hêrîşên bombayî ên ´întixarî ên li til-têmir û hwd, di derbarê stretejî û rewşa di çerçoveya vê stretejiyê de ku dixwezin biafirênin jî hizirna baş didina me. Her wusa, piştî civîna li Rîyadê, hêrîşên bombayî li Til-têmirê, her wusa, nîşanaka hêrîşên nû ên li rojava û civate kurd jî mirov dikarê bixwêne. Di vê çerçoveyê de hêrîşên li bakûrê kurdistanê jî dixwezin bidina domandin. Bi wê re di ahengekê de hêrîşên li rojava zêde bikin. Di destpêka hêrîşên li kobanê de ji bakûrê kurdistanê alikarîya mazin ji wê bû. Bi berxwedana li kobanê re li bakûrê kurdistanê jî hemwaxt serhildan bûn. Vê carê, dixwezin ku şer li bakûrê kurdistanê bidina domandin. Bi wê re li rojava gav bi gav, li rojava pêvajoyek nû ya şer bidina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de têkilîya rojava û bakûrê kurdistanê, bi şerên ku di wan de hatina dayîn destpêkirin re ji hevdû cuda bikin. Hinekî jî divê ku mirov mantiqê domandina şerê rejima tirk ê bi konsepta wê ya şer re li bakûrê kurdistanê, ji vê aliyê ve jî hilde li dest. Di vê dema ku li bakûrê kurdistanê hêrîşên xadar dibin, rejima tirk û rayadarên wê dihizirin ku bi wan hêrîşên ku li bakûrê kurdistan dikin, dema ku pêvajoyaka nû ya hêrîşan li rojavayê kurdistanê werê dayîn destpêkirin wê pêşîya beertek, serhildan û rabûna serpîyan wan bigrê.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov têkilîya pêvajoya şer ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê dayî destpêkirin, bi pêvajoyên hêrîşên li ser rojava re jî werêne ser ziman. Divê çerçoveyê de jî divê ku mirov li pêvajoyê binerê. Her wusa, di vê çerçoveyê de dixwezin ku pêvajoyeka nû ya şer di vê çerçoveyê de bidina destpêkirin.

Pêvajoya şer ku rejima tirk li hemberî kurdan daya destpêkirin, di vê demê de li ser gotinên ku di wan de navê ´birêz ´ocalan´ dihê bikarhanîn re, bi wan re dixwezê ku manipûla bike. Di gera Berzanî de hanîna rojevê ku Berzanî bi ocalan re hevdîin kir´ jî, di vê çerçoveyê de weke manipûlasyoneka li mejiyê mirov divê ku mirov wê hilde li dest. Ev di serî de weke oparasyoneke têgihê ya. Li ser gotin û hevokên bi vî rengî re dixwezin ku mejîyan mijul bikin û herîşên xwe bidina domandin. Piştî pêvajoya pêşî a bi DAÎŞê û navê DAÎŞ´ê ku li hemberî civate kurd li başûrê kurdistanê, rojavayê kurdistanê û bakûrê kurdistanê hat dayîn destpêkirin, nûha jî, wusa dihê dîtin ku li ser wê re pêvajoyek duyemin ya şer li hemberî civate kurd dixwezin ku bidina dayîn destpêkirin. Her wusa, pêvajoya şer û hêrîşên rayadarên tirk bi polîs û leşkerên wê re li bakûrê kurdistanê, şandina leşkerên tirk li beşîka û her wusa civîna Rîyadê, di vê çerçoveyê de

pêvajoyek nû ya şer li hemberî herêmê û bi teybetî li kurdistanê li hemberî kurdan dihê dayîn destpêkirin. Li Rîyadê, li darxistina civînên bi vî rengî û piştî wan re destpêkirina pêvajoyên hêrîşê li herêmê û li kurdistanê, weke rêbazekî bikarhanîna olê jî di şerê xwe yê ku li hemberî herêmê û kurdan didina dayîn de, mirov dikarê fahm bike.

Ev rêbazê bikarhanîna olê, divê ku mirov li ser wê jî bisekinê. Ji xwe, heta ku ev newê fahmkirin ku li gorî wê bi nêzîkatîyaka rast bersiv ji wê re newê dayîn, wê li hemberî wê serkevtin jî zêde çênebê. Ev rêbaza bikarhanîna olê, di temenê vê pêvajoya şer ku navê "DAÎŞ´ê" lê hatîya kirin jî ya. DAÎŞ, ji rêxistinekê zêdetirî, navê pêvajoyeka şer a li herêmê û li dijî civate kurd a. Heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê ev pêvajo jî, were domandin li herêmê û li ser serê civate **kurd.**

Hêrîşên li Afrînê, civîna li Rîyadê û hebûna leşkerên tirk li beşîka, bi rewşa ezaz û cerablusê re çerçoveya hêrîşên nû ên li herêmê å li rojava jî diafirêne. Destpêka van hêrîşên ku bi vê çerçoveyê wê werina kirin, destpêka wan weke ku bi hêrîşa li til-têmirê bû. Di vê çerçoveyê de hêrîşên nû wê li ser Afrînê bidina destpêkirin. Ji herêmên weke ezaz û cerablusê, ku bi alikarîya tirkiya di destê çeteyan de hatîya hiştin, ji wir, hêrîşên li kobanê û Afrînê di van deman de zêde bûna. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Ev herêmên ezaz û cerablus´ê, weke herêmên ku tirkiya li ser wan re şerê li dijî rojava ku bi rê ve dibê ya. Ji ber vê yekê, naxwezê ku ev herêm ji destê çeteyên DAÎŞê ku di bin kontrola wê de na derkeve.

**Komkujiya li Til-têmirê, di roja ku li rojava ji hemû dordorên Sûrî û rojava ku li hevdû civin bo ku çareserîyekê ji rewşa Sûrî re bibînin re pêktê. Her wusa, komkujiya li Til-Têmir, weke ´şabote´ kirina wê civînê jî divê ku mirov werêne ser ziman. Yanî, weke ku ji gelên Sûrî û rojava re hatîya gotin ku ´win nikarin li çareserîyan bigerihin û wan bibînin. Tenê, çareserîya me heya. Dernekevina dervî wê." Bi komkujiya li Til-têmir re ev peyam hatîya dayîn li dordorên demokratîk ên li Sûrî û rojava.**

Li rojava kongreya Sûriyeya Demokratîk a hêzên opozîsyona Sûriyeyê li bajarê Dêrikê di dîrokên 8-9´ê berfanbara 2015'an de bi dirûşmeya "Ji bo avakirina Sûriyeke azad û demokratîk" hatibû lidarxistin. Di vê civînê de nêzî 103 keseyetên ji dordorên rêxistinên Sûrî û rojavayê kurdistanê tevlî bûbû bûn. Armanca wan ew bû ku ji tengezerîyên li Sûrî re çareserîyekê mayînda peyda bikin. Li darxistina kongireya Sûrîyeya demokratîk, hêz û rejimên weke tirkiya ku naxwezin ku çareserî ji pirsgirêkên Sûrî re were ditin jî aciz dike. Komkujiya li Til-Têmirê, her wusa, weke komkujiyeka

hêzên ku li Rîyadê civîyane ji vê cîvîna ku li bajarê Dêrikê ê rojava ku hatîya li darxistina jî.

Hêzên statûqûparêz ên li herêmê, di civîna li Rîyadê de amedê bûna. Ev hêz jî,, bi politika û zihniyetên xwe, ne dixwezin ku statû û xweserîya rojava nasbikin ku kurd bigihijina mafên xwe û ne jî dixwezin ku li herêmê dervî zihniyeta wan bi navê gelan pêşketinek rû bide. Di vê çerçoveyê de ev hêz, heta roja me, bi rêxistinê kujar ên şer ên weke yên DAÎŞ, Ahrar el-şam, Cebetil-nasr û hwd, hêrîşan li rojavayê kurdistanê li hemberî kurdan û xalkên din ên li rojava pêktênin.

Heta roja me, ji Sûrî û rojava, bi deh-milyonan mirov hatina goçberkirin û qatilkirin. Hemû jî, di ancama politika û hêrîşên van rêxistinên kujar ên weke DAÎŞ, Ahrar el-şam, Cebetil-nasr û hwd, ku li ser navê van hêz û rejimên herêmê û ku bi zihniyeta wan şer dikin in. Em dema ku van rastîya li berçav digirin û dikin ku rastiya hêrîşa li Til-Têmir a di 11´ê berfanbarê ku hatîya kirin, baştir fahm dikin. Her wusa, çendî ku mirov divê ku komkujiya li Til-Têmir ku di wê de jin, zarok û gelek sivilan jîyane xwe de ya, weke ancama zihniyeta hêzên ku li Rîyadê civîyane, bi heman rengî divê ku mirov weke bertekeka wan hêzan li hemberî çareserîyên xalkan ku weke ku li rojava û dêrikê ku bo çareserkirina pirsgirêkên Sûrî û rojava ku kongiraya Sûrîyeya Demokratik ku hatibû li darxistin jî werêne ser ziman.

Heta roja me, hêrîşên li rojava, divê ku mirov weke hêrîşên ku ev hêzên ku li Rîyadê li hevdû civîyane jî werêne ser ziman. Her wusa, pirranîya hêrîş, şer û komkujiyên ku li Sûrî û rojava hatina kirin, divê ku mirov weke ancama zihniyeta wan jî werêne ser ziman. Ji ber ku di çerçoveya zihniyeteka ku bi wê dixwezin ku serdestîya xwe li ser serê gelan ava bikin û wan bikina bin kontrola xwe de û bi wê re jî ku dernekevina dervî gotina wan. Di vê çerçoveyê de xwediyê zihniyeteka metinger in. Heta roja me, hemû şer û pevçûnên ku wan li herêmê derxistina, weke şer û pevçûnên ku ancama vê rastîya zihniyeta wan in.

Pirsgirêka Sûrî û rojava, ne pirsgirêka dîtina çereserîyê ya. Her wusa, pirsgirêka, zihniyeta van hêzên ku li Sûrî, ku dixwezin ku li gorî zihniyeta xwe serdestîya çêbikin a. Bo vê yekê, her yekê ji aliyê xwe ve hêzeka xwe avakirîya û li sûrî li dijî gelên Sûrî û rojava dide hêrîşkirin û şerkirin. Di vê çerçoveyê de pirsgirêk, dema ku ev bê, hingî, vîna gelên Sûrî û rojava tûna dihê hasibandin. Bi wê re jî, ew hêz, dixwezin ku hêza xwe bi hêrîş, şer û hêrîşkirinan dixwezin ku bidina herê kirin. Dema ku gelên Sûrî û rojava vîna van hêzan herê nekin jî, ev hêz, bi hêzên ku xwe çekdar ku di nava Sûrî de dervî vîna gelên Sûrî û rojava ku ava kirina, didina hêrîşkirin li ser serê wan. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov dihizirê, mirov dibînê ku pirsgirêk, ne

pirsgirêka gelên li Sûrî û rojava ya. Pirsgirêk, dibê pirsgrêka zihniyeta van hêzên ku dixwezin ku metingerî û dagirkerîya xwe li wir pêşbixin a.

Komkujiya li Til-Têmirê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke komkujiyeka ku li hemberî vîna gelan û lêgerîna wan ya çareserîyan jî werêne ser ziman. Ev komkujî, di vê çerçoveyê de weke komkujiyeka van hêzên ku li Sûrî ku şer dikin, a li dijî gelên li Sûrî û rojava ya. Mirov dikarê, vê komkujiya li Til-Têmirê ku di 11´ê berfanbara 2015´an de bû, weke komkujiya ku di newroza 2015´an de li Hesekê bû jî, bibînê û werêne ser ziman. Zihniyeta di temenê wan de heman zihniyeta a. Di dema Newrozê de komkujiya li Hesekê ku hat kirin, hingî di roja ku di wê de nameya birêz Ocalan hatibû xwandin de hatibû kirin. Di wê nameyê de, bahse pêvajoya çareserîyê dihat kirin û dihat xwestin ku pêvajoya çaserîyê were domandin û bê wergerandin li muzakareyan. Lê weke bersivaka ku ji vê gotinê re jî bê, ew komkujiya di roja newrozê de li Hesekê hat kirin ku her çar beşên kurdistanê kira navê şînê de. Piştre jî, ji xwe re rejima tirk, hin bi hin pêvajoya çareserîyê dawî li wê dihanî. Dema ku dîrok hat dema hilbijartinên 7´ê hezîrenê û pê de, êdî bi tememî rejima tirk, konsepta şer bi gelê kurd re xist meriyetê de.

Di ancama wê de li hemû bajarên bakûrê kurdistanê, hêrîşên raaydarên tirk, bi polîs, leşker, hêzên teybet û hwd, hemû çekên giran ên weke balafirên şer û tank û topan jî di nav de, bi wan didomê. Her wusa, ev zihniyeta ku wê di dema newroza 2015´an de ew komkujiya mazin li Hesekê kir, ne dixwest ku pêvajo bidomê û ew zihniyet î ro hêrîşan li bajarên bakûrê kurdistanê dike. Her wusa, bi şandina hêzên xwe li bajarên başûrê kurdistanê ên weke beşîka û hwd re temenê pêvajoyek din ya mazin a şer bi kurdan re dike ku birêxistin bike û bide domandin. Ji vê rewşa şandina leşkeran li beşîka, divê ku mirov fahm bike ku pêvajoyek şer ya giştî li hemberî civate kurd bi armanca tûnakirina wê û ji dîrokê birina wê bi wê re dihê meşandin.

Hêrîşên li rojava, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wan hilde li dest û fahm bike. Heta roja me, hêrîşên ku li rojava bûna, bi armanca şikandina civate kurd in. Pêvajoyek şer ya giştî ku hebûna civate kurd armanc digirê bi wê re dihê meşandin. Ji Aliyê rejima tirk ve weke ku di 10´ê berfanbarê de hanîna Berzanî li Tirkiya û hevdîtin kirina wî, tenê bi armanca weke maskeyekê ji vî şerê jenosîdê ê li hemberî civate kurd dihê meşandin a. Yanî, dixwezin ku dîmenekî din li ser wî şerê ku bi wê dixwezin ku jenosîdkirina civate kurd bikin, bidina cihanê. Gotinên T. Ardogan ên bi rengê, "Dewletê wê hertimî bi kurdan re bê. Wê wan bi tenê ne hêle" jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke çêkirina dîmenekî din li ser vê şerê bi armanca jenosîdkirina civate kurd re ku dîmenekî din ku wê weke ku li cem

kurdan in bidina cîhanê. Lê ev dîmen, dîmenê xapandina mejiyê rayagiştî û cihanê ya. Dîmenê rastî ê ku rastîya rejima tirk dihêne ser ziman, bi alikarîya wê hêrîşên li rojava, bombardimana wê ya li çîyayê bakûrê kurdistanê û başûrê Kurdistanê, Hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs û leşkerên wê li bajarên bakûrê kurdistanê ya û bi wan hêrîşan tarûmar kirina bajarên kurdan a, şandina leşkerên tirk li beşîka û musilê û hwd a.

**....**

**Di dewama vê de berxwedan û serhildanên gelê kurd li bakûrê kurdistanê û pêvajoyên wê.**

Ji 7´ê hezîrene 2015´an ve li kurdistanê hêrîşên mazin ên dewletê li kurdistanîyan bûn. Berî 7´ê hezîrenê, amedekarîyên mazin ên bo hêrîşkirinê dihat kirin. Rejima tirk, gelek hêz weke polîs û leşker, tank û top bo hêrîşkirinê diharikandin li bajarên kurdistanê. Ev hêz û tank û topênn ku dihatin herikandin li kurdistanê hin bi hin dihatin kirin devrê de ku hêrîşî kurdistanîyan bikin. Di nava bajaran de tax bi tax, hêrîşên rayadarên tirk bi polîs û leşkerên wan re hebûna wê didomî ya. Pêşî, navê Sûra amedê, Cizîra bota û Farqînê derket li pêş. Berî hilbijertinên 7´ê hezîrenê, kurdistanîyan li bajarên kurdistanên weke Cizira bota, Gever û her wusa Baxlara Amedê, sê dibistanên kurdî vekirin bo ku zaroyên xwe di wan de perwerde bikin. Lê hêzên dewletê bi fermana hikimeta tirk, hêrîşî wan dibistanan kir. Gelek caran mohr li devê wan dibistanên kurdî xistin lê kurdistanîyan her seferê ew mohr qatandin û cardin dibistanên xwe divekirin.

Bi wê re hêrîşên li kurdistanîyan zêdetir dibûn. Dem bi dem hêrîş dibûn. Li deverekê bo xwepêşandinaka demokratik jî dema ku çend mirov dihatina cem hevdû rastî mudahaleya hêzên dewletê dihatin. Êdî kurdistanîyan, ne xwestin ku ev di jîyane wan de bibe. Bo vê yekê, êdî bidest berxwedana kirin. Di wê dema ku li rojavayê kurdistanê, Pêşî Girê-sipî û piştre Hesekê ji destê çeteyên DAÎŞ´ê ku alikarî dida wan ku ji destê wan rizgarkirin û pê de, rejima tirk pirr bi hêrs bû. BI wê re jî, hin bi hin ew rengê hêrîşên li rojava li bakûrê kurdistanê jî pêşxistin. Li bakûrê kurdistanê, êdî tax bi tax bidest hêrîşê dikirin. Her wusa, diçûna bi ser kurdistanîyan de. Weke bersiveka mazn ya kurdistanîyan, wê pêşî ji Cizîra bota û Farqînê bersiv ji van hêrîşên rejimê re were. Van bajarên kurdan. rêveberîyên xwe yên xweser denezendin. Di xwestin ku ew xwe bixwe bi rêve bibin. Bo vê yekê, bidest xwe parastina cewherî jî kirin. Pêşî li Farqînê, çend rojan bi hêrîşên ku hêzên dewletê bi polîs û leşkerên tirk re ku li wê dikir û pê de, ket rojevê de. Lê piştre, hin bi hin berxwedana li Cizîra bote derket li pêş. Li Cizira bota, berxwedana li taxên wê ên weke ´**Yafes**´, ´Nûr´, ´Sûr´, ´Cudî´ û ´qonakê´ û gelek taxên wê yên din jî, wê bi wê bikeve rojeve kurdistanê, tirkiya û

cihanê de. Berxwedana li Cizira bota, wê têgînekê bi xwe re jî di nava kurdistanîyan de bide çêkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman, Cizîra bota, bi wê berxwedana xwe re ser du hefteyan re wê di rojeve Kurdistan, tirkiya û cihanê de bê. Her wusa, di wê demê de jî hêzên dewletê bi polîs û leşkerên wê re herêm û taxên Cizîra bota dorpêç kiribû bûn. Bi wê re qadaxaya derketina li sûkê danîbûn. Kurdên ku derdiketina li sûkê dihatina qatilkirin. Ev rewş, wê ser du hefteyan re li kurdistanê bê sedema pirr bertekên kurdistanîyan ku ji bajarên din ên kurdistanê bo cizira bota dihatina dayin bû. Ji aliyekî ve ew şerê ku li rojava hatibû pêşxistin, rejima tirk ew dihanî bakûrê kurdistanê. Lê bi wê re kurdistanîyan jî berxwedana li rojava û bi teybetî ku kobanê bûbû dagera wê, hanîbûn bakûrê kurdistanê û pêş dixistin. Di vê demê de gotinên ku li ser berxwedana Cizira bota dihatina gotin, weke gotinên li ser berxwedana li kobanê dihatina gotin bûn. Bi wê re jî, bandûra wê berxwedana Cizîra bota li hemû kurdistanîyan pirr zêde bû. Gîyanek nû ya berxwedan û serhildanê dabû bû çêkirin.

Piştî du hefteyên berxwedana li Cizira bota, wê di gotinê de ew qadaxaya derketina li sûkê a li ser taxên Cizira bota wê werê rakirin. Her wusa, gelek kurdistanîyan, bi wê re hêvî dikirin ku bi wê re êdî dawî li hêrîşên dewletê û polîs û leşkerên wê were. Lê rayadarên tirk, ên ku derdiketina berçapameniyê dihanîn ser ziman ku "wê ev pêvajoya hêrîşê bidomê." Wusa jî bû. Piştî hêrîşên li Cizira bota ku ser du hefteyan re bi qadaxaya derketina li sûkê a li ser taxên wê re ku di rojeve Kurdistan, tirkiya û cihanê de cihgirt û pê de, piştre hin bi hin nûçeyên hêrîşa hêzên dewletê bi polîs û leşkerên wê re ji Farqîn, Silopî û Geverê dihat, Lê tam di wê demê de demekê Silopî bi hêrîşên li ser wê dibin re ket rojevê de. Rejima tirk, bi hêrîşên ku bi tank û topan ku li wê dikirin, gelek herêm xûrîxandin. Piştî rakirina qadaxaya derketina li sûkê a li ser Cizira bota, dîmenên ku ji wê dihatin, ew bûn ku hêzên dewletê bi polîs û leşkerên wê re bi tank û topan hêrîşî wan kiribûbûn. Car bi car jî, halîkopter dihatina bikarhanîn. Dîmênên ku ji Cizira bota dihatin û piştre ku ji Silopî dihatin, wê ji dîmenên ku ji Kobanê dihatin ne cuda bin.

Bi wê re jî, herkesekî rastîya berxwedana li Cizira bota baştir fahm dikir. Gelê Cizirê bi berxwedana weke ku li kobanê bû, serketibû. Li Silopî jî serketibû. Lê hêzên rejima tirk, dema ku xwe vekişandibûn, her dever xûrixandibûn û kavil kiribûn. Tax, hatibûn tûna kirin. Li hemberî wan rewşên hêrîşa li ser Cizira bota, bo piştgirîyê, Nisêbîn bi hemû xalkê xwe re rabûbû ser pîyan. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku Nisêbîn, wê êdî di şopa Cizira bota de berxwedana xwe-rêveberina

xweser pêşbixe û bendên xwe parastinê weke ku Cizirîyan danîbûn wê dênin. Cizirîyan, bo ku taxên xwe ji hêrîşan biparêzên, hendek danîbûn li pêşîya hêzên dewletê ku bikevina taxan de. Ev rewş, wê piştre li kurdistanê giştî belav bibe. PIştre Wê Farqîn û Gever jî, wê di nava xwe de pêş bixe. Di wê de jî, hêzên dewletê, dem bi dem wê hêrîşî wan hendekên kurdistanîyan bikin. Lê di wê demê de herî zêde wê êdî qadaxaya derketina li Sûkê weke ku li Cizira bota hatibûbûna danîn li ser taxên farqînê. Taxên farqînê, di wê demê de jî, ji aliyê hêzên dewletê ve dihatina dorpêçkirin. Farqînîyan fahm dikirin ku wê hêzên dewletê hêrîşî wann bikin. Bo vê yekê, bidest çêkirina hendekên xwe kirin. Piştre jî, weke ku li Cizira botam Nisêbîn û li Silopîyê bidest berxwedana di wan hendekan de kirin. Ya ku ew berxwedan pêş dixist jî wê ciwanên kurd bûn. Şerê ku hêzên dewletê di nava bajaran de bi civate kurd re pêşxistibû, wê ciwan di wê de li refên pêş bin bo parastina gel.

Li farqînê, her ku dem têve diçû, wê êdî nûçeyên berxwedana zêdetir dihatin. Her wusa bi wê re jî, nûçeyên hêrîşên mazin ên bi tank û topan ên hêzln dewletê, weke ku li Cizira bota dihatin kirin, li farqînê jî êdî dikirin. Farqînîyan bi wê re bidest li berxwedanê dikirin. Berxwedana Farqînîyan, wê weke ya Cizirîyan, bidomê. Di vê demê de jî, weke ku Li Cizira bota bûbû, Qadaxaya derketina li sûkê hatibû danîn li ser taxên farqînê. Taxên farqînê, bi tememê hatibûna kirin weke ´herebe´. Li farqînê jî, ew qadaxaya derketina li Sûkê, wê wê weke ku çawa ku li cizira bota bû, ser du hefeteyan re doma bû. Bi wê re jî, hêzên dewletê, bi her cure tank û topan hêrîşî kurdan kiribûn. Dîmên ku ji Farqînê hatibûn, weke ku farqîn bûbû bû bajarekî xeyelet. Bi tememî hatibû xûrixandin.

Di dema berxwedana li Cizirê de, ser 22 kurdistanîyên sivîl hatibûbûna qatilkirin. Bi heman rengî li farqînê jî, gelek mirovên sivîl hatibûbûna qatil kirin. Lê bajar jî, hatibûbûna xirakirin û kavil kirin. Bi tememî, bajar hatibû tûna kirin. Piştî du hefteyan ew qadaxaya derketina li sûkê a li Farqînê jî ku hatibû rakirin, dîmenên ku dihatina weşandin, weke ya li kobanê bû. BI tememî bajar hatibûb tûnekirin. Di vê çerçoveyê de bi kirina bajarê farqînê weke herebeyekê û kavilkirina wê re, piştre qadaxaya derketina li sûkê rakiribûn. Di wê demê de jî, hêzên dewletê, bajarên ku kiribûbûna kavil, li ser hêzên wê, nivîsandibûn ku "ku tu tirk bê şênaz ba û ku tû ne tirk bê îteatê bike."

Piştre, weke ku çawa ku li kobanê bû, kurdistanîyan li Cizirê û farqînê bidest avakirina bajarên xwe kirin. Lê hêzên dewletê bi fermana hikimeta wê bidest hêrîşên xwe yên xûrîxandinê li Nisêbînê kirin. Her wusa, wê dîsa weke ku li Farqînê û Cizira bota kirin, wê qadaxaya derketina li sûkê dênîn û piştre bidest hêrîşê bikin. Wê rayadarên tirk, qadaxaya derketina li sûkê

didanîn, bo ku hêrîşên wan newina ditin. Bo ku kirinên wan newina kifşkirin. Bo vê yekê bû. Piştî Cizira bota û Farqînê, li Nisêbînê jî, wê heman rewş, were dûbare kirin. i NIsêbînê jî, wê pêşî qadaxaya derketina li Sûkê wê were danîn li ser taxan û piştre hêzên dewletê bi polîs û leşkerên wê re bi çekên giran û tank û topan wê bidest hêrîşê li ser taxan bikin. Her wusa, bi hêrîşên li ser taxên Nisêbînê dihê kirin, weke ku çawa li taxên Cizira bota û Farqînê dihê kirin, wê li wê were kirin. Piştre wê, navê Geverê, Licê û hanîyê, Derka çîyayê mazî û Kerboranê jî wê derkeve li pêş bi berxwedana wan ya bo rêveberîya xwe ya xweser re. Her wusa, bo ku ev bajarên û bajarokên kurdistanê jî, xwe ji hêrîşên hêzên dewletê biparêzên, wê bend û hendekan dênin û li pişt wan jî, bidest xwe parastinê bikin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku politikaya şer û ankû weke ku di çapemeniyê de dihê ser ziman konsepta şer a hikimeta tirk, wê xwe di çerçoveyeka demdirêj de bide domandin. Ji xwe, rayadarên tirk, bi hêrîşên ku li ser kurdistanîyan bi wan polîs, leşker û çekên giran ên weke tank û topan, hinekî jî demdirêj hizirîna. Hizirkirina, bi vî rengî, demek dirêj hêrîşên xwe li ser kurdistanîyan bidina domandin. Ev jî, weke politikayekê, dana berxwe.

Hikimeta tirk a AKP`ê di bin serkêşîya Ardogan û Dawutoglu de pêvajoya çareserîyê pêşî dawî li wê hanîn û piştre jî, politikayên şer kirina meriyetê de. Piştî ku kurd li rojava serketin li hemberî hêrîşên DAÎŞê ku wan alikari didayê de, êdî dawî li pêşîya çareserîyê jî hanîn. Ji ber ku ji destpêka ku pêvajoya çareserîyê hatibû dayîn destpêkirin de, rayaderên tirk wusa dirêj ne hizirîbûn. Wan di serê xwe de hizirkiribûn ku wê bi hêrîşên DAÎŞê derbeyek mazin li kurdan were xistin. Wan ti carî hizir ne dikir ku wê kurd bi serkevin. Bo vê yekê bû ku dema ku hêrîşên DAÎŞê li ser kobanê destpêkirin, T. Ardogan diçû antebê li Sînorê Afrînê û digot ku "va kobanê jî ket, dikeve." Bi vî rengî hêvî û bendewarîya xwe dihanî ser ziman. Lê çendî ku dem têve çû, pêvajoya ku wan di serê xwe de hizirkiribû, weke wan nemeşî. Kurd bi serketin. Ev jî, bo wan bû weke şokekê. Piştî kurd, bi serketin, êdî wan jî, dawî li pêvajoyê hanîn. Pêşî, wan hizirkiribûn ku wê li başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê derbeyek mazin li kurdan were xistin. Bi wê re, wê tevgera kurd jî, derbeyê bixwê. Piştre jî, ew jî, wê pêvajoyê, weke ya dilê xwe bi ancam bikin. Ya ku wan di serê xwe de hizirkiribû, ev bû. Her wusa, piştî ku ditin ku weke ku ew dihizirin, wusa namêşê, êdî wan di cih de di kirinê de konsepta şer a ku ji ber hilbijartinên 7´ê hezîrene 2015´an ve bahse wê dikirin, wê pêş bixin û bikine meriyetê û bi wê bidest hêrîşên li kurdan bikina li bakûrê kurdistanê. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de pêvajoya şer a li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk bi civate

kurd re da destpêkirin, hinekî jî, di vê çerçoveyê de pêşîya wê bi hêrîşên DAÎŞê re heya.

Piştî ku dîtin ku pêvajoya şer ku wan li hemberî kurdan bi navê DAÎŞ´ê û hwd ku daya destpêkirin, weke ya ku ew dixwezin bi ancam nabê, êdî ketina nava lêgerînan de. Konsepta şer, pêşxistin. Komkujiyên weke ya komkujiya li Pîrsûsê, di vê çerçoveyê de bi konsepta şer ve girêdayî divê ku mirov bi teybetî li ser wê bihizirê û fahm bike. Her wusa, piştî ku konsepta şer li hemberî civate kurd dana destpêkirin, xwestin ku komkujiya li Pîrsûsê bikin û wê bikina hêncet ku bi wê bangî li NATO bikin ku li hevdû bicivê û li ser wê komkujiyê re piştgirîya xwe ji wan re werêne ser ziman. Rayadarên tirk, wê vê piştgirîya NATO a piştî komkujiya Pîrsûsê ku hatibû kirin, wê bi hevokên ku di wan de ew piştgirî weke pişgirîyeka ji wê konsepte wan ya şer a li bakûrê kurdistanê a li hemberî kurdan a, wê bikin ku werênina ser ziman. Di aslê xwe de, aliyekî xistina balafira şer a Rûsya û piştî wê di cih de banga Civînê li NATO kirinê yê ku mirov divê ku di vê çerçoveyê de bi hewldana çêkirina pişgirîyê û ankû weke ku pişgirî ji konsepta wan ya şer a li hemberê kurdên bakûrê kurdistanê ku heya re bidina nîşandin heya. **Mirov di vê çerçoveyê de çendî ku divê ku mirov ev komkujiya di 11´ê berfanbara 2015an de ku li Til-Têmirê ku bû ku mirov wê bi mantiq, zihniyet û rengê komkujiya ku di roja newroza 2015an de ku li Hesekê hatî kirin de ku em divê ku werênina ser ziman, bi heman rengî, divê ku mirov xistina balafira şer a Rûsya jî bi komkujiya li Pîrsûsê re bi hevdû re bi zihniyetekê û konseptekê re werênina ser ziman.** Ji ber ku di çerçoveya hrîşên wê yên li kurdan û konsepta wê ya şer de, divê ku mirov bi hevdû re werêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de ev pêvajoya şer a ku rejima tirk û hikimeta AKP li hemberî bakûrê kurdistanê daya destpêkirin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, şandina leşkerên tirk oi beşîka jî, divê ku mirov di vê çerçoveya vê konsepta wê ya şer de werênina ser ziman. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi şandina leşkerên tirk li beşîka, her wusa, divê ku mrov di çerçoveya pêvajoya hêrîşên nû ên li başûrê kurdistanê û her wusa li civate kurd de werênina ser ziman. Gotina, ´ew leşker bo perwerdeyê li wir in´, derew a. Ji xwe, li bajarên başûrê kurdistanê ên weke ´kanîmasî´, ´delakokê´, Şêladizê´ û Bamernê´ ji xwe leşkerên bi hezaran û sadan tank û topan re li wir in. Li vir, di serî de ev aliyekî din ê kontrol kirina musilê û her wusa, hewldana dagirkirina hin herêmên musilê ku di wan de hinek tirkmenan ji musil, kerkukê, telaferê û hwd werênê li wir û li wir,, gelheyek tirkmen bi afirêne ku karibê temenê xwe li wir mayinda bike. Ev kiryara tirk, di çerçoveya hêrîşên wê yên li ser rojava û bakûrê kurdistanê

de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, bi wê re jî, divê ku mirov di dewama hêrîşên DAÎŞê û ku weke piştgirîyekê ji wê re jî werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di vê çerçoveyê de hêrîşên li bakûrê kurdistanê, hinekî jî, biqasî ku mirov ji rewşa hêrîşên çeteyên DAÎŞê, aharar el-şam û cebetil-nasr ên bi alikarîya tirkiya ku li ser ezaz û cerablusê re dibin û her wusa rewşa şandina leşkerên tirk li beşîka û musilê fahm dike, wê zêdetir bi demê re dirêj bibe. Rejima tirk, li pêvajoyek dîrok ya hêrîşan li bakûrê kurdistanê dihizirê. Her wusa, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Çend ku weke sedema destpêkirina hêrîşan, dikin bibêjin ku hêrîş piştî leşkerên me din û ankû weke ku piştî komkujiya pîrsûsê mirina du polîsên wan bigûman ku dikina hêncet jî, lê di aslê xwe de, ev konsepteka ku bi wê dixwezin ku bi tememî temenê xweserîya demokratî a civate kurd ji holê rabikin a. Hinek kurd, dema ku diaxivin, dibêjin ku ´ji ber ku hendek hatin çêkirin hêrîşan destpêkir´ jî, weke gotinaka vala û ku rastiyê nayê ser ziman a. Ji xwe, hêrîş hatibûbûna destpêkirin. Ji xwe hanîna van gotinên weke hêncet, wê hêrîşên ku ji xwe rayadarên tirk plan dikirin, wê bimaf derxe. Lê ev jî ne rast in. Mijar ne mijara hendekan a. Ya ku ev dordor yan fahm nakin û yan jî bizanebûnî dixwezin ku berevajî bidina nîşandin jî, ev a. Armanca herîşên tirk, ne hendek in. Armanc, temenê civatî ê civate kurd ku pêşketîya ya. Dixwezin ku van hêrîşan di serî de wan tûna bikin. Ya ku armanc dihê girtin jî di aslê xwe de ev bixwe ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku piştî pêvajoyan hêrîşên hêzên dewletê bi polîs û leşkerên wê re, ku bi tank û topan dikirin ku bajarên kurdan, hat fahm kirin ku her wusa, qadaxaya derketina li sûkê, tenê bi armanca ´kamufle´ kirina rengê hêrîşên xwe ji rayagiştî û çapameniyê ya. Lê qadaxaya derketina li sûkê, rengekî politikaya hêrîşê ya. Her wusa, her devera ku herîşî wê dikin, pêşî qadaxaya derketina li sûkê didênin û piştre hêrîşî wê dikin.

Di aslê xwe de divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku destpêka konsepta şer û çêkirina temenê wê, mirov dikarê heta dema xwepêşandinên bo kobanê ên di 7 û 8ê êlûna 2014´an de jî. Di wê de jî, Dawutoglu derketibû berçapameniyê û gotina "cardin çêkirina sazûmana civakî´ ku bikarhanî, mirov dikarê weke temen û destpêka wê werêne ser ziman. Di vê demê de hingî dema ku hizirî bûn ku dema ku ev sê car çar salin ku bi gotina çareserîyê û ankû pêvajoya çareserîyê ´rehewet´ bi gel re çêbûya. Zan ne dikirin ku wê wilqasî ji kurdistanê bertek bi girseyî derkevin. Lê dema ku xwepêşandinên bo kobanê dîtin, êdî fahmkirin ku weke ku ew dihizirîn wusa çênebûya. Piştî wê re, êdî ji xwe gotina ´sazûmana civakî´ û

ankû parastina sazûmana civakî´ hanîna rojevê. Ji wê roje û pê de, êdî dem bi dem asta hêrîşên xwe yên li kurdistanîyan dana domandin û zêde kirin. Ji wê demê û heta hatina vê demê jî, hertimî dem bi dem di asta hêrîşên li bajarên kurdan zêdetir bûn. Piştre jî, her dema ku xwepêşandinên demokratikî dibûn, wê bi awayekî hovana hêrîşî wan bikin.

Î ro jî, dema ku mirov li rewşên ku dibin, dinerê, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku dem bi dem hêrîş li kurdan hatina zêdetir kirin. Kurd, hatina qatil kirin. Kurd, hatina tûna kirin. Tenê ji wê dema berxwedana kobanê û heta roja me, rojek namêne ku mirov nûçeyên qatilkirina ciwanên kurd nebihîzê. Her roj, hêrîş dibin û kurdistanî dihên qatil kirin. Ji wê demê û heta vê demê, bajarekê kurd, nîn a ku di wê de hêrîş û komkuji nebûna. Î ro jî, bi awayekî hovane hêrîşên lis er Nisêbînê û bi teybetî ên li ser Sûrê divê ku mirov werêne ser ziman. Hêzên dewletê bi polîs û leşkerên wê re û bi çekên weke tank û topan, hêrîşî Sûrê dikin. Sûr, navçeyeka Amedê ya. Ev navçeya Amedê, weke ku çawa ku li Cizîra bota, Farqîn û Nisêbînê hêrîşên xadar hatina kirin, li wê jî bi heman rengî hêrîş dihên kirin.

Di vê demê de divê ku mirov werêne ser ziman ku hemû çavçe û bajarên kurdistanê di bin dorpêçkirina hêzên rejima tirk ên bi polîs û leşkerên wê de ya. Weke ku li Sûrê, dibû, hêrîşî wê dikirin. Weke ku ê Cizira bota, Farqîn û Nisêbînê dibû, hêrîşî wan dikin. Di vê demê de pirranîya bakûrê kurdistanê bi polîs û leşkeran hatîya dorpêçkirin. Di vê çerçoveya wê dorpêçkirina hêrîşên li bajarên kurdistanê de hêrîşên xwe li başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê dikin. Ji ber ku ew li hemberî statûya kurd in. Hemû derd, ew a ku wê çawa kurdan bêstatû bihêlin. Bo vê yekê ya ku bi darêzorê, dixwezin ku kurdistanîyan ji herêmên wan bidina goçberkirin. Weke ku çawa bi plan, ji rojava û başûrê kurdistanê mirov bi zorê û tûndûtûjiyê didana goçberkirin, bi heman rengî dixwezin ku kurdistanîyên bakûrê kurdistanê jî bidina goçberkirin. Bi teybetî, herêmên ku li berxwe didin, ev politika li wan dihê meşandin. Bo berxwedana wan ya civatî bişikênin, dixwezin ku wan ji herêmên wan bidina goçber kirin. Heta roja me, ji herêmên weke Cizira bota, Farqîn, Nisêbîn û Sûrê, gelek bi zorê dana goçberkirin. Lê pirranîya gel jî, naxwezê ku goç bike ji mal û herêma xwe. Bo ku cihekî ku herîyê û xwe di wê de ewla hîs bike tûna ya.

Hêrîşên li kurdistanê ku rejima tirk dike, bi armanca dana hêrêkirinê a bêstatûyê li civate kurd a. Bi wê re jî, ku bi rêbazên bişavtinê ên li ser pergale perwerde û hwd re, êdî wan asîmle bike. Bişavtinê li ser serê wan pêşbixe. Wan ji rastîya wan dûr bike. Hêrîşên ku dibin, bi wê re jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku zimanê kurdî hatîya qadaxa kirin. Yanî, divê ku mirov hêrîşên ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe li kurdan dike, divê

ku mirov bi wê qadaxaya ku wan danîya ser zimanê kurdî re wê hilde li dest û fahm bike. Bi hevdû re ji navikê ve girêdayî na. Li bajarên bakûrê kurdistanê, berxwedana ku kurdistanî didina nîşandin, li hemberî van rengên hêrîşan a. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werêne ser ziman ku kurdistanî êdî li şûna ku goç bikin li berxwe didin. Di dema hêrîşên rayadarên tirk ên li Cizira bota û Farqîn û Nisêbînê de jî me dît. Her wusa di dema hêrîşên li ser Sûrê de jî me ev rastî dît. Di dema ku berxwedan li van bajaran dibû, li bajarên din ên kurdistanê jî, gelê kurd rabûbû serhildanê bo piştgirîya bi berxwedana Sûrê, Cizira bota, Farqîn û Nisêbînê û hwd re. ...

**Li bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, silopî, Nisêbînê, Sûrê, farqînê û hwd û li hemû deverên din ên bakûrê kurdistanê, derîyan dişikênin û dikevina malan de. ..**

Bêgûman, cihê gotinê nemaya. Dema ku rewşek bi vî rengî were jîyînkirin, êdî cihê gotinê namêne. Hikimeta tirk a AKP´ê li bajarên kurdan ên weke Silopî, Cizira bota, Sûr, Kerboran, Dêrîka çîyayê mazî, Nisêbînê û hwd, li gelek deverên din jî ên kurdistanê, qadaxaya derketina li sûkê denezendîya û bi wê re jî ´oparasyonan li nava bajêr li jîyane sivîlan dike. Her wusa, piştî gotinên Dawutoglu ên bi rengê "wê mal bi mal bikevinê" û pê de, hêrîş zêdetir bûn. Rayadarên tirk ên li herêmên kurdan bi polîs û leşkerên wê re, ev gotinên Dawutogu ji xwe re weke ´ferman´ dîtin û bidest hêrîşê li kurdistanîyan dikin. Dawutoglu dibêje ku "wê Cizirê azad bikin." Lê vajî wê, ya ku ew dikin û heta roja me kirina, ku hemû hikimetên tirk û ku hikimeta dawutoglu jî di nav de li hemberî ´azadîya kurdan û cizirîyan şerê tûnakirinê daya destpêkirin. Weke hikimetên berê ên rejima tirk, hikimeta dawutolgu jî, ji kurdan re dibêje ku doza maf û azadiyê nekin. Bahse zimanê kurdî û perwerde ya bi zimanê kurdî nekin. Bahse ´xwe rêvebirinê´ ankû rêveberîyên xweser nekin. Ji kurdan re dibêje ku xwe weke yekî tirk hîs bikin, tenê zimanê tirkî bikarbênin û weke yekî andamê civate tirk bibînin. Bo vê yekê ya, ku gotinên weke **´kurd´, ´civate kurd´, ´Kurdistan´ û ´ zimanê kurdî´,** li kurdan bixwe hatîna qadaxa kirin. Yên ku van gotina bikardihêne û ankû dibêje ez kurd im û zimanê kurdî bikardihêne û bi zimanê kurdî dinvîsêne, li gorî wan, weke ku sûcekî bike lê dinerin.

Li vir, di aslê xwe de ya ku bi gotina ´azadiyê´ re dike ku dawutoglu werêne ser ziman, bi gotina ´azadiyê´ re wateya kolekirinê û ji hemû nirxên xwe yên civatî dûrxistina. Her wusa, di vê çerçoveyê de hêrîşên rayadarên tirk ku li kurdistanê li kurdan bûna heta roja me, hemû jî, bi armanca ji destê kurdan û kurdistanîyan xistina azadiya wan a. Ya ku li Cizira bota û Silopî tê

kirin, ne oparasyona azadkirinê ya. Oparasyona tafisandin û çermisendinê ya. Ev oparasyonên leşkerê û polîsî, li hemberî denezendina kurdan li van bajarên xwe rêveberîyên xwe yên xweser pêktê ya. Yanî, oparasyonên kolekirinê na.

Li vir, di aslê xwe de berevajî kirina gotina, heta roja me, weke rêvebazekî ku rejima tirk kirîya ya. Gotinên weke ´dewleta dadê´ û ankû ´pergale demokratik´ bikarhanîna. Lê di in van gotinan de, her cure kiryarên qirêt û pîs kirina. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev gotinên bi vî rengî, weke gotinak ´maske´ û ankû gotinna ´sernûxûmandinê´ hatina bikarhanîn. Her wusa, weke ku çawa di destpêka pêvajoya konsepta şer ku rejima tirk û hikimeta wê li hemberî kurdan da destpêkirin di pêvajoya dema hêrîşên DAÎŞê ên li kobanê de dawutoglu gotina ´parastina sazûmana civakî´ hanî ser ziman û hwd. Ev jî, weke gotinaka weke maske bû ku wê hêncetekê xwe qaşo li ser wê re çêkiriban û piştre bi wê re bidest hêrîşê li civate kurd bikiran. Rejima tirk, wê çawa civate kurd, di nava tirkiyatiyê de bihalêne û tûna bike, hertimî di vê çerçoveyê de politika pêşxistina û di wê çerçoveyê de hêrîşî civate kurd kirina. Ev 40 sale ku bi konseptên şer li hemberî civate kurd daya destpêkirin, di roja me de, hêrîşên ku bi konsepta şer re li Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûrê, Farqînê û hwd ku dike, wê weke dewam û ancama wê bin. Heta roja me, şer bi armanca ji dîrokê birina civate kurd bi wê re kirina. Dema ku zimanê civatekê were qadaxakirin û bi hemû nirxên wê û hebûna civatê ya fîzîkî re şer were meşandin, divê ku mirov vê weke şerê bi armanca jenosîdkirina civatê werêne ser ziman.

Heta roja me, ev bûya. Oparasyona ku di 16´ê berfanbara 2015´an de hikimeta tirk ku dawutoglu serokwezirê wê ya, ku li hemberî civate kurd li bajarên kurd ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbîn, Sûrê û hwd daye destpêkirin, divê ku mirov bi ast û şêwaya wê re weke asta hêrîşên rejima tirk ên li hemberî civate kurd jî werêne ser ziman. Qadaxaya derketina li sûkan ku hikimeta tirk a dawutoglu di 15´ê berfanberê de li hemberî bajarên kurd denezend, bi carekê li bajarên kurd ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûr, Farqîn, Kerboranê, Dêrîka çîyayê mazî û hwd bû. Bi wê re piştî ku qadaxaya derketina li sûkê danîna ser van bajaran, piştre jî, ev herêm û bajarên kurdan tişî polîs û leşker kirin ku hêrîşî civate kurd û saziyên wê bikin. Her wusa, wê hêrîşî hemû kurdên ku doza maf û azadiyê dikin bike. Di vê çerçoveyê de ev oparasyonên hikimeta tirk a dawutolgu jî, li hemberî maf û azadîya civate kurd, weke oparasyoneka giştî ya tafisandin û çermisandinê ya. Di çerçoveya hewldanên rejima tirk û hikimetên wê ên berê û ya demê a ku dawutoglu serokwezirê wê ya de ku dixwezin ku

kurdan bi civatî ´bêstatû´ bihêlin û piştre ku wê ji civatîtiya wê derxin û bi demê re bi rêbazên weke bişavtinê û hwd êdî tûna bikin. Ev oparasyonên ku di çerçoveya zihniyetek bi vî rengî ya rejima tirk a 90´ salî de ku dihên kirin in.

Di vê dema ku oparasyonên leşkerî û polîsî pirr zêde li bajarên kurdan li hemberî kurdan û civate kurd dihên meşandin de jî, hin rayadarên tirk ên weke T. Ardogan û Dawutoglu û ankû hineka din jî, gotinên weke "biratiyê" dihênina ser ziman. Ew bixwe jî, dema ku vê gotinê dihênina ser ziman, bi wê bawer nakin. Ew bixwe jî, ti carî kurdan, weke ´bira´ nabînin. Weke xwe nabînin. Kurdan, weke xwe mirov û xwediyê maf û azadiyê nabînin. Yên ku van gotinan dibêjin, tenê bi armanca ´manipûle kirinê´ dibêjin. Ti rastîya van gotinan, di rastiyê tûna ya. Gotinên weke "ev hezar salin ku em bi hevdû re dijîn" dihênina ser ziman. Lê ev dîroka ku bi gotina ´hezar salî´ dihênina ser ziman, hemû jî bi şerê wan ê bi kurdan re meşîya ya. DI dema osmanîyan de dîroka osmaniyan ji aliyê kurdan ve bûya dîroka şerê wê yê bi kurdan re. Her wusa, di dewama wê de li li ser bermehiyên osmnaîyan avabûya komare tirk jî, dîroka wê dîsa ji aliyê kurdan ve bûya dîroka şerê rejimê ê bi kurdan re. Î ro jî, wusa dihê dayîn domandin. Rejima tirk, dixwezê ku vê dîroka ku ji aliyê kurdan ve hertimî bixwûna, li ser serê kurdan bidina domandin.

Komkujiyên ku î ro, rejima tirk û hikimeta wê li bajarên kurd ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûr, Farqîn, Kerboranê, Dêrîka çîyayê mazî û hwd, ku divê ku mirov weke ya dema komkujiya zilanê (1925-6) û dema komkujiya dersimê(1937´an) werêne ser ziman. Her wusa, wê çawa kurdan bêvîn bikin û vîna wan ji destê wan bigrin, oparasyonên wê li kurdan û bajarên kurdistanê dikin. Her wusa, divê ku mirov di çerçoveyekê de bihevdû re hilde li dest. Hêrîşên li goristanên kurdan, qadaxaya li ser zimanê kurdî, oparasyonên rejima tirk ên li hemberî civate kurd ên leşkerî, polîsî û sîyesî û hwd, hemû jî di vê çerçoveyê de oparasyonên ku li vîna kurdan dihên kirin in. Bajarên kurdan ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûr, Farqîn, Kerboranê, Dêrîka çîyayê mazî û hwd, ku di denezendina rêveberîyên xwe yên xweser de ku derketina li pêş, di serî de di armanca hêrîşên rejimê de na. Bi teybetî, Cizira bota û Silopî, weke herêmna ku di vê çerçoveyê de ji van hêrîşan re weke navend girtina na.

Hêrîşên li civate kurd ku bi oparasyonên leşkerî, polîsî û sîyesî ku hikimeta tirk a dawutoglu li bajarên kurdan ên herêma botanê û hwd dike, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke hêrîşên ku di ancama israrkirina rejim û hikimeta tirk di bêstatûya kurdan de werêne ser ziman. Her wusa, wê çawa bêstatûyê bi kurdan bidina herê kirin, şerê wê bi kurdan re dikin. Hêrîşên wê li kurdan dikin. B vê yekê ya, ku li rêveberîyên xweser ên

kurdan ku kurdistanîyan li van bajarên xwe denezendina dibina armanca hêrîşên rejima tirk. Bi reng û navê civate kurd, ti tişt heya, di armanca hêrîşên rejima tirk de na. Her wusa, di vê çerçoveyê de hêrîşên ku ji aliyê hêzên rejima tirk ve li civate kurd dihên kirin, di dema ku kurd li kurdistanê li bajarên kurdan ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûr, Farqîn, Kerboranê, Dêrîka çîyayê mazî û hwd, ku rêveberîyên xwe yên xweser didenezênin zêdetir dibê. Bi teybetî jî, li van rêveberîyên xweser ew hêrîş û rengê zêdetir dibê.

Dema ku mirov rengê hêrîşên di vê demê de şîrove bike, divê ku mirov bibêje ku ji rengê hêrîşên salên 1990î ku li kurdan û herêmên kurdan dibûn zêdetir dibê. Di vê demê de bi awayekî vekirî li berçav, li jîyane civatê oparasyon dihên kirin. Ji ber vê yekê ya, ku qadaxaya derketina li sûkê pêşî didênin ser bajaran û piştre li nava wan bajaran û jîyane gelhe û civatên wê bajarê oparasyonên leşkerî û polîsî û sîyesî dikin. Bi tememî, jîyane civatê û rengê jîyane civatê di vê çerçoveyê de armanc dihê girtin. Li bajarên kurdan ên ku rêveberîya xwe ya xweser denezendina ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûr, Farqîn, Kerboranê, Dêrîka çîyayê mazî û hwd, gelê kurd, hendek di destpêka ketina taxan de çêkirina. Bi wan hendekan, dikin û dixwezin ku hêrîşên ku li wan û jîyane wan dibin, pêşîya wê bigrin. Her wusa, di vê çerçoveyê de rayadarên tirk jî, wê wan hendekan nîqaş bikin û weke armanc bidina nîşandin û piştre jî, wê hêrîşên leşkerî, polîsî û hwd li wê bikin. Di vê pêvajoya hêrîşê de, saziyên çandî û zimanî ên civate kurd û zimanê kurdî jî, di armanca wan hêrîşan de na. Wê çawa wan tûna bikin, di wê çerçoveyê de hêrîşî wan dikin.

Di van oparasyonên leşkerî, polîsî û sîyesî ku li jîyane civatî a kurdan dikin, ti sînorê nasnekin. Derîyan dişikênin û dikevina hunduran de. Dema ku derî şikandin û ketina hundurê malan de jî, wê her cûre rengê tûndûtûjî û şidetê li hemberê mirovên ku di wê malê de dijîn wê pêk bênin. Wê malê vêran dikin û xira bikin. Her wusa, hertiştî dişikênin û xira dikin. Dibêt ku ew xwediyên wê malê, ew bi dehan sale ya ku kar dikin û di ancama kedeka mazin de ew mal ji xwe re avakirina ku di wê de bisitirin. Lê wê malê tûna dikin. Heta ku her cûre çekê herîşî malan dikin. Hêrîşên bi tank û topan ku li nava taxan hatina kirin ji aliyê polîs û leşkerên tirk ve, bi wan mal, weke ku ji temen ve dihên hilweşandin. Bi wê re, gûleyan di barênin li ser malan û nava malan. Di hundurû de tiştên ku mal bi wê dijî, rastî gûlabaranên ku li wan tên kirin dibin. Malên wan tên xirakirin. JÎyane wan bi vî rengî, bi carekê dihê tûnakirin ji temen ve. Bi rengekê hêrîş dikin ku temenê jîyanê malbatî li wir bi tememî were xûrixandin. Di vê çerçoveyê de li bajarên kurdan ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûr, Farqîn, Kerboranê,

Dêrîka çîyayê mazî û hwd, ku di serî de xweserîya denezendina, bi vî rengî hêrîşên li temenê jîyane civatî li wan dihê  kirin. Mal, tên kavilkirin û malbat tên vêran kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku tenê bi danîna qadaxaya derketina li sûkê û piştre li ser serê civate kurd li darxistina oparasyonên leşkerî, polîsî û sîyesî û hwd re bi sînor namênin. Ji wê zêdetirî, giştîya herêmên jîyanê ên civate kurd û kurdistanê, di çerçoveya dorpêçekê de hatina xistin bin ´abluka´yekê de. Bi gotinaka din, rewşeka awarta, li ser serê jîyane mirov hatîya afirandin. Ji salên 1990´î ve ev rewş heya. Di van demên ku di wan de digotin ku ´me rewşa awarta rakirîya de jî, di filîyetê de rewşek zêdetirî awarta hatîya afirandin. Ji her aliyê ve jîyane civatî a kurdî hatîya dorpêçkirin.

Hêrîşên rayadarên tirk ên bi polîs û leşkerên wê re li jîyane kurdan, ti carî ji leze ti tişt winda nekirîya. Lê di vê demê de ew lez, zêdetir bûya. Asta hêrîşên rejima tirk a li civate kurd, gihiştîya wê astê ku ew êdî bi tank û topan li hemberî bajarên kurdan û xalkê sivîl bikardihênin. Hêrîş taxan dikin bi tank, panzêrên leşkerî û topan. Her wusa, cih bi cih jî, weke ku me li Cizîra bota, Nisêbînê, Sûrê, Farqînê û hwd dît, helîkopter jî hatina bikarhanîn. Li hemberî berxwedana gel, her tank û top hatina bikarhanîn. Weke ku me di rewşa hêrîşên li ser taxên Cizîra bota ên weke Cudî, Nûr û Yafêsê de dît, ji dervî taxê, wê topbaranê li nava taxê bikin. Gelê kurd, weke ´dijmin´ dihê dîtin û weke ku çawa li hemberî dijmin şer dikin, di wê çerçoveyê de bi wê rengê şer dikin û hêrîşan pêktênin. Divê çerçoveyê de divê ku mirov vê jî binxat bike ku ´sekvan´ li serê banên malan tên bicihkirin û ew jî, her mirovên ku derdikevina derve û ankû serê xwe derdixin ji malên xwe re, rastî gûlabarana wan tên.

Di hêrîşên li ser rêveberîyên xweser ên ku kurdan li van bajarên xwe denezendina, rayadarên tirk, pirr zêde giringî didana wê ku ´cerdewanan´ jî, di wê şerê li hemberê hendekên kurdan ên bi armanca xwe parastinê de bikarbênin. Gelekan ji wan redkiribûn ku di hêrîşên li hemberî hendekan cih bigrin. Lê rejima tirk û rayadarên di vê yekê û rewşê de jî israr dikirin. Ji ber ku di şerê ku rejima tirk bi civate kurd re dide, hertimî dixwest ku çend kurdên ku hildana rex xwe û ku ew li hemberî civate kurd didana şerkirin de, li ser wan re bibêje ku meyizênin kurd jî li rex min şer dikin.´ Tenê bo ku vê yekê bibêje û ankû bide gotin li ser çapameniyê re ew cerdewan, li rexên dişandina şer û didana kuştin. Minaq, di salên 1990´î komkujiyên weke ên ku weke ´komkujiya guclukonakê´ tê bîrhanîn jî, ku di wê de 11 cerdewan hatibûbûna qatilkirin, bûbûn. Ev 11 cerdewanên ku di ´dolmûşekê de hatibûbûna qatilkirin, tenê bo ku zêdetirî mirovan li ser bertekên ku bi

wan çê bike û bike cerdewan ew kiribû. Leşkerên tirk, ew komkujiya ku di wê de cerdewan hatibûbûna kuştin kiribûn. Lê komkujî avêtibûbûna stûyê tevgera kurd PKK´ê. Lê piştre bi lêkolînên ku dordorên weke ´sazîyên mafên mirovan´ ku kiribûn, hat derxistin li holê ku ew komkujî bi armanca pêşxistina pergale cerdewanîyê hatibûbû kirin. Ji aliyekî din ve, weke ku carna kurd jî dibêjin, li ser cerdewanan re kurd bi kurdan re didana şerkirin û bi wê re kurd bi destê kurdan didana kuştin.

Î ro jî, bi teybetî li herêma Silopî û Cizîra bota, dixwestin ku dîsa vê rewşê bidina pêşxistin û cerdewana di refên pêş de bidina hêrîşkirin li ser hendekên kurdan ên bo parastinê. Bo vê yekê jî, di rojên 15´ê berfenbara 2015´an de ku rejima tirk, oparasyonên leşkerî û polîsî û sîyesî bi leşker û polîs û hêzên xwe yên teybet li hemberî silopî, Cizîra bota û herêmên din ên botanê ku dabû bû destpêkirin, di heman rojê de li anqerê, rayadarên tirk ên hikimetê li hevdû dicivin û biryarê didin ku ´cerdewan di hêrîşên li kurdan ên li silopî û Cizîra bota de cih bigrin. Ev jî, di çerçoveya vê politikaya kurdan bi kurdan rebidina şerkirin re ew dikirin. Her wusa, dakû, li ser wê re bibêjin ku meyizênin, kurd jî bi min re li hemberî hendekan şer dikin, dixwest ku wan cerdewana di refên pêş de bide şerkirin û kuştin. Di vê çerçoveyê de tenê bo ku li ser wan re politikayê bikin û ankû şerê xwe yê derûnî li hemberî civate kurd li ser çapmeniyê re bi kuştina wan re bidina domandin.

Hêrîşên ku li bajarên kurdan dibin di vê demê de divê ku mirov weke hêrîşên tafisandinê û çermisendinê werêne ser ziman. Bi wê re jî, divê ku mirov weke hêrîşên bi armanca bêstatû hiştina civate kurd werêne ser ziman. Ji xwe, rayadarên tirk, dema ku pêvajoya çareserîyê ser 3 salan re bi hevdîtinan domîya û ku hat asta ku divê ku êdî muzakare were kirin û bahse statûya kurd hat kirin û pê de, dawî li pêvajoyê hanî û rayadarên tirk ên weke T. Ardogan bidest gotinên weke "pirsgirêka kurd tûna ya" kirin û piştre konseptên şer pêşxistin û bidest hêrîşkirinê kirin. Çendî ku ti hêncetê ji dawî lê hanîna pêvajoya çareserîyê re werênin jî, divê ku mirov weke sedem û hênceta pêşî di vê çerçoveya dijberîya li hemberî statûya kurd a di mejiyê rayadarên tirk de werêne ser ziman. Hemû hêncetên din ên ku dihênina ser ziman, tenê manipûlasyon in û derew in. Gelek dordor, weke sedem û hênceta dawî li pêvajoya çareserîyê hatinê de kuştin du polîsên lu Rehayê di dema piştî komkujiya pirsûsê dihênina ser ziman. Lê ev tenê manipûlasyon a. Tenê derew a. Piştî xwandina nameya birêz Ocalan a di newroza 2015´an de ku di wê de dixwezê ku muzakare werina dayîn destpêkirin bo çareserkirina pirsgirêka kurd û pê de, rayadarên tirk bidest xirakirina pêvajoyê kirin. Di seatên ku nameya birêz Ocalan dihat xwandin

de jî, li Hesekê kirina komkujiyeka mazin di roja newrozê de jî, di vê çerçoveyê de weke komkujiyekê ku divê ku mirov werêne ser ziman a. Bi vê komkujiyê, weke ku berteka xwe li hemberî gotinên di nameyê de ên weke ku bi wan bang li rayadarên tirk dihê kirin ku divê ku muzakare werina destpêkirin.

Piştî wê re, dem bi dem gotinên xirab ên ne baş hatina hanîn li ser ziman. Hêrîşkirinên li xwepêşandinan û bidest oparasyonên şer kirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bahse oparasyonên artişa tirk biike. Bi wê re oparasyona li Tendurekê ku demekê di rojevê de jî ma, li vir divê ku mirov hinekî wê werênê ser ziman û bibîr bixe. Çendî ku tevgera kurd, dixwest ku xwe ji şer û pevçûnan bide dûrkirin, artişa tirk, li hemû çîyayên kurdistanê bidest oparasyonên leşkerî ên bejahî kir. Di vê demê de li ser partî û hêzên kurd ên başûrî û rojhilat re jî xwestibûn ku nakokîyan bidina çêkirin. Her wusa, rewşa li kelaşînê ku li ser PDK-Î re hatibû pêşxistin jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov weke provakasyoneka ku dixwestin di nava kurdan de di vê demê de nakokîyan çêkin û kûr bikin ku nikaribin bi hevdû re bisekin û li rex hevdû parastina kurdistanê bikin. Yanî, di van demên bûhûrî de de ji gelek aliyan ve di xwestin ku pirsgirêkê di nava têkiliyên kurdan de çê bikin. Di aslê xwe de di vê dema ku bi konseptek şer a giştî de rejima tirk li bakûrê kurdistanê li hemberî kurdan şer dike ger û zîyereta Birêz Berzanî li anqerê jî, aliyekî wê yê bi vî rengî heya. Li ser wê gerê û zîyeretê re dixwestin ku bibêjin, meyizênin têkiliyên me û kurdan baş in. Şerê me ne li hemberî kurdan a, li hemberî ´terorê´ ya. Yanî bi gotinaka din, di vê çerçoveyê de ev ger û zîyeret, di çerçoveya dayîna hinek peyaman di vê çerçoveyê de jî hatîya bikarhanîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di çerçoveya herêmê giştî de bibje ku rojhilat dikelê. Di vê pêvajoya ku ji nû ve weke ku şekil û awa dihê dayîn li sîyeseta rojhilat de, wê çawa kurdan dervî pêvajoyê û statûyê bihêlin, şerê wê bi kurdan re dihê meşandin. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ancamên vî şerê ku î ro rejima tirk û rayadarên wê bi hikimeta wê a demê ku dawutoglu serokweizirê ya ku bi kurdan re dike, wê mayînda ûû dîrokî bin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku serkevtinên kurdan, wê temenê statûya wan ya civatî bê li herêmê. Bi vê yekê, rayadarên tirk jî, heta ji wan tê, hêrîşî wan destkevtiyên kurdan dikin ku ji holê rabikin.

Li vir, di dewama vê rewşê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev şer û pevçûnên ku li herêmê dihên derxistin, hemû jî têkilîya wan bi pirsgirêka kurd ve girêdayî heya. Hemû jî, weke şerên li hemberî civate kurd in. Li herêmê rêxistinên hov û kujar ên weke DAÎŞê, hêrîşên

xwe tenê di nava sînorên kurdistanê de li kurdistanîyan kirina. Her wusa, ev rewş, li bakûrê kurdistanê wusa ya. Li rojavayê kurdistanê jî wusa ya.

Li rojhilat, wê statûya kurdistanê, aheng(´denge´)yên herêmê bide gûharandin. Her kesek jî, van rastîyan dibînin. Bo vê yekê, di serî de Kurdistan, hebûna civate kurd û herêmên kurdan Kurdistan, weke navenda van şer û pevçûnan a. Î ro, şerê ku rayadarên tirk li bakûrê kurdistanê bi kurdan re dimeşênin, divê ku mirov di çerçoveya pêvajoyên şer ên ku bi navê DAÎŞê li başûr û rojavayê kurdistanê bi kurdan re dihat meşandin de werênina ser ziman. Konsepta şer a ku rayaderên tirk ji 7´ê hezîrenê ve bi awayekî şitt bi wê bi kurdan re şer dana destpêkirin, wê pêvajoya hêrîşên DAÎŞê, weke pêvajoyên wê yên pêşî jî bin. Her wusa, pêvajoyên dawî ên şerê bi civate kurd re, li bakûrê kurdistanê î ro rejima tirk dimeşêne. Her wusa rewşa xate di nava kobanê-Afrînê de a ezaz û cerablusê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi vê şerê rejima tirk ê bi civate kurd hildina li dest. Dema ku em bahse konsepta şer a rejima tirk ku li hemberî civate kurd daya destpêkirin, di vê çerçoveyê de çendî ku navende wê bakûrê kurdistanê jî bê, divê ku mirov bi hewldanên rejima tirk ên wê yên bi şerê yê bi kurdan re ên li başûr, weke ku bi rewşa beşîka re ket rojevê û her wusa li hemberî rojava ku bi şerê çeteyên weke yên ahrar el-şam, cebetil-nasr, DAÎŞ û hwd ku bi kurdan re dike re jî werêne ser ziman. Hêrîşên van çeteyan ên li ser kantona Afrînê jî, divê ku mirov weke şer û hêrîşên rejima tirk ên li hemberê kantona afrînê jî werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de pêvajoyek giştî ya şerê şikandina civate kurd bi civate kurd re hatîya dayîn destpêkirin û dihê domandin. Hêrîşên li ser bajarên bakûrê kurdistanê ên ku rêveberîya xwe ya xweser denezendina ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûr, Farqîn, Kerboranê, Dêrîka çîyayê mazî û hwd ku dibê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de lê binerê û werêne ser ziman.
..

Abdusamet Yigit, 2016, Cizîra bota, Kurdistan

,,